# Giyana Azad Û Kurmê Darê

## Rojnivîsa Şehîd Zinar

DÎROKA ÇAPÊ: ADAR 2015

CIHÊ ÇAPÊ: ÇAPXANEYA ROJ

PIRTÛK: GIYANA AZAD Û KURMÊ DARÊ

KOMÎTEYA XEBATÊN ŞEHÎDAN A PKK'Ê- 3

NAVEROK

PÊŞEK ....................................................................................................7
PÊŞGOTIN ............................................................................................... 8
SALA NÛ BI PÊNGAVA BIHARÊJI HÊVIYÊN RÊXISTINÊ RE BÛNA BERSIV . 13
Li Aliyekî Amadekarî Li Aliyê Din Xinizî ........................................... 13
Hêjî Perçeyên Skoskiyê Li Wir in .................................................... 14
GEL Lİ SEROKATÎ Û RÊXİSTİNÊ XWEDÎ DERDIKEVE.................................. 21
Me Xinizî Li Şêx Se'îd Kir Em Ê Li We Jî Bikin................................. 21
Axaftiniên Li Qada Newrozê ........................................................ 22
Divê Em Bi Çavê Roj Çem Derbas Bikin.......................................... 23
Ji Aliyê Şopan Ve Ji Berfê Xirabtir e ............................................. 24
Ji Bo Ez Nekevim Vî Halî Ez Bi Baldarî Dimeşim ............................. 25
Ji Bo Heval Nekevin Xeteriyê Her Tiştî Digire Ser Xwe.................... 29
ÊDÎ FERSENDEKE WISA NAKEVE DESTÊ ME ........................................... 31
Cihê jiyana rêxistinê nebe girêdana bi nirxan ve jî namîne ............ 31
Bersiva Ji Bo Dijmin û Xayînan ....................................................... 31
AGIR DÎSA ZAROKÊN XWE HEMÊZ KIRIBÛ ............................................. 36
Plansaziya Piştî Civînê ................................................................... 37
DI ŞOREŞE DE LEHENGÎ XINIZÎ Û FERASETÊN ŞAŞ................................. 45
Di Dilê Hemû Gerîlayan De Heye Biçin Amedê............................... 45
Dema Çûn Çalakiyê Hemûyan Kêmasiyên Hev Bexşandin .......................46
Şaneya xayîntiyê Ya Di Hiş û Mejî De û kurmê ji darê .................... 48
Ne Bilbilik, Amed Jî Were Em ê Îro Derbeyê Li Dijmin Bixin ........... 50
Dîcle Ji Ber Ku Berpirsiyar Bû Ji Bo Keşfa Serê Sibê Ma Şiyar ......... 54
Heke Em Bibin Yek Ew Nikare Tiştekî Bike..................................... 56
Ne Kes Li Nuqteyê Hebû Ne Jî Kesî Ji Wan Re Nîşe Hiştibûn .......... 58
Wek Tûtiyan Gotinên Hev Dubare Dikirin ..................................... 60

Herêma şehîd Navdar ........................................................ 63
Wî Bênamûsî Giliyê Me Kiriye........................................................ 66
Çi Bû Çima Mayîn Teqiya ........................................................ 70
Tu Carî Jahrî Ji Têjikên Maran Xilas Nabe ........................................ 75
Ava Koyspî ji Kaniyên Buhiştê Ne........................................................ 76
Divê Mirov Amade Be, Ew Jî Dikeve ............................................ 78
Pêwîst Nake Em Li Pey Dijmin Bikevin Dijmin Hatiye Vir ................ 80
Me Henekek Kir Maksîmos Çawa Qîr Da ...................................... 82
Şûm Bin Li Wan Bixin Çekên Wan Rakin û Xwe Ji Gir Berdin .......... 84
Werin Radestî Edaleta PKK'ê Bibin ............................................ 91
Ji Ber Hevalên Wî Xew Nediket Çavên Wî...................................... 94
GIYANA AZAD........................................................ 99
Tenê Miriyên Sivîl Dabûn ........................................................ 99
Têkoşerekî Vê Rêxistinê Me Divê Ez Jî Werim ............................. 101
Heke Li Gorî Rêxistinê Tevbigerin Nayên Girtin............................ 105
Amadekariyên Civînê ........................................................ 106
Lingê Têkoşîna Me Yê Bingehîn Ziman e...................................... 108
Ew Nexwaze Jî Em ê Biçin Wir .................................................. 112
Em Piştre Biçin Plansaziyeke Din ............................................... 113
Tu Yê Di Pratîkê De Bipijî........................................................ 115
Heke Perwerdeyê Encam Girtibe Dê Di Karvaniyê De Diyar Bibe. 118
Erd Dihejand ........................................................ 118
Ji Aliyê Derûnî Ve Têk Diçin........................................................ 122
Dijmin Jî Got Du Leşkerên Me Mirine .......................................... 123
Êdî Çalakî Navendî Dihat Destgirtin ............................................ 125
Ev Der Keda Şehîd Navdar e ........................................................ 127
Rêwitiya Ber Bi Amedê Ve ........................................................ 128

Me Jî Xwe Daye Vî Karî ............................................................ 130
Ev Der Guncaw e.................................................................... 131
Dibe Em Careke Din Neyên...................................................... 132
Polêsan Em Şopandin ............................................................ 133
Divê Em Destê Xwe Zû Bigirin.................................................. 136
Amadekariyên Dawî.................................................................. 138
Ji Bo Bizivirim Jî Nehatime ...................................................... 140
Ew Ji Bo Çalakiyê Amade Dikirin ............................................. 141
Sekna Li Ber Difina Dijmin....................................................... 142
Me Dikarî Vê Nuqteyê Jî Bidin ................................................ 144
Bila Dûman Bike...................................................................... 144
Bavê Min Jî hez Ji Polêsan Nake ............................................. 145
Plansaziya  Xiniziyê ................................................................ 147
Em Zû Ji Vir Derkevin ............................................................. 148
Sibê Her Tişt Bihata Fêmkirin................................................... 149
XWEDAVENDA GORSÊ ............................................................. 152
ÇEND KES BÛN....................................................................... 155
STEMEK JI BO ROJÊ ................................................................ 159
TIRS ....................................................................................... 160
ZAROKÊN WELATÊ MIN .......................................................... 162
HÊVÎ ....................................................................................... 164
AZADÎ...................................................................................... 166
BÎRANÎNEK ............................................................................. 167
ÊDÎ KES NIKARE ME BIGIRE...................................................... 170
GERÎN...................................................................................... 173
GOTINEK ................................................................................. 174

XIYANET ........................................................................................ 175

JIBÎRKIRIN XIYANET E ........................................................................ 180

HÊVIYÊN MIN HENE ........................................................................... 181

SİZE GELİŞİM .................................................................................... 183

EZ MIROV IM...................................................................................... 185

EZ BI TE ŞA NEBÛM........................................................................... 187

HESTÊN MIN ÊN JI BO TE ................................................................. 188

LI DÛR LI MIN NEGERIN ..................................................................... 190

RONÎ'LEŞEN ÖZGÜR'LEŞİR.................................................................. 193

NAMEYÊN JI BO XWÎŞKA MIN ............................................................ 197

Jİ BER KU MİN ZÊDE Jİ TE HEZ DİKİR EZ Jİ TE VEQETİYAM ................... 197

EM HER ROJ XWE NÊZÎ AZADÎ Û SERKEFTİNÊ DİKİN ............................ 200

FERMANDARÊ DİLAN MÊRXASÊ AMEDÊ............................................. 202

Dİ CÎHANÊ DE KARÊ HERÎ ZAHMET MİROV PERWERDE KİRİNE ............ 206

TU YÊ ÇAWA Dİ XETA RÊBER APO DE BİMEŞÎ ...................................... 208

LI VIR KARÊ ME NE TENÊ ŞER E .......................................................... 211

KALEKÎ HEFTÊ SALÎ ............................................................................ 214

WARGEHA ZİVİSTANÊ PÊWÎST E ......................................................... 215

JI NIHA VE NÊZÎKATIYA DIJMIN DIYAR E ............................................ 216

GUL ÊDÎ XWE BI XWÎNA XWE DÊ AV BIDIN......................................... 217

EM Ê ÇAWA MIROVAHIYÊ BÎNIN CIHÊ KU HÊJAYÎ WÎ YE ..................... 223

RÊBAZÊN XWE GİHANDİNA HEQÎQETÊ ............................................... 229

DI BINGEHA HER KÊMASIYÊ DE PARA MIN HEYE................................. 234

PIRSGIRÊKÊN HEYÎ ÇAVKANIYA XWE JI MIN DIGIRIN........................... 237

AMED LI ÇAND Û HUNERA XWE XWEDÎ DERKEVE............................... 239

MIROV JI WAN WANEYAN BIGIRE ...................................................... 242

CARINAN KÊMASÎ JÎ MIROV BI PÊŞ DIXIN ......................................... 243

# *PÊŞEK*

*Em vê pirtûkê ji bîranîn û hestên hevalê şehîd Zinar ji hevrêyên xwe re radigihînin.*

*Hevalên hêja hûn ê di vê pirtûkê de hest û ramanên gerîla bibînin. Gerîla çawa jiyan dike, helsûkeftina gerîla çawa ye, hûn ê bi awayekî rastîn bibînin.*

*Di vê pirtûkê de hûn ê li nav eyleta Amedê bigerin, bejahî, erdnîgariya Amedê û rewşa ku niha Amed tê de ye binasin. Ev pirtûk ê carinan we bibe ber Çemê Dijleyê û bigerîne, hin caran jî we bibe lûtkeyên çiyayên ku bixwîna şehîdan hatine avdan. Hin caran pirtûk wek roman hatiye destgirtin, hin caran jiyana gerîla hatiye destgirtin û hin caran jî xweşikiya çiyayan vedibêje.*

*Di pirtîkê de giyana li pey azadiyê bibînin, hin caran şaneyên xiyanetê ku di hiş û mejiyan de bi cî bûne bibînin. Ev şane wek kurmê darê çawa nahêlin ku dar di xwezaya xwe de bijî û darê dixin xwarê bibînin. Hûn ê çawa ku jahrî ji têjîkên maran xilas nabe û kengê keysa wan lê were dê wê fersendê bernedin bibînin.*

*Hevalê şehîd Zinar hestên ji bo hevaltiyê û hestên ji bo xwîşka xwe bi pênûsa xwe aniye ser ziman. Hin caran bi rojnivîs, hin caran ji bo xwîşka xwe û hin caran jî bi helbestan hestên xwe yên giranbuha anîne ser ziman.*

*Em wek* ***"Komîteya Xebatên Şehîdan a PKK'ê"*** *vê xebata şehîd Zinar ji hevalan re radigihînin. Gihandina xebateke wiha ji bo me cihê şanazî û serfiraziyê ye û em pê dilşad dibin. Em hêvîdar in hûn ê bi vê xebatê dilşad û bextewer bibin.*

**KOMÎTEYA XEBATÊN ŞEHÎDAN A PKK'Ê**

# PÊŞGOTIN

***Îro yekane jiyana ku ji bo Partiyê bê ferzkirin, jiyana şehîdên berxwedanê ye ku stûnên têkoşîn û pêkhateya Partiya me pêk tînin.***

***Xelekên esasî ku çêbûna PKK'ê û yekîtiya teorîk û pratîk a PKK'ê di zikhev de dihone, vaye ev nirx in.***

***PKK ne pêşketineke ji rêzê lê pêşketineke ku bi xwînê pêk tê esas digire.***

***Ew jî ji girêdana bi bîranîna şehîdan ve fêm dike: jiyaneke hê pêşketî pêşkêşkirina pêşeng û bi xwe re pêşketin çêkirina pêşeng. Ev nirx bi awayekî rast an jî bi awayekî çep fêmkirin, bi awayekî nebes an jî şaş şîrovekirin, tê wateya pêşketin û jiyaneke herî bêesil hildigire nava Partiyê. Ji ber vê yekê neçar e; divê yên di nav refên pêşengiyê de ne xwe bikin sentezeke nirxên şoreşgerî yên şehîdan. Li gorî demên derbasbûyî, wezîfe û erkên pêşeng ên pêwîst e li pêşberî şehîdan bînin cih zêde bûne. Lê ji ber destkeftên ku qehremanên berxwedanê, zemîna xwe spartinê jî li gorî demên derbasbûyî, bi qasî ku li gel raboriyê ve neyê pêşberî li hevkirin bihêz bûye. Ji van nirxan her yek, riya me ronî dike û bûye meşale. Kesên ku dibin xwediyê van nirxan û dixwazin pê bimeşin, ji bo wan êdî rê heta asta dawî ronî bûye, hêsan bûye. Lê yên dikevin ser riya serxwebûn û azadiyê, divê bimeşin, hem jî bi terzeke herî şoreşgerane bimeşin. Domdariya tevgerê pêkanîn û ji bo ku ew were mezinkirin, pêwîst e bi misogerî ji asta ku hatiyê paşveketin çênebe.***

***Ji bo ku taybetmendiyên milîtanî yên Partiya me bên pêşxistin, îro di nava Partiya me de şerekî mezin tê meşandin. Yek ji pirsgirêkên me yên herî acîl ev e: Gelek asteng hene ku ji ber vê yekê kadro û milîtanên me nikarin bibin fermandarên taktîkî. Pêwîstiya gelê me bi navendeke fermandariyê ku biryarên rast digire, pêk tîne û timî dixebite bi awayekî eşkere li holê ye. Tevî ku ev rastî, ji aliyê Serokatiya Partiyê ve bi hemû aliyên xwe ve weke neçariyekê daxistibûn holê û Partiya me ev kiriye biryar jî, hin kesên di nav Partiyê de ku ji hin bingehên cuda yên çînî tên, xwediyê asteke cuda ya îdeolojîk û polîtîk in, bi helwestên ku nîşan dane bi zanebûn an jî nezanebûn vê zehmet dikin. Lê di nav tevgerek ku ew qas mezin û biesil de jiyankirina van û bi wê wêrîn jî têrê dike da ku kesek bikeve nav rewşên pir zehmet. Wê demê, neketina nav van rewşan û rewşa ketinê çêbe jî dawî lê anîn, layiqê şehîdan bûn talîmatek e.***

*Partiya me bi armanca ku ji bo pêvajoya li pêş me amadekarî bike, li derve û hundir pir zêde hewl dide. Bi taybetî di nava Partiya me de em hewl didin ku raboriyê di asteke herî li pêş binirxînin, şaşîtiyan, xêran, tiştên hatine qezenckirin û tiştên hatine windakirin careke din hewl didin ku hê baştir bê fêmkirin. Gava ku di demên pêş de têra xwe hate derxistin wê hê baştir were dîtin ku ev raboriya bi zêde daneyan (veri) dagirtiye, temînata pêşeroja me ye.*
*Tenê dikare bi xwespartina bîranînên şehîdên me, em xwe bigihînin pêşeroja em divên.*
*Partiya me di pêvajoyên pêş me de bi biryarên konferans û kongreyan, wê van weke rêgezên jiyanê, weke zagonên Partiyê be lê bike; jiyana şehîdên me, berxwedanên wan û bîranînên wan, di her qada têkoşînê de wê bibe yekane hêz û pîvana ku bi pêş dixe û pêşketina xwe didomîne…*
*…..Hemû endamên Partiyê deyndarê şehîdên me yên berxwedanê ne; ev, dilsoziya bi şehîdan re ye û deynekî pir mezin e.*
*Em îro xwediyê hêzeke berxwedanê ne ku bi saya hewldan, fedekarî û wêrekiya şehîdên me xwe gihandiyê. Gelê me pêngaveke mezin û pêşketineke mezin çêkiriye. Wê demê divê em nirxa van destkeftiyan baş zanibin. Em ê van ewladên herî bijare yên mala me ya Mezin Partiya me di nav dilên xwe de bi cih bikin û di zanabûna xwe ya ronak de timî zindî bigirin.*
*Em ê bi wan re bifikirin û bi wan re bibîzin.*
*Her wiha em ê di her kêliyê de, her saet di nav têkoşîn û pêşeroja xwe de wan bidin jiyîn. Îro şerê me yê berxwedanê hatiye ber deriyên xeta taktîkî. Ku hedefa wê "gel di nav cepheyê de birêxistin kirin û di nav artêşa gerîla de şer dana kirin e". Berpirsiyariya me ew e ku em weke pêwîstiyeke girêdana bi welat, gel û şoreşê re jî vê wezîfeyê pêk bînin.*
*Amadekariyên bi vê zanebûnê tên meşandin, ji bo afirandina rêxistinbûna artêşê bi lêz pêş dikeve; ji bo ku gelê me bi rêxistina xwe ya cewherî re bibe yek, tewdîrên derxistina qanûna leşkriyê jî di nav de, amûr û rêbazên pêwîstî bi wan heye tên bi pêşxistin. Partiya me afirandina artêşa gerîla ji xwe re kiriye hedef. Em ê vê jî bi honandina cepheyekî neteweyî li derdora kadroyên bijare yên Partiyê re di zikhev de çêbikin. Partiya me ji bo pêkanîna van hedefan xebata xwe kûr û giran kiriye. Hemû endamên Partiyê di heman demê de ev erka dikeve stûyê wan ku bicihanîna wesiyetên şehîdên me yên mezin, wê bi*

*misogerî bînin cih û bi zanebûn û berpirsiyariya vê bi awayekî watedar bijîn.*
*Di dema pêş me de wê kongre û konferansên Partiya me bên lidarxistin. Partiya me wê di van xebatan de ji bo ku aliyê rêxistinî yê avabûna Eniya Rizgariya Neteweyî were mezinkirin xebatên pêwîstî bi wan heye li dar bixe û tewdîrên sazîbûnê bi pêş bixe. Dema li pêş me, ji bo ku em bi van erk û wezîfeyên xwe rabin wê bi awayê herî berhemdar bê nirxandin.*
*Dîsa di vê çarçoveyê de ji bo rêxistinbûn û perwerdeyeke hê li pêş wê plansaziyên pêwîst bikin bên lidarxistin; ji bo pratîkeke rast û têrî dike wê amûrên pêwîst ji niha ve bên amadekirin.*
*Kar û xebata Partiyê li ser vê bingeha girîng bi pêş dikeve û wê di mijara tifaqan de pêşketinên erênî û girîng bên jiyîn. Di pêvajoya pêş me de weke em li bendê ne, li hundir tifaqên li ser bingeha eniyê pêş bikevin û li derve jî di mercên ji yên timî zêdetir çêkirin û kûrkirina têkîliyên dostane wê bên domandin. Ji ber berxwedanê, şehîdên me yên berxwedanê çêdibin. Pêwîst e ev windahî bên pêşwazîkirin. Ji bo vê divê em hê zêde kadroyên nû perwerde bikin; kadroyên ku karibin di astên li pêş de têkoşînê bimeşînin, endamên kadro yên nû biafirînin û amade bikin. Partiya me, bi vî awayî, wê avabûna xwe ya rêxistinî bi lez pêşdebirinê bidomîne; wê vê jî li ser esasa têkoşîna li dijî bi her awayî jirêderketinên rast û çep pêk bîne, rêxistinkirina xetê bi kontrol û pratîkeke xurt hê bihêztir bike û bimeşîne…*

***RÊBER APO***

***Ji Dahûrînên Gulana 1986'an***

# GER TU BIPIRSÎ
# NAVÊ MIN
# EW AMED E BAVÊ MIN
# ABERNA YA DELAL E
# DAYIKA MIN

# SALA NÛ BI PÊNGAVA BIHARÊ JI HÊVIYÊN RÊXISTINÊ RE BÛNA BERSIV

## Li Aliyekî Amadekarî Li Aliyê Din Xinizî

Dema ku em dest bi sala nû bikin, zehmetiyên hatî jiyankirin derbas kirin, wek rêxistin û qad pêywîrên ku dikevin ser milên me bi cih anîn û guhertina rojevê, ji bo rêbazên nû piştgriya çalakiyan kirin.

Di destpêkirina demsala nû de, wek eyaleta Amedê derbaskirina zehmetiyên ku sala borî, ji bo çalakiyan rêbazên nû peyda kirin û ji derveyê çalakiyên sabotajê çalakiyên çekdarî û yên serdegirtinê derbasî meriyetê kirin, pêşxistina çalakiyên bi bandor û bideng, her wiha pêkanîna erkên ku dikevin pêşiya qadê û di vê derbarê de heviyên rêxistinê pêşwazî kirin û bûna bersiv. Pirî caran ev mijar hatine diyarkirin. Di perwedeyên zivistanê yên lêşkerî û siyasî hatine dîtin de, ev hatine ser ziman.

Bi hatina biharê re hêzên li qadan ji bo keşif, venasîna bikin û hedefên guncaw bibînin, di hin qadan de li hemberî hêzên dijmin yên ku bi piyade derketine bejayî teşebûs kirin e. Li herêma Şehîd Brûsk yekeyeke dijmin ku derketîbû Gorsê, li hemberî vê yekeya dijmin çalakî li dar dixe, di vê çalakiyê de sê leşkerên tirk tên kuştin û dema hevalek di milê xwe de bi aweyeke sivik bîrîndar dibe bi şûnde vedikişin. Di qada Şehîd Serxwebûn de du rev çêdibin. Lê li hemberî van revên ku çêbûyî ji bo keyfxweşî û manewiyata hevalan bandor neke, li hemberî yekeyên dijmin yên derketine arazî hevalên ku çalakiyê dikin, ji aliyê wan ve du leşker tên kûştin. Piştî vê bûyerê çend roj şûnde li qadê reveke din çêdibe.

Li ser wan revan; ji wan revan şûndetir, rêxistinê rêveberiya herêmê guhert. Li herêma Ş. Sînan jî hêzên dijmin yê derketibûn

operesyonê, heval diçin li pêşiya wan bi cî dibin. Dema êvarê paşve dikişin dikevin kemîna hevalan û du leşkerên wan li cihê bûyerê tên kuştin. Dema ku ev çalakî pêk hatibûn hê Koyspî, ango herêma Ş. Mezlûm ji wargeha zivistanê derneketibûn. Herêma Apê Mûsa di 22'yê reşemiyê de ji wargeha zivistanê derketibûn. Bi awayekî sê yekeyan xwe birêxistin kiribûn. Ji ber ku herêma Apê Mûsa ji aliyê erazî ve wek herêmên din xurt nabe, despêka biharê hê zêdetir xwe diparêze.

## Hêjî Perçeyên Skoskiyê Li Wir in

Demeke dirêj bû ku em ji hevalan qetiyabûn. Yekeya me li Cimsaqê bû. Îro 22'yê adarê bû. Ji bo me anons hat kirin. Me di anonsê de şîfre girt. Cihê ku dabûn me, me çar hevalan jî ew cî dernexist. Fermandarê me yê yekeyê H. Baran bû. Ji me pirsî, got: "Van cihek dan me, lê em wir nizanin. Em biçin ku derê?" Me texmînî çend nuqte gotin. Herî dawî, me biryar li ser nuqteyeke li Şelê da. Ev nuqteyeke ku me payîzê dabû şixulandin. Navê vê nuqteyê di şîfreyê de tunebû. Navê hevalan di şîfreyê de dabû me, me ew nuqte dernexistibû. Me got; îhtîmaleke mezin ew nuqte be.

Di despêka biharê de hêzên eyaletê ketibûn nav liv û tevgerê. Hê di despêka biharê de li herêma Ş. Brûsk hêzên dijmin ên ku derketibûn operesyonê, ji aliyê hevalan ve tên ferqkirin. Li KoyêGorsê, li jor nuqteya Ş. Zinar xwe bi cî kiribûn. Koyê Gorsê, hemû derên wê şkêr in; di her derî de cî (rê an cih) nade. Yê ku Gorsê baş nas neke, dibe ku winda bibe. Yê ku nas bike jî, bi şev nikare bigere. Di Gorsê de av tuneye; ji ber ku binê wî valetî ye, av tê de nasekine. Her derê qulik, şkeft û bintaht in. Heval bihar û payîzan di Gorsê de ava xwe kom dikin. Gorsê hem şkêr, hem jî

daristan e. Çend riyên wî tenê hene. Aliyekî Gorsê girêdayî Amedê, aliyekî wî jî girêdayî Elezîzê ye. Li aliyê Pîranê girê Tunegiratê, li milê Arîcaxê jî Ûçqûla heye. Di navbera van her du çiyayan de jî mila (sırt) Pirijmûnê heye. Di navbera van çar milan de deşt cî digire. Derdora vê deştê hemû daristan e. Nava wê erdên vale ne. Bîreke avê di nav vê deştê de heye; lê belê havînan zuha dibe. Di navbera girê Tunegirat û mila Pirijmû de kaniya Pirijmû heye.

Ş. Zinar di ketina Gorsê de bû. Hêza dijmin a ku li jora Ş. Zinar bû. Dijmin ji vir zêdetir nikaribû xwe berda nav Gorsê

Berêvarkî komek heval bi dizî xwe nêzî dijmin kir. Dema ku dijmin ket mesafeya narincokên hevalan, hevalan bi narincok û çekên ferdî lê xistin. Di heman demê de dijmin jî bersiv da. Çend xulekan li hemberî hev şer domiya. Di vî şerî de du leşkerê dijmin miribûn.

Piştî wê, vê carê dijmin derketibû Wişkaleyê. Wişkale jî hemû şkêr û dar in. Di çûna se dijmin de, eraziyekî wek Wişkale zaf rihet e. Wekî din jî dê bi tabûran leşker tê de were veşartin. Mirov ji serê sibê heta êvarê dûrbînê bavêjê jî, mirov dijmin tê de nabîne. Eraziyê wî ji bo veşartinê zaf baş e. Şkêrên wî û daristanên wî, hem mirov diparêzin, hem jî mirov vedişêrin. Serê Wişkale cih bi cih rast e. Darên wî bilind û şkêrên wî kozikên xwezayî ne. Vê carê, hevalan yekîneyeke dijmin li ser milên Wişkaleyê dîtin. Çiqas heval hebûn, vê carê hemû ji bo biçin ser dijmin ketin nav amadekariyan. Nêzî deh hevalan bîksiya xwe jî girtin û çûn.

Di plansaziyê de dê hemû heval xwe nêzî dijmin bikin; hemû bi hev re li wan bireşînin. Piştre ew ê weke paşde bikişin, xwe bi şûnde bidin û li hemberî skoskiyê bisekinin. Dema skoskiy were dê hemû bi hev re li skoskiyê bidin û têk bibin.

Dema hevalan xwe nêzî dijmin kir, hê haya dijmin ji wan tunebû. Sê hevalan di mesafeyeke nêz de, her yekî li leşkerekî

nîşan girtibû. Bi lêxistina van hevalan re, hevalên din jî dê bi carekê bi ser dijmin de bireşînin. Bi lêdana her sê hevalan, hevalên din jî bi ser dijmin de reşandin. Her sê leşker ketin, ên din jî xwe avêtin erdê. Bi sekinîna dengê çekan re, vê carê dengê qîrîn, girî û hewar hewara leşkeran dihat. Hin leşkeran hê şoqa bûyerê ji ser xwe neavêtibûn. Wek dînan li derdora xwe gule direşandin û xeber ji derdora xwe re didan.

Wê demê hevalan xwe qedemeyekê bi paşve kişandibû û li benda skoskiyê bûn. Bê îstîsna, her dem piştî her çalakiyê, skoskiy ji bo mirî û birîndarê xwe rake tê. Lewre hevalan ji bo wê piştî çalakiyê, xwe ji cihê çalakiyê dûr nexistibûn. Hevalê Heqî, ji hevalê li kêleka xwe re got:

“Dema skoskiy hat deyne, bi lêdana bîksiyê re bila hemû heval bi carekê lêdin; nehêlin skoskiy rabe û li wir bikeve.

Piştî bûyerê bi çil xulekî, ji milê Elezîzê ve skoskiyek hat, li derdora cihê bûyerê çend çerx (tur) dan xwe û hêdî hêdî daket. Hevalan jî pozîsyona xwe rast kirin. Dilên wan di qefesa xwe de nedisekinî. Ji ber ku heta niha, di eyaletê de bi çekan helîkopter neketibûn

2006 Dema ku li herêma Ş. Remzî operesyoneke berfireh dest pê kiribû, di bejahiyê de leşkeran lêgerîn pêk dianîn, skoskiyan jî li girên bilind leşker dadianîn. Hevalê Soro skoskiya ku li ser mayînê danîbû bi qomandaya dûr mayîn teqandibû. Li wir neh tîmên taybet û pîlot di hundirê skoskiyê de miribûn û skoskî jî perçe bûbû. Hê jî parçeyên skoskiyê li gir in.

Dema skoskî hêdî hêdî dadiket, kelecana (heyecan) hevalan bi bayê perwaneya skoskiyê re pêl bi pêl zêde dibû. Dengê bîksiyê kelecana hevalan avêtibû aliyekî û hemûyan bi hev re gule li skoskiyê direşandin. Guleyên ku li cam û kaportaya skoskiyê diketin, çirûsk ji skoskiyê radikirin. Pîlot û leşkerên ku berî

demjimêrekê derbe xwaribûn, şaş û mat bûbûn. Pîlot fêm kir ku ew ê nikaribe skoskiyê deyne. Skoskî rakir û ji cihê bûyerê dûr ket. Dengê wê qut bû. Leşkerên li derdora miriyan jî, her yek bi qîrîn û hewar bi cihekî ve reviyan. Heval di lêdana leşkeran de gihîştibûn armanca xwe; ji aliyê skoskiyê ve negihîştibûn armanca xwe. Divê skoskî li cihê bûyerê biketa. Lê skoskî ji cihê bûyerê bi awyekî derbexwarî reviyabû û piştre dengê wê qut bûbû.

Hevalê Heqî: "Heval ew helîkopter ket. Piştî dûr ket, dengê wê qut bû. Bila îro çend heval, hem cihê çalakiyê qontrol bikin, hem jî biçin derdora gundê Wişkulayê meyze bikin. Ji gundiyan jî pirs bikin; ka tişt dîtine yan nedîtine. Tekmîla leşkeran bidin, a helîkopterê jî bêjin; me lê daye, em ê ketina wê misoger bikin.

Hevalê Yaşar: "Ez û hevalekî em ê biçin, em ê hem li cihê çalakiyê meyze bikin, hem jî em ê biçin ji bo ketina helîkopterê zelal bikin."

Hevalê Heqî: "Hevalê Ziya çi dibêjî; bila heval biçin zelal bikin?"

Hevalê Ziya: "Çi bêjim. Hevalê Yaşar jî dikare biçe, ez jî dikarim biçim. Ferq nake.

Hevalê Yaşar, Armac û Egît ber bi cihê çalakiyê ve meşiyan. Dema gihîştin cihê çalakiyê:

Yaşar: "H. Egît, cihê ku dijmin lê bû ne ev der bû?"

Egît: "Erê ew li vir bûn."

Girê li hember nîşan da û got:

"Me jî ji wir li wan da."

Armanc: "Li vir qet şop nîn in. Em ne li cihê şaş bin? Ne xwîn heye, ne jî tiştekî din heye."

Egît: "Ev der e heval, va li vir patekî bi xwîn heye û çend dilopên xwînê jî pijiqîne vir."

Yaşar: “Temam, em biçin gund, ka em di derbarê skoskiyê de agahiyan nagirin.”

Xwe di nav şkêran re berdan û bi aliyê gund ve meşiyan. Hê roj bû. Li vir bi giştî heval bi roj tevdigerin. Ji ber ku bi şev di erazî de zahmetiyan dikişînin, piştî nîvro karê xwe dikin. Hevalan xwe ji mila Wişkulayê bi ser gundê Wişkulayê de berdan jêr, hatin nav zeviyan. Mirovek ji wan dûr di nav zeviyan de dişixulî.

Armanc got: “Hevalê Yaşar, em ji vî gundiyî pirs nekin; çi heye, çi tuneye?”

Yaşar: “Em biçin bipirsin.”

Dema bi aliyê gundî ve meşiyan, haya gundî ji wan tunebû. Gundî ji bo ajal nekevin nav zeviyê. Bi dirî û guliyên daran ên hişk derdora zeviya xwe digirt. Heval di nav zeviya herî de ber bi gundî ve dimeşiyan. Ji ber ku bala kesî nekişînin, wek gundiyan di kêleka hev re ber bi gundî ve diçûn. Carinan jî heriya ku bi pêlavên wan ve dizeliqî dadiweşandin; xwe ji heriyê xilas dikirin. Dema nêzî gundî bûn, hê haya gundî ji wan nebû.

Armanc: “Apo qewet be!

Gundî dimilî bû. Wek pê re bi tirkî hat axaftin. Li pişt xwe zivirî, dema dît ku heval in; çongên wî lerizîn, zimanê wî li nav hev ket.

Armanc: “Apo, duh êvarê helîkoptera me li vî aliyî ket. Te nedît li ku ye?”

Gundîgot: “Helîkoptera çi, ketina çi, gund tijî leşkerin, zû ji vir biçin!”

Her wiha gundî wek ku bireve, ber bi gund ve ji wan dûr ket.

Yaşar: “Hemû bênamûs in, alçaxan nabêjin.”

Heval ji wir ber bi qûntara Wişkuleyê çûn. Dema heval gihîştin nêzî gewriyê, ji gund dengê çekan hat. Gule bi ser wan de direşandin.

Armanc: ”Ji Arîcaxê guleyan tavêjin me.”

Yaşar: “Nexwe wî alçaxî giliyê me kiriye. Nikarin werin ji wir guleyan bi ser me de direşînin.”

Dema çûn nuqteyê tarî ketibû erdê. Hevalên nuqteyê li ber pelan rûniştibûn û çay vedixwarin. Gotin:

“Qewet be?”

Cî dan wan.

Heqî: “Çi bû? We tiştek dît? We agahî ji helîkopterê girtin?”

Yaşar: “Em çûn cihê çalakiyê, patekî bi xwîn û çend dilopên xwînê li ser keviran hebûn. Wekî din me tiştek nedît.”

Heqî: “Na yaw, we baş li wan deran meyze kir. Na heval ne wilo ye, we baş li wan deran meyze nekiriye yaw. Min li leşker da, wisa sekinî û ket. Me zaf leşkerên mirî dîtine.

Yaşar: “Heval, li wir tiştek nebû. Heval jî li wir bûn. Ji bo helîkopterê jî, me gundiyek di nav zeviyan de dît. Zilam em dîtin reviya. Got: “Di nav gund de dijmin heye.” Helîkopter jî nedîtibûn.”

Heqî: “Na heval, ne wilo ye. Yaw min dît zilam ket. Ne wilo ye hevalê Ziya.”

Ziya: “Wele bêjim çi heval. Ancax sibê em biçin lê meyze bikin.”

Bû sibe Heqî, Ziya û çend hevalên din çûn cihê çalakiyê, li ser keviran tijî xwîn bû. Dema ku dijmin, miriyên xwe bi erdê ve kaş kiribûn, cihê ku tê re biribûn tev bûbû bi xwîn.

Heqî: “Yaw wilo karê… herhalde hevalan li cihê şaş meyze kirine. Em wêneyên vê xwînê bikişînin. Meyze bike mirî wilo di vir re kişandine.”

Ziya: “Vî şapînokî (uyduruk) hem di kozika xwe de xwarin xwariye, hem razaye, hem jî tê de nepakiya xwe kiriye. Tam şapînok in. Ziravên wan diqete.”

Heqî: “Yaw wilo ji mirinê ditirsin. Ne armanca wan heye, ne jî cesareta wan. Ew ê di kozikê de… jî û ew ê bi xwe de jî birîn.”

Ziya: “Leşkerê ku Armanc lê xistiye dibê qey nemiriye. Çend dilop xwîn tenê hene. Dibê qey gule li pêçiya wî ketiye.”

Heqî: “Na yaw, em neçin. Wilo tên karê ewk dikin, mirov dîn dikin.”

Dema ku ji cihê çalakiyê dûr ketin û ber bi nuqteyê ve meşiyan, hê jî hêrsa hevalê Heqî daneketibû. Ji aliyê xwe ve mafdar bû. Bi rastî jî hevalan li cihê şaş meyze kiribûn û agahiyên şaş dabûn wî.

# GEL Lİ SEROKATÎ Û RÊXİSTİNÊ XWEDÎ DERDIKEVE

## Me Xinizî Li Şêx Se'îd Kir Em Ê Li We Jî Bikin

Serê sibê hê tarî bû, Yûsif banî Baran kir, go: “Rabe keşfê bike, kêm maye dinya ronî bibe. Baran rabû dûrbîna xwe girt, berê derdora xwe guhdar kir. Piştre çû cihê keşfê. Dema dinya ronî bû, dûrbîn avêt derdoran hemûyî. Dema tiştek nedît, hat ji hevalên xwe re rojbaş kişand.

Baran: “Rojbaş heval! Rabin îro Newroz e; hûn hê razayîne. H. Cotkar rojbaş, Yûsif, Zinar, rojbaş! Mala we, niha gel hemû li qadan kom bûne, hûn hê ranebûne. Hevalên wî jî, jê re gotin: “Rojbaş! û rabûn. Dinya zaf sar bû. Çaydana xwe tijî av kirin, tûpên xwe pêxistin û çaydana xwe dan ser. Hemûyan destên xwe dan ber tîna agir. Destên wan germ nedibûn, lê dîsa wan destên xwe didan ber. Belkî jî bûyereke derûnî bû. Yûsif bêdengiya wan xira kir.

Yûsif: “Şelêhaydan duh êvarê Newroz pîroz nekirin. We qet meyze kir?”

Zinar: “Şelêhaydan û Dêrnan, ku Newrozê pîroz bikin, wê demê dê şoreş bibe. Di vê axa bê xêr de kes Newrozê pîroz nake.”

Baran: “Zilaman li Şêx Se'îd îxanet kirine.” Bixwe jî dibêjin. Dibêjin: “Heval, me îxanet li Şêx Se'îd kiriye; em ê her li we bikin. Baweriya xwe bi me neyînin.”

Çaya wan keliya. Taştêya wan ji zeytûn, toraq, penîr û sarelayê pêk dihat. Taştêya xwe kirin. Ji ber ku cihê wan di navbera du şkêran de bû, pir sar bû; di cihê xwe de dilerizîn. Rojê heta derengî tava xwe li cihê wan nedixist. Ji bo wê jî kesî kîsê xewê kom nekiribû. Cotkar carekê got:

“Pir sar e. Em agir pênexin?” Me her roj van deman agir pêdixist.”

Lê belê Baran nepejirand.

Got: “Hê zû ye.”

Li ser vê Zinar kîsê xewê avêt ser xwe û xwe dirêj kir. Bi dengekî şiyar bû. Yûsif jê re got:

“Çaydan, şekir û avê bigire were ber agir.”

## Axaftiniên Li Qada Newrozê

Rabû tiştên jê xwestibûn girt û derket cem hevalên xwe. Di nav şkêran de agirek dadabûn. Wî jî xwe germ kir. Dema ava çayê keliya qahwe û çay têkelhev, di nav hev de dagirtin. Zinar û Baran her yekî ji xwe re cixareyek jî pêçan. Piştre agirekî mezin dadan. Zinar wênegir derxist û li ber agirê Newrozê wêne girtin. Radyoya Dengê Mezopotamya ji Newroza Amedê weşana zindî dikir. Axaftina Leyla Zana, Osman Baydemir û Ehmed Turk wan, zindî diweşandin. Leyla dîsa ji Ameda dilşewitî, Osman ji kelandina kundirê qirş û Ehmed jî ji dikana Beko û çend qalibên sabûnan mînak didan û Erdoğan teşhîr dikirin.

Heval li Cimsaqê bûn. Cimsaq di sêkuça Amed, Çewlik û Elezîzê de ye û ev der girêdayî Amedê ye. Di herêma Apê Mûsa de eraziyê herî xweş e. Bi şkêr û daristan e. Eraziyekî Ji bo sizme û derbe danîna dijmin dest dide. Lê belê piştî paşvekişînê gundiyan daristanên wê hemû jêkirine. Yek jî pirsgirêka wê ya avê heye. Ji bo wê jî heval vir naşixulînin. Qûntarên niha heval lê disekinin hemû xîz e. Lê di nav şkêran de ciyê dest bidin hene. Gundên li derdorê, gundên ne baş in.

## Divê Em Bi Çavê Roj Çem Derbas Bikin

Bû roja din, di cîhazê de ji bo hevalan anons hat kirin; hevalan di radyoyê de anons dişopandin. Di şîfreyê de cihê ku dabûn wan kesî nizanibû. Çend nuqte texmîn dikirin. Ji ber ku navê wan nuqteyan di şîfreyê de nebû; li ser nuqteyekî biryar girtin. Gotin: “Em ê biçin nuqteya şûtikê.” Berêvarkî erzaqê zêde veşaşrtin, hê ji êvarê re gelek mabû, lê ew ketin rê. Ji ber ku li ser riya wan ava Çemê ‘Elik hebû, divê ew çem bi çavê roj derbas bikirana. Yê ku vî çemî nas neke, biharan nikare derbas bike. An ew ê di ser piran re derbas bibe, an jî divê cihê ku av rê dide nas bike. Dijmin, biharan bi hêviya ku rojekê heval di ser piran re derbas bibin, her dem li ser piran kemînan datîne. Lê heval bi piranî cihê ku av rê dide nas dikin û vê hewldana dijmin vale derdixin.

Heval hê bi çavê roj hatibûn ber çem. Du bi du, bi destên hev digirtin. Xwe bi cil, bi alavên leşkerî û bi çente li çem dan. Avê da şûtika wan, qûma di nav avê de ji bin lingên wan diçû. Lê belê wan dizanibû divê di nav avê de nesekinin. Dema bisekinin, qûma bin lingên wan biçe dê lingên wan têkeve valetiyê û dê bikevin. Ji bo wê jî di nav avê de bi lez dimeşiyan. Dema çem derbas kirin qet nesekinîn. Nav pêlavên wan tijî qûm bûbû û av ji şalên wan diçû. Girek li pêşiya wan hebû, ew gir derbas kirin. Çûn pişt gir, di dolê de şalên xwe guvaştin, pêlavên xwe paqij kirin û riya xwe dewam kirin.  Dema gihîştin nuqteyê bûbû nîvê şevê. Nuqteya ku ew ê biçinê, hê riya nîv şevî mabû. Ji ber wê jî, ew ê îşev li vir bimînin. Dema singer û kîsê xwe yên xewê raxistin, hê jî zuha nebûbûn. Tenê goreyên xwe guhertin û razan.

## Ji Aliyê Şopan Ve Ji Berfê Xirabtir e

Serê sibê zû Yûsif rabû çû keşfê, derdor kontrol kirin, dûrbîn avêt ciyê ku jê ve xwiya dike. Dema ku tiştek nedît, dar kom kirin û xwe berda cem hevalên xwe. Rojbaş kişand û agir pêxist. Hemû li derdora agir kom bûn;ji ber ku hê zuha nebûbûn, hem xwe germ dikirin, hem jî xwe zuha dikirin..

Cihê ku lê bûn jê re digotin: "Orta Alan." Ji ber ku ev der navenga herêma Apê Mûsa bû. Ev der ji hezaran gir (tepe) pêk tê û bi ew qas jî dolikan. Tu gir li ser girekî din bandora xwe nake. Cih bi cih daristanên wê jî hene. Bihar û payîzan di hemû dolikên wê de av diherike. Havînan jî dilopek av tê de nayê dîtin. Zivistanan jî berfê nagire, lê dema axa wê têr avê vexwe heriya wê di ser pêlavan re davêje û dide çongê. Ji aliyê şopan ve ji berfê xirabtir e. Yan divê mirov nemeşe, yan jî divê mirov av û av bimeşe. Ber êvarê dîsa xwe kom kirin, bi çavê rojê pêşiya xwe keşif kirin.

Divê dîsa Çemê Elik qut bikin û derbasî aliyê din bibin. Ji nuqteyê derketin, ji ber ku şopan dernexin di kêleka dolê re meşiyan. Kêleka dolê jî ji kevir û xîçikan pêk dihat. Ji ber wê şop dernediketin. Dema hatin serê dolê dîsa pêşiya xwe keşif kirin, xeta cihê ku biçinê tiştek nedîtin. Ji wir meşiyan hatin kêleka çem. Vê carê şal û pêlavên xwe derxistin û li avê dan. Dema hatin binê nuqteyê rûniştin.

Baran: "Em ê ji vir di çend demjimêran (se'et) de biçin?"

Zinar: "Em ê bi van baran ve di sê demjimêran de biçin."

Baran: "Em ê di şiverêya (patîqa) cem şkeftê de biçin. An riyeke din heye."

Zinar: "Na, na şiverê di taxa vê gomê de ye."

## Ji Bo Ez Nekevim Vî Halî Ez Bi Baldarî Dimeşim

Dema cixareyên wan qediyan, qadereke din jî di rê de meşiyan û ketin ser şiverêyê. Ev şiverê diçû serê Çiyayê Şelê. Ev çiya qûntara wî ye. Jor hemû şkêr bûn. Şkêrên wî piranî jî şkêrên kor bûn. Bintaht tê de zaf kêm hebûn. Cih bi cih qulik jî tê de hebûn. Lê ev qulik ne qulên mezin û fireh bûn.

Qûntarên wî yên jêr hemû daristan bûn. Li jêra wî nêzî heşt kaniyan hebûn. Li ber wî jî çar-pênc kanî hebûn. Çend şkeftên wî yên zaf mezin hebûn. Şkeftek di navbera gundê Mehmê û Goma Şelê de hebû. Nêzî sed kesî dikaribûn têketanê. Şkeftek din jî nêzî wê şkeftê bû. Şiverêya ku heval tê re derbas dibûn deh xulek (deqîqe) dûrî wan bû. Navê vê şkeftê; şkefta Hevalê Mezlûm bû. Hevalê Mezlûm û yazdeh heval di 2002'an de di vê şkeftê de şehît ketibûn. Ji ber wê navê Hevalê Mezlûm dabûn vê şkeftê.

Şkefteke din jî di navbera gundê Şelê û Goma Şelê de hebû. Ev şkeft pazdeh xulek li jor Goma Şelê bû. Ev şkeft jî zaf mezin bû. Vê zivistanê pazdeh hevalan xwe tê de bi cih (üslenme) kiribûn. Ev şkeft ji heft şaxan (bölüm) pêk dihat. Gelek şaxên din jî tê de hebûn, lê ji ber ku devê wan şaxan teng bûn neketibûne wan. Jixwe cihê ku hevalan dabû xebitandinê ji wan re mezin bû. Ji ber wê jî pêwîstî nedîtibûn devê wan şaxên din vekin. Ava ku bi hezarên salan dilop kiribû û kils çêkiribû, devên wan hatibûn girtin. Di nav şkeftê de bi dehan hewzên (cirn, gol) avê hebûn. Dema mirov bi laytê (fener) tê de digeriya her derê şkeftê dibiriqî û menzereyên zaf xweş derdiketin holê.

Dema ku heval gihîştin nuqteyê, meyze kirin ku nuqte vale ye. Heval ne li wir bûn. Tam mehek bû ku ji hevalan qetiyabûn. Diviyabû hevalan hê zûtir banî wan kiribûna, lê kesî banî wan nekiribû. Dema serê sibê H. Baran çû keşfê li çend nuqteyên din jî meyze kir, lê belê ne heval nejî şopên hevalan hebûn. Baran

vegeriya cem hevalên xwe, hevalên wî agir dada bûn, çay dem kiribûn.

Zinar jê pirsî: “Te kes nedît?”

Baran got: “Na kes li vir tune, ez çûm wan nuqteyên din jî tu kes li wir jî nebû.”

Yûsif: “Yaw, heval ne li Nuqteya Nêrî bin? Navê wê jî di şîfreyê de nebû. Dibe ku hevalan navê wê di şîfreyê de cuda nivîsîbin. Nêrî navekî xweş nîn e, dibe ku guhertibin.”

Baran: “Zinar û Harûn şîfre nivîsandin. Zinar jî nizane navê Ş. Selîm li kîjan nuqteyê kirine.”

Zinar: “Yaw, heval min nenivîsandiye. Harûn bi serê xwe nivîsand. Ez çi dizanim; li gorî xwe navê nuqteyan guhertiye û piştre jî navê wan nuqteyan didin.”

Ciyê wan zaf zor bû. 24’ê adarê bû, hê berf jî li jora Şelê neheliyabû. Hevalan jî heta êvarê agirê xwe qet venemirandin. Berf dihelandin û çaya xwe jê çêdikirin. Berêvarkî Baran pirsî: “Em çi bikin? Me heval jî nedîtin. Em biçin ku derê?

Cotkar got: “Erzaqê me jî nemaye, li van deran cihekî ku erzaq heye em biçin wê derê.

Baran: “Hevalê Zinar li Bûzdolabiyê erzaqê me hebû?”

Agirî: “Na li van deran erzaqê me tuneye, ancax em ji gund bînin. Em biçin Nêrî, hem li wir av heye, hem jî em ê ji xwe re erzaq jî bînin. Di heman demê de em ê bi cîhaza piçûk banî hevalan bikin; ciyê wan hîn bibin.”

Baran: “Na, cîhaza piçûk nabe. Em ê biçin Nêrî, heval li wir bûn, li wir in, nebûn jî em ê li benda wan bisekinin.”

Berêvarê ketin rê, cihê ku tê de dimeşiyan hemû şkêrên tûj bûn. Cihên ku şkêr jî diqediyan hemû xîz bû, rêya wan jî hemû wisa bû. Ji ber wê jî zû diçûn û nedixwestin bimînin tariyê. Baran û Yûsif di pêşiyê de dimeşiyan, Zinar jî li dûv wan bû. Dema ku xwe di şkêr

re berdidan destên xwe jî dixebitandin, nedixwestin di şkêrê de bikevin. Yûsif ji Baran re qala berê dikir:

“Dema Ş. Amed Tozo li vir bû, digot: “Em her tim di vê riyê de diçûn û dihatin.”

Cotkar jî ji Zinar re digot: “Ma tu ditirsî di ser şkêran re bimeşî; hinekî rihet bimeşe.”

Hê çend gav nemeşiyabûn; lingê Cotkar şemitî û ket bi qasî çend xulekan li erdê ma.

Zinar zivirî û got: “Ji ber ku ez nekevim vî halî, ez bi hişyarî dimeşîm.

Piştre Cotkar rakir û riya xwe domandin. Lê belê ji ber ku Cotkar zêde êşiya bû; nikaribû bi tempoya hevalên xwe bimeşe.

Baran jî serê her gavê digot: “Hadê heval hinekî zû bimeşin.” Û li benda wan disekinî.

Hatibûn jor nuqteya Bûzdolabiyê.

Baran pirsî: “Zinar ev der ne Bûzdolabî ye?

Hê zinar bersiv nedabû, yekî ji jêr ve bang kir: “Hûn kî ne?” Hevalan hema emniyeta çeka xwe vekirin, di cihê xwe de rûniştin û berê çekên xwe dan aliyê ku deng jê hat.

Baran qîr kir: “Tu kî yî?”

Yê ku qîr kiribû dengê Baran nas kiribû û got: “Baran ez im, ez Şivan im, werin werin, ji vî aliyî ve, ji jor ve werin.

Heval ber bi wî aliyî ve çûn. Şivan hatibû pêşiya wan.

Şivan got: “Hay ji vir hebin, ka çekên xwe bidin min.”

Şivan çekên wan ji wan girtin û wan jî xwe di şkêran de berdan; çûn rûyê hev ramûsîn.

Baran pirsî: “Hevalê Rûbar li vir e?”

Şivan: “Erê ez û hevalê Rûbar in.”

Baran: “Hevalên din li ku derê ne?”

Şivan: “Ew çûne keşfê.”

Hevalê Rûbar û hevalê Şivan kêmekî li jora nuqteya Bûzdolabiyê, di navbera du şkêran de, çend darên qaçê jî anîbûn li derdora nuqteyê çandibûn û pê kamuflaja nuqteyê çêkiribûn. Dema hevalê Rûbar heval dîtin rabû bixêrhatina hevalan kir, yek bi yek heval ramûsîn û got: “Burno hûn li ku derê ne? Ev du hefte ne em ji bo we anons dikin.”

Baran: “Na heval me anons girt, em hatin.”

Rûbar: “Ji duwazdehê mehê û vir ve hevalê Serxwebûn ji bo we anons dike. Ê temam, niha wan berdin. Rewşa we çawa ye, hevalê Cotkar rewşa te çawa ye?

Cotkar: “Baş e heval.”

Rûbar: “Yûsif Qeyserî, rewşa te çawa ye, dibê qey tu qelew bûyî?

Yûsif: “Sax bî heval. Rewşa we çawa ye?”

Rûbar: “Baş e sax bî. Hevalê Zinar tu çawa yî? Yaw hûn hemû qelew bûne. Şivan ji hevalan re xwarinê bîne, bîne û em çayekê jî bidin ser pelan. Ez û Şivan em îro bi hev re naxivin,em bi hev re guftûgo nakin. Heval çûn keşfê ez û ew jî bi hev ketin.”

Şivan xwarin û çay anîn û got: “Ez ê biçim avê.”

Rûbar got: “Hûn xwarina xwe bixwin, me jî nû xwar.” Axaftina xwe domand. “Heval jî îro hemû çûn keşfê. Me ji hundirê bajêr ve keşif kir. Me got; bila heval carekê jî biçin ji derve keşfê bikin.”

Zinar: “Gundiyan keşif kir?”

Rûbar: “Na me hevalek şand, çû tê de geriya hedef jî keşif kirin. Me got; bila heval carekê jî ji derve keşfa tepe bikin û riya xwe bibînin.”

Baran: “Hevalê Harûn û her sê hevalên stî (jin) çûn.

Rûbar: “Na! Hevalê Cûdî jî bi wan re ye; Cûdiyê me yê Fîsê.”

Zinar: “Ew jî hatiye vir?”

Rûbar: “Ew jî bi Serxwebûn wan re hat. Agir û Rizgarê Çêrmûgê jî li vir bûn; ew çûn.”

Yûsif: “Hevalê Rûbar, ew çalakiya Amedê wan kiribû, wer nîn e?”

Rûbar: “Erê, Rizgar û Agir kiribûn. Temam em niha razên, em ê sibê guftûgoyan bikin, du kes werin li kêleka min razin, sê kes jî li wir razin.”

## Ji Bo Heval Nekevin Xeteriyê Her Tiştî Digire Ser Xwe

Bû sibe hemû di rojbaşê de rabûn taştêya xwe xwarin. Hevalê Rûbar li ser Newrozê, li ser çalakiya Amedê û di derbarê eyaletê de agahî dan hevalan.

Rûbar: “Heval ji civînê zêdetir, em ê hinek agahî û pêşketinan bi we re parve bikin. Çalakiya Amedê jî, hevalên ku ji derve mabûn wan kiribû. Ew heval jî hatin, me ji wan re civîn çêkir. Me rexneyên xwe li wan kirin. Ji bo girtina hevalê Botan jî heval çalakiyê dikin, diçin ku wî jî derxin, ew heval dernakeve; hevalên ku çalakiyê dikin derdikevin. Ew jî di rûyê telefonê de tê girtin. Dibêje dibe ku heval derneketibin, ji ber vê yekê jî hemû tewanbariyê digire ser xwe. Me di vê mijarê de jî heval rexne kirin. Lê hevalan got: “Me nekarî wî derxin.” Gotiye: “Jixwe ez ê çalakiyeke din bikim û werim.” Carekê bi serê xwe li hemberî qereqola polîsan çalakiyekê dike û nobeçiyê qereqolê dikuje.

Ji bo Newrozê jî; Newroz zaf baş derbas bû. Mirov ji gel moralê digire. Me jî kêmekî di televîzyonê de şopand. Bi rastî jî xwedîderketina li Serokatî û têkoşînê, ji bo pêvajoyê qonaxeke (merhele) nû ye. Hevalê Bahoz jî guftûgo kir. Hevalan jî xwedîderketina gel a li rêxistinê erênî nirxandin û gotin: “Divê mirov bi çalakiyan piştgiriyê bide vê morala gel û her dem gel li ser piyan bigire. Mijareke din jî li ser herêma Ş. Serxwebûn e; di wê

herêmê de du kes reviyane. Ên ku reviyane; Çekdarê Hênê û Ayten in. li gorî agahiyên dan me, wan ji zivistanê ve, xwe rêxistên kirine û bi derketina biharê re direvin. Çûna me ya gund jî ji bo wan bû. Ew qas pêşketin hene, ew qas li ser Serokatiyê zor; tecrît, cezayên hucreyê,  tê meşandin. Gel li Serokatî û rêxistinê xwedî derdikeve. Lê van xayînan zivistanekê li ser revê xwe rêxistin kirine. Bila ev rev li ser moralê hevalan bandorê nekin. Jixwe me çend kes bi dûv wan xistin, îro sibê belkî şopa wan bigirin.”

Piştî vê civînê H. Rûbar bi hevalan re yek bi yek jî guftûgo dikir. Dema ev guftûgo yek bi yek bi hevalan re kiribû, hê zêdetir di derbarê wan de li ser rewşa hevalan a takekesî bû. Li ser dema pêş dê nêzîkatiyeke bi çi awayî bidin diyarkirin. Ev guftûgo li ser pêvajoyê fikirandin bû. Piştî van guftûgoyan ji bo ku heval biçin cem hevalên herêmê amadekariyên xwe dikirin. Di wê demê de hevalê Rûbar dibêje: “Heval jixwe hevalan banî we kiribû, me hinek kar dabû pêşiya wan, divê hûn jî di nav wî karî de cihê xwe bigirin, piştre em ê hev bibînin.

# ÊDÎ FERSENDEKE WISA

# NAKEVE DESTÊ ME

## Cihê jiyana rêxistinê nebe girêdana bi nirxan ve jî namîne

Di herêma Ş. Serxwebûn de hevalan zivistaneke zaf zahmet derbas kiribûn. Di vê wargehê de hevalan ji aliyê bîrdozî û jiyanê ve hev pir êşandibûn. Di wargehê de hin kes bûbûn rêxistin û xwestibûn di wargehê de fikrê wan were jiyankirin. Li ser vê jiyana rêxistinê û fikrê rêxistinê avêtibûn aliyekî û di nava xwe de bûbûn çend kom. Piştî ku ji wargehê jî derketin dev ji vê nêzîkatiyê bernedabûn. Cihê ku jiyana rêxistinê û rihê hevaltiyê lê nemîne, li wir girêdana bi nirxan ve jî namîne. Wateya wan a jiyanê, mayîna wan a li serê çiyan namîne û ji wan re bê wate tê. Ji ber vê yekê jî berê Sefqan ji herêma Ş. Serxwebûn reviyabû. Di rapora xwe de gotibû: "Ez êdî nizanim kî rêxistin e û kî heval e, ji ber wê ez qut dibim." Çend roj piştî wan Çekdar û Ayten bi hev re reviyan. Wan jî di raporên xwe de nivîsandibûn û gotibûn: "Me zivistanê bi hev re biryara revê girtiye, ji bo wê jî em bi hev re diçin û gelek gotinên wek van vale."

Piştî ew qas bûyerên neyînî dîsa jî hevalan jiyana xwe ya rêxistinî didomandin. Bê guman di reva wan kesan de û di lewaztiya jiyana rêxistinê de para wan hevalan jî hebû. Lê belê wan dev ji xwe û ji jiyana rêxistinê bernedabûn.

## Bersiva Ji Bo Dijmin û Xayînan

Serê sibê… keşifçî bû dûrbîn avêt derdora xwe, li serê giran û li qûntaran baş meyze kir tiştek tunebû. Piştre dûrbîn avêt ser rê, li

ser rê reşahî û panzêrek dît. Erê ew dijmin bû. Piştre cihê xwe hê xweştir kir û hê bi hişyarî dûrbîn avêt serê gir qûntaran; dar bi dar, kevir bi kevir mêze kir. Dema tiştek nedît dîsa dûrbîn avêt sêkuçka rê, erê hê li wir bûn. Car carinan tevdigeriyan, diçûn cem panzêrê, car carinan jî li derdora xwe digeriyan. …xwe ji cihê keşfê berda û hat nuqteyê. Çend heval şiyar bûbûn, çend heval jî hê di xew de bûn. Ên ku şiyar bûn li benda hevalê li keşfê bûn. Keşifçî werin dê ji xwe re agir dadin û xwe germ bikin. Dema… hat hevalan darên xwe danîbûn ser hev, li bendê bûn ku bêje tişt ***şehîd Zinar*** ek tune û agir pêxin. Lê belê… got: “Li sêkuçka riya Manîsorê panzêrek û yekîneyeke dijmin heye.”

Rûbar pirsî: “Li derdora me tiştek heye?”

Necmî got: “Na min tiştek nedît.”

Cîger: “Ka wan hevalên din jî şiyar bikin, ez û hevalekî din em ê biçin bişopînin, dema em hatin, tiştek nebe em ê hingî agir pêxin.”

Hevalê Cîger û Çekançûn cihê keşfê, Necmî jî hevalên din şiyar kirin û li benda Cîger û wan sekinîn.

Avaşînê ji Necmî pirsî: “Hevalê Necmî dijmin tam li ku derê ye?”

Necmî: “Li sêkuçka riya Manîsorê ye.”

Avaşîn: “ Heval heke li wir bin dema paşve bikişin mirov dikare li wan bide; ew cî ji bo lêdanê baş e.”

Dilbirîn: “Her hatine erazî divê mirov wan vale neşîne.”

Cîger û Çekan dijmin dişopandin. Ji derveyî wan kes nedîtibûn. Çekan bi destê xwe ji Cîger re erazî destnîşan dikir.

“Hevalê Cîger mirov di vê dolê re biçe, mirov ê xwe bigihîne wan. Ew gir ê li ser wir heye, mirov ê li ser wir, li wan bixe. Weleh ew nikarin yek guleyê jî biteqînin.”

Cîger: “Ger ew heta berêvarkî neçin jixwe em ê li wan bidin.”

Dema ew wisa bi vî awayî diaxivîn, Avaşîn û Dilbirîn hatibûn cem wan.

Dilbirîn: “Hûn li wir in hevalê Cîger?”

Avaşîn: “Ka dûrbînê bidine min. Ez jî meyze bikikm.”

Cîger dûrbîn da Avaşînê û got: “Temam hûn meyze bikin, em ê biçin jêr. Em ê piştre hevalekî rê bikin bila bişopîne.”

Avaşînê dema dûrbîn avêt û tevgera wan şopand got: “Heval ji bo lêdanê tam fersend e. Hêza wan jî hindik e û ji bo ku mirov biçe ser wan jî, cihê wan zaf xweş e.”

Dema Cîger û Çekan hatin cem hevalan Cîger got: “ Heval ka agir dadin, dê îro diya hinekan bigirî.”

Çekan: “Hevalê ‘Elî weleh cihê wan zaf xweş e. Mirov di dolê re biçe hema li ser wan girek heye û mirov ji wir li wan bide; ew ê hemû belav bibin.”

‘Elî: “Eger wiha ye em çend heval biçin, hem ji bo dijmin, hem jî ji bo xayînan dibe bersivek.” Hevalan heta piştî nîvro tevgera dijmin şopandin. Dijmin li ser rê weke ku lêgerîna rê bike tevdigeriya. Heval ji bo biçin ser dijmin û derbeyê lê bidin li hev kom bûn.

Cîger got: “Heval jî dizanin dijmin hatiye ser rê. Ji bo em biçin lê bidin fersend e. Biharan fersendeke wiha rihet careke din nakeve destê me. Ji bo wê, divê em vê fersendê baş binirxînin. Me rêveberiyê, du heval diyar kirin. Dibe ku heval jî xwe pêşniyar bikin. Lê hê despêka biharê ye û hê demeke dirêj li pêşiya me heye. Ji ber vê yekê niha ez û hevalê Necmî em ê biçin.”

Piştî vê gotina hevalê Cîger her çiqasî hevalan ev nêzîkatiya wî nepejirand jî, di fikra xwe de zêde israr nekirin.

Cîger û Necmî ji hevalan qetiyan û bi aliyê yekîneya dijmin ve bi awayekî dizî diherikîn. Di nav şkêran de, cihên ku ji dijmin ve dixwiya li wan deran hê bi dizî û bi navber dimeşiyan. Dema ku

xwe berdan dolê û ji dîtina dijmin winda bûn, hê bi lez meşiyan. Di navbera wan û dijmin de mesaeyeke zaf zêde nemabû. Hevalên ku li nuqteyê mabûn, hem ew û hem jî dijmin dişopandin. Di liv û tevgera dijmin de cudahî ferq kirin, panzer vegeriya û berê xwe da qereqolê. Hêdî hêdî diçû. Leşkeran jî girên ku li derdora wê girtibûn berdidan, li hev civiyan, bi awayekî yekrêzî ketin dûv hev û panzêr şopandin. Dema hevalan ev liv û tevgera dijmin şopandin, Avşînê got:

“Yaw heval dijmin  paşve dikişe; em bi cîhazê piçûk ji hevalan re bêjin; bila biçin pêşiya wan.”

Rêber: “Me qenalên cîhazê di navbera xwe de çênekiriye.”

Wê demê Cîger û Necmî gihîştibûn cihê ku dijmin bibînin. Cihê ku wan hêvî dikir, dijmin ne li wir bû. Xof ket hundirê wan.

Cîger got: “Em ferq kirin, çi bû? Şiyar be, em ê bi navber hineke din jî bi pêşve biçin.”

Hê çend gav neçûbûn; Necmî bi lez xwe gihand Cîger, destê xwe li pişta wî xist û got: “Va li vir in, ber bi Korxê ve diçin. Were em ê di vê dolê re biçin pêşiya wan.

Cîger got: “Na dev jê berde. Em xwe nagihînin wan.”

Necmî li Cîger guhdar nekir û da dûv dijmin. Cîger jî ji mecbûrî Necmî şopand û di dolê re beziyan. Qederekê şûnde xwe gihandin cihekî rast. Li wir li derdora xwe meyze kirin hê dawiya leşkeran neqediyabû. Ji bo wê kêmekî sekinin. Dema dawiya leşkeran ji wan winda bû, her du jî bi hev re beziyan, dema Necmî xwe gihand şkêran di navbera wan û leşkeran de bîst û pênc-sî (25-30) metre hebûn. Necmî çeka xwe li wan rast kir û li wan reşand. Leşker her yek bi aliyekî ve reviyan; xwe avêtin pişt rê û şkêran. Du leşker di nav rê de dirêj bûn û ne dilivîn. Dema ku leş-ker di nav şoqê de dibeziyan, Cîger jî xwe gihandibû Necmî. Wî jî li leşkeran reşand. Dema dengê çekan hat, panzêr bi jor ve vegeriya.

Heval bi lez ji cihê bûyerê dûr ketin. Ew cihê deştik (rast/deşt) bi bezê derbas kirin. Piştre hê nû deng bi çekên dijmin ket û gule direşandin. Dema heval gihîştin dolê edî dev ji bezê berdan û bi lez dimeşiyan. Dema hevalên nuqteyê dengê çekan bihîstin, bi dilşadî (keyfxweşî) qîr kirin dest bi komkirina nuqteyê kirin. Çente û erzaqê xwe kom kirin û li benda hevalan sekinîn. Dema hevalan xwe gihand nuqteyê ji zû ve tarî ketibû. Hevalên nuqteyê hemûyan ji wan re gotin: "Destê we sax be! Dema dijmin bi rê ket me got; hûn êdî xwe nagihînin wan." Di debarê bûyerê de ji wan pirs pirsîn. Ji ber îhtîmala operesyonê cihê xwe guhertin.

# AGIR DÎSA ZAROKÊN XWE HEMÊZ KIRIBÛ

Dema yekeya Baran ji hevalê Rûbar wan qut bûn, rojekê şûnde xwe gihandin Serxwebûn wan. Bi giştî hejmara wan bûbû neh kes. Serxwebûn ji wan pirsî:“Hûn li ku derê bûn? Me deh-duwazdeh rojan ji we re anons kir. Piştre me nuqte da we, hûn çûn di cem hevalê Rûbar wan re derketin. Ma hûn nizanin nuqteya Ş. Selîm li ku derê ye? Nuqteya hûn lê bûn, ew der bû.”

Baran: “Me nizanibû navê wê nuqteyê di şîfreyê de Ş. Selîm e. Ji bo anonsê jî me herî dawî anons girt û em li ser wê ketin tevgerê.”

Serxwebûn: “Temam, bila heval biçin ser û cilên xwe bişon. Em ê piştî nîvro civînê çêbikin.”

Nuqteya hevalan di navbera Alîgor û Hêgamezel de bû. Ev cî berdewama “Orta Alanê” bû. Hemû girên wê wek hev in; daristanên wê zaf kêm in. Lê belê cihê ku heval lê bûn, çar heb darên qaçê wek sîwanê (şemsiye) vebûbûn û di navbera wan de jî dareke berû hebû. Ev dar zaf mezin bû. Wek din jî derdora darên qaçê bi diriyan tijî bû. Ji ber ku mirov têketa hundirê wê diriyeke piçûk hebû. Mirov dikare bêje; şkefteke dizî ya li ser rûyê erdê bû. Hevalan di nav van daran de ji bo baranê naylon vegirtibûn. Ji bo biharê kamufleyeke çar bi çar bû. Av jî hema bîst metreyan li jêr hevalan bû. Ber bi nîvro Cotkar, Yûsif û Zinar çûn xwe bişon, her çiqasî av cemidî be jî, ji pêwîstiyê mecbûr bûn. Ji ber ku du meh bûn xwe neşûştibûn û bêhn ji wan dihat. Di sermaya dawiya adarê de bi ava cemidî cilên xwe şûştin. Ji serma destên wan mor bûbûn. Bi roj jî êdî tavê li wan nedixist.

Zinar: “ Me tenê cilên xwe şûştin, destên me hemû mor bûn; dema em xwe bişon kî dizane dê çi were serê me.”

Cotkar ji serma dilerizî, di ser wê re jî bi halê Yûsif û Zinar dikeniya û got: “Li min meyze bikin, ez qet nacemidim. Hûn min ji xwe re mînak bigirin.”

Dema dor hat ku serê xwe bişon, Zinar qotiya avê girtibû destê xwe û li ber avê sekinîbû, newêrîbû avê bi ser xwe de bike. Dîsa Cotkar pê dikeniya û ji aliyekî ve jî digot: “De zû bike hê em jî di dorê de hene.” Bi zahmetî be jî xwe şûştin; cilên xwe li xwe kirin û reviyan ber agir. Dîsa jî agir pîrozî, hevaltiya xwe ya germ dabû wan û laşê wan ê ji serma dilerizî, bi dilê xwe yê germ ew hemêz dikir.

Çawa ku dayikek dergûşa xwe ya dest û lingê wê di berfê de dicemide û ji girî lal dibe hemêz dike; agir jî wisa zarokên hemêz kiribû. Jixwe ew zarokên agir bûn. Ji Zerdeşt heta îro ev her dem wiha bû. Agir ji bo wan pîroz bû, heval bû, ronahî û bawerî bû. Lê jê resosret (tuhaf) nedibûn. Jixwe di dema Zerdeşt de jî kes pê sosret nedibû.

Di dîroka kurdan de, ji bo kurdan cihê agir her dem cuda bûye. Ar, ax, av û ba di Zerdeştiyan de ev çar tişt pîroz bûn. Mirovan xwe li ser van çar tiştan afirandiye û hê jî xwe li ser wan didin jiyankirin.

## Plansaziya Piştî Civînê

Di civînê de her kesî pêvajoya mehekê û pirsgirêkên ku hatibûn jiyankirin guftûgo kirin. Di plansaziyê de bi awayekî sê yekeyan (tîm) xwe bi rêxistin kirin. Yekeyeke ji sê kesan ew ê xwe li derdora qereqola Korxê, di kemînê de bisekiniyana. Yekeyeke din jî dîsa ji sê kesan ew jî dê li derdora qereqola Hêgasor di kemînê de bisekiniya. Di tevgera dijmin de wê derbe li dijmin bida. Yekeyeke din ya ji çar kesan jî, dê di herêmê de mayînçandin bikira.

Piştî civînê her sê yekeyan jî amadekariyên xwe kirin û heta riya Xiraba bi hev re meşiyan. Li wir Serxwebûn, Yûsif û Xebat ji wan qetiyan û ber bi Hêgasor ve çûn. Her du yekeyên din heta qederê demjimêreke din bi hev re meşiyan, xwe gihandin nuqteya biryargehê. Baran, Cûdî û Aram jî ber bi Korxê ve meşiyan. Hemze, Amed, Cotkar û Zinar li "Orta Alanê" mabûn. Karê wan, di herêmê de girên stratejîk û şiveriyên ku dijmin dide xebitandin mayîn bikin. Roja din ji bo Zinar mayînên ku ji dûrteqînêr deyne serê sibê zû dest bi amadekirina cîhazê kir. Ji bo danîna mayînekê; du cîhaz, duwazdeh heb pîlên mezin û dewreya ku mayînê diteqîne amade dikir. Ji her cîhazê re çar û ji bo derve jî çar heb pîl dixebitandin. Ji ber ku ev cîhaz demdirêj di binê axê de diman; ji bo ku di baranê de şil nebin, an jî ji axê hêwî (nem/rutubet) nebin;ev ên hatin amadekirin xistin qotîkan û tenê serê antênên wan ji derve dihiştin.Heta nîvro çar heb amade kiribûn. Êdî karê wan, ew ê biçin cîhaz û mayînên di bin erdê de ne biguherin û mayînên nû deynin. Li Hemze zivirî jê re got: "Cîhaz temam in, em dikarin van deynin."

Hemze: "Ma pêwîst dike em hemû biçin?"

Zinar: "Na ez û yekî biçin bes e, lê belê ev mayîn mezin in, divê hevalekî din jî were. Ji ber ku em ê du tenekeyan bibin û li cem me cîhaz jî hene, em du kes nikarin bibin."

Berêvarê çûn ji bîdonan du tenekeyên bîst kîlo derxistin. Ji wir bîst xulekan meşiyan gihîştin cihê ku mayînan deynin. Du kes bi dizî di pêşiyê de çûn serê gir, derdorên xwe kontrol kirin, piştre banî yên din kirin. Ên din jî dema hatin cem wan, Hemze ji Zinar (Zinar kî ye? pirsî: "Cihê mayînê diyar e?"

Zinar got: "Na. Bila du heval nobetê bigirin, em ê jê re cihekî bibînin."

Cotkar û Amed çûn nobetê. Hemze û Zinar jî cihê ku deynin diyar kirin û dest bi kolanê kirin. Di nîv demjimêrî de mayîna xwe danîbûn û qamuflaja wê çêkiribûn. Zinar ji hemze re got: “Ka cîhazekê bîne ez girê bidim.” Dema Hemze qotiya cîhazê dayê, jê re got: “Qabloya dirêj bikişîne piştre girê bide.”

Zinar got: “Temam.”

Dema ku qabloya dirêj girêda çû cem Hemze, banî Cotkar û Amed jî kir.

Hemze: “Heval ez û hevalê Zinar em ê biçin, êdî îşev em nikarin bizivirin, em ê sibê bizivirin.”

Cotkar û Amed ji wir zivirîn nuqteyê. Hemze û Zinar jî ber bi Ziyareta mezin ve çûn. Zinar nedixwest Hemze pê re biçe. Ji ber ku zivistanê di guftûgoyeke ne baş de dilê hev hiştibûn.

Piştî wê bûyerê sê roj şûnde dema ku dijmin ketibû şkefta ew tê de bûn, wê demê Zinar nobeçî bû, dijmin despêkê narincoka destê xwe avêtibû şkeftê piştre jî di şkeftê de lêgerîn pêk anîbû. Ji ber ku dijmin nizanibû şkeft ji çend şaxan (bölüm) pêk tê, deriyê ku hevalan girtibû dijmin ferq nekir. Lê belê dijmin qul bi qul li her derê meyze dikir. Zinar jî ji jor ve li wan meyze dikir. Deriyên ku hevalan girtibû, yek ji wan deriyan di bin Zinar de bû. Zinar demekê ferq kir ku dijmin bi kevirê derî mijûl dibe. Zinar xwe ji cihê nobetê berda jêr, layt (fener) di nava destê xwe de pêxist, xwe gihand çeka xwe. Heke layt pênexistiba nikaribû xwe bigihîne çeka xwe. Dibe ku lingê wî li tiştinan biketa, deng derxista, wê demê jî dê dijmin bi wan bihesiya. Dema ku Zinar xwe gihand çeka xwe û çeka xwe girt, dijmin kêmekî din jî bi derdoran ve mijûl bû û derket çû.

Piştî wê civîn hat çêkirin. Hemze, Zinar bi lebikîbûnê (li hev xerbilî /panîk) tewanbar kir û jê rapor xwest. Zinar jî li ser vê pêşniyara wî, di fermiyeta rêxistinê de rest kişand; li ser vê

guftûgoyên ne baş derketin holê. Bûyer bi nirxandina hevalê Rûbar qediya û pêşniyar jî ji aliyê hevalan ve hat pejirandin. Ji vê rojê û pê ve Zinar li hemberî Hemze bi bertek û bi rik bû.

Lê belê berpirsiyar Hemze bû, kî pê re bişanda ew ê pê re biçûya. Baran wê demê ji wan qetiya, hema çû bîst xulekan ji wan dûrtir di nuqteya Apê Zabit de sekinî. Dema gihîşt nuqteyê got:

Baran: “Em îşev li vir bisekinin; em ê sibê biçin ji gund hem agahiyan bigirin, hem jî em ê ji xwe re erzaq bigirin.”

Aram: “Ger wisa bû, em li cem hevalan bimana, çima em hatin vir?”

Baran: “Ji bo ewlekariyê hê baştir e, em hemû li cem hevalan bûna ne baş e.”

Wê şevê li wir razan. Êvara din pêşiya xwe keşif kirin û piştre ketin gund. Ji gundiyan hem di derbarê dijmin de agahî girtin, hem jî ji bo xwe, ji bajêr erzaq xwestin û ji gund derketin. Car caran dijmin derdiket derdora gundê Gezanê, ji ber wê jî heval diçûn di navbera Gezan û qereqola Korxê de disekinîn. Êvara din çûn di navbera riya zift û riya ku tê Çemê ‘Elik desekinîn. Bi qasî du demjimêran li wir di kemînê de rûniştin. Meyze kirin kes naçe û nayê.

Baran got: “Ew qas bes e. Jixwe bihatan ew ê heta niha bihatana. Em biçin, niha erzaqê me hatiye, em biçin bigirin. Em ê sibê heta demjimêr yekê bisekinin.”

Ji wir ketin rê, rê û rê meşiyan hatin gund.

Hemze û Zinar wê şeva ku ji Cotkar wan qetiyan çûn Ziyareta Mezin. Ew qûntar, cihekî wisa hemû ji daristanê pêk tê. Ji ber ku hê pelan venekiriye; ji bo ewlekariyê ne baş e. Wê şevê çûn nuqteyeke ku berê hevalan dabû şixulandin. Di vê nuqteyê de dareke qaçê hebû. Her du heval çûn di binê wê darê de razan. Se-rê sibê rabûn keşfa xwe kirin û taştêya xwe xwarin. Her du cihên

ku ê biçûna ji wan ve dixwiyan. Êvarê tenekeyên xwe dan pişta xwe û çûn mayînên xwe deynin. Piştre cîhazê xwe girtin çûn ser mayîneke ku berê danîbûn. Cîhaza wê jî guhertin û vegeriyan cem hevalên xwe. Dema gihîştin cem Cotkar û Amed, demjimêr bûbû diduyê şevê. Dema serê sibê rabûn Serxwebûn jî hatibû.

Hevalan jê pirsîn: “Tu tenê hatî?”

Serxwebûn: “Erê, divê îşev em yekî rê bikin keşfê, herhalde dê îro çalakiyê bikin. We çi kir? We karê xwe qedand?”

Hemze: “Ên li vir qediyan. Ew du heb ên ser rê mane. Ew jî dê cîhazên wan werin guhertin.”

Êvarê Serxwebûn û Andok çûn gund; gundiyek şandin Ş. Navdar, ji gundiyekî re navê mala ku dê biçê, jê re gotin. Gundî ew kes nas dikir. Bu roja din bi cîhazê agahî dan hevalan, gotin: “Em li ser wî karî sekinîn.” Hevalan jî wê demê navê Zinar û Baran dan, gotin: “Bila ew cebilxaneyê bi xwe re bînin.” Navê Aram jî dan, gotin: “Ji wî û Baran kî dixwaze, bila ew were.”

Piştî nîvro Serxwebûn çû dûrbînê bavêje derdor, dema dûrbîn avêt Cahîda Piçûk, dît ku li wir kon (çadir) hatine vegirtin. Xwe ji cihê nobetê berda û hat cem hevalan, got: “Dijmin li Cahîda Piçûkkon vegirtine. Xebat û Yûsif nêzî wan bûn. Dema ku êvarê hatibûn wir, divê di kemînê de li wan dabûna; heke di riya Şelê de jî hatibin, divê berêvarkî bi ser wan de biçin.”

Serxwebûn: “Ger me zanibûya dê heval lê nexin, em ê du kes ji vir biçûna. Heval hema li jor wan in, divê bibînin.”

Heta berêvarê şopandin û piştre ew, Cotkar û Zinar çûn gund. Li gund Baran û cebilxane li benda wan bûn. Heta gihan gund jî tim li pişt xwe meyze dikirin. Digotin: “Heval ê li dijmin bidin.”

Dema gihîştin gund Baran û ew li benda wan bûn. Gundî hê nehatibûn. Serxwebûn û Baran çûn cuda axivîn. Piştre banî wan jî kirin.

Serxwebûn: “Ez û hevalê Baran em axivîn.” Got:“Bi hevalê Zinar re hevalê Aram biçe dê hê erênî be.”

Ji Aram re jî got: “Amadekariya hevalan heye, lê belê dê çalakî bibe nebe ne diyar e. Heke tu naxwazî dê Baran biçe. Jixwe hevalan jî got; kî dixwaze bila ew were.”

Aram: “ji bo min ferq nake ez dikarim biçim.”

Baran: “ Ji bo min jî ferq nake.”

Lê dema Baran ev gotin got, ji çavên wî diyar bû ku nedixwest tevlî çalakiyê bibe. Çawa di rêveberiya herêmê de yek bixwaze tevlî çalakiyê bibe û tevlî nebe; vê zêde bawerî neda me.

Aram hevalekî ji Başûrê Mezin bû. Jê re gotin: “Tu dixwazî tevlî çalakiyê bibî?” Ji rûmeta paşverûtiyê be jî tu kes nabêje na.

Serxwebûn: “Temam, wê demê bila hevalê Aram biçe. Hevalê Baran û hevalê Cûdî jî bila li ser karê xwe bisekinin. Hevalê Zinar hûn biçin wan cîhazan li ser riya xwe biguherin piştre biçin.”

Zinar: “Em cihên wan nizanin û pêwîst e cîhazên zêde jî werin.”

Serxwebûn: “Bila hevalê Cotkar bi we re were. Di vegerê de wî heta Gezanê bînin. Ji wir û şûnde bila bi tenê were, ez li vir li benda wî me.”

Jixwe gundî cebilxane neanîbû. Li gund û li derdora gund operesyon hebûye, ji ber wê nekarîbûne cebilxaneyê derxînin.

Dema Cotkar, Aram û Zinar ji gund derketin, baraneke zêde dijwar dest pê kir, hê negihîştibûn cihê xwe tayekî zuha di laşê wan de nemabû. Baran sekinî. Piştî wê bayek rabû û pê re zîpikê dest pê kir. Êdî nikaribûn pêşiya xwe jî bibînin. Di rê de heriyê pêlavên wan digirt û meşa wan asteng dikir. Cih bi cih jî dişemitîn.

Dema gihîştin ser mayînê baran sekinîbû û bayekî cemidî dest pê kiribû. Ji aliyekî ve dilerizîn, ji aliyekî ve jî diranên wan li hev diketin. Cilên wan bi wan ve zeliqîbûn. Zû zû cîhzên mayînan guhertin û riya ku tê de hatibûn, dîsa tê re zivirîn. Dema xwe gihandin gewriya Gezanê ji Cotkar xatir xwestin û xwe li erazî xistin. Berê xwe dan nuqteya Bûzdolabiyê. Êdî herî û av ne xema wan bû. Jixwe pêlav û goreyên wan jî tev şil bûbûn. Ji ber vê yekê jî çi rastî wan dihat xwe lê dixistin. Dema gihîştin nuqteyê demjimêr yekê şevê bû.

Harûn got: "Zinar hûn hatin?"

Zinar: "Erê"

Harûn: "Werin xwe germ bikin, em ê niha biçin."

Zinar got: "Me B-7 û cebilxane neanî."

Wê demê Bêrîtan jî ji xew rabû û got: " Hûn bi xêr hatin. We tiştek nedît."

Zinar: "Li Cahîda Piçûk dijmin hebû. Me dûrbîn avêt van deran, li van deran tiştek nebû."

Bêrîtan: "Dibêjin li vê derê jî operesyon heye. Ji ber wê jî me got, hûn jî werin em xwe bidin Nuqteya Şûtikê."

Aram: "Wele me jî tiştek nedît. Em niha ji ser esfatê tên, li wir jî tiştek nebû."

Bêrîtan: "Hevalê Harûn tu dibêjî çi, em biçin an na?"

Harûn: "Hûn dizanin heval, hûn bêjin em biçin, em ê biçin."

Bêrîtan: "Ez dibêjim; em bimînin. Sibê bişopînin piştre."

Wê şevê cihê xwe neguhertin. Serê sibê Harûn û Şivan her du çûn keşfê, li derdor tiştek nedîtibûn. Dijmin hê jî li Cahîda Piçûk bû. Dema cîhan ronî bû dengên xerîb dihatin guhên wan. Di wê demê de hevalê Rûbar got:

"Qey dengê tangan tê."

Hevalan dûrbîn girt û avêtin ser esfaltê. Tang ketibûn ser riya Çemê ‘Elik û panzêrek jî bi wan re bû. Sê tang û panzêrekê li gorî gundê Gezanê xwe bi cî kiribûn; berê xwe dabûn aliyê hevalan. Harûn û Şivan hê li cihê keşfê bûn. Wan jî tang dîtibûn. Xwe berdan û hatin nuqteyê.

Rûbar pirsî: “Dijîtal li derdorê tiştek hebû?”

Harûn: “Na, me tiştek nedît, lê dijminê li Cahîdê hê li wir in. Li gorî van tangan xwe dane pêşberî me, dibe ku li jor Şelê jî hebin.”

Taştêya xwe kirin û çaya xwe vexwarin. Piştî wê Rûbar pirsî:

“Zinar ma Xebat ew ne li wir in?”

Zinar: “Ez nizanim, lê li gorî Serxwebûn digot; divê li jor wan bin.”

Harûn: “Em ji vir nikarin biçin ser wan?”

“Em nikarin biçin, lê di paşvekişandinê de, em dikarin pêşiya wan bigirin.”

Bêrîtan: “Bila heval biçin bişopînin, em ê biçin li wan bidin.”

Vê carê Harûn û Cûdiyê Fîsê çûn dijminê li Cahîdeyê bû bişopînin. Harûn û Cûdî demeke dirêj li cihê keşfê...**(ÇAR RÛPEL NÎN IN)**




# DI ŞOREŞE DE LEHENGÎ XINIZÎ Û FERASETÊN ŞAŞ

## Di Dilê Hemû Gerîlayan De Heye Biçin Amedê

……Dibû bi çi awayî, bi çi dilî û bi çi hêviyê. Erê di dilê hemû gerîlayan de heye ku biçe Amedê. Lê belê ne niha dema ku dilê me hêviya me û fikrê me azad be, em dixwazin biçin Amedê; em şewqên Amedê bibînin. Wekî din jî em ew qas ji azadiyê hez dikin.
Ji ber ku em dixwazin biçin Amedê, Amedeke azad wek mirovekî azad di kolanên Amedê de bigerin. Dema em di dilê dayika xwe de; di Amedê de azad bibin, em ê bi her du milan wê hemêz bikin. Em ê li ser sûrên wê bi azadî bigerin. Dibe ku êdî sebra wê nemabe, lê ji bo me her tiştî nû dest pê kiriye. Ji gewriyê xwe berdin êdî nuqteya em biçûna zêde nemabû. Lê di bin barên giran de westiyabûn.

## *Dema Çûn Çalakiyê Hemûyan Kêmasiyên Hev Bexşandin*

Ji tîna jî êdî gewriya wan zuha bûbû. Dema gihîştin nuqteyê êdî hemûyan xwe avêtin erdê. Piştî hinekî bêhna xwe vedan, Cûdî û Zinar çûn av anîn, xwarina xwe xwarin û razan. Dema bû roja din, hinek kêmasiyên teknîkî ji bo çalakiyê mabûn. Ew jî di nav xwe de çareser kirin. Parolaya ji bo birîndariyê çi be, ji bo şehîdbûnê çi be û paşvekişandinê çi be. Birîndar resûl, şehîd felat û paşvekişandin jî pazdeh bû. Qodê Şivan Agir, ê Dîcleyê Amanos, ên ku diçûn ser rê jî Amed bû. Yên ku di nav wan de fêm nekirin derketibûn. Wan jî dilê hev girtin. Berê di navbera Dîcle û Harûn de nefêmkirin derketibû. Wan jî ji bo çalakiyê, bi hev re guftûgo kirin û dilşkandina navbera xwe çareser kirin; ji holê rakirin. Di çalakiyê de kî dê paşve vegere, venegere ne diyar e. Di PKK'ê de kes bi dilmayînê, an jî bi dilşkandinê naçe çalakiyê. Dibe ku yê/a dilê wê/î mabe an jî şkestibe, ew kes biçe çalakiyê û şehîd bikeve. Wê demê mirov, her dem wê dema dilşkandinê bi bîr tîne; mirov ji aliyê wijdanî ve xwe nabexşîne.

Berêvarkî bi hev re heta ser riya Enehîrê çûn. Harûn li wir cihê tenekeya mayînê nîşanî wan da. Ji hev xatir xwestin û ji hev qut bûn. Harûn, Şivan û Nûjîn bi aliyê Babixê ve çûn. Yên din jî tenekeya xwe dan pişta xwe û xwe li qûntara Tahwêlê xistin. Ji ber ku cihekî erênî nedîtin heta destê sibê li cî geriyan. Car caran baranê jî li wan dikir. Dema cîhan ronî bû, ji xwe re cihekî erênî dîtin. Ji ber ku bi şev ranezabûn wê rojê heta nîvro razan. Ji bo ji baranê xwe biparêzin; tenê çadirek wan û çend metre bintahtek hebû. Ji ber vê yekê li ser çokên xwe razan. Tenê kefiyeyên wan hebûn. Yekeya ku wê biçûya gir (tepe) zû gihîştibû cihê xwe. Baranê ji cihê wan nedigirt.

Dema piştî nîvro ji xew rabûn; Zinar fûnyeyên mayînan bi cî kirin û cihê ku mayînan lê deynin bi hev re diyar kirin. Bi êvarê re her çaran bi hev re xwe berdan, çûn ser riya Hênê û Amedê. Ev rê di nav deştê de bû. Riya ku ew tê de diçûn hemû zevî bûn. Ji ber ku baran barî bû her der bûbû herî, ji bo wê di meşê de zahmetî dikişandin. Heriya zeviyan bi lingên wan ve dizeliqî û li ser meşa wan bandor dikir. Dema ku hatin ser rê cihên ku mayînan lê deynin diyar kirin. Ji ber ku siware (erebe) zêde nediçûn û nedihatin kortek jî hebûna, dê panzêr û reo di niveka rê de biçûna. Zinar rê pîva; rê duwazdeh gav bû. Cihê ku ew ê mayînê deynin dê bandorê li siwareyan neke. Ji bo wê jî mayîn daneanîn.

Zinar: “Hevala Dicle, em mayînê deynin jî ê tu bandorê neke. Ev ê jî cesaretê bide wan û derketina me ya ji vir jî zahmet dibe.”

Dicle: “Çima heval, ma we berê çawa datanîn û bandor dikirin?”

Zinar: “Heval ew rê, yên du şerît bûn. Ev rê naşixule, werin jî ew ê di nîvê rê de werin, ev jî mesafeyeke şeş metre dimîne, em nikarin di nîvê rê de jî deynin.”

Dicle: “Heval hûn bi mayînê ve mijûl dibin, hûn dizanin.”

Zinar: “Temam, lê berpirsiyariya me tuneye, tu bibêjî deynin em ê deynin.”

Dicle: “Ger hûn daneynin hûn ê sibê çi bikin?”

Zinar: “Em ê bi çekan nêzîkê rê bibin, cihê ku rê dibe çaryan em ê bisekinin, tiştek bibe, an jî bixwazin pêşiya we bigirin em ê bi çekan li wan bidin û hemû lêhûrbûna wan bikişînin ser xwe.”

Aram: “Wisa hê baştir e, ez jî tevlî dibim. Di vê mesafê de mayîn kar nake.”

Dicle: “Temam, em çi ji vê tenekeyê bikin?”

Zinar “Em ê dîsa bibin jor, li wir veşêrin.”

Li hev dan, kom bûn, dîsa tenekeya mayînê ji deştê dan pişta xwe û derketin rê. Di deştê de, di nav zeviyên çandî de bi zahmetî derketin. Dema xwe gihandin qûntarên Tahwêlê, êdî ji hal ketibûn. Ji ber ku hemû hêza xwe di nav zeviya çandî û heriyê deşixulandibûn, dema xwe li hevrazyê dan û meşiyan, ji bêhalbûyînê êdî nedikarîn gava xwe bavêjin. Di hevraziyê de her çend gavan dimeşiyan ji hal diketin û rûdiniştin. Qûntarên Tahwêlê zaf hevrazî bûn, ji bo wê jî bi tenekeyên bîst weqî (kîlo) derketina wê zahmet bû.

## Şaneya xayîntiyê Ya Di Hiş û Mejî De û kurmê ji darê

Dema ku ev heval ji bo çalakî bi ser bikeve, sekna ku rêxistin ji wan dixwaze bidin nîşandan zahmetî dikişandin; ji aliyê din ve koma ku biçûya gir, ji xwe re raza bûn. Şivan û Harûn ji bo baranê çadira xwe vedabûn. Her du yan kîsê (tulum) xewê avêtibûn ser xwe û raza bûn. Nûjîn jî çend metreyan ji wan dûr bi tenê dibin tahtê de raza bû.

Şivan ji cihê xwe rabû, çû cem Nûjînê û ew ji xewê şiyar kir.

Nûjîn: “Çi ye, ez zîrevan (nobeçî) im?”

Şivan: “Na ez dixwazim bi te re biaxivim.”

Nûjîn: “Vê şevê?”

Şivan: “Erê dibe ku sibê fersenda me çênebe.”

Nûjîn: “Temam, lê Harûn şiyar bibe şaş fêm nake?”

Şivan: “Na, ew razaye. Tu dizanî min îro li gir meyze kir; gir hem nêzî tabûrê ye, hem jî nêzî malan e, heke em yek guleyekî jî biteqînin, ji me her sisêyan yek jî xilas nabe.”

Nûjîn: “Wa, em çi bikin?”

Şivan: “Ez dibêjim, em vê çalakiyê deşîfre bikin. Wiha nebe em ê hemû bimirin.”

Dema ku her duyan ev guftûgo dikirin, Harûn ji ber sermayê ji xew şiyar bû, dît ku Şivan ne li kêleka wî ye. Berê got qey derketiye derve. Lê belê dema dengê axaftinê çû wî, guhên xwe vekirin û guhdarî kir. Berê got qey dijmin e. Dema baş guhdarî kir, dengê Şivan nas kir û gotinên wî ku dibêje:

“Em ê biçin, lê wek ku ez dibêjim, em ê xwe nîşanî wan bidin. Ew me bibînin, an ew ê ronahiyên şevê bavêjin, an jî ew ê A-4 (A dört) bi ser me de bireşînin. Em ê bêjin; em deşîfre bûn.”

Harûn ev gotin bihîstin. Nûjîn jî nêrînên wî pejirandibûn. Pê re bûbû yek. Şivan gotinên xwe domandin.

“Jixwe dê Harûn di pêş de bimeşe. Em ê jî di cihê ku tên dîtin de, bi veşartî neçin jixwe termal jî hene ew ê me bibînin.”

Harûn jî tirsiya bû. Heke wî şehîd bixin û biçin, ji hevalan re jî bêjin: “Reviya, an jî bêjin; em dema çûn êrîşê şehîd ket.” Êdî xewa wî  çûbû. Di nav dijmin û tirsonekan, de bi tenê mabû. Bixwe ji xwe re got:

“Ez niha çi bikim? Biçim cem hevalan? An jî biçim cem wan, bêjim; hûn çi dikin? Erê, erê ez ê biçim cem wan.”

Harûn rabû û bang li Şivan kir. “Şivan tu li ku derê yî?!”

Şivan bi bezê hat cem wî.

Şivan:  “Dengê xwe nizm bike li jêr deng tê.”

Harûn fikirî û wek ku tiştek nebihîstibe: “Ji ku derê deng tê?” Destê xwe avêt çeka xwe û got: “Ka em biçin binêrin dibe ku dijmin be.”

Şivan: “Em çûn, me meyze kir. Me tiştek nedît. Min banî te kir, tu razayî bûyî. Hevala Nûjîn rabû, min û wê, em çûn me meyze kir, me tiştek nedît.”

Dema şivan ev digotin, Nûjîn jî hatibû cem wan. Wê jî gotinên şivan erê dikirin. Wek ku ew rast dibêjin, Harûn jî xwe nêzî çeka xwe kir û dîsa xwe dirêj kir…

## Ne Bilbilik, Amed Jî Were Em ê Îro Derbeyê Li Dijmin Bixin

Dema ku wan wisa îxanet jiyan dikirin, koma Dicleyê jî hê xwe negihandibû nuqteyê. Di wî hevraziyî de bêhal bêhal dimeşiyan; xwe gihandibûn binê nuqteyê. Dîsa li wan bûbû sibe. Dema gihîştibûn nuqteyê hemû ji hal ketibûn û xwe avêtin erdê. Barê xwe danîn. Ji westandinê kesî tiştek nexwar û razan. Piştî nîvro Dicleyê ew ji xew rakirin, xwarina xwe xwarin. Êdî çend demjimêr ji çalakiyê re mabûn.

Dicle: "Heval ji bo êvarê êdî çend demjimêr man. Heke tiştek nebe, em ê îro destaneke din jî binivîsin."

Zinar: "Ger Bilbilik îro neyê Hênê wekî din tiştek nabe."

Li ser vê gotina Zinar hemû keniyan û moral dan hev.

Dicle: " Na na îro ne Bilbilik, Amed jî were, em ê derbeyê li dijmin bidin, wan mat û şaş û maş bikin."

Aram: "Hûn heta ber hedefê saxlem biçin, êdî tiştek nabe."

Cûdî: "Jixwe nîzamiye hema nêzî malan e. Em xwe bigihînin malan jixwe sivîl diçin û tên. Navbera nîzamiyeyê û malan bîst-bîst û pênc metre ne. Em xwe ji malan hinekî din jî nêzî wan bikin, jixwe dikevin hedefa me. Êdî kes nikare wan ji destê me xilas bike."

Dema ku wan li ser van tiştan guftûgo dikir; Harûn hê di çûn û neçûna çalakiyê de xwe zelal û misoger nekiribû. Li ser riyên ku herî deşîfre bûne kîjan in, difikirî. Dîsa ji xwe re digot; na ez bi wan re naçim. Carinan jî ji xwe re digot; ku em deşîfre nebin, wê demê ew ê jî ji mecbûrî têkevin nav.

Dema ku Harûn li ser vê difikirî, wek ku ew nebihîstibin, car caran jî bi wan re, dê çawa biçin ser dijmin, ê çawa li dijmin bixin,

diaxivî. Wan jî wek kes vê îxaneta wan nizanibe, xwe wek Şêrê ‘Elî didan nîşandan.

Koma Dicleyê amadekariyên xwe yên dawiyê dikirin. Êdî berêvarkî bû. Dicleyê got: “Heval em xwarina xwe bixwen û biçin.” Piştî xwarinê Cûdî cilê xwe yê sivîl li xwe kir. Qazaxê Dicleyê sivîl bû. Got: “Ez ê li kêleka bajêr etek di ser şal re li xwe bikim.” Ji bo piştî çalakiyê zû etekê xwe biqetîne û zû paşve bikişin; ji hevalan maketek girt.

Dema êvarê ji hev qetiyan, ji bo her îhtîmalî dîsa cî dan hev. Ger çalakî bibe, an jî nebe ew ê heta demjimêr yekê (1) nêzî gundê Tahwêlê li benda hev bisekinin. Her yekê/î pakêtek biskewêt (biskuvit) girtin û ji hev xatir xwestin. Jixwe ji derveyî çar pakêt biskewêt tu tiştekî wan nemabû.

Dicle û Cûdî xwe berdan. Ji ber ku riya Aram û Zinar wan nêz bû, ew li benda tarîtiyê man. Dicle û Cûdî bi dizî, îhtimalê wan bibînin ji holê radikirin, di nav daran de xwe berdidan. Xwe bi hedefa xwe ve kilît kiribûn. Dema gihîştin deştê, Aram ew bi pêçiyan (tilî) nîşanî Zinar didan. Êdî tarî dibû. Li pêşiya Dicle û Cûdî çewlikek hebû. Êdî dijmin wan nabîne. Aram û Zinar jî çenteyên xwe û yên wan girtin û xwe berdan. Dema Aram ew hatin cihê ku bigihîjin hev, çente li wir hiştin. Dicle ew jî gihîştibûn nêzî bajêr, rastî çeperên ku gundî li derdora erdê pê digirin hatibûn. Heta ji xwe re rê dîtin, demekê di dora wan re çûn û hatin. Di wir de ketin hewşa dibistanê û li benda demjimêra çalakiyê man. Jixwe malên ku li derdora nîzamiyeya tabûrê bûn, pênc xulekan ji wan dûr bûn.

Êvarê Harûn wan jî xwe ji jor Babixê berdan. Ji aliyê rastê ve xwe berdan dolê. Ev dol tam nebe jî, dema diqede, diçe cihekî du-sê gir dikevin pêşiya (navbera) wan û gir. Dema xwe berdan dolê…

Şivan: “Harûn çima em di vir re diçin? Wek ev der ne baş e. Em deşîfre bibin ew ê çi bibe?”

Harûn: “Cihê herî saxlem ev der e. Ez berê jî di vir re çûme. Dema me mayîn di qada wan a perwerdeyê de teqand jî, ez di vir re çûm, ev der saxlem e.”

Nûjîn: “Ez jî tevlî hevalê Şivan dibim, dibêjim ku ev der ne saxlem e.”

Harûn: “Na heval cihê herî saxlem ev der e.”

Piştre di dilê xwe de got; “Ez nizanim çi ji te û hevalê te yê Şivan…”

Dema ku Harûn wan xwe gihand serê dolê

Harûn: “Heval em ê van du-sê girên pêşiya xwe derbas bikin. Ez ê li wir bisekinim, hûn ê biçin gir. Dema hûn gihan binî, bi cîhazê ji min re bêjin; ez ê bi bîsivingê lê bidim.

Dicle û Cûdî demjimêr ji heştan re çariyek mabû ji baxçeyê dibistanê derketin, ketin nav taxê û li ber malê sekinîn. Aram wan jî xwe nêzî esfaltê dikirin. Ji ber ku karê dikete ser milên wan piştî teqîna çekan bû, hêdî hêdî dimeşiyan.

Harûn li pişta gir bi awayekî veşartî dimeşiya û di dilê xwe de digot: “Me tepeyek quliband.” Şivan û Nûjînê xwe netewandin, wek gundiyan dimeşiyan, dê tam xwe bigihandana ba Harûn, dijmin ronahiya şevê avêt. Berê çekên xwe dan wan û bi ser wan de gule reşandin.

Şivan got: “Em deşîfre bûn.” Hema ji wir dûr ket. Nûjîn jî da dûv wî. Harûn wek dînan lê hatibû. Wî jî bi bisivingê, çar heb roket, bi rext û çeka xwe, xwe gihand wan. Ew ji nav dijmin derxistin.

Dîcle û Cûdî tam fêm nekiribûn çi bûbû. Deşîfrebûna wê komê zaf kêm bû. Dema ku wisa difikirîn ji tabûrê panzêra heşt tekel derket û ber bi riya Pîranê ve çû. Wê demê Aram û Zinar li ser esfaltê bûn. Wan jî ronahiya şevê ferq kir. Wan di navbera xwe de got: “Dicle û Cûdî deşîfre bûne.” Ji ber wê cihê xwe bernedan.

Pir neçû, Şivan bi cîhazê bang kir. “Amed, Amed.” Zinar bersiv dayê.

Şivan: “Amed cihê xwe berdin.”

Zinar: “Temam, temam.”

Şivan: “We girt.”

Zinar: “Erê, erê, me girt Agir.”

Wan jî, Dicle û Cûdî jî tiştek fêm nekiribûn. Çûn cihê ku wan dabûn hev, li benda hevalên xwe man. Demjimêrek û nîv derbas bû kes nehat. Zinar kêmekî xwe da jor û bi cîhazê banî Amanos kir. Kesî bersiv neda. Çû cem Aram cixareyek kişand. Dîsa hedara Zinar û Aram nehat.

Aram: “Ka careke din, dîsa biçe banî wan bike. Çi li wan hat.”

Zinar: “Dema ronahiya şevê avêtin dengê çekan hat; piştî wê jî nehat. Qey ew deşîfre bûn?”

Zinar dîsa çû çend caran li ser hev banî wan kir. Wê demê lembeyên tabûra qumando vemirîn. Zinar ew ferq kir, dîsa çû cem Aram.

Zinar: “Min çend caran bang kir, tabûrê hemû lembeyên xwe vemirandin. Dibe ku termalê jî bavêjin.”

Cara dawîn dema çûn banî kirin, Cûdî bersiv da got:

“Em nêzî we ne; em tên.”

Dema hatin demjimêr deh û nîv bû, xwe gihandin hev. Aram û Zinar ji wan pirsîn:

“Çi bû, çima çalakî deşîfre bû?”

Cûdî: “Em jî nizanin, em li ber hedefê bûn bi carekê me dît ronahiya şevê avêtin û gule reşandin.”

Ji wir çenteyê xwe dan pişta xwe, di jor gund re xwe li palê xistin. Dema gihîştin nîvê qûntarê, bê taqet bûbûn, êdî hal di wan de nemabû. Cî bi cî li ser destan jî dimeşiyan. Dema gihîştin ser gir banî agir jî kirin, lê bersiv negirtin.

## Dîcle Ji Ber Ku Berpirsiyar Bû Ji Bo Keşfa Serê Sibê Ma Şiyar

Xwe ji wir berdan çûn gundê Enehîrê. Di gund de çûn mala herî jor a li ser riya wan bû. Li derî xistin, lê kesî derî venekir. Ji ber ku hem birçû bûn, hem jî tiştekî wan nebû sibê bixwin wan israr kir. Careke din jî li derî û li pencereyê xistin. Xwediyê malê di pencereyê de meyze kir ku heval in derî vekir. Gundiyên vir Dimilî bûn.

Zinar: "Dayê merheba!"

"Merheba, şima xêr amê."

"Xêr miyan dayê."

"Bêrên zere ronişên."

Hemû çûn hundir û rûniştin.

"Dayê to ma şînasna?"

"Erê mi şîma şînasna, in kêyn yew car amey tiya."

"Dayê, ma vêşon, ra ma dîre, to non bidma mayê şî."

"Na na şîma şî ça, min çay vîraştî şîmara."

Zinar li hevalên xwe vegerî.

"Min got; nan bide me em ê biçin."

Dibêje: "Min çay çêkiriye."

"Umbazê Harûn sekena, nêyên tena."

"Umbazê Harûn holê hol, şîma Umbazê Harûn heskena. Harûn zî dimiliya seba ên şîma zaf heskena."

Aram: "Hevalê Zinar bêje; bila avê ji me re bîne."

"Dayê umbaz tîşena bûyo, to mara awk biya ma bisimên."

Piştre zilamê malê jî hat, hevalan xwarina xwe xwarin û rabûn. Ji bo sibê jî ji xwe re xwarin girtin û ketin rê. Dema hatin gewriyê dîsa li pişt xwe zivirîn, li Amedê meyze kirin û kesereke kûr kişandin. Ji ber ku dîsa

destvale vegeriyabûn. Dema ku gewrî derbas kirin, vê carê şewqên Licê xwiya kir. Zinar got: “Aha Bilbilik!”
Aram: “Hê cihê xwe neguhertiye.”
Dicle: “Yaw ez ê jî rojekê potên we bigirim, hûn ê wê demê bibînin.”
Bilbilik di navbera Licê û Dara Hênê de alay a dijmin e. Di vê alayiyê de, di navbera pênc şeş hezaran de leşker hene. Ronahiya wê ew qas mezin e ku di Bakur de tu navçe ew qas mezin nabe. Dema heval ji Başûr tên û di ber re derbas dibin, heval pirs dikin: “ Heval ev kîjan bajar e?” Heval nabêjin, ev qereqol e. Yan dibêjin ev Dara Hênê ye, yan jî dibêjin Çewlik e. Heval jî bawer dikin; dibêjin belkî rast e. Ji ber ku tu carî qereqoleke ew qas mezin nedîtine. Bi rastî jî dibêjin qey bajar e.
Dema ku Dicleyê ronahiyên Licê dîtin got qey Bilbilik e. Lê Licê di deştê de di qûntara çiyê de ye; Bilbilik li ser gir e. Ji ber wê hevalan kiribû mijara henekan.
Xwe ji gewriyê berdan, Ji ber ku hê dinya venekiribû ber bi gundê Şelê ve meşiyan. Divê xwe bidana nav şkêran, ev qûntar hemû şkêr bûn; lê belê hemû şkêrên kor bûn; cihên ku lê bimînin zêde tunebûn. Qederekê li cî geriyan piştre, Dicle: “Heval werin vir, li vir cî heye.”
Heval hemû çûn. Bi rastî jî cihekî xweş bû. Di nav tahtan de, tahtekî mezin wek sîwanê ser tahtan girtibû. Di baranê de jî pêwîstî bi kon nebû. Her çar ketin bin, heta li wan bû sibe. Cihê wan ji tu derî nedixwiya. Ji bo razanê cihê xwe rast kirin. Konekî (çadir) wan hebû. Ew jî her sê hevalên xort avêtin bin xwe. Dicleyê jî, ji wan wêdetir ji xwe re cihek çêkir. Yên Dicle jî parçeyek kon û kefiyeya wê hebûn.

Dicle: “Hûn razin, ez ê şiyar bimînim. Piştre ez ê yekî ji we rakim.”

**Ne ku Dicle stî bû ranediza; ji ber ku berpirsiyara komê bû; divê keşfa serê sibê bikira.** Ji bo wê jî şiyar mabû. Jixwe di nav hevalan de xort û stî ferq nake.

## Heke Em Bibin Yek Ew Nikare Tiştekî Bike

Harûn ew jî, dema ku ronahiya şevê û gule bi ser wan de avêtin; Şivan û Nûjîn xwe li gir xistin, xwestin li pêş dijmin birevin. Harûn xwe gihand wan û ew bi aliyê Cimsaqê ve birin. Bi awayekî bez û bi dizî ew li pişta Hênê girtin, berê xwe dan Cimsaqê. Qûntara Cimsaqê ya li Hênê meyze dikir, qûntareke bilind û xîz bû. Ji ber ku daristana wê hatibû jêkirin, rût mabû. Bi lez û bez ev qûntar derbas kirin û xwe dan navbera Hêgasor û Dirnanê. Ew şev li wir derbas kirin. Dema ku serê sibê ji xew rabûn, derdora xwe keşif kirin. Dema dîtin ku tiştek tune, agir dadan.

Ji ber ku tiştekî wan nebû bixwin, çûn giyayên ku tên xwarinê kom kirin. Dema ku Harûn çû giya…

Nûjîn: “Dibê qey moralê Harûn tuneye. Wê şevê em nebihîstibin?”

Şivan: “Na. Bawer nakim. Lê dema em biçin cem hevalan. Em ê bêjin; Harûn çalakî deşîfre kir. Riya ku em tê re birin, ne riyeke saxlem bû. Heke ez û tu em gotinên xwe bikin yek, ew nikare tiştekî jî bike.”

Nûjîn: “Temam, jixwe em du kes in, ew bi tenê ye.”

Her duyan axaftinên xwe kirin yek û wan dê hemû tewanbarî bixistana stûyê Harûn.

Dema Harûn hat cem wan: “Em ê piştî nîvro bi rê bikevin û em ê pêşiya xwe jî bibînin. Ji xwe li ser riya me qereqola Hêgasor jî heye. Em ê bi çavê ronahî wir keşif bikin, dê baş bibe.”
Şivan: “Dibê qey moralê te ne baş e. Ji bo çalakiyê ye, an…”
Harûn : “ji bo çalakiyê ye. Hevalan ew qas ked rijandin, H. Bêrîtan û H. Rûbar bixwe li ser wê çalakiyê sekinîn, me jî çû deşîfre kir. Ew qas ked vale çû.”
“Nizanim, lê riya me dibê qey ne saxlem bû. Me li wir jî got, lê… çi bû carekê bû.”
Harûn xwest wê demê … û dilê xwe lê rihet bike… ji ber pîvanên ku ji rêxistinê girtibûn dîsa jî xwe girt.
“Tişt nabe, em ê careke din şiyar bin.”
Piştî nîvro bi rê ketin. Ji aliyekî ve dimeşiyan, ji aliyekî ve giyayên dihatin xwarin kom dikirin û dixwarin. Dema gihîştin jora Hêgasorrûniştin, bi baldarî dûrbîn avêtin derdor û riya ku wê tê re biçûna. Bi tarîtiyê re, bi dizî, di nav şkêr û daristanê re di pêşberî Hêgasor re derbas bûn; hatin ser riya Hêgasor û Şelê. Li wir ketin rê, rê û rê meşiyan hatin ser kaniyê av vexwarin û dîsa riya xwe domandin. Gund derbas kirin, ketin ser şiveriya Goma Şelê. Ji duh êvarê ve birçî bûn, dîsa jî neketin Şelê. Ji ber ku Şelê gundekî ne baş bû, ji bo wê jî hatin Goma Şelê. Mirovên di Goma Şelê de rûdinin jî ji Şelê ne, lê ne wek wan e; ji wan cuda ne.
Dema gihîştin gund çûn malekê, wê malê ji berê ve heval nas dikirin. Li derî xistin, xwediyê malê derî vekir.
“Umbazê Harûn bê zere.”
“Merheba, kom kêy da esta.”

"Ma pîr kêy da."

Ketin hundir. Merheba dan ên hundir û rûniştin.

Pîrê: "Harûn, lacê min tu xêr amê, halê to senînê."

"Xêr miyan dayê, halêma hol niye."

Gundî: "Umbaz çima, ma çi biya halê şimabaş nîya?"

Hê Harûn û gundî, ew bi hev re diaxivîn, xwarina wan anîn danîn jî. Li van deran heval têr jî bin, gundiyan bi zorê xwarin didan wan û barên wan ê xwarinê amade dikirin; pêwîstî bi xwestinê tunebû. Di her malê de tevlîbûn nebe jî, her malê ji destê dijmin pir kişandibû. Ji ber wê wek ku bi hevalan ve têkel bin, ji wan hez dikin.

Dema Harûn li ser xwarinê rûnişt, zîvirî pîrê:

"Dayê vîzêr şandara ma çîk nêwena, çîk ma biyo."

"O Harûnê min kêy min tora biveşe."

Zivirî keç û bûka xwe.

"Lez zî umbazan ra çî biya, çîmê min birijê şîma ra, homa kêy dişmen biveşn, pîyer qorbanê şîma biv."

Pîre dest bi nifiran kiribû. Hevalan jî xwarina xwe xwarin û derketin.

## Ne Kes Li Nuqteyê Hebû Ne Jî Kesî Ji Wan Re Nîşe Hiştibûn

Dema Dicleyê tiştek li derdora xwe nedît ew jî raza. Ji ber ku dinya ew qas sar bû û binê wan cemidî bû, zû ji xew şiyar bûn. Ji xwe re agir dadan û li ber rûniştin.

Heta êvarê gundî di bin wan re diçûn û dihatin. Li hafa (karşi) wan jî hin gundiyan bi hespan cot dikirin. Motor û wesayîtên din nikaribûn bihatana vê derê. Duh êvarê ji

gund, ji xwe re qedeh û şekir jî anîbûn. Lê çaydanê wan tunebû. Wan di qotiyên (pet) kolayê de ji xwe re çay çêdikirin.

Berêvarkî, dema gundî ji erazî çûn, ew jî ketin rê. Ber bi nuqteya Bûzdolabî ve çûn. Li nuqteyê av nebû, li ser riya xwe çar pet av jî girtin. Bi tarîtiyê re gihîştin nuqteyê. Li nuqteyê ne heval hiştibûn, ne jî Harûn ew hatibûn.

Dicle: “Hevalê Zinar biçe wê nuqteya din, nîşeyekê têxe bîdon. Meyze bike, dibe ku hevalan ji me re nîşeyek hiştibin.”

Zinar çû li bîdon meyze kir, ne kes li wir hebû, ne jî kesî ji wan re nîşe hiştibû. Nîşe nivîsî û xiste hundirê bîdon. Ew der cihê wan ê hevdîtinê bû. Dema zivirî nuqteyê got: “Min tiştek nedît.”

Heta Zinar hatibû, hevalan singêr û kîsê (tulum) wî yê xewê jî derxistibûn. Hê nû bûbû êvar, lê belê dibû çend şev ew bê xew bûn. Ji êvarê ve razan.

Serê sibê hê zû bû Harûn hat cem wan. Zinar jî şand dûv Şivan û Nûjînê. Zinar çû banî wan kir û bi hev re hatin. Hevalan agir kiribû, wan jî xwe dan ber agir.

Dema derdor vale bû, Harûn ji Zinar re bi dimilkî, qala bûyerê kir. Gengaz bû kudeng diçû wan, lê belê tu kesî bi dimilkî nizanibû.

Harûn: “To zane sebiya?”

Zinar: “Ez çi zona sebiya!”

“En namûsizê cîmid esta, çalakî deşîfre kerdin. Kişt min kotêrê bû, ez şev wûrz kişt minda çinya, min va ez van kena, barcê veng amê min, min goşdar kerd vange ene merdim biya, va; ma şî çalakiyê, la ma çalakiye nêkena. Ma çalakî bikir, mayê yên kiştin.

“To sekena.”
“Ez çîk nekena, ez tirseno, ay du kes bî, ez yew kes bî, ez bikiştana zi min nêşkanî bû çîk zi bikena.”
“To semeda se çita şî çalakiye, to neşiya.”
“Min va belkî ma deşîfre nêbûyo la biyo.”
“Temam mira nêvena, şî rêxistin ra vacê.”
“Ez ê vacê, la çimê to zi ser eno biyo.”

## Wek Tûtiyan Gotinên Hev Dubare Dikirin

Dema ku Harûn ji Zinar re qala bûyerê dikir, Nûjînê jî bi Dicleyê re guftûgo dikir. Li dijî Harûn dest bi propagandayê kiribû.
Nûjîn: “Min û hevalê Şivan, me got; em di vir re neçin, ev der ne saxlem e. Lê wî got; na, ez Hênê nas dikim; em ê di vir re biçin. Ev der tam li pêşiya gir û tabûrê bû. Jixwe derûniya wî ev çalakî ranedikir. Heta êvarê, qet bi me re neaxivî. Bê moral bû. Nedixwest were. Tam yekî tirsonek e. Xwezî li şûna wî yekî din hatiba. Me fersendeke zaf mezin winda kir. Oportonîstê pîs. Ew qas hevalan ked rijand. Ji bo em tola hevalan bigirin, em çûn; lê belê di rûyê tirsonek de hemû tişt vale derket.”
Dema ku Nûjînê van dibêje, Dicle jî ew bi dilekî hevaltiyê yê safguhdarî dikir. Digot, qey rast dibêje. Dicleyê, piştre li cem Nûjînê banî Şivan kir. Şivan jî çûcem wan.
Dicle: “Hevalê Şivan çi bû, hûn çawa deşîfre bûn.”
Şivan jî heman tiştên Nûjînê gotibûn, wek tûtiyan (papaxan) dubare kirin. Li ser vê moralê Dicleyê zaf xirab bû. Heke te kêrek lê bida, dilopeke xwînê jê nedihat.

“Yaw min fêm nekir, hinek heval bi eşq û moral diçin ser dijmin, hinek jî hê bi dûv canê xwe yê rezîl ketine. Ew qas heval şehîd ketin, qet pozê wan naşewite. Hûn nikaribin:“bêjin em nikarin.” Hinekên din, ê destê xwe li singa xwe bixin. Hem pêşiya hevalan digirin, hem jî nakin. Ev tam rezîltî ye. Ez di şûna mirovên wisa de bim, ez ê xwe bikujim.”

Ev gotin û bê moral ji cem wan rabû; hat cem hevalên din rûnişt. Dixwest tiştekî bêje, lê dîsa jî xwe girt û tevlî guftûgoyên wan bû.

Piştî çend xulekên din, dema ku nûçe guhdarî kirin, dijmin di nûçeyan de digot: “Li navçeya Hênê ya bi ser Amedê ve şer derket; di şer de du gerîla şehîd ketine.”

Harûn: “Herhalde çend gule avêtin me, ji xwe re dibêjin, qey me du kesên wan kuştine. Yaw ev dijmin tam bûye bênamûs. Baş e ku negotin, me pênc heb kuştine.”

Dema ku Harûn wisa bi xwe bawer diaxivî, Dicleyê di hundirê xwe de digot: “Ger tu ew qas zilam bûyî, tu çima neçûyî ser gir. Di cihê fireh de, pîrika min jî dikare biaxive.”

Dema ku Harûn ew çûn cem, hevalê Rûbar wan di derbarê çalakiyê de agahî dan hevalan.


## Deşîfrebûna Çalakiyê Bi Kêmasiyên Teknîkî Ve Nirxandin

Serê sibê hevalê Rûbar, li ser bûyera ku li Ş. Serxwebûn hatibû jiyankirin jî, agahî dan hevalên ku ne li wir bûn.

“Heval, hevalê Ciwan û hevalê Xebat şehîd ketine. Ev heval piştî çalakiya li ser rê, xwestine di herêmê de mayînan deynin. Ev heval, mayîn û pîlan dixin nav hev, dibêjin; ‘bila zaf cî negirin.’ Qederekê bi vî awayî dimeşin. Dema ku dixwazin mayînê deynin, bi wan de diteqe.”

Piştî nîvro civîna herêmê hat çêkirin. Hevalan pêvajoya ji derketina wargehê û vir ve nirxandin. Ji bo çalakî bi ser neketiye ew jî hat guftûgokirin. Lê ne Harûn bal kişand ser rewşa Şivan û Nûjînê, ne jî wan tiştên ku di derheqê Harûn de gotibûn di civînê de anîn ser ziman. Deşîfrebûna çalakiyê zêdehî bi kêmasiyên teknîkî ve nirxandin. Piştî civînê Yûsif û hêzên girêdayî biryargehê çûn Ş. Remzî, hêzên Apê Mûsa jî li cihên xwe man û li ser esfaltê ketin nav liv û tevgerê.

Dema ku hinekî derdor kom bû, Harûn ji bo çalakiyê her tişt ji hevalê Rûbar re bi awayekî berfire vekir. Dema bû sibe hevalan di derbarê şehadeta hevalê Xemgîn û hevalê Şoreşê Meletî de jî tekmîl dan.




## Herêma şehîd Navdar

Demeke dirêj e heval li Zarayê bûn. Piştî ku ji qampê derketibûn hatin vir. Li vir çend mayîn danîn û karê xwe yê din dan meşandin. Eraziyê Ş. Navdar ji girên piçûk û pan pêk tê. Ş. Navdar di navbera Licê, Karaz û Hênê de ye. Eraziyê dikeve nav axa Hênê ji deştê pêk tê. Cihê dikeve Karazê, girên pan in û heta ber axa Licê dirêj dibe. Ev der hem daristan e, hem jî şkêr in. Axa Licê jî wek axa Karazê girên pan û nizm in. Ji pêşiya Licê bigire heta ber axa Karazê tê. Di herêma Ş. Navdar de sê heb qereqol

hene. Yek ji van qereqola Hîzan e. Girê vê qereqolê, di Ş. Navdar de girê herî bilind e. Leşkerên di gir de ji yên li qereqolê bêhtir in. Ev gir ji dema Osmaniyan heta niha tê girtin. Ango her dem cihekî leşkerî bûye. Vî girî di dema Osmaniyan de rista mûhaberê didît. Îro jî heman ristî û rista parastina qereqolê dibîne.

Yek jî qereqola Engolê ye. Ev jî li ser riya Amedê û di deştê de ye. Di nav deştê de, li ser qereqolê, girekî ji şkêran pêk tê heye. Girê vê qereqolê jî di nav şkêran de, hem parastina qereqolê dike, hem jî li ser rê rista asayîşêdigire ser milê xwe.

Yek jî qereqola Gir heye. Ev qereqol di deştê de ye; dikeve navbera Ş. Navdar û Ş. Kawa.

Heval li Zarayê bûn. Girên vir ji deştê dest pê dikin û bilind dibin. Serê van giran rast in; ji şkêr û daristanê pêk tên. Eraziyeke ku ji bo gerîlatiyê dest dide ye. Heval li nuqteya Ş. Têkoşer bûn. Ev nuqte li serê gir, di nav şkêr û daristanê de bû. Li vir pênc heval hebûn. Ev heval çend caran ketibûn gundê koçeran. Ji vî gundî, ji xwe re erzaq derxistibûn.

Welat: “Heval, hevalê Rûbar bîsiving û guleyên wê dixwazin. Hevalê Şoreş kê ji we bîsiving û guleyên wê veşartine, îro wan derxin, em ê rê bikin.”

Şoreş: “Cihê wan hevalê Mêrîwan dizane.”

“Hevalê Mêrîwan bîsiving li vir e.”

“Erê heval, cihê wê li vir e, em ancax berêvarkî derxin.”

Xemgîn: “Herhalde dê hevalên Hênê çalakiyê bikin.”

Welat: “Dikarin bikin.”

“Di Apê Mûsa de yê ku biçe li Hênê çalakiyê bike kes tuneye. Heta ku ev avaniya (yapi) li wir neyê guhertin ew nikarin pisîkekê jî bikujin.”
“Herhalde hê berteka te ya li hemberî wan venemiriye.”
“Na, ez rast dibêjim. Em ê çend rojên din şûnde bibînin. Heke wan çalakî kir, ez tiştekî nizanim. Di wan hevalan de mantiqê leşkerî kêm e. An ew hemû dê xwe bidin kuştin; an jî nikarin tiştekî bikin.”
Wê êvarê, Şoreş û Mêrîwan birin cihê ku hevalan dabûn wan danîn û ji gundî re gotin: “Yê ku tê wan dibe bila cîhaza mezin jî bîne vir. Bila ji hevalan re bêje; pêwîstiya hevalan bi cîhazê heye.”
Ev gotin û ji gund derketin.




## Wî Bênamûsî Giliyê Me Kiriye

Bû roja din û şûnde, vê carê pênc heval bi hev re çûn gundê Hûrê. Hevalan par ji vî gundî sîxurek (ajan) kuştibûn. Dema heval dikevin gund, ji aliyê hinekan ve tên dîtin. Dema ku hevalan di gund de karên xwe qedandin, her pênc jî bi hev re derketin derveyî gund.

Welat: “Heval em ê di vir re biçin. Hûn jî nuqteya xwe biguherin; biçin wê nuqteyê ya jêr. Hevalê Xemgîn tu bi me re nayê?”

“Na, ez ê li cem hevalan bim. Dibe ku bi wan re bibim alîkar. Wekî din jî yekî xwedî tecrûbe li cem wan be dê baş bibe.”

“Temam,  hay ji xwe hebin.”

Welat û Şoreş Maku ji wan qetiyan û ber bi Sîsê ve çûn. Xemgîn, Şoreşê Meletî û Mêrîwan jî çûn nuqteyê; çenteyê xwe girtin û ji wir çûn nuqteyeke ji wê jêrtir. Dema ku heval ji gund derketin, agahiya hevalan ji zû ve çûbû destê dijmin. Dijmin amadekariyên xwe kiribû. Jixwe rojekê berî wê dê êrîşek xeternaktir kiribana, lê ew dîtibûn. Ji ser xwe avêtibûn. Ev agahiyên ku ketibû destên wan, dixwestin baş bişixulînin.

Hinek yekîneyên xwe ji êvarê ve derxistibûn. Serê sibê jî bi qamyonên ocaxa mermeran, ji bo ku balê nekişîne biribûn derdora eraziyê Zarayê danîbûn. Serê sibê zû, hê dinya ronî nebûbû hevalan di cîhaza piçûk de feq kir ku dijmin di erazî de ye. Dema dijmin di cîhazan de diaxivî, hevalan feq dikir ku derketine. Wê sibê qareyên cîhazê hemûyan lê didan, li ser wê hevalan ferq kir ku dijmin li derdora wan e. Di tariyê de hevalan xwe komî ser hev kirin. Hemû rabûn çûn cihê keşfê. Heta derengî keşif kirin, tiştek nedîtin, lê dîsa jî rihet nebûn.

Xemgîn: “Hûn xwe berdin nuqteyê agirekî piçûk pêxin, lê hay ji dûmanê hebin. Ez ê hinekî din jî dûrbînê bavêjim piştre werim.”

Dema hevalan agir pêxistin, şivanan jî pezê xwe anîbûn derdora wan. Hevalê Xemgîn xwe berda û çû cem hevalan.

“Dema dijmin li derdoran be, şivan tên van deran.”

Şoreş: “Heke ferq bikin ji derdora gund dûr nakevin, lê carinan dijmin jî xwe vedişêre.”

Mêrîwan: “Heval va dijmin li derdora me ye. Hemû qareyên cîhazê tijî dibin. Wî bênamûsî, duh giliyê me kiriye.”

Dema ku heval wisa diaxivîn keriyek pez ket nav nuqteyê. Şivan heval dîtin; hevalan bi destan banî wî kirin.
Xemgîn: “Were vir! Tu li çi digerî?”
“Heval ez hatime ber pez.”
“Te li derdor leşker dîtin.”
“Na heval, min bi baldarî meyze nekir; lê hebûya min ê dîtibûya.”
“Temam, em heta êvarê te bernadin, tu yê li vir bî.”
“Li ser çavan heval, berê ez carekê pez kom bikim.”
Mêrîwan: “Na, wî berdin. Ew quralsiz jî dixwaze em tewanbariyeke wiha bidinê.”
Dema ku Mêrîwan wisa got, çavên şivan dibiriqîn.
Şivan: “Ez li cem we bim. Weleh ji kesî re nabêjim.”
Şoreş: “Na, tu yê pezê xwe bigirî û li hemû eraziyî bigerî, ger tu tiştekî bibînî, tu yê werî ji me re bêjî.”
“Temam, heval ez çend xulekên din jî rûnim, ez ê biçim.”
Mêrîwan: “Rabe bêqural, hema biçe û baş li derdora xwe meyze bike.”
Şivanê pez rabû bi destê hevalan girt û ji wir derket.
Xemgîn: “Hûn wî nas dikin, ew kî yê?”
Mêrîwan: “Erê em nas dikin; zirar jê nayê…”
Hê Merîwan axaftinên xwe didomandin, gurmêniyek ji nav wan hat; bi ba û dijwariya teqînê ji cihê xwe firiyan. Şaş û mat bûn. Xemgîn li xwe meyze kir ku birîndar bûye. Hevalên din jî xwe komî ser hev kirin, dest avêtin çekên xwe û xwe avêtin pişt tahtan.
Xemgîn: “Heta ku em ne xistine nav xwe, em xwe ji vir dûr bixin…”

Dîsa dengê teqînê hat. Piştî teqînê deng bi çekan jî ket û nuqte gulebaran kirin. Di wê demê de hevalan fersenda ku xwe ji wir dûr bixin dîtin. Xemgîn û Şoreş berê xwe dan nav daristanê. Li vir cî bi cî şkêr jî hebûn. Merwan berovajî wan, berê xwe dabû deştê û bi dizî ji wir dûr diket. Dijmin ev der tenê vale hiştibû.
Xemgîn û Şoreş qederekê ji cihê bûyerê dûr ketibûn, xwe nêzî serê gir kiribûn, reşahiyên ku li ber çavên Şoreş ketin fersenda xwe bavêje erdê û Xemgîn hişyar bike nedîtibû. Dijmin bi ser wan de gule reşandin. Dema ku hevalan gule li wan reşandin hêzên dijmin bê deng bûn. Li ser wê hevalan riya xwe guhertin û bi aliyê Koçeran ve bezîn. Hê nû ji cihê bûyerê dûr ketibûn, careke din di nav guleyan de man. Şoreş li wir ketibû, êdî bê hereket bûbû. Ji ber ku birîna Xemgîn giran bû xwe nedigihand Şoreş, ket. Wî jî xwe avêt erdê. Ji xwe re fikirî. "Şoreş jî şehîd ket, Mêrîwan jî şehîd ket."
Hê ew li wan difikirî, careke din deng bi çekên dijmin ket. Vê carê cihê ku ew lê bû, di bin gulereşandina dijmin de mabû. Êdî nikaribû milê xwe bide şixulandin, zaf jî xwîn winda kiribû. Hemû hêza xwe kom kir, careke din berê çeka xwe bi aliyê dijmin ve kir û li wan reşand. Piştî bêdengbûna wî, dîsa dijmin cihê ku ew lê bû gule reşandin.
Xemgîn ferq kir ku laşê wî lerizî û piştî wê xwe nedît.
Dema ku Mêrîwan xwe li deştê xistibû, ferq kir ku hemû meyla dijmin çûye ser wan. Du caran li cihên cuda cuda dengê çekan hatibû wî. Dema ku dengê çekan ê dawî bihîstibû, xwe nêzî gund kiribû; xwe gihandibû nav keviran. Jixwe xwe ji cihê bûyerê jî dûr xistibû. Bi tarîtiyê

re kete gundê Koçeran û çû mala milîs. Dema milîs ew dît xwe avêt stûyê wî.


“Hevalên din li ku derê ne?”

“Nizanim, dema em di şer de ji hev qut bûn, piştî wê çend caran dengê çekan hat, çi bû, nizanim.”

“Hûn bi hev re nebûn?”

“Erê, lê dema roket li nav me ketin, em ji hev qut bûn. Min xwe da deştê, herhalde wan jî xwe daye




## Çi Bû Çima Mayîn Teqiya

Piştî çalakiya li ser rê, rêxistinê dest avêt rêveberiya Ş. Serxwebûn û ew revên hatibûn jiyîn. Bi civîna hevalê Nûman hin tişt ronî bûbûn. Di vê civînê de tiştên ku hatibûn jiyîn, yên ku reviyabûn, raporên ku nivîsandibûn, tevlîheviya ku derketibû, ji aliyê jiyanî û rêxistinî ve

rêveberî berpirsiyar hatibû dîtin. Cîger, Rêber, Şino û Necmî ji erkê hatibûn girtin; dîsa berpirsiyarî dabûn hevalê ‘Elî.
Hevalê ‘Elî zivistanê, ji ber tevlîhevî û nakokiyên di nav rêveberiyê de derketibûn xwe dabû aliyekî û karê xwe bi rêveberiyê neanîbû.
Piştî civînê yên ku ji rêveberiyê hatibûn girtin, çûn Ş. Remzî.
Nûman: “Elî abî em ê niha çi bikin; em ê plansaziyeke demkurt bidin pêşiya xwe. Heta fermandarê herêmê tê.”
‘Elî: “Wele hevalan digot; em ê çend mayînên pêlêkirinê deynin.”
“Hevalên ku ji vî karî fêm dikin hene?”
“Hevalê Ciwan bi salan e vî karî dike.”
“Ê temam, bila van çend rojan deynin. Lê bila li ser riya sivîlan daneynin. Bila hay ji vê mijarê hebin.”
“Temam yaw, heval van tiştan dizanin. Em ê hê zêdetir deynin ser giran, gundî jî naçin wan deran.”
Vegeriya Ciwan û jê pirsî: “Ne wiha ye hevalê Ciwan?”
“Erê heval kes naçe wan deran. Jixwe her tiştê me amade ye. Em ê îro pîl û fûnyeyan jî têxinê, em dikarin êvarê biçin deynin.”
Ciwan bi karê xwe re mijûl dibû; wî fûnye dixistine nav şûşan. Avaşînê jî şûşeyên qavanozan naylon û band dikir. Ji ber ku ev qavanoz ê bi salan di binê erdê de bimînin, ji bo ku şil nebin; bi salan saxlem bimînin, ew naylon û band dikirin. Di wê demê de Xebat:
“Hevalê Ciwan, mirov van pîlan jî têxe nav qavanozê, hem hêwî nabin, hem jî di dema baranê de şil jî nabin.”

Avaşîn: “Yaw heval, pîl û fûnye nakevin cihekî. Yek jî tu jê fêm nakî, serê me jî tevlîhev neke.”
“Kê gotiye ez jê fêm nakim? Ez jê fêm dikim.”
Ciwan kêmekî fikirî?
“Erê mirov dikare têxe nav şûşê, lê dema em kilîtê deynin, em ê pê ve girê bidin. Dê wisa, pîl hê demdirêj li ber xwe bide. Dê pîl jî ji hêwîbûn, şilbûnê werin parastin û ji germahiyê jî neteqin.”
Avaşîn: “Yaw heval, wisa xeter e, lê tu dizanî.”
Xebat: “Na, na, wisa baştir e.”
Heta piştî nîvro gelek mayîn amade kirin. Qavanoz xistin nav kefiyeyekê, kilît jî xistin kefiyeyekê û berêvarê ‘Elî, Ciwan û Xebat ji bo mayînan deynin ji hevalan qetiyan. Dema xwe digihînin gundê Atîkanê, Ciwan:
“Hevalê ‘Elî em yekî li vê jorê deynin. Ew bênamûs xwe di vir re jî berdidin.”
“Temam, em yekî deynin.”
Ciwan, Xebat û ‘Elî xwe didin jor gund û li ser şiveriyê, cihekî bi tevşo dikolin. Ji bo axa wan belav nebe; axa ku dikolin dixin nav kefiyeyê.
‘Elî: “Ez ê nobetê bigirim, êdî hûn deynin.”
Xebat: “Erê erê, tu biçe em ê deynin.”
Xebat cihek kola û Ciwan şûşa mayînê xiste hundirê çalê. Ax avêt ser. Kêmek cihê kilîtê hiştibû; Xebat jî xwe bi ser de xwar kir.
“Hevalê Ciwan, em kilîtê nedin kêlekê, em bidin ser qavanozê, ku binê wê hişk be çawa pê lê bikin dê biteqe.”
Ciwan, axa ku avêtibû ser qavanozê, dîsa ji ser rakir; ji bo kilîtê cî çêkir. Dema ku kilît danî ser, qabloyek gira da.

Xebat jî xwe bi ser de xwar kir. Dema ku Ciwan qabloya ku di valetiyê de mabû gihandin hev çirqîniyek bihîstin. Çirqîniya ku hatibû wan bi teqînîyeke mezin çûbû hevalê ‘Elî.
Dema ku hevalê ‘Elî beziya çû ser wan; hevalê Xebat tenê li erdê bû û dinaliya. Dema ku hevalê ‘Elî xwe bi ser de xwar kir; dît ku lingek û milekî wî tuneye. Li derdorê meyze kir, çavên xwe li hevalê Ciwan gerand, laşê hevalê Ciwan li ser guliya darê li ber çavên wî ket!
Hevalê ‘Elî li hemberî wê bûyerê şaş mabû û nizanibû çi bike! Geh dibeziya Xebat; geh jî dibeziya Ciwan ji ser darê deyne.
Piştre bi cîhazê, bi hevalên nuqteyê re ket peywendiyê û banî çend hevalan kir. Ji nuqteyê çar heval hatibûn. Dema ku hevalan xwe gihandibûn wan, hê hevalê Xebat jiyan dikir. Heta wê demê hevalê ‘Elî birînên hevalê Xebat girê dabûn. Lê belê hê jî hevalê Ciwan li ser darê bû. Çend hevalan, hevalê Xebat li darbestê kirin û birin nuqteyê. Hevalê ‘Elî û çend hevalan jî, hevalê Ciwan ji ser darê danîbûn û ew veşartin.
‘Elî: “Heval em îro baş veşêrin, sibê em ê wî têxin erdê.”
Ji bo erdê bikolin, tiştek li cem wan nebû. Lê dîsa jî ew baş veşartibûn; ji ajal û xeteriyên xwezayê parastibûn.
Hevalê ‘Elî bi şev çû gund ji bo hevalê Xebat derman xwestin. Dema ku çû nuqteyê, Nûman: “Çi bû, çima mayîn teqiya?”
‘Elî: “Heval weleh nizanim, ez li nobetê bûm, her duyan danî. Li ser diaxivîn, bi carekê ronahî bû û dengê teqînê hat. Ez çûm hevalê Xebat li erdê dinaliya. Ez li hevalê Ciwan geriyam; min dît ku li ser darê ye.

“We hevalê Ciwan veşart, ew çi bû?”
“Weleh me veşart, lê divê sibê em biçin têxin bin erdê. Ew jî parçe bûbû, qet nedihat naskirin. Wê mayîna piçûk çawa ew anî wî halî hê jî difikirim.”
Digel tevahiya destwerdana heval dîsa jî nikaribûn Xebat rizgar bikin. Ew jî li kêleka nuqteyê veşartin.



## Tu Carî Jahrî Ji Têjikên Maran Xilas Nabe

Hevalê Koyspî, demeke dirêj bi awayekî du yekeyan ji hev qut bûbûn. Piştî wê demê, hemû heval li Ş. Serhed hatibûn cem hev. Êdî di Koyspî de şertê erazî ji bo her derî dest dida. Koyspî wek ku navê wî jî li ser e, zivistanên wî dirêj in. Dema hê heval ji derve ne, ev heval meha dawî ya payîzê dikevin wargehê; heta nîvê avrêlê di wargehê de dimînin. Koyspî axa dora Hênê ye. Cihê ku heval dişixulînin, herêma eşîra Sîwaniyê ye. Ev eşîr bi giştî dimilî ne. Hemû nokeriyê ji dijmin re dikin. Nirxê welatparêziyê di wan de qet tuneye. Heta qirikê ketine nav pîsiya dijmin; ji vî halî xwe jî pir razî ne. Ji wan re kûçikbûyîna dijmin şerefeke herî bi nirx e; di kûçikbûyînê de tu kes nikare avê li destê wan bike. Di serhildana Şêx Se'îd de yê ku despêkê xinizî kirine ev eşîr e; ango ev herêm bûye. Herêmeke ku bi hemû aliyan ve, ji rastiya xwe dûr ketine. Çiqasî ji heqîqet û rastiya xwe dûr ketine, ewqasî jî bi dijmin re bûne yek.

Di vê eşîrê de ji cerdevanan bajarokê Sîwanê (Selvî) hatiye avakirin. Ji destpêka cerdevaniyê heta îro, li hemberî hevalan, ji dijmin bêtir, bi eşq şer dikin. Destên wan ketiye nav xwîna bi dehan hevalî. Hevalan jî ji bo wê, ji bo xweparastinê gelek kes ji wan kuştine. Ji ber nokertiyê bi sedan kes ji wan kuştine.


Niha cihê ku heval didin şixulandin tê de cerdevan nemane. Ji bo dijmin pêşiya mirina hemûyan bigire, gundên ku cerdevan tê de hene, ji hemû gundan cerdevan birine Sîwanê. Bi vî awayî bajarok ji cerdevanan çêkir û navendî kir. Di vî bajarokî de tabûreke piyade û tabûreke komando heye.

Di vî bajarokî de yê ku bibe hijdeh salî û nexwaze biçe ji derve kar bike dibe cerdevan. Ji bo jiyana xwe derbas bikin, ev jî ji wan re deriyekî aboriyê ye. Dema ku ji van cerdevanan yek, an jî du kes di operesyonan de ji aliyê hevalan ve tên kuştin, ji payebilindên artêşa Çewlik û Darahênê jî tên tevlî merasima termê wan dibin. Di vê merasimê de, ciwanên ku nebûne cerdevan li hev kom dibin. Ji bo tola miriyên xwe rakin, ji bo bi hev re kûçiktiya xwe bidin nîşandan, li cem payebilindan hemû bi hev re derbasî pergala cerdevaniyê dibin.

## Ava Koyspî ji Kaniyên Buhiştê Ne

Bi giştî eraziyê Koyspî hemû ji çiyayên bi daristan pêk tê. Daristanên wê seriyek heye; seriyek tuneye. Herêma Koyspî (Çiyayê Spî) di nexşeya Darahênê de, cihê ku Darahênê lê ye, dest pê dike û hemû rojavayê wê digire nav xwe. Ji axa Çewlikê jî, Qere'emeran digire. Di

navbera Darahênê û Qere’emeran de Çemê Mûradê heye.
Bakurê ava Mûradê gelek welatparêz in û bi sedan şehîdan wan hene. Hemû gundên wan ji aliyê dijmin ve hatine şewitandin. Esas di herêma Sîwanê de jî gelek şehîdên me hene. Lê gelekî ew qas kor bûye ku ne bi lehengên xwe ve; bi xayînên xwe ve hatine girêdan.
Me gotibû; seriyekî daristanan heye, seriyek tuneye. Girê vir jî ew qas ne bilind in. Tê de pirsgirêka avê qet tuneye. Her kaniyeke wê ya heyî wek ava buhiştê ne. Pirî ava wê cemîdiye, dema mirov vedixwe diranên mirov diarin; mirov nikare di van kaniyan de têr avê vexwe. Mirov çiqasî tîn dibe bila bibe nikare zêdetirî qedehek av vexwe. Ev av, di çileyê havînê de wek cemedê ne. Hewaya wê cemidiye, mirov di meha tebaxê de jî li vir xwêdan nade. Mirov bi şev nikare bê kîsê xewê razê. Ev der bihar û payîzan zahf sar e. Zivistanan jî bi metreyan berf dikeve. Di eyaletê de berfa herî zû li vir dikeve, herî dereng jî ji vir radibe.
Di herêma Koyspî de çar heb qereqol hene. Yek ji van bajarokê “Sîwanê hemû ye”. Yek qereqola Qazê ye. Yek li ser ava Mûradê qereqola Suwêrenê ye. Qereqola Ûçûrê jî di navbera Koyspî û Apê Mûsa de ye.
Cihê ku heval lê ne, ev der Ş. Serhed e. Ev der dikeve pişta mila li pêş Evnîkê, ev nuqte di nîve gir de wek şaneşînê (balkon) ye. Ji ber ku heval demeke dirêj ji hev qut bûbûn, li vir komî ser hev bûn. Ew dema ku ji hev qut bûbûn, bi civînekê nirxandin û çûn plansaziyeke nû.




## Divê Mirov Amade Be, Ew Jî Dikeve

Rizgar Dêrxust: “Temam, hevalan dema derbasbûyî nirxandin. Em tiştekî nabêjin. Dema em ji hev qut bûn, armanca me hejmar kêmkirin û xwe parastin bû. Wê demê wisa di-xwest. Lê belê em ê dîsa ji hev qut bibin. Vê carê armanca me çalakî ne. Divê her yekeyek çalakiyekê bike. Êdî şertên me jî û yê erazî jî dest didin. Em ê tîmek biçin aliyê Ş. Sînan, li wir dijmin bişopînin û derbeyê lêxin. Em tîmek jî biçin aliyê Sekamêrgê. Teqez ê van rojan dijmin derkeve, dê ev tîm jî li vir derbeyê li dijmin bide. Divê her tîm çalakiyekê bike. Kes li ser vê tiştekî dibêje? Ger nebe, tîma hevalê Şahîn biçe Ş. Sînan. Hevalên ku pê re biçin; hevalê Mezlûm, hevalê Çiyazan û Berxwedan jî dê bi wan re biçe. Piştre werin xwe amade bikin, biçin Sekumêrgê. Hevalên ku biçin aliyê Ş. Sînan bila amadekariyên xwe bikin û hema îşev biçin.”

Piştî civînê Rizgar banî yekeya ku ew ê biçe Ş. Sînan kir û cuda jî bi wan re axivî.

“Heval me di civînê de jî da diyarkirin; ji bo wê ez li vir dubare nakim. Lê divê hûn zêde şiyar bin. Despêkê hûn ê biçin mayînan deynin. Ji bo mayînan; hevalê Çiyazan tu û hevalê Berxwedan jî, hûn ê biçin wan erzaqên zêde derxînin û veşêrin. Heke we dijmin dît lêxin. Hûn lê

nexin, ew ê li we bixin. Ji bo vê jî divê hûn zaf şiyar bin. Bila hemû fikrê we li ser dijmin be, temam.”

Şahîn: “Temam heval, em ê bi baldar bin. Jixwe em ê du kes mayînan deynin û li ser bin. Wekî din jî fersend derkevin em ê binirxînin.”

Piştî ku Rizgar, dîsa heval şiyar kirin, heval ji bo amadekariyan belav bûn. Wê demê.

Çiyazan: Maksîmûs, te dîsa nehişt ez li skoskiyê bidim. Tam fersend bû. Lê divê ez rojekê skoskiyekê bixim; tu yê bibînî.”

Di nav civînê de, Rizgar: “Skosky dikeve. Divê mirov amade be, wê têxe kemînê. Di civînê de ne; skosky di ser me re diçe, divê ez lêxim.”

Berêvarkî, hemû bi hev re ji nuqteyê derketin. Rizgar û koma wî çûn aliyê gundê Xiraba. Şahîn û koma wî jî, xwe di gewriya Ş. Serhed de berdan. Di binê Ewnêkê de derketin gewriya Ş. Orhan û ketin ser rê. Dema gihîştin Seferan, Şahîn û Mezlûm riya xwe domandin. Berxwedan û Çiyazan ê li Sêsmala bîksî veşartana û piştî wê ew ê xwe bigihandana Panê. Şahîn û Mezlûm jî çûn Ş. Sînan. Rizgar wan jî xwe ji nuqteyê berdabûn Xiraba.

Rizgar: “Em ê bizinê ji kîjan malê bigirin?”

“Wele ferqa nake. Hemû ji hev xirabtir in. Hema em ji yekî bigirin.”

Çûn ber deriyekî û li derî xistin. Zilam derî vekir ku heval in; zaf germ nêzî hevalan bû.

Rêber: “Bizinê te hene?”

“Erê heval.”

“Ji me re yeke goşt bîne, bila baş be.”

Gundî çû ji wan re bizineke baş anî. Rêber pereyên wî danê. Ev gund dema heval didîtin zaf germ nêz dibûn. Yên ku ew nas nekirana, ê bigotana ev zaf welatparêz in.
Dema heval ji gund derdiketin, hema giliyê hevalan dikirin.
Rêber bizin girt û çû cem hevalan. Heval ji derveyî gund li benda wan bûn. Li wir hemû bi hev re çûn Panê.

## Pêwîst Nake Em Li Pey Dijmin Bikevin Dijmin Hatiye Vir

Şahîn ew, wê şevê li Ş. Sînan man. Ji ber ku bi şev zaf sar bû, her du di kêleka hev de razan. Serê sibê zû Şahîn rabû; Mezlûm şiyar kir û bixwe jî çûn cihê keşfê. Berê dûrbîn avêt aliyê Suwêrenê û girê Ş. Kirîv. Piştre jî dûrbîna wî bixwe çû ser girê Heçberê. Di gir de tiştên cuda hebûn. Gir hatibû rastkirin û reşahî tê de dixwiyan. Baş şopand ku dijmin gir girtiye.
“Min ji hevalan re got; ew ê vî girî bigirin, vî girî bigirin. Dê tevgera me ya vî alî bimire. Aha zilaman girtin.”
Demeke din jî şopand, leşkeran hin tişt dikirin. Xwe ji cihê keşfê berda, hat cem Mezlûm.
“Tiştek heye hevalê Şahîn?”
“Dijmin girê Hecberê girtiye. Hê nû girtine. Min ew qas ji hevalan re got; em wir mayîn bikin. A niha kî guhdar dike.”
Şahîn heta êvarê gir şopand. Dema ku bû êvar, ji Mezlûm re got: “Ez ê biçim cem Çiyazan wan. Bila biçin ji hevalê Rizgar re bêjin; pêwîst nake biçin bi dûv dijmin bigerin. Bila werin vir, em ê li vir çalakiyê bikin.” Ji mezlîm qut bû çû cem Çiyazan û Berxwedan. Wan hê karê xwe

neqedandibû. Dema ku Şahîn xwe gihan wan, ji zû ve bûbû êvar.
Çiyazan: “Çi bû hevalê Şahîn, ka Mezlûm?”
“Mezlûm li nuqteyê ye. Dijmin girê Hecberê gitiye. Ma we nedît? Biçin ji hevalê Rizgar re bêjin; bila werin vir. Pêwîst nake li dûv dijmin bigerin; bila werin vir, em çalakiyê li ser van bikin.”
Çiyazan û Berxwedan wê êvarê ji Sêsmala çûn Panê. Şahîn jî vegeriya Ş. Sînan. Dema ku Çiyazan ew gihîştin Panê êdî bûbû nîvê şevê. Rojhat nobeçî bû, dema ku deng bihîst guhên xwe bêtir vekir. Meyze kir ku deng nêz dibin.
“Hûn kî ne?”
“Em in, serfile em in.”
“Çiyazan, hûn in?”
“Erê, em in, em in.”
“Çi bû, karê we qediya?”
“Erê, karê me qediya. Ka Maksîmûs li ku ye? Dijmin Hecber girtiye. Bi dozeran her der rast kiriye. Em ji bo wê hatin.”
“Wa li wir e, razaye. Hûn nebirçîne, xwarinê ji we re bînin.”
Piştî xwarin xwarin razan. Serê sibê ji Rizgar re gotin: “Hevalê Şahîn dibêje; bila werin vir. Em li vir çalakiyê bikin.”
Berêvarkî hevalê Rizgar, heval girtin û berê xwe dan Ş. Sînan. Dema ku bi rê ketibûn, dijmin jî riya ku ew ê tê de biçin, dest bi avêtina hewanan a li ser rê kiribû. Rizgar: “Rêber, tu û yekî din di pêş de biçin, li rê meyze bikin.

Me hemûyan daye dûv hev, em neçin nekevin nav lepên wan.”

## Me Henekek Kir Maksîmos Çawa Qîr Da

Rêber û Çiyazan di pêş de çûn. Dema ku xwe gihandin ser riya Ş. Serhed, hewanek li jora wan ket. Rêber û Çiyazan xwe avêtin erdê û keniyan.

Rêber: “Law kêm mabû li nav guhê me dida.”

Şeytaniyek hat bîra rêber.

“Çiyazan, ez ê xwe bavêjim erdê û lingê xwe têxim bin xwe. Dema heval nêzîk bûn, ez ê dest bi qîrîniyê bikim; tu jî bibeze biçe pêşiya wan, bêje; hewan li Rêber ket.”

Dema ku heval nêz bûn, dengê qîrîniya Rêber çû wan! Berxwedan di cihê xwe de sekinî.

“Kes di pêş de çûye?”

Rizgar: “Rêber û Çiyazan li pêş in.”

Wê demê Çiyazan bi bez hat cem wan.

“Hewan li hevalê Rêber ket, lingê wî qut bû.”

Hemû bi hev re beziyan çûn cem Rêber. Rêber di nîvê rê de xwe dirêj kiriye û qîr dike.

Rizgar: “Rêber çi bû, çi bû!”

Dema dît ku lingê wî di çongê de tuneye, xwe avêt ser wî. Wê demê pîqênî bi Rêber ket, rabû ser xwe û ji wan dûr ket.

“Me got; em henekekê bikin.”

Wê demê Çiyazan jî li cem Rizgar sekinîbû, dikeniya. Hevalan hê bandora matmayînê ji ser xwe neavêtibûn. Rizgar qîr kir.

“Bêdeng be! Hê li pêş min sekiniye, dikene jî.”

Bi vê qîrê, hevalan jî şoqa li ser xwe avêtin. Hemûyan dan dûv Rizgar. Riya xwe domandin.

Rêber ji tirsan di pêş de diçû; Çiyazan bê moral, bê moral.

“Maksîmos meyze bike; me henekek kir, çawa qîr da.”

Berxwedan: “Hûn jî henekên hirçan mekin; we dilê me sekinand.”

Piştî wê dîsa keniyan.

“Henekeke xweş bû, wer nîn e?”

Dema gihîştin nuqteyê, Rizgar got: “Em ê li vir bin, bila heval sibê banî Şahîn wan bikin.” Wê şevê li nuqteya Meyzîliyê man. Serê sibê çûn banî Şahîn û Mezlûm jî kirin.

Dema ku Çiyazan çû banî wan bike, heval hemû li ber agir bûn. Rêber jî hatibû, di bin çavan de li Rizgar meyze dikir û dikeniya.

Rizgar: “Careke din henekên hirçan ê wisa meke. Rojekê rast be jî, em ê bawer nekin. Qaşo tu fermandar î, tu wer bikî, dê heval çi bikin.”

Li ser vê Rêber di bin simbêlan de dikeniya. Di têlên dengê wî de jî wekî mirovekî tewanbar hebû.

“Temam heval, em ê dîqat bikin. Em careke din henekên wisa nakin.”

Dema ku Rizgar lê meyze kir; çavên wan bi hev ket, Rêber keniya. Wek xwe ji tiştekî biparêze, li ser vê xwe bi şûnde da.

“Gozlik, ez henekan nakim!”

“Hevalê Rizgar, wele ez jî rast dibêjim.”

# Şûm Bin Li Wan Bixin Çekên Wan Rakin û Xwe Ji Gir Berdin

Demek şûnde Şahîn ew jî hatin.

Rizgar: "Ka em biçin bişopînin. Ka em dikarin çi bikin, çi nekin. Em li gorî wê biçin encamekê."

Rizgar, Rêber, Berxwedan û Arîn çûn cihê keşfê. Demeke dirêj şopandin. Leşker di gir de digeriyan û zaf rihet bûn. Tu êrîşeke li ser xwe nedifikirîn, ji bo wê jî zaf rihet tevdigeriyan. Hevalan xwe ji cihê keşfê berdan, hatin jêr. Piştî wê banî hemû hevalan kirin.

Ev du roj in, heval dijmin dişopînin. Serê sibê tên û êvarê vedigerin qereqolê. Hê nû gir rast kirine. Dibe ku dema pêş di gir de bi cî bibin. Heval jî dizanin, heke Hecberê bigirin, em nikarin vî geliyî bidin şixulandin. Li ser vê heval dikarin fikrê xwe bêjin. Em bi çi awayî biçin ser? Li gorî min, ez dibêjim: "Dema ku ji gir vedigerin, em di navbera gir û qereqolê de; di kemînê de li wan bidin."

Rêber: "Heval ez dibêjim; em sê heval bi fedayî, an nîvro têkevin nav wan, an jî sê kes biçin di gir de rûnin, dema ku hatin lêxin, hemû çekên wan rakin û werin."

Şahîn bê ku mafê axaftinê bixwaze.

"Ev dînîtî ye."

Hevalan hemûyan lê meyze kir. Wî jî ferq kir ku kêmasiyek kiriye. Lê qet lê nebû xwedî û domand.

"Ez dibêjim; em gir hemûyî bikin mayîn, dema ku hatin ketin gir, em hemûyan bikujin."

Rizgar: "Wekî din kes tiştekî dibêje."

Kêmekî sekinî, kesî tiştek negot.

"Temam, em ê pêşniyaran têxin dengdana hevalan. Ji bo pêşniyara yekemîn yê ku tevlî dibin?"

Ji bo pêşniyara rizgar du kes tevlî bûn.
"Ji bo pêşniyara hevalê Rêber kî tevlî dibe?"
Ji bo vê pêşniyarê pênc kes tevlî bûn.
Ji bo pêşniyara hevalê Şahîn jî sê kes tevlî bûn.
"Temam, pêşniyara hevalê Rêber hat pejirandin. Niha jî em hevalên ku biçin diyar bikin. Pêşniyara min; hevalê Rêber, hevala Sema û hevalê Berxwedan e. Heval jî dikarin pêşniyarên xwe bikin."
Çiyazan: "Pêşniyara min, yek ez bim."
"Wekî din kes tiştekî dibêje?"
Şahîn: "Heval niha ev heval biçin, kes tune parastina wan bike. Pêşniyara min; ji bo parastina wan, em du heb jî mayînan deynin gir."
"Temam, ew jî dibe. Heke kes tiştekî nebêje, hevalên ku min navê wan got, em ê bişînin. Ji bo mayînan jî bila hevalê Şahîn û Rojhat bin. Em ê biqedînin."
Çiyazan: "Heval we pêşniyara min nexiste dengdanê."
"Ya te bila careke din be. Temam bila heval amadekariyên xwe bikin ew ê sibê biçin."
Piştî civîn qediya, Çiyazan rextê xwe avêt erdê.
"Ma em tirsonek (oportonîst) in, hûn me rê nakin?"
Rizgar di bin çavan re lê meyze kir.
"Rêber, hûn her sê werin vir."
Dema ku her sê hatin.
Rizgar: "Meyze bikin heval, divê hûn zaf şiyar bin. Dibe ku dijmin di gir de be. Dibe ku nebe jî, ji bo wê bila di we de sistahî çênebe. We gafîl bigirin, hûn çûn. Bila haya we jê hebe. Nebêjin em ê hemûyan bikujin, piştre ji gir derkevin. Çar heban bikujin, çekên wan bigirin bes e. Hûn bêjin, em hemûyan bikujin, dibe deshilatdariya agir

têkeve destê wan. Wê demê hûn nikarin xwe ji gir derxin. Em nikarin ji bo çar leşkerên pîsik şehadeta sê hevalan rakin. Şûm (atik) bin lê bidin, çekên wan rakin û xwe berdin. Yên têkevin gir, ê Şahîn ew destwerdanê bikin. Wê demê nikarin tiştekî bikin. Şûm bin, lê bidin, çekên wan rakin û xwe berdin, temam.”

Wê rojê hevalan heta êvarê Hecber şopandin. Roja din jî, ji serê sibê dest bi şopandinê kirin. Erê bi ronahiyê re leşker hatin gir. Di pêşiyê de du kes nêzî bîst metreyan berî hemûyan xwe gihandin gir. Piştre yên din ketin gir. Wê rojê di mûhabereyê de hevalê Rûbar, Rizgar û Cûdiyê Zaza kişandin qenaleke din; ji wan re encamên civîna eyaletê diyar kirin. Di civînê de herêma Ş. Sînan û Ş. Mezlûm bûbûn eniyek (cephe). Fermandarê eniyê hevalê Rizgar bû. Piştî Rêber ev bihîst, singêrekî din jî xist bin Rizgar.

“Axayê Bekiro, peywira xwe mezin kiriye. Ji axayê Bekiro re çay bînin.”

Bi vî awayî yarî û henekên xwe dikir. Ya rastî hevalê Rizgar piştî ji cem Serokatiyê hatibû, di 97’an de, fermandarê herêmê bû. Lê di du hezarî de, bi gotina wan tixtorê bênamûs (Dr. Silêman)ew xapandibûn. Qaşo,“rêxistin naxwaze şer bike; Serokatî bi tenê hiştine, qadroyên Amedê di bin navê ku dê biçin şer bikin, li İmraliyê li Serokatiyê xwedî derkevin.”Wê demê ew wisa xapandibûn, biribûn Silêmaniyê xistibûn bin desthilatdariya Celal Telebanî. Dema ku vê ferq dikin, dîsa tên cem rêxistinê. Hemû dikevin pêvajoya kedê, dîsa bi şervantiyê dest bi şoreşgeriyê dikin.

Êvarê jî ji bo çalakiyê, pênc heval ji komê qut bûn. Çûn mayîna xwe girtin û berê xwe dan girê Hecberê. Dema hatin binê gir, Şahîn tenekeya mayînê da Berxwedan. Ew û Rêber çûn ji pişt ve ketin gir. Li gir hemûyî geriyan, ji dijmin tu tiştek nebû. Piştre banî yên din jî kirin. Ji bo ku mayînê deynin kîjan kozikê; li gir hemûyî geriyan. Piştre biryar dan deynin cihê ku dê heval tê de paşve bikişin. Du heb kozik hebûn, dema ku heval paşve bikişin, ji bo ku dijmin nehêle heval şûnde werin dê têkevin wan kozikan; guleyan berdin hevalan. Bi vê mebestê hevalê Şahîn, di her kozikekê de tenekeyek danî. Her du teneke jî bi cîhazekê ve girêdan. Dema Şahîn ji wan qetiya û xatirê xwe xwest jî.

“Temam, ev karê em dikin karê dînan e, lê dîsa jî hûn hay ji xwe hebin.”

Ew û Rojhat çûn rûyê hevalan, ji wan dûr ketin û li ber çavan winda bûn. Rêber di gir de û li derdora gir geriya, lê belê cihekî ku lê bimînin nedît.

“Em ê di van kozikan de ji xwe re razin. Em serê sibê ranebin û dijmin me di van kozikan de, di xew de bigire dê dînê me bileqîne.”

Berxwedan: “Em ê di van kozikan de razin!”

“Erê.”

Sema: “Heval ev der ne xeter e?”

Rêber: “Na, em razin. Hevala Sema tu biçe wê kozika din, em ê jî di vê de razin.”

Serê sibê hemû şiyar bûn, cihê xwe girtin.

Rêber: “Berxwedan tu yê xwe bidî pişt vê deviyê. Hevala Sema tu yê jî têkevî vê kozikê. Ez ê jî di vê kozikê de bim.

Heta dijmin xwe negihîne Berxwedan û ez lê nedim, hûn kes lê nadin, temam.”
Heta derengî li benda dijmin man, tu kes nehat. Wan jî bîst-sî metreyan xwe dan biniya gir û sekinîn.
Sema: “Heval hûn xwarinê naxwin?”
Xwarina wan jî toraq û donê sana (sana yağı) bû. Ewqasî tavê li wan dabû haldi xwarina wan de nemabû. Ji ber ku çar nanên wan tenê hebûn, xwarina wan jî ji mecbûrî bû.
Rêber: “Heval nan parî parî bixwin. We dît sibê jî nehatin.”
Şahîn û Rojhat xwe dabûn pêşiya wan, li benda wan bûn. Wê rojê dijmin nehat gir. Bû êvar dîsa li benda dijmin sekinîn.
Serê sibê zû dîsa her sê çûn ketin kozikên xwe, li benda dijmin sekinîn. Çavê Rêber her dem li riya qereqolê bû. Kes di rê de nedihat. Li pişt xwe zivirî, di wateya ji nû ve serê xwe li bakin. Çend xulek şûnde, meyze kir ku nêzî bîst leşkeran dane pey hev, ber bi gir ve tên. Rêber cihê xwe berda û hat cem Semayê.
“Wa tên, hemû wek hirçan e, ziravê mirovan ji wan diqete.”
“Ew hemû ne wek hirçan e; wek keran e.”
Çek li destan û çavên wan li dijmin bû. Dema ku leşker ji Rêber ve xwiya bûn, kevirek avêt aliyê Semayê. Wê jî kevir avêt Berxwedan. Ev îşareta hatinê bû.
Di pêşiyê de du heb dedektorvan bûn. Wan çekên xwe çeprast avêtibûn stûyên xwe; di destên wan de dedektor hebûn, li mayînan digeriyan. Dema leşkerê destpêkê ket gir, di cihê xwe de sekinî.

Heta vir kutekuta dilê hevalan bû dilê hevalan lê dida. Dema ku leşker sekinî, kelecana hevalan hê jî zêde bû. Ew leşker hema pênc metreyan ji Rêber dûr bû. Heke şûnde bireviya, dê Rêber ew bikuşta. Leşkerê din jî tenê serê wî dixwiya.

Leşker li pişt xwe zivirî got: “Baldar be şop hene.”

Dewam kir, dedektor baş li derdorên xwe gerand. Rêber û Sema derbas kir, xwe gihand Berxwedan. Leşkerê din jî di navbera Rêber û Semayê de bû.

Bi carekê deng bi çekan ket. Rêber û Semayê li yê li ber xwe xistin. Berxwedan jî çek xistibû zikê leşkerî û jerjûrek tê de vale kiribû.

Rêber got: “Çekên wan rakin.”

Ber bi wan leşkerên li jêr ve çû û çend caran bi ser wan de gule reşandin. Sema û Berxwedan çûn ser leşkeran û çekên wan rakirin. Dema ku Semayê çeka wî û dedektor ji ser anî… jî avêtê.

Leşkerekî birîndar bê çek û li ser piyan bi aliyê Rêber ve diçû. Rêber meyze kir ku leşkerê şoq bûye, bi ser wî de tê. Wî jî bi dest û bi deng banî wî kir. Pîmê narincokê jê derxist û avêt nav du leşkerên ku di pişt deviyê de li ser tûtka rûniştî û serê xwe xistibûn nav destên xwe. Dema ku narincok di nav wan de teqiya, her du jî firiyan hewayê. Leşkerê ku şoq bûbû û bi aliyê Rêber ve diçû, dema xwe gihand Rêber, Rêber rabû û bi ser wî de gule reşandin, û got:

“Law birevin, werin, werin bi dûv min de werin!

Xwe ji gir berda aliyê Sêsmalan. Şahîn û Rojhat jî li pêşberî wan, bi dûrbînê ew dişopandin.

Rojhat: “Bi Quran, bi Quran eyn wek filîman e. Wa ye hevalan xwe ji gir berdan. Heylo, çawa dibezin!”
Şahîn: “Ka li gir meyze bike dijmin neket kozikan.”
Hê Rêber wan xwe bernedabûn nîvê gir; Sema ket û got:
“Ez nikarim bibezim. Bîna barûdê mahdê min li hev dixe.”
Rêber: “Hevala Sema, qurbana te rabe, wer nabe, ew ê me bikujin. Berxwedan van çekan jê bigire.”
Berxwedan her du çekên Semayê jî jê girtin, bi çar heb çekan dibeziya. Rêber jî bi destê Semayê girtibû, ew bi dûv xwe de dikişand. Wê demê leşkerên ku dema hevalan li wan dabû, li jêr mabûn ketin gir û xwe avêtin kozikan.
Rojhat: “Ketinê! Biteqîne ketinê! Her kozikê sê heb ketinê.”
Şahîn pêl cîhazê dikir, lê nediteqiya. Wî jî cîhaz avêt.
“Nateqe min di…”
Rojhat cîhaz rakir pê li pişkojê kir.
“Hevalê Şahîn tu pê li vê dikî?”
Hê axaftina xwe neqedandibû; Şahîn qîrek da, got:
“Teqiya! Teqiya!”
Xwe avêt stûyê Rojhat û ew maç kir. Rêber wan xwe gihandibûn.. yê û dengê teqînê çû wan jî.
Rêber: “Hevalan mayîn jî teqandin. Hevala Sema ka zû bike, dê niha qobra werin.”
“Yaw heval mahdê min li hev dikeve.”
Heta ku hevalan xwe gihandin saxlemiyê, Şahîn û Rojhat li cihê xwe man. Piştî ku hevalan xwe dan cihê saxlem û ji ber çavan winda bûn, wan jî cihê xwe guhert.

Nîvrokî Rizgar wan bi cîhazê nuqte da Rêber wan. Rêber wan, êvarê xwe gihandin wan. Ew li nuqteya Ş. Serhed bûn. Dema ku hevalên wan gihîştin wan, Rizgar, Rêber û berxwedan her du maç kirin û ew hemêz kirin. Hevalên din jî yek bi yek ew pîroz kirin. Piştre bi çi awayî li dijmin xistine dirêj dirêj ji wan re qal kirin. Dijmin wê şevê jî derketibû hatibû li jêra hevalan sekinîbû.

## Werin Radestî Edaleta PKK'ê Bibin

Dema ku serê sibê Şahîn çû keşfê, dijmin di navbera gundê Xiraba û cihê keşfê de bû. Derveyî vê jî baş li derdoran meyze kir, dema tiştek nedît, xwe berda cem hevalan.

Şahîn: "Hevalê Rizgar dijmin wa li jor Xiraba ye."

"Tam li ku ye?"

"Di navbera me û Xiraban de ne."

Rêber: "Em çi bikin?"

Rizgar: "Em ê li wan jî bidin. Her ku hatine bila vale neçin."

"Axayê Bekir zaf qehirî ye!"

Heta piştî nîvro ew jî şopandin, piştî wê, Rêzgar:


"Rêber, Çiyazan û Berçem hûn ê biçin êrîşê; hevalê Şahîn, Botan û Mezlûm ew ê li nuqteyê bin. Ên din jî em ê li gewriyê parastina we bikin."

Dema Rêber wan, xwe gihandin nêzî wan, dijmin cihê xwe berda. Di Xiraba re hat milê Eynikê; ji wir jî berê xwe da gewriya Ş. Serhed.

Rêber wan jî dabû dûv wan. Rizgar, Rojhat û Sema tam di gewriyê de rûniştibûn. Berxwedan û Arînê jî li jora wan

bûn. Dema dijmin hat gewriyê ket ser riya ku diçe Ş. Êzdîn.
Hê du kesan berê xwe zivirandibû Ş. Êzdîn, Rizgar li wan nîşan girt û li wan reşand, li pey wî Sema û Rojhat jî bi ser wan de gule reşandin. Cihê ku hevalan gule diavêtinê ji Berxwedan û Arînê ve nedixwiya. Lê wan jî bi wî aliyî ve gule avêtin. Di gewriyê de du kes ketin û qet nedilivîn. Sê kes jî bi halê xwe yê birîndar, xwe berdan jêr. Yên din jî bi bezê xwe berdan aliyê Eynikê.
Rizgar: "Rêber, hemûyan xwe bi aliyê we de berdan."
"Erê, me dîtin."
Ev bi cîhazê ji Rêber re gotibû. Rêber wan bi bezê xwe nêzî wan dikir. Bîna Berçemê qut bûbû, li paş bi zahmetî dibeziya, carinan jî disekinî. Ji ber astimê nikaribû xwe bigihanda wan.
Dema ku Rêber xwe nêzî wan kir, wî û Çiyazan bi ser wan de gule reşandin.
"Radest (teslîm) bibin; werin xwe bavên bextê PKK'ê."
Ji nav dijmin yekî qîr kir: "Hem dibê radest bibin, hem jî guleyan berdidin me."
Yekî din jî hem digiriya, hem jî diaxivî: "Em radest nabin, hûn me hemûyan jî bikujin em radest nabin."
Di nav wan de yên ku dinaliyan jî hebû. Dema ku ev deng dihatin wan, Berçemê jî xwe gihandibû wan. Cihê ku dijmin li wir bû, dîsa her sêyan bi hev re gule li wir reşandin. Vê carê dengê girî û nalînê hê zêdetir bû. Wan jî xwe berdan dolê û bi aliyê rizgar ve çûn.
Dema xwe gihandin Rizgar wan.
Çiyazan: "Maksîmûs, te dîsa ji min re nehişt!"
Rizgar: "Çi bû, we nedîtin?"

Rêber: “Me dîtin. Me cihê wan di nav guleyan de hişt. Lê me newêrîbû em biçin ser wan. Hemû digiriyan, me got; radest bibin. Gotin: “Em radest nabin, me hemûyan bikujin.”
“Temam, we jî henekên xwe bi wan kiriye. Ka em biçin cem Şahîn wan.”
Dema xwe gihandin nuqteyê, du qobra ji aliyê Çewlikê ve hatin. Heval hemû reviyan kozikên qobrayan. Li gewriyê û li derdora gewriyê dan. Hê ew neçûbûn du qobrayên din jî hatin. Ên destpêkê xwe dan alî, vê carê ev ên nû hatibûn li derdora gewriyê û cihê ku Rêber wan bang dikir li wir dan. Bi çûyîna qobrayan re:
Rizgar: “Haydê zû bikin, em biçin.”
Hemûyan çenteyên xwe dan pişta xwe û ketin pey Rizgar. Êdî tarî bûbû. Dema gihîştin jor gundê Xiraba, Rizgar di cîhazê de ferq kir ku li pêşiya wan dijmin heye. Berê xwe zivirand milê Ş. Orhan. Dîsa dengê qobrayan hat.
“Hemû rûnin, kes xwe neleqîne.”
Hemû di cihên xwe de rûniştin. Qobra dîsa çûn li derdora gewriyê û li derdora Eynikê dan. Hê qobrayan xwe tam vale nekiribûn, du hebên din jî hatin, cihê ku wan di nîvî de hiştibû vê carê van lê didan. Wê demê, Şahîn:
“Hevalê Rizgar li jor mêrgê jî, li Eynikê jî dijmin heye. Cîhaz tam lê didin.” Dema qobra çûn, dîsa ketin rê. Wê demê dîsa.




## Ji Ber Hevalên Wî Xew Nediket Çavên Wî

Şahîn: “Hevalê Rizgar, ez û hevalekî biçin, ez ê hem mayîna sefaran nîşanî wî bidim, em ê hem jî arvan û erzaq bînin.”

“Na. Kes naçe cihekî.”

“Yaw heval ne erzaqê me heye, hem jî ez sibê biçim, kes cihê mayînê jî nizane.”




“Temam, tu û Çiyazan biçin. Lê belê hûn ê ne rê, ne jî şiverêyan neşixulînin. Hûn ê di erazî de biçin û werin. Temam.”

“Temam, hevalê Çiyazan ez û tu, em ê biçin.”

Dema ku ji hev xatir xwestin.

Çiyazan: “Ew ê îro diya hinekan bigirî. Diyar nabe, dibe ku diya me jî bigirî.”

Dîsa keniya û ji hevalan qut bûn. Xwe dan wî aliyî rê û xwe li erazî xistin. Rizgar wan jî di kêleka gund re xwe li erazî dan û çûn di biniya Evnîkê de derketin. Wan xwe li hevrazî dabûn û demekê rûniştin.

Şahîn û Çiyazan, demekê di hevraziyê Nûbelda de demekê meşiyan nêzî gewriyê bûbûn, dema ku dîtin di gewriyê de tiştek tune, xwe berdan ser rê. Şahîn di di rê de di pêş de çûbû. Çiyazan jî ket ser rê û ew şopand.

Di carekê de di nav agir de man. Şahîn li ser rê ket û qet neliviya. Çiyazan bi halê birîndar xwe avêt kêleka rê banî Şahîn kir.
“Şahîn! Şahîn!”
Careke din gule wek agir barîbûn. Çiyazan berê çeka xwe da cihê ku agir jê derdiket û bi ser wan de gule reşandin. Bi gulereşandina wî re cihê wî jî diyar bû. Vê carê jî ji aliyê gewriyê yê çepê ve bi ser wî de gule reşandin. Bi barîna van guleyan re dîsa çend derbeyên din girtin. Ji cihê xwe rabû, bi qîrekî êrîş kir. Di heman demê de bi ser dijmin de gule jî reşandin. Hê çend gav neçûbû, cercûra wî qediya û di nîvê rê de ket.
Dengê guleyan û teqînê çûbû hevalên wî jî. Dema ku deng bi çekan ket; Rizgar ji cihê xwe hol bû!
“Heval ketin kemînê.”
Berê xwe da cihê ku deng jê tê, piştre çeka xwe girt û kêmekî xwe da jor. Dît ku dengê çekan ji gewriyê tê. Zivirî yê kêleka xwe:
“Deng ji ser riya di navbera Mêrg û Nûbelda de tê. Dibe ku heval di wê riyê de biçin, lê belê min got; di wê riyê de neçin.”
Rêber: “Nizanim, divê hevalê Şahîn di wir re neçe; ma bixwe got; dijmin li wir heye.”
Dema ku ew diaxivîn, hevalên stî jî her sê hatibûn cem wan.
Sema:” Çi bû, hevalê Rizgar deng ji ku derê tê?”
“Ji navbera Mêrgê û Nûbelda tê.”
Berçem: “Ez bawer dikim heval bin. Lê çi karê hevalan li wir heye?”
Hê ew wisa diaxivîn, dîsa dengê qobrayan hat.

Rizgar: “Zû birevin kozikan! Hadê hadê zû bikin!”
Hê axaftina Rizgar di devê wî de bû, qobrayan ji ser Seferan dest bi lêdan Mêrgê û Nûbeldayê kiribûn û pê re dihatin ser rê. Li her metreyî guleyek û carinan jî roket lê didan. Çerx didan xwe û dîsa dest bi roketavêtinê û gulereşandinê dikirin. Hê van qobrayan xwe vale nekiribûn, du hebên din jî hatibûn wan jî dest bi lêdanê kiribûn.
Belî bû ku dijmin aciz bûbû. Ew derbeyên ku du rojan xwaribûn ew aciz kiribûn. Hem dixwestin tola xwe bigirin û hem jî dixwestin rûmeta xwe xilas bikin. Ji ber wê jî hemû hêza xwe dabûn êrîşên hewayî. Dema êrîşên hewayî disekinîn, vê carê her sê qereqolan dest bi avêtina hewanan dikirin.
Wê şevê xew neket çavên tu kesî. Tam çavên wan diçûn ser hev, bi dengê hewanan, an jî bi êşa zikê birçî dîsa şiyar dibûn. Lê belê yek kes di nav wan de hebû; ne ji ber dengê hewanan, ne ji ber lêdana qobrayan û ne jî ji birçîna xew nediket çavên wî. Ya wî ji ber hevalên wî xew nediket çavên wî. Carinan ji xwe re digot:
“Dibe ku heval bin, lê belê Şahîn kêmasiyên wiha nake. Divê neke! Jixwe wî dizanîbû dijmin li wir heye.”
Hevalên din wiha dizanibûn ku ne Şahîn û Çiyazan in, ji ber ku divê ew di wir re neçin. Dijmin hemûyî xwe dabû alî û cihên xwe bi îşaretan nîşanî qobrayan dabûn. Cihê bûyerê bi cîhazê ji qobrayan re tarîf kiribûn. Dijmin heta sibê neçû ser meytên wan. Dema bû serê sibe dijmin xwe berda û ji dûr ve dîsa gule berdan cenazeyên wan. Dijmin ji meytên gerîla jî ditirsiya. Destpêkê cilên wan ji

wan xistin; çek û rextên wan girtin û ketin berîkên wan. Çi yên wan hebûn hemû not girtin.

Fermandar: “Binivîse, cîhazeke piçûk, du keleş, deh cercûr, sê narincokên destan, wênegirek (fotoğraf makinası) du lênûsên berîkan.”Dema ku fermandar ev dinivîsandin, skoskiy jî hatibû. Ji skoskiy du kîsên meytan derxistin, anîn. Laşê wan ê tazî xistin hundirê wan, ew li skoskiyê kirin û birin.

Dijmin, piştre cilên wan, şûtikên wan û pêlavên wan li cihê bûyerê şewitandin.

Dema ku skoskiyê di navbera Mêrgê û Nûpeldayê de danî û rabû, Rêber:

“Tu dibêjî qey skoskiyê tiştek rakir. Tu dibêjî çi?”

Rizgar: “Dibe ku heval bin.”

Hê wan nezelaliyek jiyan dikirin. Di mûhabera nîvro de, hevalan ji wan re got ku, radyo dibêjin: Di bejahiya Darahênê de du kes şehîd bûne.”

Dema hevalên wan jî wer gotin, êdî wan tam bawer kirin ku hevalên wan şehîd ketine.

Piştî du rojan, dema ku çûn li cihê bûyerê meyze kirin, dîtin ku çend qovanên guleyan û parçeyeke şûtikê tenê li wir e. Li derdoran bi du cihan xwîn heye, li cihekî jî piştî şewatê, xweliya cilan û parçeyekî şûtikê tenê dîtin. Parçeyê şûtikê ne veşartî bû.

Rizgar parçeyê şûtikê nas kir. Ev parçe ji şûtika Çiyazan mabû. Rizgar li vir wek zarokan dest bi girî kir û şûtik maç kir.

“Rêber, ev şûtika Çiyazan e. Çiyazan şehîd ketiye. Rêber!”

Dema ku ev gotin digotin, hêsir ji çavên wî dibarîn.

Piştre çûn geriyan, cihê ku dijmin lê sekinîbû dîtin. Tu dibêjî qey li vir bi kulman qovan rijandibûn. Cihê ku lê sekinîbûn li ser wan serwer bûn û di nav deviyan de bûn. Dema ku fetlonek dizivirî, tam diket pêşberî wan û ji bo kemînê cihekî erênî bû.
Hê di serê Rizgar de nakokî hebûn; çima di vir re hatibûn?




# GIYANA AZAD

## Tenê Miriyên Sivîl Dabûn

Êdî hevalan ji bo pêngava biharê, çalakiyên ku di herêmê de dibûn bes nedidîtin. Divê çalakiyên ku deng didin, bandora ramyarî zêde be, dewletê têxe nav şoqê û bêçare bihêle difikirin. Ji bo çalakiyeke wisa, dîsa Rizgar Çêrmûg û Agir şandibûn navenda Amedê. Van her du

kesan, çalakiya ku zivistanê di Amedê de jî hatibû kirin,kiribûn. Otobûseke  ku tijî û efser (subay) jî tê de hebûn, pêncî kîlo amonyûmnîtrat tê de teqandibûn. Ev otobûs hemû şewitî bû, lê belê dijmin li ber çavên hemû dinyayê miriyên xwe veşartibûn. Tenê miriyên sivîl dabûn.

Biharê dîsa ev heval çûbûn Amedê, hê hedef ji xwe re nedîtibûn, Agir hatibû girtin. Rizgar jî şûnde vegeriyabû. Ji bo hedefê bişopîne ka guhertin heye yan na; cudabûn, an jî tedbîr girtin hene an na, milîsek şandibû. Dema ku temaşe kirin dijmin hin tedbîr girtine, vê carê hevalan gotin: “Em ê berfireh li ser bisekinin.”

Ji ber ku Rizgar û Agir wî şandibûn bajêr, hevalê Heqî jî hatibû Apê Mûsa. Ji bo banî Rizgar bike, bi Ziya, Yaşar û Soro re axivî.

“Çi bûye, çima agir hatiye girtin? We agahî girt, çawa bûye? Çima wilo bû? Ma me ev ne ji bo çalakiya fedaî şandibûn? Fedaîyek çawa sax tê girtin, çima sax ketiye dest? Ma tiştek li ser nebû? Ev ji bo çalakiyên fedaîtiyê tên, me dixapînin….



## Têkoşerekî Vê Rêxistinê Me Divê Ez Jî Werim

Dema Baran ew ketin hundirê malê, xwediyê malê û ciwanek di hundir de bûn. Dema xwediyê malê merheba da wan, ciwan jî ji şabûnê çavên wî biriqîn û wî jî merheba da wan.

Ciwanekî paqij, rûspî û bi çand bû. Dema ku li hevalan meyze dikir, wek ku tiştên wî yên bi salan winda bûbin dîtibe, ew qas dilşad bûbû. Pantolonekî qedîfeyê serikî û qazaxekî reş lê bû. Di binê qazax de, bestûk qutikê (gomlek)wî dixwiya. Rûniştina wî ji rûniştina gundiyên asayî cudatir, lê ne biyanî bû. Dema diaxivî têgîn û hevokên xwe hildibijartin, bi evîndariyekê li hevalan temaşe dikir û ew bi rêzdarî guhdarî dikirin.

Vî halê wî bala Baran kişandibû. Heta niha di vî gundî de kesek, an jî ciwanek ew qas bi pîvan rastî nehatibû. Li ser vê pirsî:
“Ev ciwan kî ye? Heta niha me nedîtibû.”
Gundî: “Ew jî, ji we ye.”
“Çawa ji me ye?”
“Ew hevalê ku zivistanê ji we re xeber rê kiribû, ev ew e.”
Baran vê carê zivirî wî.
“Heval navê te çi ye?”
“Navê min Özgür e Heval.”
“Hevalê Özgür tu ji ku yî?”
“Ez ji Elbîstanê me.”
“Tu ji bajêr têyî?”
“Erê heval, ez deşîfre bûm. Ji zivistanê ve li Amedê me. Min ji we re xeber rê kir. We gotibû, “bila heta biharê bisekine.”
“Rast e, min negotibû, lê hevalên min gotibûn. Ji me re gotin. Niha kêmek karê me heye. Tu li vir be, em ê werin.”
Derketin derve, bi gundî re karê xwe çareser kirin. Piştre dîsa hatin hundir.
“Hevalê Özgür tu çend rojên din li vir be, em ê piştre werin te bibin.”
“Yaw heval, ez jî têkoşerekî vê rêxistinê me. Hûn çima min li gund dihêlin? Ev ne rêxistinî ye. Ez napejirînim; divê ez jî werim!”
“Yaw temam, em te fêm dikin, lê belê yê me, karê me heye. Piştre dê ev heval ji te re bêje; çima em nikarin te bi xwe re bibin.”

Dema ku ji wir veqetiyan, jê xatir xwestin.
“Em ê werin te bibin.”
“Temam.”
Baran û Cûdî ji gund derketin çûn karê xwe.
Özgür nîv kelegirî bû:“Roja ku ez deşîfre bûme heta îro, hemû hêviya min; ez xwe bigihînim hevalan bû. Ew jî min bi xwe re nabin; dibe ku ji min bawer nakin.”
Gundî: “Yaw na, na, wan ne ku bi te bawer nekirin, ji bo wê te bi xwe re nebirin. Ev diçin kemînê. Nikarin te bi vî halê sivîl û bê çek bi xwe re bibin. Hem jî wan tu xwestî. Wer nebe min çi dizanibû tu li ku yî?”
Piştî wê dîsa çavên wî keniyan û kêfa wî hat cî.
Berî ku Özgür ji hevalan re agahiyê bişîne, ji Başûr ji aliyê hevalên jor ve hatibû rêkirin. Nêzî salekê li başûr gerîlatî kiribû. Piştre komek ji aliyê hevalê Cemal ve tên amadekirin û wan dişînin metropolan. Ji bo ji nû ve kovara ciwanan dest bi weşanê bike, hevalê Özgür hatibû şandin. Lê di demeke kin de deşîfre bûbû. Ew jî bi riya milîsan hatibû Amedê ku xwe bigihîne qadroyên li çiyayan.
Özgürhê pir ciwan bû. Dema ket nav nivînan û raza; di xew de, di nav komek heval de nîqaş dikir. Li ber agir rûniştibûn, çaydanê xwe yê reş danîbûn ser agir û bi hev re guftûgo dikirin. Carekê deng bihîst, çavên xwe vekir ku hundirê odê ronî bûye. Milîs.
“Rojbaş hevalê Özgür!”
“Rojbaş! min digot qey ez hê di xew re neçûme.”
Rabû betaniya xwe kom kir. Piştre derket derve. Li ber derî li derdora xwe meyze kir, her der çiya bûn. Hinek cihên çiya rût û xîz bûn, hinek cî jî daristanên wisa bûn ku

ji dûr ve wek aşopekî (xeyal) dixwiyan. Dema ku ev cihên wisa xweş dîtin, kêfa wî jî xweş bû, ji hewaya paqij bêhneke kûr kişande dil û hinavên xwe. Piştre çû dest, rû û serûçavên xwe şûştin. Dema dê têketa hundir, dîsa li derdora xwe meyze kir û bi ken ket hundir.

Milîs sifre danîbû. Li ser sifreyê hêk, penîr û zeytûn hebûn.

Dema ku li ser sifrê rûnişt, li milîs meyze kir.

“Em niha vê taştê dixwin. Gelo niha tiştekî hevalan heye bixwin?”

“Meraq meke, tiştên ku ew dixwin  serokwezîr jî nikare bixwe.”

“Na yaw, derfetên herî zêde li Başûr hebûn, dîsa jî me hefteyê carekê penîr dixwar. Ez niha derketim derve, min li derdoran meyze kir, ev çiyayê li pêş me zaf xweş e, lê belê ev aliyê wî hemû rût e. Nuqteyên hevalan qet li wir hene?”

“Erê pir in, niha ev der neyînî ye, lê çend rojên din êdî xweş dibe,  dê carinan werin vir.”

Dema ku Baran li ber agir rûniştibû qala wî dikir.

Serxwebûn: “We çima bi xwe re neanî?”

“Ew ciwanekî pir xweş bû, lê me got; em niha bibin. Lê belê dîsa me got; em pirs bikin piştre.”

“Ji zvistanê ve li Amedê ye. Xeber rê kiribû, me da sekinandin. Me got; em ê biharê bigirin.”

## Heke Li Gorî Rêxistinê Tevbigerin Nayên Girtin

Piştî nîvro Serxwebûn û Harûn ji nuqteyê derketin. Gotin: “Ê yek were em ê wî bibînin. Çûn heta nîvê şevê nehatin. Her çendî hevalên nuqteyê meraqa wan kiribin jî, vale bû. Dema bû sibe dîtin ku li nuqteyê ne. Dema êvarê tekmîl hatin girtin, ev nêzîkatiya wan hat rexnekirin. Her çendî rêveberên herêmê bin jî, divê di derbarê çûn û hatina nuqteyê de hevalên xwe agahdar bikin. Êvarê Baran û Zinar çûn gundekî, Serxwebûn û Harûn jî çûn gundekî din. Li nuqteyê cotkar û Cûdî mabûn.

Baran û Zinar çûn gund, dema ketin hundirê malê dîtin ku Rizgar Çêrmûg bi cilên sivîl rûniştiye. Baran dizanibû dê Rizgar were, haya Zinar ji tiştekî nebû. Dema ku çûn odeya din, Zinar dît ku du keleş li wir in.

“Ka xwediyê vê çekê li ku ye?”

Rizgar: “Ew jî çûbû ku ji bo demeke dirêj lêhûrbûnê bike.”

Zinar fêm nekiribû, ji ber ku Rizgar nas nedikir. Li hemberî vê bersivdayîna wî, wekî din jê pirs nekiribû. Dema ji gund derketin:

Baran: “Agir çawa hat girtin?”

“Nizanim, çûbû di bajêr de bigere. Ew û hevalekî wî yê sivîltiyê, di dolmîşê de hatin girtin.”

“Ma li ser wî tiştek nebû?”

“Hebû, lê nizanim.”

Baran bi henekî.

“Rêxistin, bi te re qadroyan nagihîne, bû du kes tu bi xwe re dibî; lê belê tu tenê vedigerî.”

“Li gorî rêxistinê tevnagerin, ji bo wê tên girtin. Ez çima nayêm gitin?”

Dema gihîştin nuqteyê demjimêr bûbû dehê şevê, ketin nav kîsê xwe yê xewê û razan.

## Amadekariyên Civînê

Şev Cûdî bi dengekî şiyar bû, rabû ku hevaline tên nuqteyê. Bi Serxwebûn wan re Ziya, Merwan, Çekdarê ‘Ereb û şervanekî nû jî li cem wan e.

Di rojbaşê de hemû rabûn. Dema yên li keşfê hatin, ji xwe re agir dadan. Servanê nû jî rabûbû. Ew jî hat ber agir.

Cûdiyê Kobanê: “Cihê me çawa ye, xweş e, ket serê te?”

Özgür: “Min bi vî awayî xeyal nedikir. Min digot; niha cihê hevalan pir bi dizî û veşartiye. Lê belê hema hûn hatine, we xwe dane nav daristanê.”

Cûdî: “Ne pirsgirêk e, bila kes nizanibe bes e. Di eraziyekî ew qas fireh de kî, dizane em li vir in?”

Temaşe bike qereqol li hemberî me ye, kes nizane em li vir in.”

“Bila be, lê divê dîsa jî cihê mirov veşartî be. Em li Başûr wisa hatin perwerdekirin.”

Dema Özgür wisa diaxivî, hemû hevalan lê meyze dikir û gelek kêfa hevalan jê re hat.

Serxwebûn: “Dema em jî li Başûr bûn, ji me re jî wisa digotin. Em bi wan re hatin Bakur, me jî ji wan re wisa got. Lê ji me re gotin: “Di Kurdistanê de cihê ku deşîfre nebûye nemaye.” Mirov dengê xwe dernexe û dema gundî tên erazî mirov xwe veşêre, mirov nabînin, temam e. Ne wisa be, bi veşartinê şoreş nabe.”

Harûn: “Bi demê re tu yê jî fêr bibî. Bê quraliya ku em niha dikin, tu yê jî bikî. Hinekên din jî dê ji te re bêjin. Wek ku tu niha ji hevalê Zinar re dibêjî.”

Pîqîniyek bi hemû hevalan ket û keniyan. Ziya û yên din şiyar bûn.
Ziya: “Çi ye, hûn nahêlin em razin!”
Berxwedan: “Ka rabin, çay jî keliya. Ma hûn ê heta nîvro razin? Mêvantiya wisa nabe.”
Hemûyan bi hev re taştê xwarin. Piştî wê dîsa çay çêkirin. Wê demê, Ziya bi rêveberiya herêmê re axivî. Harûn derbarê Şivan û Nûjînê de agahî dan Ziya jî.
Piştre Ziya bi hevalên din re jî axivî. Destpêkê banî Cotkar kir.
“Hevalê Cotkar, em ê biçin civînê. Tu ji bo civînê tiştekî dibêjî?”
“Ji bo civînê tiştekî nabêjim. Lê belê dixwazim tenê li ser zivistanê hinek tiştan bêjim. Piştre jî dixwazim bi hevalê Heqî re biaxivim.”
“Tu jî dizanî hevalê Heqî ne li vir e, lê dema were tu dikarî pê re biaxivî.”
“Jixwe ji bo bi hevalê Heqî re biaxivin; me ji hevalê Rûbar re jî pêşniyar kiribû. Wî jî ji ber wê em li vir hiştin. Ji bo zivistanê jî; di têkiliyên rêveberiyê de, têkiliyên rêxistinî û hevaltî nebûn. Di navbera Şivan û Nûjînê de jî, têkiliyên rêxistinî tunebûn. Jixwe ev zivistan li me kirin dojeh. Bi tahrîka rêveberiyê, hevalan li min jî... Divê hesabê vê bidin. Çawa cudahiyê dixin navbera hevalan; çawa hinekan digirin û çawa hinekan jî ji çavên xwe derdixin. Ez ê van hemûyan ji hevalê Heqî re jî bêjim. Min xwest ku haya we jî jê hebe. Jixwe berpirsiyarê eniyê hûn in.”
“Van tiştên ku tu dibêjî, te di raporê xwe de jî diyar kirine.”
“Na. Min rapor nenivîsandiye. Jixwe moralê min ê rapor nivîsandinê jî tunebû.”
“Temam.”
Piştî wê banî hevalên din jî kir, kesî ji bo civînê tiştek negot, tiştên pêwîst di raporan de nivîsîbûn. Dawî banî Zinar kir; hema li ser piyan axivîn.

“Heval tu ji bo civînê tiştekî dibêjî, an jî wekî din pêşnîyarên te hene? Em ê biçin civînê gelek biryar di civînê de tên girtin. Wekî din jî tu xwe ji bo bajaran amade dikî? Dibe ku em çalakiyan bi pêş bixin tu çi dibêjî?”
“Heval ez ji bo civînê tiştekî nabêjim. Jixwe me raporên xwe nivîsandin, lê ji bo ez ji herêmê derkevim, pêşniyar dikim. Ez heta civînê derketibama dê ji bo min baştir biba. Ez li ser bajêr qet nefikirîm. Ji ber ku karê hêzên taybet bû, ji bo wê jî min pêwîstiya ku li ser bifikirim nedidît.
“Temam heval, lê êdî hûn bifikirin dê baş bibe. Ji bo ji herêmê derkevî havînê nebe jî, em ê payîzê meyze bikin.”

## Lingê Têkoşîna Me Yê Bingehîn Ziman e

Dema ku kes nemabû, Ziya jî hat li cem agir rûnişt û ji Özgür pirs pirsîn.
“Tu li ku mayî?”
“Ez çend mehan li şervanê nû mam. Çend mehan jî di tabûra ewlekariyê ya hevalê Cemal de mam.”
“Tu ji bo çi çûyî bajaran, ji bo çalakiyan bû an?”
“Na, ya me hevalê Cemal em şandin. Em çend heval bûn. Hinek çûn tevgera ciwanan. Ji bo ku kovara ciwanan derxim, ez şandim.”
“Navê kovara we çi bû?”
“Berê Genç Bakiş (Nêrîna Ciwan) bû. Ew hatibû girtin. Piştre me kovara bi navê Yurtsever Gençlik (Ciwanên Welatparêz) derxist. Piştî ku hevalek hat girtin, ez jî deşîfre bûm. Ji Başûr wêneyên min jî bi xwe re anîbûn. Dema wêne dikevin dest, bi awayekî xwezayî em jî deşîfre dibin.”

“Temam heval, êdî tu yê li cem hevalan bî. Heke çek, rext û cilan bibînin, dê bidin te. Tu jî di jiyanê de hevalan bişopîne û xwe fêrî şertên Bakur bike. Temam. Piştre em ê dîsa hev bibînin.”
Dema ku wan bi hev re guftûgo dikir, çaya wan keliyabû. Heval hemû li derdora Çekdarê Ereb kom bûbûn pê henek dikirin.
Zinar: “Çekdar, ebe webe.”
Wî jî bi zimanê erebî henek kir.
Çekdar: “Zinar, tu jî henekên xwe bi zimanê erebî dikî.”
“Na, ez bi erebî dibêjim, were çay vexwe.”
Piştî çay vexwarin, Ziya vê carê banî Rizgar kir. Di derbarê girtina Agir de û çima çalakî nekirine jê agahî girtin.
Ziya: “Temam, heta ku ez ji civînê têm,tu li vir be. Dibe ku heta wê demê hevalê Heqî jî were. Piştre em ê hê berfiretir binirxînin.”
Dema ku bû êvar, Ziya, Merwan û Çekdar ji wan xatir xwestin û çûn Ş. Remzî.
Dema ku êvarê heval ji bo kar belav bûn, Serxwebûn, Zinar û Özgür di nuqteyê de man. Dema ku Zinar petên avê kom dikir, Özgür dibêje.
“Ez jî dixwazim bi te re werim.”
“Na tu mêvan î, tu yê piştre zaf biçî.”
“Na heval ev bi salan e, hûn kar dikin, ez ê jî werim.”
Çavê Zinar û Serxwebûn bi hev ket, di wateya erê de Serxwebûn serê xwe hejand. Xwe ji nuqteyê berdan, dema çûn ser kaniyê.
“Hevalê Özgür tu bi kurdî nizanî?”
“Ez dizanim, lê belê kurdiya min herêmî ye, ji bo wê jî ez bi tirkî diaxivim.”
“Bila herêmî be, tu biaxive, tu yê bi pêş bixî. Heke tu neaxivî, tu yê wê jî ji bîr bikî. Jixwe sedema têkoşîna me jî, lingekî wê yê bingehîn zimanê me ye.”
“Rast e heval.”

Piştre bi destê xwe destnîşan kir.
“Navê wê qereqolê çi ye?”
“Ew neqereqol e; ew girê qereqolê ye. Qereqol jî li jêr wî yê. Navê wê Korxê ye. Ew cihê di ser gir re dixwiyê jî Bilbilik e.”
Wê demê gihîştibûn ser kaniyê. Hemû petên xwe dagirtin û zivirîn. Wê demê dîsa dibêje.
“Navê vî gundî çi ye, welatparêz in an na?”
Ev pirs ji bo yekî nû ne baş bûn. Ji ber ku di gerîla de her tişt nayê pirskirin. Lê Özgür ne ciwanekî ku şikê bikişîne bû. Di pirsên wî de xwezayîbûn hebû. Hevalan bersiv didanê.
“Gundekî zaf baş nîn e. Jixwe gundên baş nemane, lê di her gundî de çendekî baş jî hene.”
“Tu dizanî, min digot; ez biçim cem hevalan, dibe ku heval min têxin lêpirsînê; an jî bi min bawer nekin. Min ev yek jî nedît. Tam berevajî wê, hevalan pir germ ez pêşwazî kirim.”
“Ê ku tu zivistanê li mala wî mayî, hevalan di derheqê te de agahiyên berfireh jê girtin, ji ber wê.”
“Niha min navê gund û rewşa wî pirsî, divê mirov pirs neke. Lê belê carekê ji devê min derket. Ez dizanim ev şaş in, ez ê hay jê hebim.”
Êdî hatibûn ber nuqteyê. Tiştekî ku Özgür tê de razê nebû. Serxwebûn û Zinar, singêrên xwe di ber hev re raxistin û Özgür xistin navbera xwe.
Serxwebûn: “Özgür tu were di navbera me de razê. Hê tu nû yî, bila tu nexweş nekevî. Piştre dê rêxistin ji me hesab bixwaze.”
“Yaw heval, dibe ez li Bakur nû bim, lê belê di gerîla de ne nû me.”
“Temam, wê demê tu yê me, yê herî ciwan î. Tu hatî êdî forsa hevalê Zinar jî nema. Hay ji xwe hebe bila hevalê zinar lingê te neşemitîne.”
“Yê me yê herî ciwan Baran bû, ne ez bûm.”

Her sêyan xwe di ber hev re dirêj kirin û razan. Jixwe yên li nuqteyê bûn, ji ber ku heval derengî hatin, rabûn nobet girtin. Piştî keşfê dema hemû heval li ber agir kom bûn, Baran dibêje:
"Tu di xebatên ciwanan de bû yî? Rewşa ciwanan çawa bû, çima ciwanan wek berê kar nedikirin? Dema em sivîl bûn, dijmin ji ber me ketibû bûnalimê."
"Heval ez ne xebatkarê ciwanan bûm. Dema ez çûm bajêr, ez gerîla bûm. Min xwe têkel karê ciwanan jî nedikir. Ji ber ku fonksiyona me cuda bû."
Cotkar: "Na, na em dizanin, tu xebatkarê ciwanan bûyî."
Bi vî awayî hinekî bela xwe li Özgür dan. Wan jî dizanibû ne wisa bû, lê dîsa jî pêde ketin. Dema bû êvar, tekmîl hatin girtin. Özgür li hemberî wan helwesta xwe danî. Dema mafê axaftinê girt.
"Heval em jî nû tevlî pergala hevalanbûn. Min digot; ez biçim dibe ku di derheqê min de lêpirsînê vekin û min xwe ji bo her tiştî jî amade kiribû. Lê ev nebûn. Tiştekî din jî heye; heval germ nêz dibin. Lê belê hinek tişt hene ku ew li zora min diçin. Mînak; heval dibêjin, tu xebatkarê ciwanan î, nizanim çima we çalakî nedikirin û hwd. Heval ez ne xebatkarê ciwana me. Ne ku ez wan piçûk dibînim. Ez qadroyê vê rêxistênê me. Heval li gorî wê nêzî min bibin ê baş bibe."
Serxwebûn: "Wekî din kes tiştekî dibêje? Em ê biçin plansaziyê. Heval Baran, Rizgar û Özgür ê biçin Ziyareta Mezin. Yên din jî, em ê biçin ser riya esfaltê kemînê bavêjin. Van rojan konvoy derbas dibin. Dibe ku em fersendekê bibînin û em binirxînin. Ew çeka ku hevalê Rizgar bi xwe re aniye, wê jî bidin hevalê Özgür. Jixwe dizane çekê bişixulîne."
Dema tekmîl qediya, hemû hevalan xwe amade kirin û ji bo çûnê sekinîn.

Serxwebûn: “Hevalê Özgür, cihê hûn diçinê cil jî li wir hene, dê heval bidine te. Jixwe tu girêdayî vê herêmê yî, em ê dîsa hev bibînin. Temam.”
“Temam heval.”
Xatir ji hev xwestin û her kes ber bi cihê ku biçinê bi rê ketin.

## Ew Nexwaze Jî Em ê Biçin Wir

Cihê Baran wan gelekî dûr bû, lê cihê yên din nêz bû. Dema gihîştin cihê xwe Zinar û Cûdî çûn ji bo demeke dirêj ji xwe re erzaq xwestin. Dema ku çûn malê, lîste dan ciwan, diya wî kêmekî aciz bû.
“Hûn timî tên, wî didin şixulandin. Ger tiştek were serê wî em ê çi bikin? Ez wisa napejirînim.”
Zinar: “Ma me mirina xwe ji bo kê ji çavan derxistiye, ne ji bo we ye? Em her roj dimirin dayê. Lawê te ji bo me çûye erzaq aniye pir e? Hem jî tu bipejirînî, nepejirînî, em ê werin û biçin. Vê bizanibe. Ev bîst sal in heval li vir in, zerara wan gihîştiye we? Yan jî yekî dijmin aniye, gotiye: ‘Van ji me re kar kiriye, an jî erzaq dane me? Na. Em canê xwe didin, hûn ê jî heta ji we tê alîkariyê bidine me.”
Dema ku pîrê wisa gotibû; lawê wê û mêrê wê zaf li ber xwe ketibûn. Mêrê wê yekî cilik bû. Hebûn û tunebûna wî ne diyar bû. Dema ku ji malê derketin lawê pîrê:
“Heval hûn li wan temaşe nekin. Em ê ji bo we canê xwe jî bidin. Bes hûn xwe biparêzin bes e.”
Hevalan di erazî de cihek destnîşan kirin û gotin: “Sibê êvarê erzaqê me bîne wir.” Dema Cûdî û Zinar ber bi nuqteyê ve diçûn, Zinar.
“Dizanî çima, min tazîl dan wê jinikê? Ev bû çend car em diçin wir, her dem vê axaftinê dike, ji bo wê. Min got; bila bizanibe, ew nexwaze jî em ê biçin wir.”

Roja din, dema ku çûn kemînê, milîs erzaq anîbû cihê ku wan destnîşan kiribû danîbû. Wan jî erzaq di nav deviyan de veşartin û çûn ser rê.

## Em Piştre Biçin Plansaziyeke Din

Dema ku hevalê Rûbar ew li wir bûn, dîtibûn ku konvoy di rê de diçe aliyê Bilbilikê. Çend rojan şopandibûn. Piştre jî dema çûn Ş. Remzî, ji rêveberiya Apê Mûsa gotibû: “Biçin ser rêkemînê bavêjin, hûn ê encamekê bigirin.”

Heval çûn ser esfaltê rûniştin, heta derengî sekinîn. Derveyî qamyonên pezên Bêrtiyan dibin Çewlikê; teqsî û transît tenê derbas dibûn. Dema qamyonên pez di ber wan re derbas dibûn, dengê marêniya pez dihat wan. Heval dikeniyan û digotin: “Ev pez ji me re dibêjin; hûn ê hê zaf li benda konvoyê bisekinin.”

Şeva destpêkê heta duwazdehê şevê, li ser rê, di kemînê de man. Tu tiştekî dijmin derbas nebûbû. Wan jî ji duwazdehê şevê û şûnde cihê kemînê berdan, li ser riya xwe erzaq û ava xwe girtin û çûn nuqteyê.

Dema ku Baran ew ji wan qut bûbûn, çûbûn Ziyaretê. Di rê de, Rizgar ji Baran re qala hedefekî leşkerî kiribû. Ev hedef du otobûsên leşkeran e. Her roj ji perwerdeyê vedigerin Amedê. Yên ku tê de jî hemû bi giştî evser (subay) in. Her roj derdikevin derveyî Amedê û êvarê jî dizivirin.

Baran: “We çima li ser wan, çalakî nekir?”

“Me li ser vê, dilê hev jî hişt. Agir digot: “Em hedefek din bibînin.”Ger me nedîtiba, me yê li ser wan çalakî bikira. Lê Agir hat girtin, ez jî mecbûr mam derketim.”

“Em yekî bişînin, bila biçe keşfa wan bike. Heke erênî be, em ji hevalan re bêjin.”

“Temam, em yekî rê bikin. Lê divê yekî pir saxlem be. Wisa nebe dê ev fersend jî ji destê me biçe.”
“Na, yekî saxlem heye. Rêxistin jî dibêje: “Kesên wisa ji bo çalakiyan bidin şixulandin.”
Wê şevê razan. Serê sibê dema di keşfê de tiştek nedîtin, agirê xwe dadan û li ber rûniştin. Piştî nîvro, Baran çû ji Özgür re, ji bîdonan cil derxistin û anîn. Şûtikeke hevalan a kevn jî jê re anîbû. Dema ku Özgür piştî salekê, dîsa cilên gerîla li xwe kirin:
“Erê yaw, niha ez nû bûm gerîla. Her çendî çeka min hebû jî, min xwe gerîla nedidît. Bi cilan temam bû. Niha kêmasî rext e, em wî jî bibînin ê temam bibe.”
Baran: ”Em ê ji te re rext jî bibînin. Heke nebe em ê rextê Rizgar jê bigirin bidin te.”
“Çima tu rextê xwe nadiyê, yê min didiyê?”
“Rêxistin ê di demeke nêz de bêxe lêpirsînê. Te du qadroyên rêxistinê birin dan dest. Em ê jî rextê te bidin şervanê nû. Jixwe êdî hêviya me ji te nemaye.”
Bi vî awayî henekên xwe bi Rizgar dikir. Êvarkî çûn gund û kesê ku digotin, banî wî kirin. Cihê keşfê jê re tarîf kirin û ji bo ku hişyar tevbigere ew hişyar kirin.
Yekeya kemînê heta êvarê esfalt xistibûn bin çavdêriya xwe.
Tîma kemînê heta êvarê esfalt xistibûn bin bin çavan. Berêvarkî dîsa xwe berdan ser esfaltê, dîsa heta derengiya şevê di kemînê de man. Dîsa ji derveyî pez û wesayîtên rêwiyan tu tiştek derbas nebû.
Zinar: “Ev konvoyên ku hevalan digotin, ne qamyonên pez bin. Ew jî wek konvoyê hemû didin dûv hev û di rêzê de diçin.”
Serxwebûn: “Dibe ku ev bin. Lê ji me re gotin; biçin kemînê. Em jî nehatana û bi tesadûfî yek derbas biba, wê demê dê ji me hesab

bixwestana. Em çend rojên din jî bisekinin; nebe em ê biçin plansaziyeke din.”
Wê şevê heta duwazdehê şevê di kemînê de sekinîn. Dema ku tiştek nehat vegerîn nuqteyê. Nîvrokî di mûhabereyê de, Ziya ji bo rendevûyê cihek da wan. Dema ku êvarê Cûdî û Cotkar çûn kemînê, çûn cihê ku ziya di mûhaberê de dabû wan, li wir li benda wî sekinîn. Her sêyên din jî di kemînê de li benda konvoyê, ango dijmin sekinîn. Di demjimêra dehê şevê de, Cûdî û ew jî hatin li cem wan sekinîn. Heta yazdehê hemû di kemînê de bûn. Piştî wê, Ziya:
“Ka em biçin, heke dijmin heta niha hatiba dê hatiba.”
Serxwebûn: “Em dikarin biçin, jixwe ji derveyî qamyonên pez tiştek derbas nabe.”

## *Tu Yê Di Pratîkê De Bipijî*

Kesê ku Baran wan ew şandibû keşfa otobûsan, bersiveke erênî ji wan re anîbû. Özgür di nuqteyê de hemû kar dikir. Nedihişt Baran û Rizgar çayekê jî çêbikin.
Digot: “We bi salan ji me re kir, niha jî ez ê ji bo we bikim.”
Her çiqasî hevalan ev nedipejirand jî, Özgür bi zorê bi wan dida pejirandin. Êdî bi çavê ku hevalan lê meyze dikir, wî bi çavê nû li xwe meyze nedikir û nedixwest kes jî lê meyze bike. Lewre serê sibê berî her kesî şiyar dibû, diçû cihê keşfê û keşfa xwe dikir. Heval radibûn ku Özgür û dûrbîn nexwiyane. Baran çû cihê keşfê, dît ku Özgür keşfê dike.
“Tu li vir çi dikî?”
“Min got; hûn razin, ez ê biçim keşfê.”
“Temam, lê hê tu erazî nas nakî. An jî dijmin bi carekê derbikeve tu yê çi bikî? Ji bo wê keşfa serê sibê pir girîng e. Heke tu dixwazî werî, an bi min re, an jî bi hevalê Rizgar re were. Divê mirov cihê

ku dijmin digire, an jî cihên stratejîk baş keşif bike. Ne wisa be em ê derbeyê bixwin. Piştî wê Baran, mirov çawa bi dûrbînê digire, an jî bi çi awayî dûrbînê davêjin derdor nîşanî wî da.
“Dûrbînê bi her du destan bigire û bi çavên xwe ve nezeliqîne. Bila aliyê jor di navbera çavên te û birûyên te de be. Aliyê jor bila li birûyên te bikeve. Cihê ku tu dûrbînê diavêjiyê li ser bide sekinandin; bila dûrbîn qet neheje. Dema ku biheje, mirov misoger erazî nabînê. A niha wisa bigire.”
Özgür tiştên ku Baran jê re gotinbûn hemû pêk anîn.
“Te niha li cihê ku tu lê meyze dikî daye sekinanadin?”
“Erê.”
“Temam, tiştekî ji xwe re destnîşan bike. Te destnîşan kir?”
“Erê.”
“Niha jî dûrbînê dîsa bavêje wir, lê belê bila destê te biheje. Ka ew tiştê ku te ji xwe re diyar kiriye, tu dibînî?"
“Na, baş nabînim.”
“Te dît, divê dema ku mirov dûrbînê bavêje, yek; destê mirov neheje. Du; mirov ecele neke. Sê; heta ku mirov cihê dûrbînê diavêjin wir, mirov misoger neke, divê mirov dûrbînê navêje cihekî din. Dema ku mirov dûrbînê diavêjin, mirov ji cihekî digire û hêdî hêdî pê re li derdorê meyze dike. Carekê bavêjî wî gir î, carekê bavêjî wî gir î, tu, tu tiştekî misoger nakî. Te fêm kir?”
“Erê. Me îro perwerdeya dûrbînê dît; em êsibê jî ya tiştekî din bibînin.”
Dema xwe berdan hatin jêr, Rizgar jî li benda wan bû. Rizgar çay-dan dagirtibû, bi awayekî izgara dar hemû danîbûn ser hev û bilind kiribû.
Özgür: “Li Başûr dûrbînavêtin qet nîşanî me nedabûn û me nizanibû wisa agir jî pêxin. Agir pêxistin nîşanî me dan, lê ew cuda bû. Bi vî awayî cuda ye.”

Dema ku li ber agir rûniştibûn, di qulpê çaydanê re darikek derbas kiribûn û çaydan li ser agir girtibûn.
Baran: "Tu li cem min bî, tu yê hînî hemû qurnaztiyên gerîlatiyê bibî. Ez ê îro taybetmendiyên di meşê de, yê ku pêşengtiyê dike jî fêrî te bikim. Pêşeng çawa di rê de dimeşe, dema dimeşe çi dike, pêşengekî hişyar çima nakeve kemînê? Ez ê hemûyan ji te re bêjim."
Rizgar: "Rast e, dê Baran hemû qurnaztiyan nîşanî te bide. Qurnaztiyên ku rêxistinê dane wî, îro hemûyan li ser serê me dişixulîne; ne li ser serê dijmin. Pêşniyara min e; tu li cem wî nesekinî."
"Tu li wî meyze neke. Rêxistinê du caran ew şand Amedê, her carê hevalek da girtin. Tu li cem wî bî, ew ê te jî bide girtin û dê bi tenê were cem rêxistinê."
Özgür: "Yaw ma mirov li ser hevalê xwe qurnaztiyan dike? Mirov li ser dijmin qurnaztiyê dike û mafê wan tine li ser hevalê xwe bike."
Rizgar: "Erê, hemû gerîla li ser dijmin dikin; Baran jî li ser me dike." Yaw baran, rêxistinê ev qurnaztî di 89'an de mahkûm kirine. Êdî dev ji wan berde."
Baran: "Tu li wî meyze meke, tu rêxistinê û şehîdan ji xwe re mînak bigirî; tu yê bi ser bikevî. Em henekan dikin. Dema ku em hatin, me jî tiştek nizanibû. Lê belê îro ne wisa ye. Bi demê re tu yê jî bi sebir bi pêş bikevî; di karvaniyê de bipijî."

## Heke Perwerdeyê Encam Girtibe Dê Di Karvaniyê De Diyar Bibe

Wê şeva ku heval ji keşfê hatin, bû serê sibê Ziya bi civînekê, encamên civînê ji hevalan re ragihand.

“Heval me civîna xwe kir. Di encamê de hevalan zivistanê perwerdeyeke xurt dîtine. Ji aliyê rexne û rexnedayînê ve jî, hevalan ev mekanîzma xurt dane şixulandin. Hêzek derketiye holê, lê belê hinek hevalan di rexneyên xwe de, tiştên ku ji dev hatine bihîstin, an jî bi beredanê (yönlendirme) hinek rexne bi pêş xistine. Ev jî ne rast in. Em nabêjin rexne nekin. Dema rexne hatin kirin, bila hundirên wan dagirtî bin û rast bin. Ango yekî di derbarê yekî de tiştek bihîstiye? Ev kiriye mijara rexneyê; ka bisekine ev rast e, an na. Ka carekê derxin holê, piştre rexne bikin. Yek jî perwerde çiqasî xurt derbas bûye nebûye, em ê di karvaniyê de bibînin. Bi giştî hevalan erênî nirxandin; em jî erênî dinirxînin. Lê belê dema mirov di karvaniyê de encamên wê negire, wê demê ew perwerdeya ku me dîtiye ew ê vale be.ji bo ku vale neçe divê mirov wê di karvaniyê de bide îspatkirin.

Niha destpêka biharê ye, rêxistin jî , ji me çalakiyan dixwaze. Divê mirov li gorî pêngava ku rêxistinê daye destpêkirin tevbigere. Li ser vê jî me guftûgo kir. Em ê têkevin nav amadekariyan. Bila heval li gorî vê jî têkevin nav lêhûrbûnê.”

Piştî civînê kesî tişt negot û civîn qediya.

# Erd Dihejand

Ziya: “Hevalê Serxwebûn ev kemîn qet nekete serê min; em mayîneke mezin deynin, bila heval bi qabloyê biteqînin. Qomanda jî jixwe kar nake. Em îro biçin çend tenekeyên mayînan amade bikin, sibê êvarê deynin. Tu çi dibêjî?”

“Wele neketibû serê min jî. Lê hevalan got, lewre em çend rojan çûn man. Mirov dikare çar tenekeyan deyne û sed metre qablo hebe bes e. Bila du heval li ser bin.”

“Temam. Em kî li ser bihêlin?”

“Bila Harûn û Cûdî li ser bin; Zinar jî bi me re were, dibe ku em çed heban li wî aliyî deynin. Jixwe Cotkar li benda hevalê Heqî ye.” Dibêje: “Ez ê pê re biaxivim. Piştre biryara xwe bidim,ez ê xwe tevlî bikim, an jî biçim Başûr.”

Wê êvarê çûn nuqteya Ş. Têkoşer. Dema ku serê sibê li derdor tiştek nedîtin, dest bi çêkirina gubreyê kirin. Heta berêvarkî çar teneke gubre çêkirin.

Harûn: “Hevalê Ziya em ê îşev van deynin, an sibê?”

“Ez dibêjim; em îşev deynin ê baştir bibe.”

“Heval niha gubre germ e, em nikarin fûnyeyan têxinê. Wê demê ancax em li ser rê fûnyeyan têxinê.”

“Serxwebûn: “Tişt nabe. Dema em bikolin bila hevalek fûnyeyan têxê.

Hevalan du teneke xistibûn yek qalibî, ji bo wê nikaribûn rakin. Rakiribûna jî, dê riya dêmjimêrekê, ancax du demjimêran biçûna. Ji bo wê, Serxwebûn:

“Ez û hevalê Ziya, em di pêş de biçin, li ser riya xwe kerekî, an jî hêstirekî bigirin heta hûn tên.”

Dema ew bi rê ketin, hevalên din jî nuqte kom kirin û barên xwe dan pişta xwe. Harûn û Cûdî her yekî mayînek rakiribûn. Giraniya

van mayînan; ya her yekê herî kêm sî û pênc kîlo hebûn. Dema ku di binê bar de dimeşiyan, diyar bû ku pir zorê dibînin. Qederekê meşiyan, dîtin ku hevalan kerek anîye. Dema gihîştin hevalan, li kerê meyze kirin.
Harûn: “Ev ker nikare vî barî rake. Ev ker pir pîr e.”
Serxwebûn: ”Yaw, heta ku bîne bila bîne, hûn bar bikin, em ê di pêş de biçin.”
Hevalan bar danîn ser pişta kerê, lê belê di çend gavan de wek sermestan li kerê hat. Qederekê bi vî awayî meşiya û sekinî. Hevalan bi lêdan û serîkişandinê qedereke din jî birin. Piştre kerê serserkî xwe avêt erdê; çi kirin û nekirin ker di binê bar de ranebû. Barê wî danîn û bi lêdanê ew rakirin. Dîsa bar lê kirin. Dema ku bar lê kirin, kerê qet nikaribû xwe bilivîne. Harûn bi lêdanê çi kir jî neliviya. Cûdî bi hefsarê wî girtibû û dikişand, Harûn jî bi pihînan lê dida. Li hemberî vê bûyerê kenekî Cotkar girtibû û êdî nikaribû xwe bigire.
Harûn: “Çi bûye, çima tu dikenî?”
“Çi bikim, ma ez nagirîm?”
Bi lêdan û kişandinê bi qasî pêncsed metreyê din jî ker meşiya û dîsa xwe avêt erdê. Piştî wêHarûn:
“Heval, ka hûn van tiştên me bigirin, em ê tenekeyan rakin. Heywan nikare di binê de bimeşe. Ev dêmjimêreke em pê ve mijûl dibin.”
Harûn û Cûdî çenteyên xwe dan Zinar û Cotkar. Wan dîsa teneke dan pişta xwe û meşiyan. Dema gihîştin Serxwebûn û Ziya, wan xwe dabû jêr esfaltê, li benda wan sekinî bûn. Dema ku rûniştin Serxwebûn:
“ Çi bû, we teneke dan pişta xwe?”
Harûn: “Em çi bikin? Nikaribû bianiya, ji mecbûrî dîsa me hilgirt.”

Dema ku rabûn, vê carê Serxwebûn û Cotkar teneke hilgirtin. Harûn ew çûn ser rê keşif kirin. Dema ku tişt nebû banî wan jî kirin. Ji bo qabloyê veşêrin, destpêkê Harûn û Cûdî dest bi kar kirin. Ji bo ji her tiştî re amade bin Cotkar jî çû nobetê. Zinar jî fûnye dixistin tenekeyan. Serxwebûn û Ziya piştî çavê xwe li derdoran gerandin gotin: "Karê me heye, divê em hinek mijaran guftûgo bikin." Ji wir çûn nuqteyê. Dema ku Zinar fûnye xistin nav tenekeyan, ew jî çû aliyê din nobetê. Cihê ku mayîn lê datanîn, pêncsed metreyî nêzî gundê Qilêderê bû.

Cotkar hema ji malan vir ve nobet digit. Zinar jî li aliyê Xweylingê nobet digirt. Êdî Zinar li cihê nobetê aciz bûbû, li demjimêra xwe têmaşe dikir. Demjimêr bûbû deh û nîv. Cûdî û Harûn hê cihê qabloyê dikolan. Yekî dikola, yê din jî li dûv qablo dixist nav çalê û ax diavêt ser.

Harûn: "Zinar, me cihê qabloyê qedand, tu û Cotkar jî cihê tenekeyan bikolin, em mirin. Hûn biçin em ê nobetê bigirin."

Dema ku Zinar ev bihîst, tam aciz bû, lê bi Harûn neda hîskirin."

"Temam."

Dema ku Zinar çû cihê ku, dê teneke têkevinê, Cotkar jî li wir bû.

Cotkar: "Em ê ku derê bikolin?"

"Were were, min dînê wan leqandî, hê bi zorê qablo veşartine."

Da pêşiya Cotkar û çûn kêleka esfaltê. Zinar bi hêrs tevir radikir û li erdê dida, Cotkar jî ax dixist hundirê kîs û dibir cihekî dûr diavêt. Dema ku erebe dihatin ji bo çala ku ew dikolin ferq nekin, guliyên daran datanîn ser çalê. Cotkar temaşe kir ku Zinar westiya ye.

"Ka tevir bide min, ez bikolim. Di te de hêz nema."

Cotkar li gorî Zinar hem qelewtir bû, hem jî ji aliyê fîzîkî ve hê xurtir bû. Wek werzişvanan bû. Zinar qels û dirêj bû. Cotkar li gorî wî li ser xwe bû; cixare jî nedikişand. Zinar berovajî wî, rojê du qutî cixare dikişand. Dema cotkar, tevir li erdê dixist; erd dihejiya. Axa

ku wî derdixist, Zinar pê re nedigihîşt, êdî ax dibir cihê nêz vedişart. Di nav nîv demjimêrî de Cotkar cihê çar tenekeyan kolabû. Zinar ew qas diçû û dihat êdî westiyabû. Cotkar bi halê wî yê westiyayî dikeniya.
“Kêm ma, ka hinekî din jî diranên xwe bijidîne.”
Dema cihê tenekeyan qedandin, Zinar çû teneke anî, bi cî kirin, serê fûnye û qabloyan bi hev ve girê dan û qamûfleya wê çêkir. Cotkar jî berê bi vî karî ve mijûl dibû. Dema ji hêzên taybet derket û şûnde, xwe têkel karê mayînan nedikir.
Zinar: “Çawa ye, kamûflaja wê baş e?”
“Erê baş e, em biçin.”
Zinar çû cem Harûn.
“Me teneke bi cî kirin. Tu jî biçe bala xwe bidê, em piştre biçin.”
“Temam, hûn biçin kêmek qablo maye wê jî veşêrin, ez ê werim.”
“Hê qablo jî maye!”
“Erê, bîst metre heye, tuneye.”
Zinar, Cotkar jî girt û çû qabloya ji derve mabû ew jî veşartin. Dema Harûn û Cûdî hatin ji kêleka rê dûr ketin, ber bi nuqteyê ve çûn.

## Ji Aliyê Derûnî Ve Têk Diçin

Dema hatin cem ava Kexnê Mamê dest û rûyen xwe şûştin, cixareyek vexwarin. Harûn û Cûdî çûn cihê nuqteya kemînê, Cotkar û Zinar jî ber bi nuqteya Ş. Têkoşer ve meşiyan. Dema ku di rê de dimeşiyan, ji westandinê wek sermestan li wan hatibû; riya demjimêrekê, bi kotekî di du demjimêran de hatin. Dema gihîştin nuqteyê demjimêr bûbû duyê şevê. Xwe wek miriyan avêtin erdê û razan.
Ji ber ku hevalan bernameyek nedabû pêşiya wan, Baran ew jî li wir li benda hevalan bûn. Özgür jî êdî fêrî hevalan bûbû. Di Ziyare-

tê de çiqas bîdon û stargehên hevalan hebûn cihê hemûyan nas kiribû. Di jiyanê de jî, wek ku bi salan bi hevalan re be, bi wan re dida û distand. Ji aliyê rêxistin û jiyanê ve jî tawîz nedida tu kesî. Kesayetiyeke rêxistinî di kesayeta wî de hebû. Hem ji derdora xwe mînak digirtin û hem jî bi sekna xwe ji derdora xwe re dibû mînak. Ji bo wê di demeke kin de cihê Özgür çavên hevalan dagirtibû; di çavên hevalan de cuda bû. Dema her sê li hev rûniştibûn:

"Çima heval nayên? Em li vir vale vale rûniştine. Hatibana me jî karek kiriba. Niha her kes di çalakiyê de ne. Çima em nakin?"

Baran: "Jixwe heval li dûv çalakiyan digerin. Tu nûyî, Rizgar jî nû ji bajêr hatiye. Ji bo wê em li vir in. Dibe ku sibê ew jî werin."

"Çima em çalakiyan li ser qereqolan nakin? Her dem çalekiyên mayînan bi pêş dixin."

"Berê hevalan wisa bi daxwazî bi sedan qereqolrakirine. Lê niha jî em bi mayînan çalakiyan pêk tînin. Ev çalakî vîna dijmin dişkîne, êdî naxwaze derkeve erazî. Her derdikevin di çend kesan de mayîn diteqin. Dema leşker laşê hevalên xwe yên perçe perçe bûyî dibînin, ji aliyê derûnî ve diqedin. Têk diçin. Gelek jî, dema goştê hevalên xwe kom dikin, dîn dibin. Mesele çalakiya hevalan zivistanê di Amedê de kir, hemû leşker di otobûsê de sax sax şewitîn. Te di televizyonê de temaşe nekir?"

"Heta milîsê ku ez li mala wî bûm jî digot; dijmin ev çalakî kiriye."

Wî jî avêtiye. Yê ku çalakî kirî va li kêleka me rûniştiye."

Rizgar: "Dibe dijmin jî bike, dibe ku milîs jî bike, dema çalakî çêdibe, her kes lê xwedî derdikeve."

## Dijmin Jî Got Du Leşkerên Me Mirine

Bû êvar Serxwebûn ew jî ji Şelê derketin û ber bi Ziyaretê ve meşiyan. Di nîvê rê de Ziya û Serxwebûn, ji Cotkar û Zinar veqetiyan. Gotin: "Karê me heye." Cotkar û Zinar çûn li nuqteyeke

ku di nav xwe de diyar kiribûn sekinîn. Ziya û Serxwebûn jî çûn cem milîs, hedefa ku Rizgar ji Baran re qalê kiribû di derbarê wê hedefê de agahî dabû Ziya jî. Ziya jî li ser vê ketibû nav tevgerê ku wê hedefê bi çi awayî, bi çi dirûvî binirxîne û encameke baş jê bigirin. Ji keşfa milîs zêdetir, bixwe biçin keşfê bikin û wisa encama keşfê binirxînin. Ji bo hevalekî rê bike nav Amedê ketibû nav tevgerê. Lewre bixwe li ser wî karî disekinî. Banî mirovekî saxlem yê ji Amedê bikira ku hevalan bibe û di keşfê de bibe alîkar.
Cotkar û Zinar jî çûbûn nuqteyê, singer û kîsê xwe yê xewê raxistibûn û razabûn. Zinar bi dengekî şiyar bû; bi dengê axaftinê rabû ser xwe. Dît ku Serxwebûn ew in. Dîsa xwe dirêj kir. wê demê.
Serxwebûn: “Zinar! Cotkar!”
“Werin werin, em li vir in.”
“Hûn razane?”
“Erê.”
Wê demê ew jî rûniştin.
Ziya: “Tiştek tune em bixwin? Ez birçî bûme.”
Zinar ji çente nan û pêxwarin derxist, wan jî bi xwe re firingî û toraq anîbûn. Her sêyan xwarina xwe xwarin û razan.
Serê sibê bi tarîtiyê re Zinar rabû û çû keşfê. Li derdor baş meyze kir. Dema tiştek nebû hat. Agir dadan û çaya xwe çêkirin, taştêya xwe xwarin.
Di mûhabereya nîvro de, Rizgar şîfre da Şahîn. Li ser vê, Rûbar di şîfreyê de pirs ji Rizgar dikirin, Rizgar jî, bersiv didanê. Di wan pirs û şîfreyan de, Ziya jî şîfre dişopand.
“Hevalan çalakiyek kiriye, lê nizanim bi çi awayî ye.“
Dema di cîhazê de banî Ziya kirin.
Andok: “Akdax tu yê tiştekî bêjî?”
“Na heval, lê van rojan Aryen zêde mûhabere neke, dê baş bibe.”

Li ser vê gotina wî Andok.
“Mecbûrî ye, pêwîstî heye, ji bo wê dike. Aryen tu yê tiştekî cuda bêjî?”
“Na heval. Em ê piştre encamê wê bidin.”
Wê rojê dijmin jî di nûçeyan de windahiyên xwe dabûn. Gotibû: “Di bejahiyê de şer qewimiye. Di vî şerî de du leşkerên me mirine.”

## Êdî Çalakî Navendî Dihat Destgirtin

Du roj piştî wê, Soro û hêzên wî jî hatin Apê Mûsa. Rojek piştî wê, Hevalê Heqî û Yaşar jî xwe gihandibûn Apê Mûsa. Êdî li ser hedefa Amedê bi awayekî navendî dihat sekinandin. Hevalê Heqî, bi rêveberiya qadê û ya eyaletê re gelek guftûgo bi pêş xistin. Her awayê çalakiyê nirxandin. Piştî van nirxandinan, çûna Serxwebûn a ji bo Amedê hat pejirandin.
Heqî ji hêzên kombûyî re civînek çêkir. Di vê civînê de, li ser rewşa rêxistinî û di vê demê de çalakiyên ku pêwîst dikin, divê çendanî û çonayetiya wan çawa û bi çi awayî bin, anî ziman.
Çalakî bi dîzî dihat girtin. Ji bo wê, piştî civînê Cîger, Welat, Amed û Xemgîn çûn herêma Ş. Brûsk. Êdî ev heval jî ê bibin hêzên herêmê. Di herêma Apê Mûsa de, hêzên qadê, hêzên taybet û hêzên herêmê, hemû li hev kom bûbûn. Roja din, Serxwebûn ji bo biçe Amedê amadekariyên xwe kirin. Piştî nîvro çû cihê ku di erazî de dabû milîs, milîs jî ji bo balê nekişîne hemû malbata xwe jî anîbû. Ji bo ku di rê de tiştek hebe jî, dema di erebeyê de malbat hebe zêde balê nekişîne. Serxwebûn cilên qatlix (takim) li xwe kiribû. Di nava van cilan de wek bûrjûwayê Amedê dihat xwiyakirin. Dema gihîşt cem wan.
“Merheba, hûn hemû hatine.”
“Merheba, wisa bêtir balê nakişîne.”
“Ya tiştek bibe, dê malbat hemû biçe.”

“Yên ku li me temaşe bikin, me hemû li malê hiştine.”
Ziya dîsa jî ji bo hem malbat û hem jî Serxwebûn şiyar bin ew şiyar kirin. Malbatê dizanibû heval ji bo tiştekî diçin bajêr. Dema zivistanê jî heval biribûn Amedê, ew çalakiya otobûsê li dar xistibûn. Di derheqê Çiya û bûyerê de agahdar nebûn. Vê malbatê dê tenê Serxwebûn biriba Amedê. Yên ku di keşif û çalkiyan de bi hevalan re cî bigirtana hinek kesên din bûn. Erebe ber bi esfaltê ve ket rê.
Serxwebûn: “Dema hûn hatin, di rê de lêgerîn hebû?”
Milîs: “Na tunebû. Lê dibe ku li Mermerî, an jî di ketina rê de lêgerîn hebe. Heke nasnameya te hebe ne pirsgirêk e.”
Dema ku texsî gihîşt esfaltê, Serxwebûn bi dizî demaçeya xwe derxist û xist bin lingê xwe yê ku bi koltixê ve dibe yek. Milîs ev tevgera wî dît.
“Pêwîst nake, bila li pişta te be.”
“Na ev der baştir e, ger tiştek bibe em ê xwe zû biparêzin.”
“Yaw tiştek tune, dema hûn gerîla ji çiya derdikevin, hûn hemû tiştî ji xwe re xeter dibînin.”
Dema ku di navbera wan de ev guftûgo derbas dibû, êdî sêrêya Licê derbas kiribûn û xwe nêzî qereqola Engolê kiribûn. Dema ku xwe nêzî qereqolê kirin, hem Serxwebûn, hem jî milîs li dûr temaşe dikirin. Cihê ku leşker li ser rê disekinin, yên ku vê riyê baş nas bikin, ji dûr ve wan leşkeran dibînin. Vê carê leşker li ser rê tunebûn. Dema ku di kêleka petrolê re derbas bûn, cihê ku riya Hênê û Amedê ji hev qut dibin, di nav petrolê de cemseyeke leşkerî dîtin. Çend leşker li ber cemseyê bûn û çend heb jî li dûr ji xwe re digeriyan. Serxwebûn ew, bi lez di ber wan re derbas bûn û riya xwe şopandin. Di ber gundê Fîsê re derbas bûn. Wê demê di nav eraziyê Zarayê de bûn. Serxwebûn: “Tu dizanî, em ji vir re dibêjin çi?” “Na.”




## Ev Der Keda Şehîd Navdar e

“Ev der Zara ye. Berê me digot; Zara. Niha jî em dibêjin; Ş. Navdar. Ev der keda şehîd Navdar e. Hevalê Navdar li vir karvanî (pratîk) dida meşandin. Zivistana 2007’an li Ş. Remzî, bi çar hevalan re şehîd ket. Hevalekî pir hêja bû. Ji aliyê leşkerî ve jî xurt bû. Heke şehîd neketa, dibe ku biba fermandarê vir. Ew ji Fîsê bû.”

“Şehadeta wan misoger bû, ne wisa?”

“Zivistanê qobra cihê wan dibînin, dikevin şer. Şêst heval rizgar dibin. Pênc heval jî di şer de, du rojan heta êvarê şer dikin, dema ku êvarê dixwazin xwe ji nav dijmin derxin, şehîd dikevin. Sê hevalên din jî xwe rizgar dikin, lê belê li Ş. Remzî berf zêde digire, ew jî diçin dikevin govekê. Roja din, dijmin diçe derdora wan digire, heta êvarê şer dikin. Du heval; hevalê Navdar û hevalê Mezlûm li cihê bûyerê şehîd dikevin. Hevalê Sînan dixwaze xwe derxe, gelekî dûr jî dikeve, lê birîndar e. Dijmin guleyan bi ser de direşîne, ew jî şehîd dikeve. Piştre fermandarê operesyonê diçe ser, bi demaçeyê du cercûran bi ser de vale dike. Hevalê Sînan ji Mereşê bû û di rêveberiya hêzên taybet de bû. Hevalê Mezlûm jî, ji Rojhilat bû. Dema ku heval dikevin govê, herhalde gundî wan

dibînin, an jî dijmin li her derî temaşe dike, piştre jî tê li vir jî temaşe dike, hevalan tê de dibînin.

## Rêwitiya Ber Bi Amedê Ve

Dema ev guftûgo dikirin hatibûn nêzî qereqola Mermerê.
Di vê qereqolê de, her dem rê dihat qontrolkirin. Lê wê rojê, wê qereqolê rê qontrol nedikir. Di ber qereqolê re bi lez derbas bûn. Êdî li ber wan deşta Amedê tenê hebû. Genim û cehê gundiyan êdî çong derbas dikirin. Dema mirov bi dirêjahî li pêşiya xwe temaşe dikir, wek ku mirov di nav zeryayeke kesk de melevaniyê bike. Bi texsiyê di nav keskahiya genim, deşt, di nav gundên dîwarên wan kevir û banê wan ax re derbas dibûn. Ji ketina nav Amedê re hê çend xulek mabûn, ji aliyê polîsan ve, li ser rê nuqteya lêgerînê hatibû avakirin û lêgerîn pêk dianîn. Dema ku Serxwebûn ji dûr ve ev dît, destê xwe li ser demaçeyê sekinand. Dema ku hatin, li ber wan sekinîn.
Polîs: “Nasnameyên xwe bidin.”
Yên ku di texsiyê de bûn, nasnameyên xwe derxistin; dirêjî polîs kirin. Polîs demekê li nasnameyan meyze kir.
Wê demê çavê Serxwebûn, hem li polêsê linasnameyan temaşe dikir bû, hem jî li yê li ber texsiya polêsan bû. Hem li wan meyze dikir, hem jî ew dişopandin. Destê xwe danîbû ser çonga xwe û çonga xwe ji ser demaçê sist kiribû. Dê di tevgereke xeter de demaçeya xwe bikişanda.
Polês: “Temam, hûn dikarin biçin.”
Milîs texsî ajot û ji wan dûr ket.
“Min digot; tu yê niha demançeyê bikişînî û guleyan berdî wan. Ji bo wê jî ziravê min qetiya.”
“Na, wey ma çi bû. Em çekê dixin zikê leşkeran, hingî wan dikujin. Ew jî heta neyên ser me û cihê me nebînin em dengê xwe nakin.

Tenê demaçeyên van polêsan hene. Ji bo tedbîrê min xwe amade kiribû, lê tiştek nabe. Ma çima ez we hemûyan biavêjim xeteriyê?"
Dema gihîştin malê.
Serxwebûn: "Ji bo sibê em bi çi awayî tevbigerin; em banî wan kesan bikin, em di navbera xwe de misoger bikin. Heke wisa nebe, sekna min a di bajêr de xeter e.
"Temam, ez bi telefonê banî wan bikim, jixwe haya wan jê heye."
"Erê, jixwe min karek jî dabû pêşiya wan, lê qet bi telefonê li ser van tiştan neaxive."
"Temam."
Dema ku milîs çû û bi telefonê banî her du ciwanan kir; hat şûnde.
"Ka, tu têkeve serşokê heta her du tên, serê xwe bişo. Bila ew qirêja bi salan ji ser te biçe. Ne ku ez dibêjim; tu qirêj î, ez bi qurbana we û qirêjiya we bim. Lê belê dîsa jî tu xwe bişo."
"Yaw, min duh xwe şûşt, hem jî ne baş e."
"Yaw, çi ne baş e, te duh xwe bi ava sar şûştiye, hem jî ev der bajêr e, ji bo mirov balê nekişîne divê mirov paqij be. Temam, ez dizanim, hûn xwe li malan naşon, lê belê ev der cudaye."
Milîs bi zorê, Serxwebûn xiste serşokê. Serxwebûn xwe şûşt şûnde hat dît ku, kesên li benda wan bû jî hatine. Serxwebûn, merheba da wan, hev ramûsîn û şûnde bi hev re li ser sifreyê rûniştin. Xwarina xwe xwarin û şûnde.
"Em biçin odeyeke din, em ji bo sibê biaxivin."
Ji bo wê milîs ew girtin birin odeyeke ku kes tê de tuneye. Piştre bixwe derket derve û ew bi tenê hiştin. Her sê li ser koltuxan rûniştin û Serxwebûn dest pê kir.

## Me Jî Xwe Daye Vî Karî

“We îro jî hedef şopandin, ango her roj diçin û tên.”

Ciwanê qelew û kinik, ev kes hê bi temenê xwe pir ciwan bû, lê belê pora wî, di nîvê serê wî de weşiya bû. Meşka wî jî gelekî xwe berdabû. Pora wî zer û gustîlok bû. Rihê wî yê sê-çar rojî bûn. Çavên wî kesk bûn. Cilên sportîf li xwe dikirin. Bi hewayeke ji xwe razî; bi dest axaftinaxwe kir.

“Erê, heval wek ku we ji me re gotibû; ev çar-pênc roj in, em her roj di cihên cuda de wan dişopînin. Roja şemî û yekşemê jî diçin û tên.”

“Erê, sibê jî biçin bişopînin, cihê ku heval şevekê lê bimînin û cihê ku di kêmînê de lê bidin, divê em baş bihesibînin.”

Ciwanê din, li pêş Serxwebûn rûniştibû. Ev ciwan ji yê din hê dirêjtir û bêtir li ser xwe bû. Dirêj û rengê xwendevanan dida, axaftinên xwe bi hilbijare dianî ser ziman.

“Heval, hinek cî hene. Hûn bi çavên xwe bibînin hê baştir e. Sibê dema em biçin, hûn ê li ser wan deran nêrînên xwe jî bêjin. Ji bo ku heval bisekinin, kêleka Dijle erênî ye. Gel diçe wir seyranê, ji ber wê jî sekna hevalan jî yê balê nekişîne. Ew cî cihê zanîngehê ye. Cihê em difikirin ku heval lê bidin jî, nêzî wir e. Hemin hûn baştir dizanin. Li gorî mantiqê leşkerî, cihê ku em dibêjin, dibe ku ne erênî be. Dema hûn bibînin hûn ê nêrînên xwe bînin ziman.”

“Temam, em ê sibê biçin temaşe bikin. Heke erênî be, em ê li gorî wê biçin plansaziyekê; neyînî be jî, em ê li hinek cihên din temaşe bikin. Divê heta demjimêra dawî tiştek neyê serê hevalan, ji ber ku me hemû dema xwe daye ser vê çalakiyê. Sibê di demjimêr dehan de, em ê biçin cihê ku hûn dibêjin. Bila tu neyîniyek dernekeve, ji ber ku di Amedê de sekna min zêde ne baş e.”

Ciwanê qelew: “Na, heval ji aliyê me ve neyîniyek dernakeve.”

Li ciwanê dirêj meyze kir.
"Ne wiha ye?"
"Erê heval, me jî xwe bi her awayî daye vî karî, heta em jî dikarin bi hevalan re têkevin çalakiyan. "
"Na, heke ji aliyê we ve pirsgirêk nebe, ji aliyê min ve jî tune. Dibe ku ji aliyê dijmin ve hebe. Divê li gorî wê jî em hişyar bin. Ji bo tevlîbûna çalakiyê jî, hûn li ser nefikirin. Karê me daye pêşiya we, hûn bikin, wek ku hûn tevlî çalakiyê bûbin."
Çaya wan li ber wan sar bûbû, hê kesî şekir jî neavêtibûyê. Dema axaftinên wan qediyan.
Ciwanê qelew: "Tu! Çaya me jî sar bûye."
Piştî axaftina xwe, şekir avêt çaya sar, tevda û di qurtekê de bi ser xwe de kir.
Wê demê rabûbûn ser xwe.
Ciwanê dirêj: "Çaya sar venexwe, em ê li hundir yeke din bidin çêkirin."
Rabûn û çûn odeya din. Piştî ku çayeke nû vexwarin, her du ciwan rabûn çûn.

## Ev Der Guncaw e

Serê sibê zû, hê xwediyê malê ranebûbû, Serxwebûn ji ber fêrbûnê zû rabibû, di pencereyê de li kolan û li malên li derdor meyze dikir.
Milîs rabû ku Serxwebûn rabûye û li ber televizyonê rûniştiye.
"Yaw, ji xwe re heta nîvro rakeve, jixwe hûn qet têr ranakevin."
"Em hîn bûne, em nikarin serê sibê rakevin. Hûn jî tam fêrî keyfiyetê bûne. Li çiya, heta niha me du çay vexwaribûn. Li vir heta niha hûn hemû di xew de ne. Heta demjimêreke din jî hê çaya we çênabe. Niha dê ew ciwan werin.

Li ser wê milîs çû çayek da ser, taştê amade kir. Banî zarokên xwe jî kir, bi hev re taştê xwarin. Piştî taştê dîsa li televizyonê temaşe kirin. Dema her du ciwan hatin, Serxwebûn nehişt têkevin hundir. Xwe bi wan re berda jêr, li texsiyê siwar bûn, berê xwe dan ser ava Dijleyê, cihê ku jê re hatibû gotin. Dema ku hatinê, ciwanê dirêj.
"Heval, ê heval li vir bisekinin, ev der balê nakişîne. Va ye gel ji niha ve hatine seyranê. Zarok jî tên li vir mangeyên (çêlek) xwe diçêrînin. Erazî girêdayî zanîngehê ye."(Bi destê xwe fekûlte destnîşan kir.)
Ciwanê qelew: "Em ê ji hevalan re Sebze, goşt û rijiyê (komur) jî bînin; bila heta demjimêra çalakiyê xwe mijûl bikin.
Serxwebûn: "Temam, ev der ji bo seknê baş e. Niha jî cihê ku em ê di kemînê de bisekinin bibînin. Ji ber pirê bi rê ketin, di ser pirê re derbas bûn û çûn ber texsiyê. Ji wir hatin ber sanayiyê, cihê ku dê li dijmin bidana. Li wir jî meyze kirin. Ew der jî guncaw bû. Niha jî li benda otobûsa ku ji xwe re kiribûn hedef, divê li benda wan bisekiyana. Hê demjimêrek hebû ji bo hatina wan otobûsên ku ev heftiyek bû milîsan dişopandin.  Her dem li derdora pênc, an jî pênc û çariyekê dihatin vir.

## Dibe Em Careke Din Neyên

Ciwanê dirêj: "Ka em biçin çayxaneyê çayekê vexwin; bila çûn û hatina li vir balê nekişîne."
Her sê, bi hev re çûn li çayxaneyê rûniştin. Her sê li derve rûniştibûn, xwediyê çayxaneyê hat cem wan. Çayger yekî porspî û paniya qundireya xwe şkandî, desmala (xewlî) wî ya sor li ser milê wî yê rastê daleqandî û destê xwe di nav desmalê re dibir û tanî.
"Hûn bi xêr hatin. Çi bidime we?"
Ciwanê dirêj: "Sê çayan bide me."

Zilam baş bala xwe da wan. Ji zilam re sosret (ecêb) hatibûn. Çû çaya wan dagirt û ji wan re anî. Hingî her sêyan jî cixare pêxistibûn. Dema çayger çay danî cem wan.
“Hûn ne mirovên sanayiyê ne. Çi bû, erebeya we xirabû?”
Ciwanê qelew: “Na, heval ji xwe re texsiyeke nû kiriye, me ew anî cem hostayan li meyze dikin.”
Dem ku ev gotin; Serxwebûn nîşan da.
Got: “Li ser xêrê be.”
Dîsa çû hundirê çayxaneyê. Demek şûnde çend berdaqên çayê danîn ser bergeşê li dikanê zivirî, çend xulek şûnde vegeriya. Ji ber ku hê otobûs nehatibû, dîsa sê çay xwestin û li benda otobûsan man. Dema çaya xwe vexwarin sê heb otobûsan dabûn dûv hev û di ber wan re derbas bûn. Di hundirên otobûsan de, mirovên bi cilên leşkerî tijî bûn. Dema otobûs ji wan dûr ketin, banî çayger kirin. Ciwanê dirêj pênc hezar YTL dirêjî çayger kirin. Çayger baş bala xwe da wan, dema ku ew baş şopandin:
“Bila çay ji min be; em ê careke din heqê xwe bigirin.”
“Dibe em careke din neyên.”
“Bila ji we re xweş helal be.”
Her sê rabûn û ji çayxaneyê dûr ketin.

## Polêsan Em Şopandin

Dema hatin cem texsiyê, dîtin ku çend sed metreyî ji wan dûr texsiyeke polêsan sekiniye. Dema texsiya wan ket tevgerê, di ber wan re derbas bû, texsiya polêsan jî da pey wan û heta nava bajêr ew şopandin.
Ciwanê qelew: “Polêsan daye dûv me, dema em di ber wan re derbas bûn, ew jî ketin dûv me. Em têkevin nav taxê, bila Muslim were xwarê. Heke tiştek bû jî bila agahiyekê bigihîne hevalan.”

Serxwebûn: “Temam, em di nav bajêr de bigerin, heke tiştek nebû em ê bi şev telefonê te bikin. Heke me heta diwazdehê telefonê te nekir, bizanibe em hatine girtin. Temam.”
Wê demê ji riya giştî ketin nav taxekê, ciwanê dirêj xwe ji texsiyê avêt û hema wek ku rêwiyek be meşiya. Texsî jî wek ku qet leza xwe nebirîbe domand. Wê demê texsiya polêsan jî gihîştibû serê riya ku ew ji riya giştî ketibûn nav taxê. Texsî kêmekî li ser rê sekinî û piştre wan jî berê texsiya xwe zivirand nav taxê. Wê demê texsiya ku Serxwebûn ew tê de bûn, zivirî nav kolaneke din. Ciwanê dirêj, wek ku rêwî be ket kolaneke din, ji wir dîsa hat ser riya giştî. Bixwe ji xwe re got: “Vê carê karê me qediya.” Hema li ser rê banî texsiyekê kir, berê xwe da derveyî bajêr, ketin ser riya Çewlikê. Ji şifêr re got: “Em ê biçin Licê.”
Şifêr: “Em ê biçin nav Licê, an gundan?”
Piştî ku demekê fikirî.
“Em ê biçin nav Licê.”
Bixwe, ji xwe re got: “Heke vî şifêrî bigirin jî, bila nizanibin ez çûme kîjan herêmê. Di rê de demjimêrekê ji xwe re fikirî: Gelo çi hat serê wan? Dema gihîşt nav Licê, ji texsiyê hat xwarê, wek ku biçe malê, ket kolanekê. Dema dît ku texsî paşve zivirî, çû texsiyeke din girt û çû gund. Dema gihîşt gund, hê demjimêr nû bûbû heşt û Ziya di gund de bû. Dema çû ber malê dît ku Özgür zîrevan e.
“Kî li vir heye?”
“Hevalê Ziya li hundir e.”
Qet nesekinî ket hundir. Dema Ziya li wî meyze kir, fêm kir ku tiştekî ne baş bûye. Ew girt û derketin derve.
Ziya: “Çi bû, tiştekî neyînî heye?”
“Wele erebeyeke polêsan em şopandin, min xwe di nava kolanê de, ji erebeyê avêt xwarê. Ez wek rêwiyekî meşiyam. Piştre jî polês ketin kolana ku em ketinê, heval wê demê ketin kolaneke din; ez jî

ketim kolaneke din, piştre jî hatim Licê. Heke heta duwazdehê telefon nekin, wê demê dê hatibin girtin; heke telefon bikin wê demê jî saxlem in.
Ziya heta duwazdehê şevê li benda telefonê ma, lê belê kesî telefon nekir.
Ziya dîsa ji ciwan re got: “Sibê biçe Amedê, bûyerê misoger bike û agahiyekê bide me.”
Ziya serê sibê di derheqê bûyerê de agahî da Heqî. Roja ku Serxwebûn çûbû Amedê, birayê wî jî hatibû nuqteyê, li nuqteyê li cem hevalan bû. Heqî, di derbarê Serxwebûn de, Ziya hişyar kir.
“Bila birayê wî pê nehese, heta bûyer misoger dibe. Wekî din jî dê hemû karê me tevlîhev bibe. Bila heval jî ji devê xwe bernedin.”
Ciwanê dirêj serê sibê çû Amedê, hema çû mala ku Serxwebûn lê disekinî. Dema çû wir li derî xist, lawê milîs derî vekir, bi kelecan.
“Serxwebûn li vir e?”
Ji kelecanê negotibû, heval jî.
“Erê, ew jî li benda te ye.”
Dema ket odeyê bi merhebayê re, hema ket nav pirsan.
“Çima we telefon nekir? Ji derve em ji meraqan mirin.”
“Me zêdeyî sê demjimêran ji te re telefon kir, lê em nedigihîştin te.”
“Niha ji meraqan, heval li cihê xwe nasekinin. Birayê te jî duh hatibû, ew jî niha li cem hevalan e.”
“Te ji kesî re gotibû ez ê telefonê vekim? Temam ji gund re telefonê veke, bila yek agahiyê bide hevalan. Bila bêje: “Ew tiştên ku hûn difikirin ne wisa ye.”
“Erê, ew temam e. Di navbera me de şîfreya erênî û neyînî heye.”
Piştî van gotinan, derket şaneşînê telefonî gund kir.”
Ciwanê dirêj: “Duh çi bû, heta ku hûn şopandin?”
“Kolana ku tu ji texsiyê hatî xwarê, piştî wê em neşopandin.”

“Temam, cihê ez hatim xwarê, hûn jî ketin kolaneke din. Ew jî li serê kolanê sekinîn, piştre ketin kolanê, hingî min got: vê carê her tişt qediya. Ji bo wê jî ez hema çûm gund. Dema we telefon jî nekir, min tam bawer kir.”
“Temam, niha divê em îşev ji bajêr derkevin. Bila texsiyek di pêş de biçe, em jî li pey biçin.”
Êvarê hê tarî nebûbû, her du texsî jî ji nav bajêr derketin ûberê xwe dan Licê. Texsiyek ji bo rê qontrol bike, çend xulekan di pêş de diçû. Heta ku gihîştin cihê xwe, di rê de tu lêgerîn nebû. Dema gihîştin gund, demjimêr bûbû heftê êvarê. Ziya li gund, li benda wan bû. Demekê li gund rûniştin, piştre çûn nuqteyê.

## Divê Em Destê Xwe Zû Bigirin

Serê sibê Heqî banî rêveberiyê kir. Serxwebûn di derbarê keşfê de agahî dan rêveberiyê.
Heqî: “Jixwe heval jî dizanin; me hevalê Serxwebûn ji bo keşfekê rê kiribû. Kêmek agahî dan me, lê belê bila di civîna rêveberiyê de jî, di derbarê keşfê de bi giştî nêrînên xwe bîne ziman.”
Serxwebûn: “Heval, em li ser bingeha keşfekê çûnbûn, keşif erênî ye. Hem cihê ku em lê bidin, hem jî cihê ku heval lê bisekinin. Me hemû der dît. Em bixwe çûn, me lê temaşe kir. Roja ku em çûn, me keşif kir, sê heb otobûs hebûn. Herhalde ev diçin perwerdeyê. Serê sibê diçin derveyî bajêr, êvarê di demjimêr pêncan de dîsa vedigerin. Hundirê wan otobûsan tijî leşker bûn. Carinan jî du otobûs in, ewlekariya wan jî tuneye. Wek zirîpoş an jî hwd. tiştek wan naparêze. Cihê ku dê heval bi şev û bi roj lê bisekinin, li kêleka ava Dijleyê ye. Dema demjimêrek ji çalakiyê re bimîne, divê mirov wan bîne cihê çalakiyê. Cihê çalakiyê jî, nêzî sanayiyê ye. Li derdora rê kevir jî hene. Mirov dikare wek kozikan jî bixebitîne.

Mirov piştî çalakiyê, hema zû dikare ji wir derkeve. Ji wî aliyî ve jî tu pirsgirêkek tuneye. Jixwe dê texsî nêzî wan bisekine.”
Heqî: “Temam, hevalê Serxwebûn di derbarê keşfê de agahî dan. Bila heval jî nêrînên xwe bidin xwiyakirin.”
Ziya: “Heval, di derheqê keşfê de, ez tiştekî nabêjim. Ez dibêjim; erênî ye. Ev çalakî, hem ji bo eyaletê, hem jî ji bo rêxistinê dê baş bibe. Jixwe rêxistinê pêngaveke nû daye destpêkirin. Divê em eyalet jî, qad jî tiştê têkeve ser milê me, em pêk bînin, ji bo pêngavê jî em rista xwe bilîzin.”
Yaşar: “Ger tiştê hevalê Serxwebûn dibêje wisa be, divê em vê bernedin û zû destê xwe bigirin. Tiştekî wisa dibe ku êdî nekeve destê me.”
Soro: “Ez jî tevlî hevalan dibim. Ev çalakî di nav Amedê de were kirin, ê dijmin dîn bike. Ji vir û şûnde, ne bi çalakiyên bi vî awayî be jî, zû bi zû dijmin nayê rê. Ez dibêjim; em ji niha ve têkevin nav amadekariyan.”
Heqî: “Temam, bi giştî nêrînên hevalan ew e ku ev çalakî bibe. Lê belê ez dibêjim, em dîsa biçin keşfeke din jî bikin. Heta hevalên din jî bên û heta em hevalên din jî li ser çalakiyê adepte bikin, bila dîsa hevalek biçe keşfê. Ji bo texsiyê jî, em texsiyeke normal bikirin. Bila heval bi vê texsiyê biçin û bi vê texsiya me bi paşve bikişin. Hevalê Soro jî, bila ew li ser amadekariyên hevalan bisekine. Ku wilo bi narincokan têkevin nav otobûsê, dê otobûsê bi temamî xira bikin û bila agir pê bikeve, hemû tê de bişewitin. Yên ku derketin jî, bila wek mirîşkên gêj hemû bikevin. Em ê piştre jî wilo guftûgoyan bikin. Bila heval îro, li ser hevalên ku biçin çalakiyê bisekinin. Hevalên ku biçin çalakiyê, em wan jî zelal bikin. Heval li ser vê dibêjin çi? Hevalê Ziya tu çi dibêjî?”

“Ez dibêjim; bila berpirsiyarê giştî Serxwebûn be. Alîkarê wî û yê ku li cem heval be, di lêdanê de bikaribe fermandartiyê bike, bila ew be.”
Wê demê Soro destûr xwest.
“Yê ku di lêdanê de fermandartiyê bike, divê yekî xwedî ezmûn be. Bila fermandarê giştî hevalê Serxwebûn be; hevalê Cîger jî bila li ser yekeya çalakiyê fermandar be. Hevalê din jî bila yek Rizgar be. Hevalên din jî, heval dikarin nêrînên xwe bêjin.”
Ziya: “Heval, heke em banî hevalê Cîger bikin, divê hevalek jî pê re were. Ez dibêjim, bila Welatcan jî pê re were. Yek jî, ew tevlî çalakiyê bibe. Ji vê herêmê jî, bila hevalê Cûdiyê Kobanê be.”
Heqî: “Heval ji bo çalakiyê, çar heval bes in, bila hevalê Taylan jî şifêr be. Hevalê Serxwebûn jî, dibin şeş heval bes in. Bila hevalê Taylan û Serxwebûn, ev nekevin çalakiyê. Bila hevalê Serxwebûn bi telefonê, hatina otobûsan ji wan re bêje, hem jî berpirsiyarê çalakiyê be. Bila piştî çalakiyê, hevalê Taylan jî, hevalan bi texsiyê bigire û ji wir derxe. Hem jî çalakiyê bikişîne qamerayê. Ji bo çalakiyê jî; Cîger, Rizgar, Cûdî û Welatcan. Ev heval temam in. Yê ku bêje, ji van kes nabe, heye?”
Kesî dengê xwe nekir. Li ser wê dîsa gotinên xwe domandin.
“Temam, heke kes tiştekî nebêje, ev heval temam in. Em îro banî Cîger wan jî bikin, bila ew jî werin. Em bi wan re li ser çalkiyê guftûgo bikin; wan amade bikin.”

## Amadekariyên Dawî

Piştî civîna rêveberiyê, dema mûhabereya eyaletê, Ziya bi cîhazê şîfre dan Cîger. Soro jî, ji bo ku heval di çalakiyê de bi kar bînin, narincokên ji C-4’ê pêk tên çêkirin. Ev narincok ji boriyên avê çêkirin. Destê mirov, li van narincokan nedihat hev, herî kêm dused û pêncî giramC-4 dikete van boriyan. Ji bo bandora wan

zêde be, di boriyê de bi ispiralê herî kêm bêtirî çil xetî çêdikir. Tevî giraniya borî û C-4’ê giraniya narincokê, bi qasî nîv kîloyî giran bûbû. Ziya, ji bo ku hevalan rê bike Amedê, dîsa banî milîsan kir. Li ser bingeha ku heval biçin hedefê baş nas bikin; dubare keşfê bikin. Ji bo texsiyekê jî bikirin, divê bi wan re bibe alîkar, bi milîsan re axivî. Karê milîsan li ser wan parve kir û piştre ji gund derket.

Bû roja din, Serxwebûn û Taylan ji bo bi hev re biçin bajêr, riha xwe jê kirin, xwe paqij kirin. Taylan, simbêlên xwe yên ku nirxeke mezin dida wan, ji bo çalakiyê jê kirin. Qama Taylan kurt bû, lê belê simbêlên xwe yên gur berdidan, ji ber wê carinan hevalan henekên xwe pê dikirin. Jê re digotin: “Hiseynê çayger.” Yê ku di rêzefilmê tirkan de dilîst. Carinan dema banî wî dikirin digotin: “Çaylar” Wî ji bo vê çalakiyê simbêlên xwe birîn. Piştî nîvro, ew û Serxwebûn çûn gel texsiya ku ji derveyî gund li benda wan bû. Lê siwar bûn û çûn Amedê. Wê êvarê Cîger û Welatcan jî hatin xwe gihandin wan. Dema ku Ziya sedema banîkirina wan got; Cîger jî got:

“Way, ma bê Qember hûn çawa diçin dawetê.”

Piştre dema Cîger got: “Min bîksî jî bi xwe re aniye.”

Ziya li ser vê aciz bû.

“Kê ji we re gotiye, bîksiyê bînin.”

“Te got. Te di şîfreyê de bîksî da. Me jî ji bo wê anî. Ne werga ye hevalê Welat?”

“Nizanim. Te li şîfreyê meyze dikir û te got; heval bîksiyê dixwazin.”

Ziya li ser vê got: “Temam e, heval temam tişt nabe. We aniye, hûn ê dîsa li xwe bikin bar û bibin.”

Wê demê, Heqî banî Ziya, Soro û Yaşar kir.

“Ez dibêjim, bila ev hevalên zêde îşev biçin. Em jî, bi van hevalên ku biçin çalakiyê re biaxivin. Hevalê Ziya, ji bo yê ku texsiyê bikirin, te banî kir?”
Li ser vê Ziya got: “Erê. Heval ew ê îşev were.”
Heqî: “Temam, bila hevalê Yaşar û ev hevalên din jî biçin Hêgasor. Dibe ku li wir tevgera dijmin hebe, heval lê bidin lêhûrbûna dijmin bikişînin wî aliyî.”
Li ser vê Yaşar, Harûn, Rêzan, Botan, Cotkar û Zinar dema ku êvarê ji wan qut bûbûn, ji ber ku ê bîksiyê kî rake, kêmekî acizî çêbû. Harûn ji Zinar re got: “Tu yê bîksiyê rakî keleşa xwe deyne.” Dema Zinar nepejirand, li ser vê acizî çêbû. Jixwe Baran ji ber ku tevlî çalakiyê nebûbû, ew jî bi Özgür re li cem Heqî mabû. Li ser vê Harûn bîksî rakir û çû Hêgasor.

## Ji Bo Bizivirim Jî Nehatime

Ziya û Özgür jî, ji bo yê ku erebeyê bikire banî kiribûn, çûn gund. Dema çûn gund, kesê ku banî kiribûn li benda wan sekinîbû. Ev kes keçeke ciwan bû; çend roj berê ji bo tevlîbûnê hatibû. Ji ber ku bavê wê, ji aliyê dijmin ve hatibû qetilkirin û birayê wê jî di gerîlatiyê de li bajêr hatibû girtin, ew kes şûnde şandibûn. Dema ku ji bo çalakiyê texsiyekê pêwist kir, ji bo kirîna texsiyê dîsa banî wê kiribûn.
Dema Ziya ket hundir, dît ku li ser qoltixê rûniştiye. Berê merheba da xwediyê malê, piştre merheba da wê û jê re got:
“Tu hatî?”
Wê jî bersiv dayê:
“Erê ez hatim.”
Ziya: “Çima tu bi cilên dibistanê hatiyî?”

“Nizanim. Ez ji dibistanê dizivirîm, min dît ku heval hat pêşiya min. Got;’Heval banî te dikin.’ Ez jî hema wisa hatim”
Ziya: “Temam. Jixwe em ê dîsa te bi şûnde bişînin. Te nasnameya xwe aniye?”
“Na, min tiştek neaniye, ji ber ku ez şûnde bizivirim jî, ez nehatime! Wele xweş e, du rojan carekê bi xebera malê were û dîsa biçe. Ez naçim!”
Li ser vê, Ziya ji xwediyê malê re got:
“Tiştên ku tê de biraze bidinê, êdî ew jî dê bibe gerîla.”
Vegeriya wê.
“Xebera hevalên stî ji te tune, lê dîsa jî em ê insiyatîfa xwe bidin şixulandin.”
Ji bo wê, yê ku ew anîbû, Ziya vegeriya wî:
“Tu sibê texsiyekê ji ku tînî bîne, biçe yekê bibîne, bila heta du rojan li vir be.”
Piştî ev gotin, ji gund derketin.

## Ew Ji Bo Çalakiyê Amade Dikirin

Harûn ew, di bin barê giran de, heta gihîştin Koycahîd, bûbû nîvê şevê. Ji jêr di ser wî barê giran de, her kesî du pet jî av rakiribûn. Her çiqasî erzaqê wan û nanê wan têrî wan dikir jî, Harûn dîsa jî nîv kîs arvan jî dabû pişta Cotkar. Ji ber ku di navbera Harûn û Zinar de acizî derketibû, hevalan êdî nedixwestin tiştên Harûn dibêje vale derxînin. Ji bo wê barê ku pêwîst nedikir jî dabûn pişta xwe.
Milîs, serê sibê texsiyeke modela wê kevn ji wan re anî. Li ser wê hevalên ku tevlî çalakiyê bibin, hevalê Heqî ji bo wan adepte bike, ji wan re civîn çêdikir; bi wan re diaxivî. Ji bo wan li ser hedefê kilît bike, bi wan re guftûgo bi pêş dixist.

Dema êvarê Serxwebûn û Taylan ji Amedê hatin, gotin: "Her tişt temam e."
Roja din hevalên ku tevlî çalakiyê bibin, hemûyan amadekariyên xwe kirin.
Dema ku heval hê bi rê neketibûn Heqî:
"Hevalê Ziya, em îro dema mûhabereyê banî hevalê Yaşar wan bikin. Em jî biçin Ş. Remzî."
Yaşar ew, derketibûn serê Cahîdê û qereqola Hêgasor xistibûn bin venêrînê (denetim). Dema tevgereke dijmin bidîtana dê ev tevger binirxandana. Dema nîvrokî ji bo wan anons hat kirin; ev yeke hemû aciz bû. Ji bo çi du rojan hatibûn vir û di anonsê de digotin: "Li derveyî nuqteyê dijmin jî heye."

## Sekna Li Ber Difina Dijmin

Dema ku yekeya çalakiyê ji bo biçe Amedê, dijmin di erazî de bû, lê wan dîsa jî karê xwe nedabû sekinandin. Bi du texsiyan di nêzî wan re derbas bûn, çûn Amedê.
Dema gotin, dijmin di erazî de heye, Harûn wan jî dûrbîn avêtin erazî. Piştî demeke dirêj, dijmin li jêr gundê Xiraba dîtin. Bi roj xwe ji Cahîdê berdan û çûn li ser riya wan kemîn danîn. Dema di kemînê de rûniştin, êdî tam tarî bûbû.
Heqî ew jî li nuqteyê li benda wan bûn. Ji bo ku biçin Ş. Remzî amade û li benda wan bûn.
Dema yekeya çalakiyê kete Amedê, hê tam tarî nebûbû; ketin ser riya fakulteyê. Dema ketin ser riya ku pir tê xebitandin, carinan bi lez diçûn, çarinan jî xwe li riya rêwiyan didan, ew jî ji neçarî leza xwe kêm dikirin. Du keç li kêleka rê sekinîbûn, dema lembeya sor pêket, Taylan hema erebe sekinand. Keçekê hema xwe li rê xist, hevala wê:

“Bisekine, erbeyê derbas meke.”
Keçika din got: “Dê zû, ma erebeya wan jî, erebe bûya?”
Xwe li rê xist û derbasî aliyê din bû. Dengê vê gotinê hatibû Cûdî. Dema lembeya kesk pêket, erebe kete tevgerê.
Cûdî: “We bihîst, keçikê çi got?”
Rizgar: “Çi got?”
Got: “Erebeya wan jî erebe bûya.”
Taylan: “Dengê wê bihata min; min ê ji re bida nîşandan ka çi erebe ye!”
Welatcan: “Wê zanîbûya kî di texsiyê de ne, ka dikarîbû biaxiviya. Herhalde gotiye, dibe ku ev sûtalên Amedê bin.”
Bi tarîtiyê re gihîştin ber ava Dijleyê. Serxwebûn bi Cîger re çû, ji bo dema otobûs hat di telefonê de jê re çi bêje, bi hev re misoger kirin. Bi hev re çûn cihê ku yekeya çalakiyê şevekê lê derbas bike. Dema hemû çûn wir, Serxwebûn:
“Hûn îşev bi van tiştan debara xwe bikin, em ê serê sibê zû ji we re erzaqê seyranê bînin. Jixwe ev der ji kesên ku tên geştê tijî dibe, hûn ê jî wek hatibin seyranê tevbigerin. Ji dema çalakiyê re demjimêrek bimîne, em ê we bigirin.”
Piştî wê milîs, Serxwebûn û Taylan ew ji wir çûn. Cîger, Rizgar, Welatcan û Cûdî li ber ava Dijleyê, li kêleka fakulteyê man. Ji ber ku li ber avê bûn û cilên li xwe kiribûn cilên havînê bûn hê êvarê ji serma dilerizîn.
Cûdî: “Niha dijmin li serê çiyayan li me digere, em jî hatine ber pozê wan. Bizanibe em li vir in, ew ê hemû polês û leşkerên Amedê wek ku li ser Ş. Brûsk û Ş. Ciwan kom kiribûn, ê li ser me jî kom bikin. Çenteyên xwe yên ku narincok û çeka wan tê de bûn, hemû li cihekî kom kirin. Ji sermayê nikaribûn li cihê xwe bisekiniyana. Hemûyan xwe di ber hev re, li ser erdê dirêj kirin û çenteyên çekên xwe dan ber serê xwe.

Cîger: “Heval, em nobeta xwe bigirin, ev der Amed e, çi dibe çi nabe ne diyar e.”

## Me Dikarî Vê Nuqteyê Jî Bidin

Heqî wan, ji bo çûnê hemû amadekariyên xwe kiribûn. Lê dema Yaşar ew nehatin, dîsa li nuqeyê man. Heqî ji ber vê nêzîkatiya wan bi hêrs bûbû.
Yaşar ew, heta demjimêr bûbû duwazdehê şevê di kemînê de, li benda dijmin mabûn. Piştre ji cihê kemînê çûbûn biniya Zixir. Serê sibê zû, ji xew şiyar bûn, keşfa xwe kirin, dema ku tiştek nedîtin, ji xwe re çay çêkirin. Piştî ku çaya xwe vexwarin, bi roj ketin rê, çûn cem Heqî wan. Dema gihîştin wan, êdî dema mûhabereyê hatibû.
Heqî: “Hûn li ku man?”
Yaşar: “Me dijmin dît, heta me xwe berda em hatin nêzî wan, êdî tarî bûbû. Me jî kemîn avêt pêşiya wan, lê nehatin.”
“Yaw heval, ma me ji bo çi ew nuqte da we? Em ê biçûna Ş. Remzî. Ma we negot: ‘Heval çima vê nuqteyê didine me?’ Me dikaribû vê nuqteyê jî bidine we. Temam, tişt nabe. We karê me rojekê dereng xist; em ê îro biçin.”

## Bila Dûman Bike

Ji serma, heta serê sibê, xew neketibû çavên yekeya çalakiyê. Dema serê sibê rabûn, gel jî hêdî hêdî dihat ber avê. Ew kesên ku hatibûn, hemû zarok bûn. Mangeyên (çêlek) xwe, dabûn pêşiya xwe û hatibûn. Dema zarokan ew dîtin, ji dûr ve bi tirs, li wan temaşe dikirin; newêrîbûn xwe nêzî wan bikin. Ji wan dûr, bi qîr û bi dengê bilind, ji xwe re dilîstin.
Wan jî ji xwe re, dar kom kirin. Dema agir dadan, Cûdî:
“Divê em îro agirekî bi dûman, bikin. Hema hemû daran bavêjin ser hev, bila dûman bike.”

Çend xulek neketin navberê,Taylan ji wan re goşt, rijî, şîş, sewze, kola û tiştên ji bo seyranê pêwîst, her tişt anîbû. Jixwe re kebap çêkirin û xwarin. Piştî nîvro.
Cîger: “Hevalê Taylan, ez û tu, em biçin cihê ku em ê çalakiyê bikin, em meyze bikin; em jî bibînin. Dê dema çalakiyê hê baştir bibe.”
Li ser vê, Cîger û Taylan çûn cihê çalakiyê geriyan. Piştre.
“Her em hatine, qet nebe em kêmekî li Amedê jî bigerin. Em hinekî ji xwe re, bi texsiyê hin tûran bavêjin.”
“Hevalê Cîger, heke piştre tiştek bibe, em nikarin di bin vê berpirsiyariyê de rabin.”
“Yaw, ma ew ê çi bibe?”
Li ser vê, Taylan ew neşkand û bi texsiyê di Amedê de tûr avêtin.

## Bavê Min Jî hez Ji Polêsan Nake

Hevalên din jî li ber avê, ji xwe re seyran dikirin. Dema êdî ji çalakiyê re du demjimêr man, goştê xwe hemû di şîşan re kirin, selateyek çêkirin û banî hemû zarokên ku hatibûn ber mange û bizinan kirin. Wan jî dîtibû ku zarokan, heta wê demê tiştek nexwaribûn. Heft zarok bûn. Cûdî, ji hemûyan re goşt xist nav nan û da wan. Hemûyan ji aliyekî ve nanê xwe dixwarin, ji aliyekî din ve jî di bin çavan re, li wan meyze dikirin. Rizgar, Cûdî û Welatcan, ji mêvanên xwe re bi dil û can xizmet dikirin. Yekî ji wan re goşt dikir kebap, yekî selate çêdikir, yekî jî ji wan re kola dadigirt.
Cûdî: “We ji serê sibê ve qet nan nexwariye. Ne werga ye?”
Zarokê di nav zarokan de, bi temenê xwe mezintir, yekî yazdeh-duwazdeh salî bû. Yekî qemer û awirên wî tûj bûn.
“Na, me nan nexwariye.”
“Çima we nexwariye, dê û bavê we, li we meyze nakin?”

“Dikin.”
Rizgar: “Navê te çi ye?”
“Navê min Mezlûm e. Hûn pir baş in. Ên din nahêlin mirov biçin nêzî wan jî. Ji mirov diqehirin.”
Cûdî: “Em ne baş in. Tu ji ku dizanî, em baş in. Dibe ku em, we dixapînin. Heke em, we hemûyan birevînin û we bifiroşin, hûn ê çi bikin?”
Wê demê, Welatcan bi zarokekî herî piçûk girt û ew rakir hewa.
“Ez vî yê han bifiroşim.”
Zarok hema giriya. Welatcan ji bo ku zarokî aş bike, ew maç kir û ew rakir hewa.
“Ez henekan dikim.”
Cûdî: “Em polês in, ji bo wê em baş in.”
“Na hûn ne polês in, hûn polês bûna, we yê li me xistibûna.”
Rizgar: “Çima, ma polês li mirovan dixin?”
“Erê, carekê bavê min girtin, zaf lê dabûn. Ji bo wê bavê min ji polêsan hez nake. Ez jî ji bo wê ji wan hez nakim.”
“Bavê te tewan kiriye, ji bo wê polêsan lê daye. Polês baş in. Bavê we ne terorîst in? Rast bêjin.”
Hemûyan bi hev re got: “Na, bavên me ne terorîst in.”
Çi kirin, nekiribûn başiya polêsan, bi zarokan bidin pejirandin, nikaribûn bidin pejiradin.
Mezlûm: “Hûn kî ne?”
Cûdî: “Çima?”
“Min pirsî, hûn ne mirovên wek yên li vir in.”
“Em xwendevan in. Bi destê xwe fakulte destnîşan kir. Em li wir dixwînin. Îro dibistan nebû, ji bo wê jî em hatin geştê.”
Dema ku zarok ji cem wan çûn, her sêyan zarok maç kirin, zarok bi dilşadî ji wan qetiyan.

## Plansaziya Xiniziyê

Dema demjimêr bû çar, Taylan û Cîger ji gera Amedê hatibûn cihê çalakiyê.

Taylan: “Em biçin cem hevalan, wan jî bînin. Heta em biçin û werin, hema hema ê wext temam bibe.”

“Temam, tu biçe wan bigire û were. Ez ê li çayxaneyê bisekinim, pêwîst nake ez jî werim. Bila heval tiştekî ji bîr nekin. Tu kêmek pere jî bide min. Dibe ku çayekê vexwim.”

Taylan du YTL û nîv dan Cîger. Ji wî qetiya û çû cem Rizgar wan. Dema pir derbas kir, xwest têkeve riya ku diçe cem wan, dît ku rê girtine. Ji texsiyê peya bû û çû rê vekir. Piştre dîsa rê domand. Dema çû cem wan, wan jî xwe amade kiribû.

Cûdî: “Hevalê Taylan, hevalê Cîger li ku ye?”

“Ew li cihê çalakiyê, li benda me ye.”

Hemûyan bi hev re çenteyên xwe girtin û çûn ber texsiyê. Çenteyên xwe avêtin paşiya texsiyê, Taylan û Rizgar li pêş siwar bûn, Cûdî û Welatcan jî li paşiyê siwar bûn. Dema hatin ber pirê.

Taylan: “We dît, alçaxan dîtin ku em di ver re ketin vir. Hatine rê girtine. Ev der girêdayî zanîngehê ye, nahêlin erebe têkevin vir.”

Ketin ser riya esfaltê. Taylan lez da texsiyê. Dema gihîştin senayiyê, demjimêr bûbû çar û nîv. Taylan li ber dukanekî, texsî da sekinandin. Çû li Cîger meyze kir, Cîger di çayxaneyê de nebû. Derket derve, li derdora xwe meyze kir, lê belê Cîger nedixwiya. Dîsa hat cem hevalê xwe.

“Min, hevalê Cîger nedît.”

Welatcan: “Ma negot, ez li ku me?”

Got: “Ez diçim çayekê vedixwim. Heta tu hevalan tînî.”

Rizgar: “Ka em biçin lê bigerin. Hê bîst xulek mane ku otobûs werin.”

Dema hemû çûn li Cîger geriyan. Serxwebûn jî çend xulekan ji wan dûrtir sekinîbû. Dema otobûs bihatana dê agahî bidana wan.
Hemû bi hev re, li derdora cihê ku çalakiyê bikin, li Cîger geriyan. Dema ji pêncan re deh xulek man, hemû hatin ber texsiyê. Kesî Cîger nedîtibû.

## Em Zû Ji Vir Derkevin

Taylan: “Ez ê biçim, kêmekî li jêr bisekinim. Dema hevalê Serxwebûn telefon kir, ji we re çi got, hûn ê li gorî wê tevbigerin.”
Çente ji texsiyê derxistin, xwe dan kêleka rê. Taylan jî, xwe çend sed metreyan ji wan dûr xistibû û di texsiyê de qamera vekir. Berê wê da cihê ku hevalên wî lê sekinîbûn. Riya esfaltê hemû girtibû nav qamerayê. Piştre qamera girt û li benda otobûsan sekinî.
Dema demjimêr bû pênc û pênc xulek, otobûs gihîştin ber Serxwebûn. Serxwebûn hema telefon kir.
Dema telefonê lêda, Welatcan telefon vekir. Cûdî jî devê çenteyan vekir û di ber çenteyan de rûnişt. Dema Welatcan telefon vekir, dengê Serxwebûn bihîst.
“Ma Cîger nehatiye?”
“Çima?”
“Nizanim.”
“Ew tiştên me digotin hatin.”
“Çi? Dengê te fêm nabe.”
“Ew ê me digot.”
Cûdî: “Dibêje çi?”
“Fêm nabe. Tiştekî dibêje, lê.”
Dema Taylan otobûs dîtin, hema qamera vekir. Berê eyarên qamerayê çêkiribûn; ango qamera amade kiribû û li benda lêdanê ma.”

Dema otobûs di ber Welatcan re derbas bûn, Welatcan hê bi telefonê diaxivî û ji hev fêm nedikirin.
Dema otobûs gihîştin Taylan, Taylan bi hêrsekê texsî ajot û çû cem wan.
“Çima we lê neda? Otobûs ev bûn.”
Welatcan: “Nizanim. Di telefonê de Serxwebûn tiştek digot, me fêm nekir.”
“Temam, ka em biçin.”
Cûdî: “Cîger?”
Rizgar: “An reviyaye, an jî hatiye girtin. Em zû ji vir derkevin.”
Hema çente avêtin texsiyê û ber bi Serxwebûn ve çûn. Dema çûn cem Serxwebûn.
“Çima we lê neda?”
Welatcan: “Cîger naxwiyê. Me jî di telefonê de, ji te fêm nekir.”
Rizgar: “Em ji vir derkevin, dibe ku reviyabe.”
Bi milîsan re li texsiyê siwar bûn û ji wir dûr ketin.


## Sibê Her Tişt Bihata Fêmkirin

Heqî, Soro û Yaşar ji bo ku biçin Ş. Remzî ketin rê. Bi wan re Cotkar, Baran û Özgür jî diçûn. Heta demjimêr pêncan sekinîn, piştre ketin rê û çûn.
Ziya û hêzên herêmê jî, ji ber ku cebilxane hatiye ku veşêrin, çûn cihê rendevûyê. Ziya, cebilxane da Rêzan û Zinar wan cebilxane birin veşartin. Dema her du ji bo hevdîtinê çûn gund, çend xulek şûnde du texsî ketin gund. Hevalên çûbûn çalakiyê zivirîbûn. Dema Ziya û Harûn çûn cem wan û şûnde, Harûn dîsa zivirî.
Zinar: “Çi bûye?”
“Cîger reviyaye. Tu û Rêzan biçine nuqteyê.”
Dema ew gihîştin nuqteyê, piştî wan çend xulekên din, Rizgar, Welatcan û Cûdî jî hatin nuqteyê. Zinar wek ku ew nebihîstine

tevgeriya; xwe li xewê danî. Ji ber ku ew ê sibê her tişt, di fermiyetê de bihata fêmkirin.
Rêzan û Baran jî wek wî tevgeriyan.

# ÖZGÜR RONÎ'LEŞEN ŞİİRLER






# XWEDAVENDA GORSÊ

Gorsê çiqas xweş bû
Bi xweşikbûna te
Asêbûna te wek asêbûna Gorsê bû
Tu bi Gorsê, Gorsê jî bi te
Xweş û geş bû

Çiqas jî hûn dişibiyan hev
Ji we hêz digirt mirov
Şa dibûn bi sekna we
Êdî dengê kenê te nayê ji nav Gorsê
Dar bi dar, kevir bi kevir

Êdî kes jê hez-na-ke wek dergûşekê
Niha sêwî maye bê te Gorsê

Ka xwedavenda rûbiken
Ka fermandara dilgerm
Şêra çiya, baza ezmanan
Baweriya hevalan

Îro Gorsê bê xwedavend e
Îro Gorsê bê deng e
Bê şêr û bê baz e
Ka Gorsêya bi kêf û coş
Bi şox û şeng, bi hêz û hêrs

Îro bê deng e Gorsê
Bê xwedavend e, xemgîn e
Jar û hejar e
Çahvên wî li rêya te ye
Bê te, bi xem û bar e
Bê evîn û hêz e

Berê Gorsê çiqas xweş bû
Bi xweşikbûna te
Bi kêf û eşqa te
Bi hêz û baweriya te
Bi sekn û helwesta te
Bi hêrs û rika te

Gorsê bi te Gorsê bû
Zêde bilind û asê bû
Warê hevaltiyê kelha berxwedanê bû
Tirs û xofa dijminan bû

Îro Gorsê bê xwedavend e
Çavên wî li rê ye, dilê wî xemgîn e
Jar û perişan e
Bê hêz û bê taqet e
Bê bawer û bê kes e

Ey xwedavenda Gorsê
Gorsê hê li benda te ye
De zû were, gorsê xweş, geş
û şa bike

**Ji Bo Bîranîna Sema Mabata**
**15. 05. 2009, Gorsê**




# ÇEND KES BÛN

Bêje yên ku te di oxira wan de
Şer kir û canê xwe da
Te çend kes nas dikirin
Te çend kes dîtibûn
Te çend kes bihîstibûn
Bejê çend kes bûn…

Çend kes hatin, te bi rê bikin
Çend kes giriyan li dûv te
Çend kes di dilê xwe de
Rika te mezin kir

Ji vê axê çend kes derketibûn
Wek te, an jî tu wek wan
Çend kesan xwe fedayê wan kiribûn
Ji bo wan

Çend kes bûbûn şervanên rûmetdariya wan
Ji vê axê çend kesên wek te, dê derkevin
Wek ku tu, wek hinekan derketî
Ji nava wan

Çend kes li te xwedî derketin
Wek ku tu li wan xwedî derketî
Bi serbilîndî

Kî dizane çend bênamûsan
Çend bêşerefan riya xwe guhert
Ji ser riya te
Dema tu bi rûmet û serbilindî ketî nava Çêrmûgê
Bêje çend kes kom bûn li ser serê te
Te hemêz kirin û te xistin nava dilê xwe

Dilên çend kesan şewitî bi egîdiya te, mêrxasiya te
Tu qet nebêjî jî, ez dizanim, ez dizanim

Hê hiş û mejî neketiye serê mirovên wê derê
Hê ne di ferqa têgînên azadî, rizgarî, serxwebûn,
Rûmet, şeref û namûsê de ne

Çend şêr mezin kirin di paşila xwe de van
Berdan serên çiyan şer kirin van şêran
Ji bo azadiya wan

Piştre bixwe bûn seydevanên şêran
Dan dûv wan, li çiya gelî û çolan
Xwîn ketibû çavên wan
Her der sor didîtin wan

Bûbûn xwînxwarên xwînxwaran
Êrîş dikirin ser şêran
Mirov ew qas xayîn dibe bi xwe re
Ew qas dûr dikeve ji rastiyan
Ji xwe ew qas direvin

Dema her kes paşde vegeriya li rastiya xwe
Bi çar destan li xwe bipêçana evîna xwe
Ev hê çi rev e ji xwe

Çiqas xweş e welatê me;
Axa me
Ava me
Darên me
Daristanên me
Çiyayên me

Asê ne rê nadin dijminan
Tu kes nikare li vir bimîne
Bi qasî xweşikbûn, asêbûn û xwezaya me

Mirovên me jî asê û xweşik bûn ji bo me
Tu kesî nikaribû daniya erdê pişta me

Şerê me ne li hemberî nezaniyê û ne zanan e
Ma ne yê ku xwe nas nakin û
Ji rastiya xwe direvin
Ew anîna ser rastiya wan e

Em mirin
Em dimirin û
Em ê bimirin ji bo azadiya xwe
Heta yek kes jî jixwebûnê dûr bimîne li ser vê axê
Em ê li ber xwe bidin
Heta em bibin em

Berde bila riya xwe biguherînin ji ser riya me
Berde bila birevin ji me û ji rastiya xwe
Em ê dîsa bibin Têkoşerê têkoşîna wan

Heta yek kes jî bimîne ji xwebûne dûr
Em ê xwe feda bikin û wan bînin ser riya xwe

**Riya Te Riya Me Ye**
**Armanca Te Azadiya Me Ye**
**Ji Bo Bîranîna Têkoşer Çêrmûg (Bedrî Odabaşî)**
**23-4-5. Pûşper 2009, Gorsê**

# STEMEK JI BO ROJÊ

Ey roja pîroz tu li bilindbûna xwe mêzeke
Derd û kulên welatê min ji te ve naxwiyên
Dîsa li hespê xwe yê rewan siwar be
Hefsarê wî li derdora destê xwe bade
Serê rewanê xwe berde dereng nemîne
Cihê ku tu xwe bigihîniyê gelêk dûr e ji welatê min
Her berbangê tu ji pişta mala me radibî
Ji me bi dizî û veşartî dibî, mêvanê cîhanê
Dema ji pişta mala me radibî
Ma çi dibe rojekê di ser welatê min de bisekinî?
Me bi germahiya xwe germ, bi ronahiya xwe ronî bikî
Ma ew ê çi bibe…
Diyar e ku vê sibehê jî eceleya te heye
Tu yê dîsa bi lez û bez di ser welatê min re derbas bibî
Dîsa rûyê xwe laşê xwe yê germ
Tu yê bê silav û bê rojbaş ji me veşêrî
Biçî diyarên dûr
Cihê ku tu biçiyê çiqasî girîng in, an jî cuda ne ji welatê min
De bêje em jî dijbertiya te ya li hemberî xwe bizanibin
Ma tu nizanî em in nebiyê Zerdeşt
Zerdeştê di dil û mejî de wek te ronî paqij û delal
Yê ku te li ser rûyê erdê afirand
De bêje îro tewanbariya me çi ye
Yê te ji me dûr xistiye
De bêje em jî bizanibin dijberiya te

**02. 07. 2009, Gorsê /Ş. Brûsk**




# TIRS

Ji dûr ve dixwiyên
Ronahiyên bajarê min
Û ez ji dûr ve temaşe dikim
Dixwazim bibezim di nav kel û
Xwêdanê de wê hemêz bikim

Nikarim
Êdî ne wek berê me
Ditirsim ji bajaran

Berê min çiqas hez dikird
Bi şev di nav kolanan de ji gerê
Di parqan de ji rûniştinê
Xwe li ser giya dirêjkirinê

Û li temaşekirina stêrkan
Dilê min şa dibû wê demê

Êdî ji bajaran ditirsim
Newêrim xwe nêz bikim
Êdî bajar mirin in
Êdî bajar ne li gorî min in
Êdî ez çiyayî me
Di nav tarîtiya çiyan de
Li stêrkan temaşe dikim

Berde ronahiya bajaran
Êdî ez ji ronahiya heyvê jî
Hez nakim
Ronahiya ne di dil û mejî de be
Ez çi bikim ji wê ronahiyê

Hemû ronahî mirinê dibarînin ser mirovahiyê
Di bin navê ronahiyê de
Dil û mejî tarî kirin
Xwînxwarên ku afirandin
Ronahiyên derewîn
Berdin bila cîhan tarî be
Ger dil û mejî ne ronî be
Cîhan roj be jî vale ye.

**04. 07. 2009, Dilbê / Ş. Brûsk**

# ZAROKÊN WELATÊ MIN

Bi lingên xwasî zikê birçî
Dilîzin li ser sergoyan
An jî di nav ava genî de
Didin dûv masî û beqan

Car caran jî didin dûv
Mirîşk, ordek û qazan
Dikevin erdê, di nav toz
û tawarê de dimînin

Rûyê wan bi toz,
Çavên wan bi hêsir,
Pozên wan bi çilm
Bi destê xwe miz didin çavên xwe
Di toz, hêsir û çilmê de digevizînin rûyên xwe
Her derên wan birîn
Dîsa jî rihet nasekinin

Dema bi milên xwe pak dikin pozên xwe
Hemû çilma wan bi cilên wan ve digire
Kerme digire milê wan

Car caran jî ji bo dayik neşon serê wan
Şilfrût direvin ji nav teştê
Bi sîle û kotekan, dîsa vedigerin
Dewsa sîlan dixwiyê li ser laşê wan
Sor dike pênc tilî li ser laşê wan

Piştî şûştinê bi cilên pak
Dikevin nava ava ku ji ji paqijiya wan hatibû rijandin
Bi dest û lingan dikevin nav
Wek ku di behrê de bin bi eşqeke mezin dileyîzîn
Zarokên welatê min

Cilên havînê qazax li xwe dikin
Qazaxekî ser zikê wî bi pîne
Hinek ji wan porsor in
Hinek porzer
Hinek jî poreş in
Hinek jî porên wan kurîşkî ne.

Her çiqasî werin şûştin jî
Bi çilm û gemar in
Bi çilm û gemariya xwe
Xweşik in zarokên welatê min

Bi ken û girî
Bi toz û tawar, çilm û gemar
Hêvî ne ji bo azadiya gelê min
Zarokê welatê min…

**02. 07. 2009, Koçkar / Ş. Brûsk**

# HÊVÎ

Hêvî ji serkeftinê bi rûmetir e
Me hê hêviyên xwe winda nekirine
Ger hêvî winda nebin serkeftin jî nêz e

Dibe ku em nebînin serkeftinê
Hemû hêvîyên me ew in ku
Em ê rojekê bi ser bikivin
Ji bo wê dîtin an jî nedîtin
Ji me re ne girîng e
Ya girîng ramana me ye
Ramana me jî hêvî ye
Jiyana me ye

Çend can ketin
Bin vê erdê
Ji bo jiyan bikin
Dema êrîş kirin ser dijminan
Qet çavên xwe ne neqandin
Ji bo jiyanê

Jiyan raman bû, ne laşek ji kombûna goşt bû
Hêvî serkeftin bû
Serkeftin jî jiyan bû
Jiyan jî raman bû
Raman jî wek hêvî û heqîqetê bû

Çend canan, qet çavên xwe

Ne neqandin êrîş kirin ser mirinê
Ji bo jiyanê û azadiyê
Hêvî; azadî bû ji bo pêşerojê
Ji bo zarokên rojê
Jiyanek wek hev ava bikin
Li rûye cîhanê

Ji ber ku hêviyên ramanên me
Pêşeroja me; zarokên rojê bûn
Ew zarok bûn ên ku hêviya me
Bilind dikirin li rûye cîhanê

Çend canan ji bo pêşerojê
Qet çavên xwe ne neqandin
Êrîş kirin ser mirinê
Hemû hêvî ew bûn
Ji bo jiyan, evîn, azadî û pêşerojê

Pêşeroj ew bûn,
Ew jî bi wan bi hêvî bûn
Hêvî jî ji serkeftinê bi rûmetir bû.

**05. 07. 2009, Xaçek / Ş.Brûsk**




# AZADÎ

Tîrmeh zêde germ e
Li jêra min çemek diherike
Ne zêde dûr e xwe berdim
Di pênc xulekan de xwe bigihînimê
Ez ê xwe hênik bikim bi avjeniyê
Dibe ku kêfxweş bibim
Azad jî bibim
Ama nikarim biçim
Ne ku nikarim biçim
Dikarim biçim
Lê dîsa jî nikarim

Dibe ku qet tiştek jî nebe
Dibe ku hinek min bibînin
Giliyê min bikin, ez bimirim
Min gotiye; dibe ku tiştek jî nebe

Dîsa jî ez nikarim biçim
Di germê de li ber tavê
Mayîna min di vî çileyê havînê de
An jî li gorî dilê xwe tevnegerîna min
Ne di destê min de ye
Ew jî berdêla jiyankirina min a azad e
Eziyeta min…

# BÎRANÎNEK

**1.** Va ye dîsa baran dibare
Hûr hûr dest pê kir
Demeke din ê dijwartir bibe

Îşev meş jî heye
Riya me jî dûr e
Dê barê me du qat bike
Dê qolincên me, ji me bike

Ger heta sibehê berdewam bike dê rezîlî be
Kî dibêje di gerîlatiyê de
Meşa herî xweş meşa baranê ye
Di baranê de meş xemsariyê bi pêş dixe
Hişyariyê kêm dike
Û her ku diçe rê dirêj dibe
Rezaleta esas di nuqtê de dest pê dike
Erd şil, cil şil, dema sermaya payîzê têkeve ser…
Mirov Serê sibehê bi bend dikişîne
Lê dîsa jî sibe nabe

**2.** Dixwazim cixareyekê bikişînim
An di qotiyê de titûna şilbûyî
An jî pel tê de qediyayî
Destê xwe di berîka xwe de digerînim
Pel nemane laşê min jî dixure
Bêhna nemê jî ji cilê min tê
Bêhna min jî teng dibe
Dîsa li berîka xwe digerim

Wek qet lê negeriya bim
Dîsa pel dernakevin
Dixwazim hevalên li kêleka xwe şiyar bikim
Lê belê dil nadim
Xwe dirêj dikim dicemidim
Vedigerim xwe komî ser hev dikim
Xew nayê!

**3.**Hêdî hêdî tarîtî diqelişe
Cîhan ronî dibe
Keşîfçî jî çûn cihê keşfe
Di rojên wek îro de tişta herî zehmet keşf e
Fedekariyeke mezin dixwaze
Çavên her kesî li hev du ye
Kî yê rabe biçe
Hemû jî şiyar in
Lê li benda hev du ne
Yê diçe jî êdî nizane
Wiha dibê qey cîhanê
Keşif bikin, bibin “Kolomb”

**4.** De zû em agirekî pêxin
Li gorî tiştek tuneye
Bila agir mezin be
Darên stûr bavên ser
Ancax ew me zuha bike
Û hestiyê me germ bike
Ka lastîkê bidin; lastîk jî tuneye
Dar hemû şil in naylon jî şil in
Ê dîsa agirekî rezîlbûnê be Dûman ê bilind bibe

**5.**Ev çi şev bû
Ehrîman hemû xezeba xwe
Bi ser me de vereşî
Tarîtî û xirabiya dilê xwe nîşanî me da

**6.**Agir bilind bû roj jî derket
Dema Ahûramazda serê xwe derxist
Çawa reviya, Ehrîman
Bi rastî wî jî kêm neanî serê me
Ger ne ji tirsa rojê be
Şev ê her dem bi xezeb be

# ÊDÎ KES NIKARE ME BIGIRE

Hê çend carên din, ew ê min li çarmixê bixin
Çend carên din, ew ê bend bavên qirika min û min darve bikin
Hê çend carên din, di kolaneke tarî de
Û bi awayê ku kujerê min ne diyar berdin serê min
Mejiyê min li erdê belav bikin, pê lê bikin û di ser re derbas bibin
Mejî û xwîna min ku pijiqiye ser wan, bi destê xwe paqij bikin
Hê çend carên din, bi qîrîna "tekbîr" li ber çavên mirovahiyê
Dê êrîşî ser min bikin; bi şûr û satorê min perçe bikin
Hê çend carên din, ez ê bimirim
Çend carên din, ez ê têkevim bin axa sar
Hê çend carên din, ew ê di kolanan de têkevin milê min û min bibin riyeke ne diyar
Çend carên din, ez ê di êşkenceyan re derbas bibim
Çend carên din, ez ê seqet, kulek, ker, lal, şel, penceşêr û weremî bibim
Çend carên din, di dadgehan de bê tewanbar bim jî, ez ê bêm tewanbarkirin û bi deh salan di zîndanan de razêm
Hê çend sedsalên din, ez ê di tarîtiya dema tarîtiyê de bijîm
Hê çend sedsalên din, ew ê çavên min ronahiya rojê nebine
Û ez ê di taritiyê de mejiyê xwe bixwim, dîn û har bibim û bi canê xwe bikevim.

Êdî bes e ev zilm û zora li ser min
Ger ez rojekê bişkînim qeyda lingên xwe û toqê hestiyê xwe
Ez ê cîhanê bi ser serê we de bînim xwarê
Xira bikim pergala we ya xwînxwariyê
Bes, bila ez rojekê tenê bibînim ronahiya rojê
Hûn ê wê demê bibînin şêrê çiya, bazê ezmanan

Nebiye Rustem û Kawa
Bes, ez rojekê tenê bibînim ronahiya rojê
Tiştekî din naxwazim
Hûn ê bibînin, ez ê çawa biqelişînim tarîtiya ku we di mejî û welatê me de afirandiye
Guleyên ku ji devê çeka min derkeve dê ronî bike hawîrdor
Hûn ê wê demê min bibînin, ez ê çawa hevaltiyê bikim bi Sema û Rizgar re
Di riya Egîd û Mezlûm de
Bes, bila carekê tenê bibînim ronahiya rojê
Ez ê çawa kom bikim, mejiyê ku we belav kiriye
Laşê ku we kuştiye, bi rihê Kemal û Bêrîtanan, ez ê dagirim û bêjim wê demê hûn ê min bibînin li serê çiyayan, wê demê ez ê bibim tirsa xewnan
Bes, ez carekê tenê xwe bigihînim ronahiya rojê
Hûn ê wê demê min bibînin, çawa azad dibim û dijîm, bi dil, bi mejî bi rih û can
Bes, ez carekê tenê bişkînim vî toq û lahneta ku we xistiye stûyê min û
Qeyda ku we li lingê min xistiye, di nav çar dîwarên tarî de
Bes, ez carekê tenê bibînim ronahiya rojê
Ez ê perçe perçe bikim vê tarîtiyê
Ez ê bi ser we de hilweşînim, vê pergala li dijî mirovahiyê
Wê demê kes nikare min bigire
Ger ez carekê li hespê rewan siwar bibim wek Derwêşê Evdî
Ez ê we ji hev belav bikim li ser rûyê vê erdê

Êdî roj hilatiye li me
Perçe perçe bûye tarîtiya we

Kes nikare me bigire, çavên me vebûne
Bi şewq û ronahiya rojê
Em dimeşin serê çiyê
Êdî em bûne tirs û xofa cîhanê
Tirsa we ne ji hovîtiya me ye;
Tirsa we, ji bîr û baweriya me ye
Gorên ku we di ser me de beton kiribûn û we digot: “Kurdê herî baş; Kurdê mirî ye.”
Bi ronahiya rojê me yek bi yek şkandin
Bi giyana Kemal û Bêrîtanê, em ji nû ve afirîn
Bi keda Heqiyan, em bûn ciwanên wek ‘Elî
Me bi agirê Çaran xwe şûştiye
Me qirêjiya xwe bi teqîna Zîlanan ji ser xwe avêtiye
Bi agirê Sema, me xwe gihand ronahiya Rojê
Êdî kes nikare me bigire
Dûrişmeya me: “An jiyanek azad, an mirinek bi rûmet.”
Êdî kes nikare me bigire,
Em ê bişkînin hemû deriyan
Hilweşînin hemû dîwaran
Em ê bi destê xwe biqelişînin tarîtiyan
Êdî kes nikare me bigire
Roj roja azadiya me ye
Roj roja xwegihandina ronahiya Rojê ye
Êdî kes nikare me bigire
Dûrişmeya me **AZADÎ** ye…

**13. 09. 2009, Şingirik**

# GERÎN

Di çend şevên tarî de
Di şevên ker û lal de
Bi pêxwasî
Ez li te geriyam
Di nav dirî û kevirên tûj de
Xwînê avêt ji lingên min
Zatûre bûm ji sar û seqemê
Dîsa jî ez newestiyam
Li dûv te ez dimirim
Zû were…

**21. 09. 2009, Gorsê**

# GOTINEK

Mêze bike tu dibînî
Navê min toz û tawar e
Xwêdan daye ji qirêjê dixure
Bestûka îşligê min ji qirêjê qalik girtiye
Laşê min êdî dixure bû çend meh in av li laşê min neketiye
Êdî ji bêhna xwêdan û mîzê şalê min reng guhertiye
Ser çokên min zirav bûne nebêje pêlavên xwe derxe
Bêhneke genî ji goreyên min tên
Ger ez derxînim pêlavên xwe
Divê hûn derkevin derve

Na na bila dilê we bi min neşewite
Ne ku dilê we bişewite
Min ev ji we re gotin
Min xwest ku hûn bizanibin
Kes bi rihetî azadiyê nade mirov
Ev berdêlên piçûk in
Me ji we re hê qala yên mezin nekirin
Ger hûn bizanibin me ji bo we çi feda kirin;
Dibe ku hûn zimanê xwe yê piçûk bixwin

**28. 09. 2009**




# XIYANET

Ez niha li kêleka zinarekî me
Dema li jêr xwe dinêrim
Çavên min tarî dibin, hişê min diçe
Dilê min li hev dikeve
Dixwazim vereşim
Wek dîwaneyekî li min hatiye
Ji derd û kulên te
Êdî ez dîn bûme
Min hişê xwe xwariye
Ji xiyaneta te
Her ku dibêjim; êdî ez ê li te nefikirim;
Dîsa jî tu têyî bîra min
Dem di nav demê de her dem
Tu di dil û mejiyê min de
Dernakevî dîsa

Her ku xiyaneta te tê bîra min
Ez har û dîn dibim
Bi canê xwe dikevim
Wek wêneyekî rûyê te
Her dem li ber çavên min e
Xiyaneta te di mejiyê min de ye

Dema ez xwe di qeraxa
Zinar de berdidim
Wek teyrekî baz, wek qulingekî difirim

Dengê herî dawî yê te

Min dilê xwe bê tirs û bê xof
Berda ber bayê çiya
Rê kir ji zarokên Amedê re
Min kir diyarî

Çend canên ji can şîrîntir
Min winda kirin
Di çavkaniyên Dicleyê de
Min ji wan re rê kirin
Ji zarokên diya xwe re diyarî kirin

Bost bi bost geriyam
Li ser axa bedew
Çend caran xwîna min rijiya
Bi dilopên baranê hatin şûştin
Tevlî çavkaniyên Dicleyê bûn
Û herikîn nav dilê diya min…

Çend canên ciwan û şîrîn
Ji bo berdêlî, min berdêl dan
Bûn kîn û tol ketin dilê min
Çend sal e dikujim, hê têr nebûme
Hê min bedêla wan negirtiye
Wêneyên Serxwebûn li ber çavên min
Hê êşa wî li nav dilê min
Şewata dilê min, li min volkan

Her ku ez diteqim di nav dilê dijmin de

Dixwazim hê bi dijwarî, kîn û tola xwe
Vereşim bi ser serê wan de

Ji bo zarokên Amedê
Ez ê rojên ronî bikim diyarî
Ji bo zarokên diya xwe
Dîsa ji wan re rê bikim
Bi bayê çiyan, bi ava kaniyan
Dîsa biherikim di Çemê Dicleyê de
Di nav singa diya xwe de
Xwe bi cî bikim

Ev çend sal e ez bi hesret im
Ji hemêza diya xwe re
Îro ez ê serê xwe deynim
Ser singa diya xwe
Xwe dirêj bikim
Di hemêza wê ya bedew de

Çiqas zarokên Amedê hene
Ji hemûyan re, xeberê rê bikin
Bila kom bibin li ser serê min
Bila min bi agirê Zerdeşt bişon
Û min di nav singa diya min de veşêrin

Bila nav sûran bikin; "Baxçeyê Ronahiyê."
Gulên bi rengên welatê min biçînin, di nav de
Bi ava Dicleyê av bidin
Û gulên li ser gora min, bila bikin diyarî
Ji evîndarên welatê min re

Bêhna wan berdin bi bayê re
Bi aliyê çiyê ve her ku ez mêvan bim jî
Ji zarokên Amedê re
Hê jî rihê min digere li çiya

Her ku hatin ser gora min
Zarokên diya min
Û li kevirê li ber serê min mêze kirin
Bila nivîsa; "Şervanê Gelê Xwe" bixwînin

Ger dixwazin min nas bikin
Bila gulekî bigirin ji ser gora min
Û berê xwe bidin çiya
Di çiyayan de li min bigerin
Û min ji çiyayan bipirsin
Ê min vebêjin ji we re
Dema gulan diyarî bikî ji hevalên min re
Wê demê ez ê serê xwe
Rakim ji nav Sûrên Amedê
Wek gulekê ez ê bala xwe bidim
Gorsê, Şêlê û Koyspî
Bêhna wan bikişînim, nava xwe û
Xwe têr bikim bi hesreta wan

Ma ne bes e heval
Hê hesreta te neqediyaye
Tu yê wek zarokekî/ê ji serma biqefilî
Xwe avêtiye hemêza diya min
Destê xwe li navtenga wê pêçaye
Serê xwe daniye ser singa wê

Ma ne bes e heval êdî rabe ji gorê,
Serê xwe rake ji nav Sûrên Amedê
Berê xwe bide çiyayan
Mêze bike ji nû ve zindî bûye xweza
Şîn û jîn bûye li benda te ye
Gul û çîçekên çiyayan

Mêze bike, agir dadane hevalên te
Li Gorsê, Şêlê, Hedik, Koyspî
Wê govendê bigirin li benda te ne
Rêyeke dûr û dirêj li ber me ye
Tev feq û kêmîn in
Ma te çi zû ji bîr kir, gotinên diya min
Dema tu di paşila xwe de dilorandî û dimijandî
Digot: “Wê lawê min bibe
Şêrê çiyayan, bazê ezmanan,
Tirsa dilê dijminan, xofa xewnên şevan.”

Ma ne bes e heval, êdî rabe
Her çiqas hemêza diya min
Germ û bi rehm be jî
**Êdî bes e**



# JIBÎRKIRIN XIYANET E

Jibîrkirin xiyanet e
Tu her dem dijî
Di dil û mejî de
Di hest û raman de tu ronahî yî

Rûyê te wek wêneyekî
Her dem li ber çavan e
Di dil de ronahî ye
Bîr û bawerî ye
Navê te stran e,
Her dem li ser ziman e
Dûrişmeya azadiyê ye
Armanca serkeftinê ye

Tîrêja roja me
Egîdê doza me
Ronahiya riya me
Mêrxasê gelê me
Navê te stran e, her dem li ser ziman e
Hêviya gelê me
Fermandarê dilê me

# HÊVIYÊN MIN HENE



Hêviyên min hene li hemberî
paşerojê
Her çiqasî dem zivistan be jî
Îro bi dawî dibe reşemî
Tê adar, wê bibe gulan
Xweza ji nû ve jîn bibe

Piştî her mirinê dîsa jîn dibe jiyan
Wek her demsal li ser mirinê
xwe ji nû ve jîn bike
Dimire zivistan, jîn dibe bihar
Ji niha ve tê guhê min dengê çûk û bilbilan
Rengê xemla welatê min tê ber çavên min
Her çiqasî ez di bin erdê de bim jî
Ji îro û pê ve ez ê xwe biavêjim
Hemêza xwezayê

Êdî li hemberî bi hêvî me
Demsal bihar e, bihar rengîn e
Bi xeml û evin e
Şa dike ji nû ve hêviyên me
Coş dide jiyana me






## SİZE GELİŞİM

Dağlardan süzülen sularla
Yüreğimi rüzgârlara salıp
Aydınlanmış fikirlerle
Özgürleşmiş beyinimle
Size geliyorum
Karanlıkları yarıp
Size güneşi sunmaya

Karartılmış beyinleri
Körleştirilmiş gözleri
Ölmüş bedenleri, canlatırcasına
Yok edeceğim bütün geriafter

Kulak zarları patlatırcasına

Haykırmak istiyorum suratlarına
Kusmak istiyorum bütün kinimi
Egemenin sömürenin, yok edenin
Yüzüne haykırırcasına
Kusmak istiyorum

Koşarken dağlardan size doğru
Almıştım içimdeki karanlığı
Size güneşin aydınlığıyla geldim

Yeniden yaratmak için binbağı
Patlarken bedenim parça parça
Yeniden yaratacaktım bütünlüğü

Atacağım bütün geriliği
Gericiliğin beyininde patlarken
Salacağım yeniden kendimi
Rüzgarlara, dağlara
Semalarda, süzülürken
**"ZÎLAN"**adı, yeni bir umut olacak
**HALKIMA**

# EZ MIROV IM

Ne di nav nivînên fahîşeyan de
Ne li ser sifreya bênamûsan
Ne jî li ser maseya serxweşan
Min qet nekir sibeh

Min her dem roj
Bi rêz pêşwazî kir
Bi evînî li stêrkan temaşe kir
Di taveheyvê de
Dema min cixare dikişand
Min qet dûyê xwe
Pifî rûyê wê nekir

Dema di şevên ker û lal de
Di ba û baranê de ez meşiyam
Ji sermayê dilerizîm
Min qet ji xwedê re neda dijûnan

Min ji bo xwedê qet rûyê xwe
Li erdê neda
Ne ji bo wî, xwar û rast
Ne jî li ber wî geriyam
Ji derveyî xwe, bi kesên din re sosret nebûm

Di cihê zor û zehmet de
Di nav lepê gur û wahşan de
Di ber bêhna mirinê de
Li ber kesî negeriyam

Ne şêrekî leheng im
Ne kîvroşkeke tirsonek
Ne roviyekî bi fen û fît
Ne jî çeqelekî tolaz im

**Ez tenê mirov im**

# EZ BI TE ŞA NEBÛM

Ronahî bi rojê
Şev bi stêrkê
Penahî bi tariyê
Ez bi te şa nebûm

Newal ji kaniyan
Rûbar ji newalan
Çem ji rûbaran
Derya ji çeman
Ez ji te têr nebûm

Bilbil bi gulê
Gul bi diriyê
Dirî bi birînê
Ez bi te şa nebûm

Dest bi rû
Rû bi çav
Çav bi roniyê
Ez bi te şa nebûm

Giyan bi laş
Mirin bi zindîbûnê
Ax bi terman
Ez bi te şa nebûm

# HESTÊN MIN ÊN JI BO TE

Çawa ku teyrek li ezmanan
Baskên xwe vedike û difire
Wek çûka di hêlînê de li benda diya xwe
Dergûşa birçî çawa êrîşî pêsîra diya xwe dike
Di hest de çi jiyan dikin
Hestên min jî ji bo te ew in

Dema xweza xwe diguherîne
Zivistan dibe bihar
Darên fikiyan bi her rengî
Vedikin çîçekan
Ji nû ve şîn û jîn dibin
Ew çi jiyan dikin di hest de
Hestên min jî ji bo te ew in

Dema dilopên baranê dikevin ser rûyê erdê
Xwe berdidin rihê kaniyê
Kanî xwe digihînin çeman
Çem xwe digihînin zeryayan
Her çi dijîn wê demê di hest de
Hestên min jî ji bo te ew in

Dema berfa li çiyayan dihele
Xwe digihîne newalan
Diherikin nav Dicle û Ferad
Her çi dijîn di hest de
Hestên min jî ji bo te ew in

Her ku pilpilig baskên xwe li ba dixe û difire
Bilbil dema bi gulê şa dibe
Her ku moz li ser gulê vedinişe
Di hest de çi jiyan dike
Ez jî ji bo te wê jiyan dikim

Di lîstoka zarokan de
Di hezkirina dayikan de
Di awirên çavên evîndaran de
Çi hest tên jiyankirin di wê demê de
Hestên min jî ji bo te ew in

Dema çavên kor vedibin
Qeyd û zincîrên koleyekê/î vedikin
Mahkûmeke/î îdam be, bend ji qirikê derdixin
Û ji kursiyê dadixin, jê re dibêjin: ”Tu azad î.”
Wê demê çi jiyan dike di hestan de
Hestên min jî ji bo te ew in

Tu ketî dil û mejî
Di hest û raman de dijî
Ji bo min çi ne hestên te
Ên min jî ji bo te ew in

# LI DÛR LI MIN NEGERIN

Carinan di kêleka rêyekê de
Carinan jî di koka giyayê di Bircên Amedê de me
Carinan bi tenê, carinan jî li nav qelebalixê
Di Newrozê de li pêş im

Li dûr li min negerin; ez ne dûr im
Yek caran di teqîna teqemeniyekê de
Carinan jî di êrîşa qereqolekê de
Li ser cenazeyên we rawestî me
Di nûçeyên êvarê de di nav firmêskên
Çahvên dayika we jinên we û zarokên we de me
Ez gerîla me, li her cihî me
Û qet ne li cihekî me

Li dûr li min negerin
Ez ne dûr im
Ez di nav dilê çûkeke di nav destan de me
Di giriyê zarokekê/î de
Di beza cahniyeke di nav mêrgan de
Li ezman di nav fira teyrekî de
An jî di kenê keçeke evîndar de
Veşartîme

Li dûr li min negerin
Ez di barîna baranekê de
Di ba û bahozê de
Di herîkîna çeman de
Di hilatina rojê de
Di şewqa stêrkê de

An jî di tarîtiya şevê de
Veşartîme

Li dûr li min negerin
Ez ne dûr im, ger hûn ê li min bigerin
Di hest û ramanên diya min de
Di firmêskên çahvên diya min de
Di qîrîn û hewara diya min de li min bigerin
Ez di nav dilê diya xwe de
Veşartîme

Ez ne dûr im
Di kenê zarokekî de
Di awirên keçikekê de
Di birîna birîndarekî de
Di gora miriyekê/î de
Veşartîme

Li dûr li min negerin
Ez li ber bêhna we me
Her ku hûn bêhnê dikişinin
Min jî dikişinin hundirê xwe
Ji bo wê ye tirsa hundirê we
Ji bo wê ye bêçarebûna we
Êrîşkariya we
Ji bo wê ye ku hûn ji tirsa xwe
Zarokan dikujin
Ji bo wê ye tanq û panzêr
Ajotin ser me
Di kolanan de gule reşandin ser me

Ez li her cihî me
Wek ne li tu cihî bim
Ev jî we dîn û har dike
Xof û tirsa we mezin dike

Wek min gotî: Ez li her derê me
Carinan li çiyayan, carinan jî li deşt, bajar û gundan




# RONÎ'LEŞEN ÖZGÜR'LEŞİR

**1**

Özgürlüğe koşarken
Zerre kadar tereddüt etmeden
Geleceğe salmıştı bütün asiliğini
Umudu bir ışık gibi parlarken gözlerinde
Rüzgârla yarışırcasına koşmuştu

Ronileşecek ki koşuşun sonunda
Ona engel olunamazdı
Ne olursa olsun bedeli vuruşacak
İnsanlık uğruna ne olursa bedeli

**2**

Özgürlüğe sevdalı bu çocuk
Zerden bir tastan içercesine
Gönlünü serinletir sevdasıyla
Umudunu saklarcasına
Rahminde saklanır geleceğe

Rakibinin karşısında dururken
Onlarsız bir dünya için
Neyi gerektirirse bedeli
İndirecek son darbeyi

**3**

Ölümüne sevdalı
Zamanın ötesinden gelme sanki
Geleceğin, bağrında kopmuş
Ülküsü özgürlük
Ruhu aydınlık dolu

Ronileşecek belki de
Onsuz yanan ve yanacak olan
Newroz ateşlerine koşarcaına
İnadına özgürlük diyecek

**4**

Ötelerden gelme sanki
Zamanını bilircesine
Geleceği haberler
Ümitsiz düşmülere

Rahmani sözleriyle

Rüzgarlara açarcasına kollarını
Onları sarar kendine
Neşeli sözlerle avutur
İmdadına koştuğu halkının

**5**

Öyle bakmayın parlak oluşuna
Zamanı geldiğinde…
Gerekeni yapacak kadar militan
Ümmetini sakınır her beladan
Rahmanda olsa yaradan

Rahim gerekli ise o anda
Ondan rahimi bulunmaz
Nefessiz de olsa yetişir
İmansızın haddini bildirir

**6**

Ölüm cenderesinde halaya durur
Zılgıtlarla şahlanır
Gecenin karanlığında
Umududur ışığı
Rüzgarda, karda, yağmurda

Rüsva ettirmez
Ondan istenilen yüceltmektir
Newroz ateşini dağlarda ve
İnsanlığın bağrında

**7**

Öyle mi temiz olur insan
Zemzem suyundan çıkarcasına
Güzelliğini yücelikten alan
Umut, ışık, aydınlık kokan
Ruhunu nurdan alan

Ruhumuza ruh olan
Omuzlarımızı oldurtan
Nurunla bizi aydınlatan
İçimizdeki karanlığa inat…



# NAMEYÊN JI BO XWÎŞKA MIN

# Jİ BER KU MİN ZÊDE Jİ TE HEZ DİKİR EZ Jİ TE VEQETİYAM

Merhaba Hêviya Min! Demeke dirêj e ez dixwazim ji te re hinek tiştan binivîsim; lê heta niha min xwe amade nedidît û min nizanibû li ser çi binivîsim? Lê belê ji îro û pê ve ez ê carinan qala bîranînên xwe bi te re û carinan jî qala jiyana xwe ya gerîlatiyê bikim. Heke rojekê derfet çêbibe ez ê van nivîsên xwe ji te re rê bikim.

Gelek caran tu têyî bîra min û ez te tînim ber çavên xwe, wek ku cara herî dawiyê min tu dîtibû, heşt (8) saliya te, tê ber çavên min. Ez di aşopên (xeyal) xwe de, te wisa dibînim. Lê ez dizanim tu îro çardeh salî yî û îro gelek mezin bûyî. Dîsa jî tu di aşop û di dilê min de her dem heşt salî û zarok î. Dibe ku mezinbûna te gewdeyî be, lê tu yê her dem di aşopên min de zarok bî û xweşik bî. Ji bo wê jî ez ê di nivîsên xwe de wek ku tu heşt salî bî, hestên xwe ji te re bînim ziman û binivîsim. Tu dizanî me di zarokatiya te de çiqasî ji te hez dikir. Zarok her dem xweşik in û bala mezinan dikişinin ser xwe. Hezkirina zarokan hezkirinek rast û ji dil e. Dema ku mirov mezin dibin êdî wate û girîngiya hezkirinê jî li hemberî mirov cuda dibin. Ji ber wê jî ez ê her dem wek ku tu zarok bî û zarok bimînî ji te hez bikim. Ez nizanim min li vir wateya hezkirinê bi te da fêmkirinê an na. Jixwe hê tu mirovî wateya hezkirinê neaniye ser ziman. Hinek têgîn hene mirov nikare bîne ser ziman û binivîse.
Ez niha ji te pirs bikim;  ji te re bêjim; tu çiqasî ji min hez dikî? Tu tê her du destên xwe vekî û bêjî: “Ez ewqasî ji te hez dikim.” An jî tu yê bi dev bêjî: “Ax te zanîbûya min çiqasî ji te hez dikir?” Bi hestên ku tu ji min hez dikî ez jî bi wan hestan û bi hemû hezkirina xwe ji te hez dikim. Ji ber ku min zêde ji te hez dikir; ez ji te veqetiyam û li serê van çiyayan têkoşînê didim. Hezkirin ne ku mirov li cem hev be û destê xwe di ser serê hev de bigerîne; hezkirin ji bo mirov hev azad bike jiyaneke ji jiyana îro baştir pêşkêşî hev û din bike û mirov hev di nava jiyaneke wek hev de bide jiyankirin e. Hezkirin ew e ku mirov ji bo hev bide jiyankirin jiyana xwe fedayî hev bike. Îro bi hezaran mirov ji bo ku we bidin jiyankirin, hûn jî wek hemû zarokên cîhanê jiyan bikin; dibe ku hûn hê baştir jî jiyan bikin canê xwe feda dikin. Ji ber ku ez ji te hez dikim; min jî jiyana xwe fedayî te û yên wek te kiriye. Hezkirina min li hemberî te ev e û ez pir ji te hez dikim. Na ger tu dibêjî; ez ji te bêtir ji te hez dikim wê demê

rêya ku ez îro ji bo te tê de dimeşim, divê sibê tu jî ji bo hinekên din tê de bimeşî. Wê demê ez ê bawer bikim ku hezkirina te ya li hemberî min ji hezkirina min a li hemberî te zêdetir e. Ger ne wiha be wê demê tu nikarî bêjî hezkirina min ji ya te zêdetir e.
Dema ez li ser te difikirim; berî çend rojan ku ez ji we veqetim min sîleyek li te xistibû; bi piranî ew tê ber çavên min û ez gelekî pê têşim. Min di telefonê de ji dayê re gotibû; "Bila ji bo wê bûyerê min bibexşîne." Nizanim tê bîra te, yan na. Wê demê te hê nû dest bi dibistanê kiribû. Te hê nû yek bi yek tîp li ser rûpelan dinivîsandin. Hê destê te neketibû ser nivîsandinê; min dixwest bi te re alîkariyê bikim, lê te nedihişt. Di her nivîsandinê de tîpa ku te dinivîsand te dîsa reş dikir. Li ser wê jî min sîleyek li te xist, te dev ji nivîsandinê berda û te dest bi girî kir. Yek jî carekê min yek li Zilfiyayê xistibû. Dema ez vedigerim û jiyana xwe ya berê tînim ber çahvê xwe; ez tenê poşmaniya van her du bûyeran jiyan dikim. Wekî din ez tu poşmaniyê nabînim. Îro me li ser hezkirin û li ser bîranînên xwe nivîsand, rojeke din em ê li ser hinek tiştên din binivîsin.

**25. 07. Ziyaret**

# EM HER ROJ XWE NÊZÎ AZADÎ Û SERKEFTİNÊ DİKİN

Ev du şev e hema hema heta serê sibehê ez û hevalê Çekdar em dimeşin. Piştî ku dibe sibe jî em bi dorê radizin. Cihê ku em çûnê heta niha ez qet neçûbûm wê derê. Çiyayê ku em çûnê, erazî ji bo gerîlatiyê qet ne xweş bû. Ji bo gerîlatiyê ne erênî bû. Em li gorî hinek agahiyan çûbûn; tişta ji me re hatibû gotin, wisa derneket. Em rojekê heta destê sibehê meşiyan me bi zorê xwe gihand wê mile (sirtê). Mileke pir bilind û dirêj e. Di heman demê de di navbera du girên dijmin de ye. Me bi zorê xwe di sê demjimêran de gihande ser serê wî.
Piştî ku me xwe gihande ser serê wî jî bi kotekî me di du demjimêr û nîvan de xwe berda jêrê. Em hem westiyabûn û hem jî gelek xewa me dihat. Wek sermestan (serxweşan) li me dihat; dema ku em di rê de dimeşiyan, barê me ji me re pir giran dihat. Dema me xwe gihand cihê xwe, me dît ku av li wir tuneye. Me her du hevalan bi lîtreyeke avê du caran çay çêkir, hem jî me heta êvarê pê debara xwe kir.
Ji Zapê heta Amedê, bi hevalê Avareş re, em tam du mehan meşiyan. Em bi hev re hatin Amedê. Piştî wê ez li vir mam hevalê Avareş bi koma xwe ve derbasî Eyaleta Erziromê bûn. Hevalê Avareş di bihara 2008’ an de li Çewlikê şehîd ket. Hevalê Avareş di sala 1992’yan de tevlî nav refên gerîla bûbû. Dema tevlî refên gerîla bûbû du zarokên wî; yek keç yek jî kur hebûn. Êdî ew niha ciwan in. Hevalê Avareş di 43 saliya xwe de bi rihekî ciwan derbasî qada şer bû. Ji gelek hevalên ciwan bi xwestektir, bi kelacantir û bi coştir bû. Li hemberî dijmin pir bi rik (inat) bû û dixwest derbeyan li dijmin bide. Ancax bi vî awayî dikaribû rik û berteka xwe bixista bin venêrînê. Her dem bi giyaneke ciwan di nav hevalan de tevdigeriya û moral dida derdora xwe. Bi rastî jî dema me li salên

wî û li tevlîbûna wî meyze dikir, me jî jê moral digirt. Pir dixwest ez jî pê re biçim Erziromê, lê dema dît xwesteka min hê zêdetir ji bo Amedê ye, ez li Amedê hiştim.
Dema ez duh çûm ser gora wî, min dît ku gora wî çêkiribûn û gelek çîçek danîbûn ser gora wî. Min destê xwe di ser gora wî re gerand û maçek li kêlika ber serê wî da. Wê demê ez gelekî hestiyar bûm. Li ser kevirê gora wî wisa hatibû nivîsandin: “Li ser kevirê gora min li navê min negerin; li ser çiya, kevir û darê welatê min bigerin, ez eserek im…” Bi vî awayî dewam dikir.
Tu dizanî min çima ev ji te re nivîsand. Ê ku me li serê van çiyayan digire û hêzê dide me; yê ku me li hemberî dijminê me, me bi hêz dike û armanca serkeftinê di dilê me de şîn dike; rihê vî hevalî û bi hezaran hevalên wek hevalê Avareş in! Ji ber ku em bi hev ve girêdayîne em bi bin nakevin û em her roj xwe nêzî azadî û serkeftinê dikin.
DEMBAŞ

**27. 07. 2009, GORSÊ**




## *FERMANDARÊ DİLAN MÊRXASÊ AMEDÊ*

Demeke dirêj e min ji te re nenivîsiye. Min dixwest binivîsim, ji ber ku gelek kar di destê me de hene; westandin heye, ji ber wê şert û merc dest nadin. Ji derveyî van karan, rêxistin hin karên din jî dide pêşiya me.

Berî heftiyekê ez hatim Apê Mûsa. Min ji vir du hevalên nû girtin birin Ş. Brûsk. Ev heval hê zêde ciwan in; yek ji wan xort, yek jî keç e. Salên wan an hevdeh an jî hejdeh salî bûn. Beriya van sê hevalên din jî yên nû li herêma me hebûn, ji wan du hevalên din jî di temenê wan de bûn. Werhasil niha li herêma me çar hevalên ciwan û nû hene. Ev ji te mezintir in. Carinan wiha bi zarokatî tevdigerin ku mirov ji wan moral digire. Bi rastî jî ji ber ku moral û rihê Apoyî her dem ciwan e, mirov jî dixwazin bi wan re ciwantiyê bikin, lê ji ber ku şertê em tê de jiyan dikin ew qas dijwar e û ji ber ku dijminê me ji mirovahiyê qet para xwe negirtiye, em ancax li gorî rastiya dijmin nêzîkatiyê li wan dikin.

Esas tiştên ku min ê ji te re binivîsandana ne ev bûn. Min got; çend roj berê ez hatibûm Apê Mûsa. Berî du rojan bangî me kirin vê

carê em hemû hêzên herêmê xwestin. Çi ye? Dê çend kes ji me re civînê çêbikin. Rast e, ev mafê wan e. Ji derveyî me hêzên du herêmên din jî hatibûn. Dema ez ji herêmê derketim; ez bi hêrs derketim. Ji ber ku me sêzdeh kesan dabû pey hev. Ciyê ku bangî me kirin, em ê biçinê, hejamara me û hêzên din ku bihatanê neyînî bû. Ji ber ku xeteriya vî karî zêde mezin bû, ez ne rihet bûm. Zêdeyî sih kesî li cihekî kom dibe û li beramberî vê teknîka di destê dijmin de pir xurt e. Yek jî ev hevalên ku li vir kom dibin zêdeyî deh kesan hevalên nû ne. Dibe ku îstîxbarat têkeve destê dijmin, dijmin bi teknîka destê xwe qetlîamekê çêbike û ji her du aliyan jî gelek kuştî çêbin. Dema ku mirov pêvajoya em tê de ne dide ber çavan, kesên ku bangî me kirine adeta dixwazin pêvajoyê proveqe bikin. Ji vê nêzîkatiyê min û me, me ev encam derxist, me got: "Em ê di civînê de vê nêzîkatiyê rexne bikin. Em du şev meşiyan, roja dawî me bi ronahiyê re xwe gihand ciyê rendevûyê.

Hê em rûneniştibûn çend hevalên ji rêveberiya me ya di asta yekemîn de berpirsiyar, hatin tiştek gotin. Piştî wê ji me re gotin: "Operesyon derketiye; bila heval xwe li gorî operesyonê mewzî bikin." Li ser vê cênîkên min rabûn tam hatin serê min. Ji ber ku min erazî nas dikir, min li erazî meyze kir, tu tevger tunebû, min dizanibû ku em ji derveyî operesyonê ne. Dîsa jî me xwe da nav şikêr û keviran. Em tîm tîm belav bûn. Min ji hevalên li cem xwe re got; "rakevin û ez jî raketim." Min dizanibû cihê ku em lê ne, tu tişt tuneye. Min li vir mantiqê erazî û yê dijmin dizanibû.

Piştî nîvro me xwe berda û dîsa em hemû çûn cem hev. Me hin hevalan, ew demeke dirêj bû, me hev nedîtibû. Di heman demê de hin heval nû ji Başûr hatibûn. Heta êvarê em bi hev re axivîn û me guftûgo kir. Piştî ku nîqaş û guftûgoya me çû ser hevalê Rizgar: "Niha tu yê bêjî H. Rizgar kî ye?" (Dema ku mirov dixwaze qala wî hevalî bike yan jî li ser wî binivîse gotin û têgînên layîqî wî û mirov

bi wî qala wî hevalî bikin nayên dîtin. Hê di cîhanê de û zanyariya ku îro cîhan û mirovên zanyar xwe gihandinê, di heman demê de têgînên ku hatine afirandin ne layîqê hin kesan e ku mirov ji wan re bişixulîne. Rêxistinê jê re got: "Şêrê Çiyayê Kurdistanê û mêrxasê Amedê." Ez û yên ku wî nas dikin, em jê re dibêjin: "Fermandarê dilan." Ev heval di sêzdehsaliya xwe de tevlî nav refên gerîla bûbû. Di salên xwe yên piçûk de bûbû serleşker û pêşengtî ji gerîla re kiribû. Kesayeteke leşkeri pê re hebû. Di jiyana xwe ya gerîlatiyê de; di gelek çalakiyan de cih girtibû; gelek caran birîndar bûbû; di nava şer de tecrûbeyên ku girtibûn êdî dijmin pê nikaribû. Bûbû tirs û xofa nava dilê dijmin. Wek tê gotin; "Bûbû tirsa xewna dijmin." Ev heval wisa lê hatibû; êdî di şer de bûbû îlah (xweda). Herî dawiyê di fermandariya eyaleta Amedê de bû û bi rastî jî fermandarek bû. Hevalên ku li cem wî bûn; di wan de rihê gerîlatî û êrîşê ava dibû. Li hemberî dijmin bi hêrs dibûn, bi tirs û bi xof dibûn. Bi hêrsa li hemberî dijmin hêz dida derdora xwe jî.

Dema me li ser vî hevalî guftûgo dikir hevalan bang kir. Dema min xwest ku ez xwe ji ser kevir berdim jêr û biçim, hevalekî got: "Ziya reviya ye." Wê demê min got qey yekî giraniyeke bi tonan bi ser min de berda; min got; qey çokên min şkestin. Çawa ku min şehadeta hevalê Rizgar bihîst ez bi çi awayî bê moral bûm û bê taqet mam; dema min rev û îxaneta vî kesî jî bihîst, ez wisa bê taqet bûm. Ziya fermandarê eyaleta me bû, vî kesî gelek ferman dabûn hêzên eyaletê û gelek heval bi fermanên wî ketibûn çalakiyan û gihîştibûn şehadetê. Ji bo eyaletê gelek keda wî hebû. Jixwe hatina me ya ji bo civînê û nepejirandina min a kombûna ew qas hêzê, ji bo xeteriyeke wisa bû; gelek tişt hesab nekirin bû. Kesê ku bangî me kiribû wî jî xinizî (îxanet) kiribû. Bê taqetbûna min ne ji tirsa dijmin û ne jî ji tirsa mirinê bû; vî kesî ferman dabû me û em rê kiribûn ser mirinê, li cem me şehadet hatibûn jiyankirin. Berî

çar mehan çar heval li kêleka wî şehîd ketibûn, dîsa H. Rizgar şehîd ketibû. Ev şexs hevalê Ş. Rizgar ê herî kevn bû. Ev çend sal e di nav rêxistinê de gelek rev çêbûn, dema min reva vî kesî bihîst, min zor û zahmetiya di rev û xiniziya vî şexsî de dît, min nû xinizî ferq kir wek giraniyek kete ser min. Ev giraniya xiniziyê bû. Ji bo heval sibê civînê çêbikin hê jî israr dikin. Îro rendevûyek dan me, yê ku civînê çêbike fermandarê qadê (sehê) ye. Yê ku reviya ye hê radestî dijmin nebûyê; dibe ku li benda belavbûna me be; an jî dibe ku naxwaze zerarê bide me. Lê dema ev kes teslîm bibe dê eyaletê hemûyî li bin guhê hev bixe. Min despêkê jî got; “ li Bakur li cihekî komkirina hêzên sê herêman ev qirkirin e. Komkujî ye. Fermandarê eyaletê yê ku ji bo civînê bang bike û bireve, hin kes jî hê di civînê de israr bikin, ev kes yên ku dixwazin pêvajoyê sabote bikin ew bixwe ne.

Ez ê sibê van di civînê de rexne bikim. Êdî dê were fêmkirin an na, ez nizanim; jixwe yê ku xwe di van ferasetan de îkna kiribe fêm nake. Civîna ku bikin, tiştên ku bêjin jixwe rêxistin ji biharê ve dibêje. Kêmek mejiyê me jî heye, em jî hinek tiştan dişopînin. Piştî reva vî kesî, di Bakur de hêzeke çil kesî anîna cem hev, li derveyî sekna pêvajoyê û helwesta rêxistinê ye. Tişta ku ez dizanim ev e; her çi pirsgirêk dibe bila bibe, ji jiyana hevalan ne girîngtir e. Hin caran di nav me de bûyer û pirsgirêkên wiha derdikevin. Ji bo me û ji bo min a esasî rêxistin û helwesta rêxistinê ye. Dibe ku di şexsê hin kesan de şaşîtî derkevin, ji bo alîkariyê em ê rexne bikin, fêm bikin û li ser bisekinin. Li ser nesekinin wê demê bidin jor, nebû jortir heye, bidin jortir.

Îro jî ew qas bes e.

Dembaş!

**29. 08. 20009, Luw Kere**

# Dİ CÎHANÊ DE KARÊ HERÎ ZAHMET MİROV PERWERDE KİRİNE

Wek min ji te re gotibû; civîn civînek ji rêzê bû. Civîneke wisa ne awerte bû, tiştekî ku wisa neyê zanîn nebû. Civînê sê rojan berdewam kir. Civîn ji aliyê fermandarê qadê ve hat meşandin. Di derbarê qadê û pêvajoyê de hin agahî dan me. Ji bo ku di derbarê eyaletê de guftûgo bikin, mafê axaftinê da hevalan. Gelek hevalan di derbarê eyaletê de nêrînên xwe anîn ziman. Dema ku hevalên herêma me mafê axaftinê girtin, li ser herêmê bi giştî li ser hevalên xort ên eyaletê û li ser hevalên li herêmê nêrînên xwe anîn ziman, civîn zivirî civîna herêmê. Berê jî li hemberî hev acizî hebû, ev di civînê de li ber çavan hatin raxistin. Hevalan du rojan li ser pirsgirêkên me guftûgo kirin, lê nikaribûn çareser bikin. Ji ber ku me hemûyan nêrînên hev vale derdixistin û her kesî nêrînên xwe didan pêş.

Dema hevalan dîtin ku pirsgirêkên me çareser nabin, ji aliyê fermandarê qadê ve, ji herêmê re civîneke din hat çêkirin. Di vê civînê de jî ji aliyê me xort û stiyan (jin) ve nêzîkatiyeke dilnizm bi pêş neket. Herî dawî ji aliyê rêveberiyê ve hizirîna ku ev nikarin bi hev re kar bikin, derket holê. Li ser vî esasî ji me pirsin: “Hûn ê bi hev re kar bikin an na?” Min û hevalê Rohat me got: “Em bi vî awayî û bi vê helwestê, em nikarin bi hev re kar bikin.” Hevalên din biryara ku ew dikarin kar bikin dan. Rêveberiya stiyan her tiştên wan erê kirin û piştgirî jî dan wan. Piştre jî her du hevalên stî ji rêveberiya herêmê derxistin.

Di vê civînê de me ew qas hev êşand dema ku em ji hev qetiyan, êdî ew rûyê me yê ku em li rûyê hev meyze bikin nemabû. Her kesî ji aliyê xwe ve, xwe mafdar didît û vê jî aciziyek mezin derxistibû holê. Xatirxwestina me ya ji hev jî wek mirov di merasimeke cena-


ze de be çêbû. Rêveberiya YJA-Star hem piştgirî da wan hem jî ciyê her du hevalan guhert. Zivistanê jî li herêma Ş. Brûsk ji ber aciziyê dîsa cihê wan her du hevalan hatibû guhertin. Îro dîsa cihê wan hat guhertin. Divê hevalek li herêmê bihişta, kêmasiyê rêveberiya wan ew bû ku her du heval guhertin û hevalek li herêmê nehiştin. Ji ber ku ev jî nekirin, kî mafdar e an ne mafdar e, ew jî ji holê rabû.

Werhasil du hevalên din ên nû ji bo herêma me hatin; her du jî ciwan in. Yek nozdeh salî ye, yek jî sêzdeh salî ye; ango yek salekê ji te piçûktir e û îro tevlî nav refê gerîla bûye. Niha di herêma me de çar hevalên nû hene; du heb jî hê nû sala wan qediyaye. Em pênc hevalên kevn in. Her roj karê me zêde û zahmetir dibe. Karê me yê sereke, divê em van hevalan bigihînin û bikin têkoşerê tevgerê. Ji bo dema pêş ew karê şoreşê bidin ser milên xwe; pêwîst e em kedeke mezin di ber wan re bidin. Heke em di vî karî de bi ser bikevin êdî pişta me nayê erdê. Di vê cîhanê de karê herî zahmet, mirov perwerde kirin û gihandin e. Navê yê mezin Hebûn ê piçûk jî Botan e. Di nava ew qas kêmasiyên xwe de, divê em wan ji bo dema pêş, bi pêş bixin û amade bikin.

Ji ber ku civîn zêdê giran derbas bû, min hê jî atmosfera civînê ji ser xwe neavêtiye. Ez ji aliyê fikrî ve zahf westiyam. Ji bo dema pêş min ji xwe re gelek wane û tecrûbe derxistin. Belkî min dixwest bi wan hevalan re nîqaş bikim, lê piştî ew qas tevlîheviyê min ew cesaret di xwe de nedît. Êdî em dema pêş aciziyên xwe ji ser xwe bavêjin û em rojekê hev bibînin dibe ku bi serekî rihet em wateyê bidin nêrînên hev.

Dembaş!

**30. 08. 2009, Gorsê**



# TU YÊ ÇAWA Dİ XETA RÊBER APO DE BİMEŞÎ

Ev nêzî heftiyekê ye em şopa Ziya dimeşînin. Me çend kesên ku pê re ketine têkiliyê dîtin. Yek ji wan niha di destê me de ye, me yek jî rê kir cem hevalan. Yeke din jî bi wî re digere, ew jin e. Êdî têkiliya wan di çi astê de bi hev re heye em nizanin. Me banî wê kesê kir nehat cem me. Herî dawî berî du rojan, me agahî ji Ziya girt; ew ciyê ku ew lê ye, me ew der xistiye bin çavdêriyê. Ev du roj in çûn

û hatina wî tuneye. Ev kes hem reviya ye, hem jî naçe dijmin. Di derbarê reva wî de tiştekî nizanin.
Li gorî kesên ku pê re ketine têkiliyê û li gorî Ziya ji wan re gotiye: "Di nav me de, Ziya ji aliyê hin kesan ve bi xiniziyê (xiyanet) hatiye tewanbarkirin. Dema ev gotin diçin guhê wî direve." Li gorî yên ku Ziya bi wan re ketibû têkiliyê ji me re gotin: Ziya gotiye: "Ez ê raporekî binivîsim tu yê vî raporê min bibî bigihînî hevalê Cuma, an jî hevalê Cemal." Jixwe yê ku serê mirov tevlîhev dike û mirov jê re çareseriyê nabîne, tevgera Ziya ye. Çima reviya ye; madem ku revî ye çima naçe dijmin; çima nayê cem me? Ev serê mirov tevlîhev dike. Ziya hê li çiya ye; hê karan dide meşandin. Karê ku dide meşandin jî bi riya hin kesan xwe bigihîne hin hevalên jor. Niha ev tevgera wî pir xeter e. Di qadên gerîla de bi serê xwe gelaciyê dike û têkiliyên rêxistinê dide şixulandin. Hê jî her kes wî li ser eyaletê dizane û pê re dixebite. Ev jî zerarê dide me û rêxistinê. Îtîbara rêxistinê tê xistin.
Ji bo wê jî berpirsiyarên qadê û eyaletê fermana sezadana wî dan. Em niha li pey wî ne, em wî li ku derê bibînin em ê wî seza bikin. Lê belê dîtina wî zahmet e. Ev kesê ku 17 salan gerîlatî kirî û me jî nas dike, ketina feqa me, yan jî dîtina me ya wî zahmet e. Eraziyê herî kêm em nas dikin herêma Ş. Brûsk, ew wek nava kefa destê xwe nas dike û serwer e, de were vî kesî zeft bike. Wê rojê jî min ji te re gotibû: "Ev kes fermandarê eyaletê bû." Eyaletê wek kefa destê xwe nas dike. Hemû herêmê; têkiliyên hevalan baş nas dike. Ji gerîlatiya xwe ya 17 salan; 14 salên xwe li vê herêmê derbas kiriye. Min ji vî kesî hez dikir; dema min agahiya reva vî kesî bihîst wek dibêjin; "şok bûm." Giraniyek ket ser laşê min; min nikaribû gava xwe bavêjim. Di reva vî kesî de min hê nû giraniya xiniziyê fêm kir û ez gihîştim ferqa xiniziyê. Berê jî min gelek kesên rêveberiyê yên di asta herî jor de dîtin û reviyan; tu kesî ew qas ez bandor

nekirim, an jî ez nexistim ferqa xiniziyê. Vî kesî gelek caran em şandin ser dijmin. Herî dawî em deh heval li erebeyê kirin û em çûn me êrîşî qereqola Hîzanê kir. Me di wê êrîşê de sê şêr şehîd dabûn. Herhalde ew tiştên ku me jiyan kirin em xistin ferqa giraniya xiniziya wî.
Dema hevalê Rizgar jî şehîd ketibû giraniyek ketibû ser laşê min. Ne min tenê; hemû hevalên eyaletê ew giranî jiyan kiribûn. Rast e, em bi qasî bi hevalê Rizgar ve girêdayî bûn, ancax em ji sedî deh bi wî kesî ve girêdayî bûn. Lê belê reva wî, li ser me gelek bandor kir. Lê ya ji me re esas hevalê Rizgar û sekna wî ya li nava rêxistinê bû. Îro çawa hevalê Rizgar ji bo me pîroz be, ew kes jî ji bo me ew qas bi lahnet e. Heke em vî kesî bibînin, em ê laşe wî tijî… bikin; tifî ser laşê wî bikin û xwe jê dûr bixin. Ez çima van ji te re dinivîsim; ji bo tu rojekê werî, bila ev ji te re bibin ronahî û tu bizanibî tu yê çawa di xeta Rêber Apo de bimeşî; tu yê kê ji xwe re esas bigirî û bimeşî, bila tu bizanibî.
Dembaş!

**06. 09. 2009, Arsek**

# *LI VIR KARÊ ME NE TENÊ ŞER E*

Ev çend roj in dîsa em ji hevalan qut bûne. Karê ku me dabû pêşiya xwe dîsa wek me dixwest pêk nehat. Nêzî pêncî rojî ye me du torbe arvan xwestine. Her ku em diçin dibêje: “Îro nebû sibê.” Ev sê car in em diçin,hê jî me erzaq negirtiye. Ji ber ku berî du caran dema em ketibûn gund, van kesan giliyê me kiribûn; ji bo wê jî bêhna me zahf teng bûbû û me ew bi zimanekî tund hişyar kirin.Vê carê me hemû gundî ji malên wan derxistin. Me got: “Yan hûn ê bi me re rast bixebitin, an jî hûn ê me nexapînin:” Hê jî ew erzaqê ku gotibûn,“Em ê ji we re bînin” me ji wan negirtibû.
Vê carê di koma me de du hevalên nû jî hebûn. Ji derveyî karê me yê karvanî, em dema xwe ya vale bi van hevalan re eleqederbûyîn û bi guftûgoyan derbas dikin. Ji van, yekî hê bi temamî biryara xwe ya tevlîbûnê nedaye. Ev kes me gelekî bi xwe ve mijûl dike. Axaftinên wî yek yekê nagire.Her ku em pê re diaxivin, ji me re qala pirsgirêkeke xwe ya din dike. Mirov rojekê pê re neaxive dikeve rewşeke neyînî. Niha bi piranî em dema xwe ya vale bi vî kesî ve, li ser pirsgirêkên wî derbas dikin. Em li ser derûniya wî guftûgo dikin. Li gorî dibêje; “Ev kes careke din dixwaze tevlî me bibe.” Ew ji aliyê dijmin ve tê girtin, dijmin bi derûniya wî dilîze û wî tevlîhev dike. Niha kesê ku derûniya wî xira bibe, em wê derûniyê nas dikin û pê ve mijûl dibin.
Hevalê din, ji vî hê ciwantir e û li gorî vî rewşa wî gelekî baş e. Mijarên ku em pê re guftûgo dikin bi giştî li ser jiyana gerîltiyê û taktîkên şer in. Ji aliyê din ve, em ji bo ku xwe ji aliyê bîrdoziyê ve bi pêş bixe, em pê re dibin alîkar. Bi giştî ev haval, me bi karê me ve dide mijûlkirin û ev kar karê me yê esasî ye. Her çendî carinan malbata wî were bîra wî jî, carinan li ser wan fikirandin çêbe jî, zû vedigere cihê ku lê ye. Hê ev heval zahf nû ye, ji bo dema pêş

hêviyê dide mirov. Lê hevalê din, ji bo dema pêş ne hêviyê dide mirov; şike dixe dilê mirov. Niha hemû armanca me ew e ku, em di demeke zû de vî hevalî bînin ser riya ku îro tê de dimeşe.

Werhasil min îro qala van tiştan kir ku tu bizanibî karê me li vir tenê ne şer e. Carinan em bi zarokên wek te re jî mijûl dibin, carinan jî jan dikeve serê me. Piştî ku me li eyeletê şervanên nû girtin, min fêm kir bi mirovan ve mijûbûn çiqasî zor e; guhertina mirovekî çiqasî wextê mirov dixwe.

Ez niha hê baştir wate didim gotina Serokatiyê ya ku dibêje: “Şerê ku ez didim meşandin ji sedî not li hemberî we ye; ji sedî deh li hemberî dijmin e.” Dema mirov bixwe dikeve nav hin karan mirov zor û zahmetiya wan karan fêm dike. Dema ku mirovek ji nava pergala dijmin tê nav pergala azadiyê divê mirov wî/ê ji nû ve bigire dest û tu wî/ê bi her awayî biguherînî. Hemû tiştên ku ji dijmin girtine divê tu ji ser wî/ê bidî avêtin û kesayeteke nû tê de bidî rûniştandin. Êdî te çi qas ji Rêbertî û rêxistinê rast fêm kiriye, divê tu xwe bi her awayî bidiyê û van kesan biguherî. Pêwîst e tu van kesan ji bo dema pêş bînî asteke têkoşer ku vê şoreşê berdewam bike. Wek min gotî; mirov gelek zahmetiyan dikişinin û mirov bi xêra van kesan gelek aliyên xwe yên kêm jî dibîne, di heman demê de li hemberî xwe jî dest bi sîtemekê dike.

Bi tevlîbûna van hevalên nû re û bi eleqederbûna wan re, ji aliyekê ve em jî xwe perwerde dikin û xwe di ber çahvan re derbas dikin. Em aliyê xwe yê kêm; aliyê xwe yê ku em nikarin ji wan re bibin bersiv, di nava şer de bi mijûlbûna wan ve, em jî kêmasiyên xwe derbas dikin. Tu niha dibêjî: “Ma kêmasiyê gerîla hene?” Erê kêmasiyê herî zêde yê gerila ne. Ji ber ku ji bo pergaleke nû şer dikin; ji bo cîhaneke nû ava bikin şer dikin. Bi pergaleke demdirêj re rû bir û ne; ango li hemberî hev in. Heke kêmasiyên wan ne zêde bûna vê pergala xwînxwar nikaribû ewqasî li ber xwe bida. Ji

bo wê kêmasiyên me zahf in. Heke me ji sedî deh jî, Rêbertî fêm bikira û me di jiyana xwe de pêk bianiya, îro Kurdistan û gelê me dê di vê rewşê de nebûya. Her çiqasî em ji bo vî gelî şer dikin jî; rewşa ku ev gel tê de ye sebebek jî em in. Ji ber ku em di fêmkirin û pêkanîna Rêbertiya xwe de kêm dimînin; di Rêbertî jiyankirinê de em kêmasiyan jiyan dikin. Ji bo wê jî sebebê rewşa îro em in. Her çiqasî bi têkoşîna tevgera azadiyê û gerîla, gelê me ji rewşeke mirinê rabûye jî, hatiye rewşeke jiyanê, hê nehatiye rewşa azadiyê û niha azad jiyan nake; ji bo azadiyê jiyan dike. Em jî hê azad jiyan nakin; ji bo azadiyê têdikoşin. Ger me di dema wê de Rêber Apo fêm kiriba û me di xwe de bida jiyankirin, îro me yê ji bo azadiyê şer nekiriba, me dê bi awayeke din ji bo çawa azadiya xwe bi pêş bixin şer bikira. Ji ber ku kêmasiyên me zêde ne, em hê ji bo azadiyê têdikoşin.

Dembaş!

**15. 09. 2009 Ziyret**

## *KALEKÎ HEFTÊ SALÎ*

Niha baran dibare. Êdî dema wê ye. Ji bo me jî rezalet dest pê dike. Niha dema xebatên amadekariyên zivistanê ne. Di van deman de rawestandin nabe. Yên ku karên xwe neqedandine nemane. Herêma me hê bi tamamî dest bi karê xwe nekiriye. Ev jî tê wê wateyê ku em ê karê xwe, di baranê de bikin. Zahmet e. Lê ji ber ku em xwe jiyan û perwerde bikin zahmetî li ber çavan nayê; êdî dibe mecbûrî. Heke me xwe dereng nehiştiba, dê karê me jî heta niha qediyaba. Niha em dev ji kar berdin; em dîsa werin baranê. Baran ji aliyekî ve baş e, lê belê ji gelek aliyan ve jî ne baş e. Mirov her dem şil dibê, ev şilbûn jî dibe sebeba nexweşiyan. Niha çend hevalên nû li cem me hene. Ev heval hê nizanin xwe biparêzin. Dema îro baran bariya her sisêyan jî xwe şilopilo kirin û ne xema wan bû. Hê dema pêş nafikirin, an jî hê ne di ferqa barê ku ketiye stûyê wan de ne. Dibe ku ji ber wê jî hê li xwe nafikirin, an jî hê qet nexweş neketine. Her çiqasî em dixwazin wan biparêzin jî, em kêm dimînin.

Duh cejna remezanê bû. Me dît ku hevalek ji van hevalên nû, hevalê Botan, di bin kon de wek kalekî heftê salî qurtên mezin li cixareyê dixe. Ez çûm cem wî, min jê re got: “Çi heye, çima tu bi tenê rûniştiyî? Wî ji min re got: “Îro cejn e, malbata min ketiye bîra min.” Em li ser vê mijarê axivîn. Min jê re qala te jî kir. Min got; xwîşka min jî heye û bi salan ji te mezintir e, ez niha jê re nivîsan dinivîsim, lê belê ne wek çardeh salî be, wek heft salî be jê re dinivîsim. Li ser van axaftinan morale wî hate cih.

**09. 21. 2009, Gorsê**

## *WARGEHA ZİVİSTANÊ PÊWÎST E*

Te dît min ji te re qala yekî kiribû. Min gotibû; hê tam biryar nedaye; em pê re guftûgo dikin. Her gotinên wî cuda ne. Ew kes berî çar rojan reviya û dûrbîna min jî bi xwe re bir. Ji derveyî wê çeka me jî bi xwe re bir û çû radestî qereqolê bû. Ji derveyî wî, niha sê hevalên nû mane, rewşa wan baş e.

Gelek dem di ser nivîsa min a dawîn re derbas bû. Ev çend roj bû derfetên min ên ku ez ji te re binivîsim nebûn. Em di nav karekî pir zahmet de bûn û em ji sibê heta êvarê dixebitîn. Ji roja ku min nivîsa dawîn ji te re nivîsîbû, ji wê rojê û pê ve ez û du hevalên din me xebatên wargeha zivistanê didan meşandin. Ev kar gelekî zahmet bû. Roj hebû me heta êvarê zomp (balyoz) dida xebitandin. Roj hebûn me tevir û bêr didan xebitandin. Dema dibû êvar em ji hal diketin. Di navberan de jî herî zêde me çayek vedixwar; an jî xwarinek dixwar. Piştî wê dîsa me dest bi karê xwe dikir. Vî karî pir dema me xwar. Lê ji ber ku em zivistanê hem di rihetiyê de bin; hem perwerdeyeke xurt û bi tendirust bibînin ev kar pir pêwîst bû. Karê me yê wargehê ji gelek karên me yên din girîngtir û pêwîstir bû. Ji ber ku em westandin, an jî giraniya karvaniyekê ji ser xwe bavêjin; ji bo em xwe ji bo dema pêş hê xurtir û amade bikin; derkevin û karvaniyeke din bidin meşandin, wargeha zivistanê pir pêwîst e.

**12. 10. 2009**

## *JI NIHA VE NÊZÎKATIYA DIJMIN DIYAR E*

Wek min got; wexta min tuneye, şert û merc dest nadin ez bi dilê xwe ji te re binivîsim. Nivîsa min a jor di nîvî de ma. Ez êdî berdewama wê nanivîsim. Niha dîsa karê wargehê didim meşandin. Karê me zêde nemaye. Îro-sibê aliyên wê yên zahmet diqedin; ên din jî ew qas ne girîng in. Bi demê re jî mirov dikare wan biqedîne. Wek tu jî dizanî ji meha adarê û vir ve rêxistinê bi awayekî yek alî biryara bê çalakiyê girtibû. Heta niha gelek guftûgo hatin kirin, lê ev tenê di asta axaftinê de man.

Niha jî ji bo bangawaziya Serokatiyê dê sê komên aştiyê werin rêkirin. Dê sibê komên Mexmûr û gerîla werin deriyê sînor ê Slopî. Ji niha ve nêzîkatiya dijmin diyar e, ew ê wek nêzkatiya not û nehan (99'an) be. Ez naxwazim li ser van nêrîn bidim, tenê bala min kişand, ji bo wê min ji te re got. Tiştên pêwîst rêxistin ji me baştir difikire û dibîne. Ji bo wê guftûgo ne karê me ye.

**18. 10. 2007**



ŞEHÎD ÇEKAN







ŞEHÎD ŞÎYAR

# GUL ÊDÎ XWE BI XWÎNA XWE DÊ AV BIDIN

Dixwazim îro nivîsa xwe li ser Hîzanê binivîsim. Par di hivdehê cotmehê de li ser qereqola Hîzanê çalakiyeke bi serdegirtnê pêk hat. Nêzî bîst hevalan di vê çalakiyê de cih girt. Ji van hevalan deh kes parastina dûr, çar kes takviye, şeş kesên din jî bi awayekî du baskan êrîşên qereqolê kirin. Li ser baskekî hevalê Mêrîwan bû, li ser baskekî din jî hevalê Devrîm bû. Piştî deh rojên lêhûrbûnê ev vesazîbûn hat diyarkirin. Her bîst hevalan jî dixwestin di nava van şeş hevalên êrîşê de cihên xwe bigirin.

Lê belê tenê şeş kesan di nav de cih girtin. Li gorî plansaziya hatibû diyarkirin, diviya ku bi tarîtiyê re heval ji qereqolê derketibana; ango hê cîhan ronî qereqol biketa. Lê belê plansazî hê di serî de şaş çû, pîqaba ku hatibû ji ber barana zêde nikaribû di hevrazÎ de derkeve, lewre çalakiyê zêdeyî bîst xulekan dereng dest pê kir. Ev jî dereng bû û êdî tarîtî ketibû.

Ji bo wê jî dema hevalan dest bi çalakiyê kir; hevalan xwestin destê xwe zû bigirin. Dema ev xwestek pêk hat êdî di plansaziyê de jî kêmasî derketin holê. Dema di plansaziyê de yek rêgez pêk neyê

êdî kêmasî wek xelekên zincîrê hev dişopînin. Dema me destpêkê li qereqolê da, dijmin jî di heman demê de bi roketan bersiv da û li vir roket li nava hevalê Çekan ket; ev heval hê di pîqabê de bû şehîd ket.
Baskê hevalê Devrîm hedefa xwe ya destpêkê pêk anîbû, kozika li ber deriyê nîzamiyê xistibû. Di heman demê de hevalê Mêrîwan jî kozika quncikê rastê xistibû. Dema ku me li ber deriyê nîzamiyeyê xwe gihand wan, wê demê diviya H. Devrîm û H. Şiyar kozika li ber xwe rakiriba û bigihîştana kozika quncikê qereqolê ya aliyê çepê û bigirta. Lê belê her du hevalan jî hema êrîşê qereqolê kirin. Ji ber ku kozik ranebûbûn, H. Şiyar li ber deriyê qereqolê şehîd ket. Diviya baskê hevalê Mêrîwan jî têketa nav hewşa qereqolê; wan jî kozik rakiriba. Di vê baskî de, jî diviyabû ez li dûv H. Merîwan û H. Harûn têketama hundir, ji bo wê min lez kir. Min û hevalekî cihê hevalê Devrîm wan girtiba, ez û ew, em bi hev re têketana hundirê qereqolê.
Dema min xwe gihand cihê H. Devrîm, hevalê Devrîm ketibû hundirê qereqolê jî. Min jî di quncikê qereqolê yê rastê de parastina xwe kir. Wê demê dema min li  pişt xwe meyze kir, min dît ku hevalê Mêrîwan hejiya û ket erdê. Min tam nedît ka gule ji kîjan aliyî ve hat. Dema ku hevalê Harûn jî hat cem min, me odeya fermandarê qereqolê tarûmar kiribû. Piştre me tang û kozikên dora tangê hemû xistin. Me nehişt kes biçe ser tangê. Bi wê re hevalê Xebat guleyeke bisivingê ya dijtang li bin luleya tangê xist û tang bi temamî îmha bû. Berî gule li tangê bikeve, hevalê harûn sê çavên li ser tangê ku wek çanaqan e, ew îmha kiribûn. Li gorî agahiyên bi destê me ketibûn; ev çav îmha bibin êdî şifêr pêşiya xwe nabîne. Jixwe yekî xwest biçe ser tangê bi gulebarana ji aliyê hevalan ve wek seradê lê hat. Piştî wê jî tu kes neket nav tevgereke bi vî awayî. Tenê kozikeke wan mabû, ji ber ku em di

nava qereqolê de bûn; ew jî ne guleyê wê ji me digirtin, ne jî guleyê me jê digirtin. Hevalan hundirê qereqolê serûbinê hev kirin; tu tiştekî wan ê teknîkî nehiştin. Cihê wan ê razanê gulebaran kirin û narincok (bombe) avêtinê. Cihê xwarinê bi heman awayî…
Leşkerên ku mirin, jixwe mirin, ên ku sax filitîn jî wan hemûyan xwe avêtibûn pişt qereqolê. Qereqol tevî hewşa wê bîst xulekan di destê hevalan de ma. Di vê çalakiyê de hevaleke jin jî hebû, wê hevalê gelek rista xwe lîst û bi hevalan re gelekî alîkarî kir. Di çalakiyê de erka ku jê re hatibû diyarkirin, wê hevalê ji wê erkê gelekî zêdetir rista xwe lîst.
Dema ku em bi paşve kişiyan hê nû min laşê hevalê Şiyar ê li erdê dît. Hema deh metre li kêleka min; li ber peykerê Beton Kemal dirêjkirîbû. Min wê demê şehadeta wî ferq kir. Dema ku em ji qereqolê derketin, min dît ku ji derveyî H. Mêrîwan û H. Şiyar hevalê Çekan jî naxwiyê. Min wê demê ferq kir. Min ji hevalê Harûn pirsî û min got; “Ka hevalê Çekan.” Hevalê Dr. Orhan got: “Şehîd ket.” Hevalê Xebat jî ji her du milên xwe birîndar bûbû. Bi xêra birîndariya wî, hevalan kozika veşartî ya ku hevalê Mêrîwan û hevalê Şiyar şehîd xistibûn ferq kirin û hevalê Cûdiyê Zaza ew kozik îmha kir. Me di vê çalakiyê de yek MG 3, du G 3 û şeş narincokên destan ji ser dijmin rakirin. Ji ber ku birîndarên me hebûn, sê şehîdên me hebûn, du hevalan çek bi xwe re anîn, ji bo wê jî me ancax ev çek gihand cihê saxlem.
Armanca min ne ew bû ku ez ji te re qala vê çalakiyê bikim, armanca min a bingehîn ew bû ez qala van her sê hevalên ku şehîd ketin bikim. Ev kî bûn, çi bûn û ji ku derê bûn? Di nava tevgera azadiyê de xwedî helwesteke bi çi awayî bûn, sekna wan a di nava çalakiya ku tê de gihîştin şehadetê çawa bû, xwesteka wan a tevlîbûna wan çi bû û bi çi awayî bû? Ez ê kêm kêm ji te re qala

wan bikim û wan kesên ku ji bo eyaleta Amedê bûn ronahî, dibe ku ji bo te jî bibin ronahî û biryarek.

Hevalê Mêrîwan ji Başûrê Kurdistanê, ji bajarê Silêmaniyê bû. Ev heval di eyaleta Amedê de bi dilnizmî, fedekarî karkeriya xwe dihat naskirin. Vî hevalî tu carî dilê tu kesî ji xwe nehiştibû. Dema qala hevaltî, dilnizmî û fedekariyê dihat kirin, despêkê hevalê Mêrîwan dihat bîra mirov. Bi rastî di dema çalakiyê de jî hevalê herî zêde bi dil ûcan dixwest ku tevlî çalakiyê bibe û vê çalakiyê bi ser bixe yek jî ev heval, ango hevalê Mêrîwan bû. Dema ku êrîşî kozika dijmin jî kir û narincok li nav kozika dijmin jî xist, ev xwesteka wî diyar bû. Hevalekî gelek çalak bû. Dema ku mirov li şekl û şemala wî temaşe bikira, tu kesî ev jê texmîn nedikir ku ev heval ew qas çalak û bi lez be. Dema xwest têkeve nav qereqolê jî bi lez bû, dema birîndar bû jî xwest zû ji qereqolê derkeve û ji hevalan re nebe bar. Lê belê nikaribû bi qasî guleyê, bi lez be û tu kes jî nikare bi qasî guleyê bi lez be û bi guleyê re bigihîje. Tam salek di ser şehadeta wî re derbas bû û hê jî gora wî di nav goristana Licê de ye. Dema ku malbata wî xwedîderketina gelê Licê ya li Ş. Mêrîwan dîtibûn, hevalê Mêrîwan jî ji wan re hiştibûn.

Hevalê Şiyar, hevalekî ji Rojavayê Kurdistanê, ji Kobanê bû. Hevalê Şiyar bi cesareta xwe û bi çalaktiya xwe dihat naskirin. Di eyaletê de, bi destpêkirina pêngava 1'ê pûşperê (hezîran) yê ku cara yekemîn li ser dijmin çek rakiribû hevalê Şiyar bû. Piştî çekrakirina wî û şûnde; piştî du salan di karvaniya eyeletê de çekrakirina li ser dijmin kete meriyetê. Ji bo di çalakiyê de çek li ser dijmin were rakirin û bi taybetî ji bo çekrakirinê hevalek bi taybetî hatibû xwestin. Heval li gorî qelewbûna xwe gelek bi lez û bez bû. Di dema çalakiyê de ew qas xwe li ser qereqolê kilît kiribû ku, kozika li pêş xwe nefikirî. Ji bo wî hedef, xistina qereqolê bû. Wekî din tu astengiyan nikaribû wî bide sekinandin. Li ber hedefa xwe ketibû

erdê. Çend gavên din jî biavêta dê bigihîşta miradê xwe. Lê belê ew kozika ku ranekiribû nehîşt bigihîje hedefê... Berî çalakiyê, hê di dema plansaziya çalakî û keşfê dihat kirin de, di sekna wî de diyar bû ku çiqasî dixwaze tevlî çalakiyê bibe. Dibe ku ji sedî sed bizanibe dê tevlî bibe jî. Moral û coşa wî di asta herî jor de bû. Piştî 12-13 salan di eyaletê de, dê çalakiya bi serdegirtina qereqolekê pêk were û ew bixwe jî dê di vê çalakiyê de cih bigire. Dibe ku coş û şabûna wî ji ber wê be jî. Di heman demê de ji bo derdoran jî moralek bû. Hevalê Çekan, hevalekî ji Rojhilatê Kurdistanê ji bajarê Makuyê bû. Di sala 2006'an de hatibû eyaletê. Berî salekê li Gabarê mabû. Di eyaletê de tu kesî wek wî nedixwest tevlî çalakiyê bibe. Ji bo ku tevlî çalakiyekê bibe tam salekê, yek rojekê li cihekî ranediwestiya. Her dem di nava tevgerekê de bû. Li herêmê li ku derê çalakî hebûya divê wî xwe bigihanda wê derê. Tam salekê bi lez û bez li dûv çalakiyan derbas kir.

Dema çalakiya Cîmê sabote bû, yê herî zêde li ber diket jî ew bû. Piştî salekê li ser riya Licê tevlî çalakiya dolmîşê bû; ev jî tam ber dilê wî negirtibû. Piştre li Koyspî tevlî çalakiya skorskiyê bû. Herî dawî, di dema amadekariya çalakiya Hîzanê de hat ji Cîmê mînak didan û moral dida hevalan. Dizanibû ku dê çalakî bi pîqaba transît were kirin. Digot: “Way kûçik ez dîtim, nizanim leşker diaxivin, nizanim têl hene, ez nikarim biçim, vê carê ev yek jî nîn in; vê carê rêxistinê tedbîr girtiyê; me li pîqabê dike, li ber derî datîne. An em ê lêxin bi pêş ve biçin, an jî em ê hemû werin kuştin. Heta em hemûyan paqij nekin bi paşve veger tuneye.” Rojê çar-pênc caran ev mînak didan û heval didan kenandin. Êdî yan dê ev çalakî bi ser bikeve, yan jî em ê hemû bimirin, ev rastiyek bû. An dê me hedefa li ber xwe rakiriba, yan jî  hedefê dê em hemû kuştibana.

Hevalê herî bi moral, hevalê Çekan bû. Di çalakiyê de yê despêkê bi ser dijmin de gule reşandin jî dîsa ew bû. Yê despêkê şehîd ket jî

dîsa ew bû. Dema dijmin di pîqabê de roket li nav me xist ew li kêleka min a rastê bû. Roket li ser zikê wî ket. Dema bi basinca roketê em pênc heval bi ser hev de ketin, min got qey em bi basinca roketa hevalan ketin. Dema em bi ser de ketin gotina wî ya dawîn, got: "Çi bû, lawo çi bû." Min got qey em bi ser de ketin ji bo wê got. Piştre, dema em paşve kişiyan, min şehadeta wî bihîst.

Êdî min dizanibû ji bo çi wisa gotibû. Me çekên wan girtin, lê me çeka hevalê Çekan negirtibû. Em di nîvê rê de pê hesiyan. Me sê gul di baxçe de çandin û em hatin. Êdî gul dê xwe bi xwîna xwe av dabana. Êdî her sê bibûn sembol. Bes ez dixwazim di derbarê wan hevalan de, di derbarê perwerdeyê de û di derbarê rewşa xwe ya vê zivistanê de te agahdar bikim.

**19. 12. 2009 Wargeha Gorsê**

# EM Ê ÇAWA MIROVAHIYÊ BÎNIN CIHÊ KU HÊJAYÎ WÎ YE

Me duh di wargehê (qamp) de dest bi perwerdeya xwe ya zivistanê kir. Waneya me ya despêkê li ser wate û giringiya perwerdeyê bû. Ev wane ji aliyê hevalê Nûman ve hate dayîn. Bi rastî jî heval wate û girîngya ku mirov bidin perwerdeyê bi her awayî û gelek xweş anî ser ziman.

Di vê gotina xwe de girîngiya ku pergal didin perwerdeyê, perwerde çi yê û bi çi dirûvî mirovên di bin pergala xwe de bi çi awayî perwerde dikin. Ji bo bo ku xwe ji pêşveçûyînên demê re bikin yek, an jî jê nemînin çi rê û rêbazan didin xebitandin. Pergala waneya perwerdeyê bi çi awayî ye li ser hat sekinandin. Carinan jî perwerdeya di nav me de girîngiya wê ji bo me çi ye, divê em bi çi awayî nêzî perwerdeyê bibin, perwerde ji bo mirov tê çi wateyê, an jî mirov çima perwerdeyê dibînin, armanca dîtina perwerdeyê çi ye. Rêxistin çima girîngiyê dide perwerdeyê? Hem bi awayê pirsan, hem jî vekirina van. Heval careke din, ez ji aliyê perwerdeyê ve anîm ser hişyariyekê.

Tu yê niha bêjî ma hûn qet perwerdeyê nabînin? Na. Em her dem perwerdeyê dibînin û em mirovên perwerdekirî ne. Lê şert û mercên me carinan me ji me dûr dike. Ev xwe di axaftin, sekn û nêzîkayên me de dide diyarkirin. Hin caran jî, em ji xwe re dibêjin; çima em wisa bûn, an jî me çima wisa kir. Ev kêmasî ne û divê wisa nebe. Wek min got: “Em mirov in.” Heke em di perwerdeyê de, ango di xwe terbiyekirinê de sistahiyan bikin, em jî dibin wek mirovên ji rêzê. Lê belê em dizanin ku em, ne mirovên ji rêzê ne.

Me berpirsiyartiya gelekî û pêşxistina pergaleke nû daye ser milên xwe. Me ev jî bidil daye ser milên xwe. Tu kesekî bi zor û zahmetî

nedaye ser milên me. Heke ku em li gorî berpirsiyariya me dayê ser milên xwe, em tevnegerin wê demê em bixwe li xwe xiniziyê dikin. Xinizî ji bo şoreşgerekî; an jî têkoşerekî/ê tiştekî ku nayê pejirandine ye. Çima van ji te re dinivîsim? Carinan ez jî li gorî barê ku min daye ser milên xwe tevnagerim. Gelek kêmasiyên min hene. Ev kêmasî di her kesî de hene, lê belê rêxistin van napejirîne û zerarê didin. Li hemberî pêşketinan, astengiyan derdixin. Heke mirov di dema wan de li ser van kêmasiyan nesekine, bi demê re ev dibin kelem û wek çiya bilind dibin. Êdî mirov nikare ji nav derkeve. Wek pora dînan lê tê. Dema ku wisa bibe di mirov de şkandin bi pêş dikeve. Mirovê ku şkest jî êdî li gorî hestên xwe tevdigere û hişê (aqil) xwe dide kêlekekê. Dema hiş nebe êdî wê demê mirov dibe qûlê hestan. Wê demê dê hestên mirov mirov bibe ku derê ne diyar e. Heman tişt ji bo hiş jî derbasdar e. Dema mirov hişê xwe tenê bide xebitandin wê demê hestên mirov jî kor dibin û bûyera wijdan derdikeve holê. Mirovê ku wijdana wî nebe, dê mirov çiqasî pê bawer bibin.

Esas tişta ku min dixwest bêjim, em niha hatin ser. Em niha li cîhanê binêrin. Du pergal deshilatiya xwe dimeşînin; pergalek feodalîzm, yek jî kapîtalîzm. Di pergala feodalîst de, mirovên ku hene bi piranî mirovên ku ji mantik dûr in. Kesên ku li gorî hestên xwe dimeşin. Li cem wan xebitandina hiş tuneye. Fikirandin û hin tişt li gorî hiş çareserkirin tuneye. Li gorî wan her tişt ji aliyê xwedê ve hatiye afirandin û ancax xwedê wan çareser bike. Xwedê jî di pirtûkên pîroz de hemû tişt gotiye. Derketina derveyî wan tewanbarî ye. Hê xwe di dema tarîtiyê de didin jiyîn; wek keriyan; heke şivan nebe nikarin xwe bidin meşandin. Ancax ê ku hiş bide wan û riya rast nîşanî wan bidin, an şêx, an seyîd, an beg, an mele, yan jî seyîd û seyda ne. Li gorî xwe nikarin tu karî bikin. Tu ferq û cudahiya wan mirovan ji zindiyên din ku ji xwe re jiyan dikin

tuneye. Di pergala sermayedarî (kapîtalîst) de tam berovajî pergala feodal e. Di pergala sermayedarî de jî mirov ji aliyê pergalê ve, bi awayekî giştî ji hest û hestiyariyê hatiye dûrxistin. Di mirovên pergala sermayedarî de her tişt li ser hiş û mejî tê xebitandin. Tiştên ku ji derveyî zagonên hiş bin, ew mirov tu carî wî kar û xebatî wê têkiliyê pêk nayînin. Ango tu carî ji hestên xwe re cî venaqetînin. Dema ku her tişt li ser aqil û mejî be bi awayekî xwezayî hest dimirin. Me gotibû; wê demê bûyera wijdan derdikeve holê. Mirov dikare dîsa li civaka sermayedarî binêre. Ewrûpa û Emerîka yên ku serkêşiya vî karî dikin û bûyerên ku bi salan e li Iraq û Afqanîstanê tên jiyankirin. An jî mirov dikare wan pergalên ku ew tê de jiiyan dikin bigire dest… Heta ku ji wan tê kesayetên egoîst, (xweperest) civakbûyîn tuneye. (Her çiqasî rêxistinên wan hebin jî ew ji bo berjewendiyên kesyetiyê tên xebitandin).

Bûyera malbat, cîrantî, xizmtî, û heta dayîk û bavtiyê jî di nav wan de tuneye. Mirov di pergala sermayedarî de wek mal-made ye; made jî ji wan re yan riya qazancê yan jî rêya ajohewandinê ye. Ji bo wan, ji derveyî van wekî din nayê wateya tu tiştekî din. Mînak; di cîhanê de rojê bi hezaran mirov ji birçîbûnê, yan jî ji sebeba şerê ku ew bûne sebeb dimirin û ew jî wan bi navbênkariya çapemeniyê temaşe dikin. Tu dibînî ku qet ne xema wan e. Lê belê pisîk, kûçik, an jî mişkên ku di mala xwe de xwedî dikin, dema ku tiştek tê serê wan ajalan bi rojan digirîn.

Di çanda wan de hevaltî, dostanî, cîrantî, tuneye. Çima? Ji ber ku nahêle, pergalê wisa aniye serê wan; her kesek compîterek û odeyeke wî/ê ya xebatê heye. Her wiha di zarokatiyê de ew bi awayekî xweperestiyê digihîje; têkiliya wî/ê ji civakê, ji her kesî qut dike. Dema ku wisa be hest jî nabin, cihê ku hest jî nebin bi awayekî pir zêde hiş dixebite; her tişt ji bo wî/ê serbest e. Dema

ku wiha be civaka ajalên kovî derdikeve holê; bi aqil, lê belê tênê xwedêgiravê mirov. Mirov dikare vê jî bibêje; perwerde tenê bi xwendin û zanistê jî nabe. Îro mirovê herî zêde dixwîne; xwendevan e, yan jî pispor, profesor, zanyar in hemû di pergala sermayedar de ne. Hemû çekên kîmyewî, nexweşiyên bê çare, ev kesên ku me li jor dan diyarkirin ew bixwe derdixin. Ev jî tê wê wateyê; ji ber ku hestên wî nemane dikare her xirabiyê bîne serê cîhanê.
Me berê jî gotibû; her pergal li gorî berjewendiyên xwe mirovên xwe yan jî civaka xwe ava dike û li gorî wan bîrdoziya xwe xurt dike. Dema ku mirov li pergala feodal û sermayedarî dinêre, mirov hê baştir dibîne û fêm dike ku ev pergal, bi sedsalan e çawa xwe li ser piyan digirin. Kesayet an jî civakên wek pez, an jî wek keriyan ji xwe re afirandine. Ji bo ku wan hê baştir bikin kerî, an jî ajal her ku diçe pergala perwerdeya xwe xurt û fireh dikin. Li ber çavên wan bi her awayî xirabî û nebaşiyê bi wan dikin. Ew jî wek gayê ku li trênê binêrin li wan dinêrin û di ser de jî ji wan re li çepikan dixin.
Di pergala me de, yan jî di pergala ku em ji bo mirovahiyê dixwazin biafirînin de perwerde çi ye û di perwerdeya me de hem ji aqil re û hem jî ji hestan re bi çi awayî vekiriye. Me li jorê ku hest ji aqil dûr be dê çi bibe, me bi kurtayî dabû diyarkirin; aqil jî ji hestan dûr bibe dê çi bibe me encamên wê jî dabû diyarkirin. Ji bo wê, em dixwazin di perwerdeyên me de bibe mirovê hemû kar û xebat, an jî mijûlbûna me, ango ya rêxistinê bi vî awayî ye. Mirovekî azad, xwedî fikir, xwedî nêrîn, xwedî dahûrîn, xwedî çareserî û pêşeng ê çawa be. Tarîtiya Rojhilata Navîn û gelê Kurd tê de ne, yan jî sedsalên ku di navbera me, gelên din û civakên din de, em ê vê navberê çawa bigirin. Gelê me ciyê ku layîqê wê derê ye em ê çawa bînin wê astê. Di ronahiya derewîn a Ewrûpayê de, ew ronahiya ku çavên mirovan digire, em ê çawa çavên xwe vekin,

ronahiya derewîn bi ronahiya Rojê û xwezayê neguherin. Rastiya cîhanê çi ye, îro cîhan li ku derê ye û di çi şert û mercan de ye? Li gorî hiş û hestên xwe yên rast em ê çawa nizanibin xwe jê rizgar bikin û pergala xwe ya ku em dibêjin; ji mirovan re azadî û wekheviyê bînin, em ê çawa di demeke kurt de bînin cîhanê li ser wê ye. Lê belê di pergal û perwerdeya me de jî, em ê çawa kesayetî, an jî civakan bikin kole, em ê çawa wan ji bo berjewendiyên xwe bidin xebitandin, em ê çawa bibin şivanê keriyan, em ê van keriyan çawa bidin meşandin, an jî em ê çawa û bi çi awayî bibin xwediyê wan, an jî ew ê çawa ji me re bibin xulam (qûl), ev di pergal û têkoşîna me de tiştên ku herî zêde em li hemberî disekinin, an jî kesên ku dixwazin xwe wisa bibînin pergala perwerdeya me jî dixwaze van tiştên paşketî yê ne li gorî mirovahiyê ji ser me û ji ser civakê bavêje, em xwe perwerde dikin. Ji ber ku em mirovahiyê bînin ciyê ku hêjayî wê ye, em xwe perwerde dikin.

Em ê hiş û hestên xwe çawa bi hev re bikin yek? Em ê çawa hejayî kar û têkoşîna ku li ber me ye bibin? Em ê çawa hêjayî gel û paşeroja gel bibin? Em ê çawa û bi çi awayî xwe di bîrdoziyê de kûr bikin? Bîrdozî ji me çi dixwaze? Pêdiviya demê, pêdiviya pêvajoyê çi ye, em ê çawa fêm bikin û bixin karvaniyê? Em xwe li ser van perwerde dikin. Ev jî pêdiviyên pergal û bîrdoziya me ne. Çawa ku pergala li hemberî me ji ber ku xwe li ser piyan bigire têdikoşin, em jî ji ber ku xwe li hemberî wan li ser piyan bigirin û bîrdoziya xwe belav bikin; xwe bi awayekî pergal bidin pejirandin; kêmasiyên ku di me de ne derbas bikin, em xwe perwerde dikin. Ne ku pergala deshilatdar, ango dagirker ava bikin têdikoşin. Têkoşina me û perwerdeya me hilweşandina wan pergalan e. Ji bo wê jî pêdivî bi perwerdeyeke watedar û girîng heye. Dibe ku mirov xwe di perwerdeyê de baş bibîne, xwe rast bike û xwe di xetê de

rast bike. Em ê paşerojê, di lêhûrbûna perwerdeya zivistanê de bibînin û bigirin dest, ji bo wê divê mirov xwe û fikrê xwe zelal bikin. Ji bo wê jî ev pêvajoya zivistanê ji bo paşerojê gelek girîng e.

**24. 12. 2009/ Wargeha Gorsê**

# RÊBAZÊN XWE GİHANDİNA HEQÎQETÊ

Îro sersal e, ser sal ne li gorî dîroka me ya sersalê ye… Sersal ku em dibêjin; li gorî xirîstiyanan e. Ev roj wek mîladekê girtine dest. Roja ku Îsa ji dayîk bûye; ev roj e. Dîroka xwe ji wê rojê digirin dest û ji salnameya xwe re jî dibêjin; mîlad.

Niha xwedê wê rojê Îsa daye ne daye, ew jî ne diyar e. Dibên vê rojê, ango 1'ê rêbendanê ji dayîk bûye. Ev roj jî bûye sersala wan. Yê ku wek wan, an jî dixwazin bibin wek wan, ew jî vê salnameyê dişixulînin.

Di Rojhilata Navîn de tenê Tirkiye vê salnameyê dişixulîne. Ereb salnameya Hîcrî (derketin) dişixulînin. Ev jî roja ku Mûhemed ji ber putperestiyê, ji Mekeyê derdikeve, ew roj e. Ereb û misilman bi vê rojê dîroka xwe dest pe dikin û dîroka xwe li gorî vê salnameyê didomînin.

Kurd jî salnameyeke wan heye. Ji ber ku bi hezarên salan e bindest jiyan dikin, ew jî êdî li gorî desthilatdarên xwe tevdigerin. Mînak; Kurdên li Iraq û Sûriyê li gorî salnameya Hîcrî; Kurdên li Tirkiyeyê li gorî salnameya Mîladî sersala xwe pîroz dikin. Wisa dizanin. Lê belê her çiqasî Kurdên li Îranê li gorî sersala Hîcrî tevbigerin jî sersala wan roja Newrozê ye. Her çiqasî pergala Komara Îslamî ya Îranê salnameya Hîcrî bide şixulandin jî, sersala wan, ne ku roja Mûhemed ji Mekeyê reviyaye. Sersala xwe li gorî kevneşopiya xwe pîroz dikin, ya rastîn sersala wan Newroz e.

Kurd salnameya xwe, an jî dîroka xwe roja hêzên MEDAN împeretoriya Asûran hildiweşînin, xwe ji bin dagirkeriyê, ji bin zilma wan derdixin wê rojê rojeke nû; dîrokeke nû digirin dest û dîroka xwe ji wê rojê dest pê dikin. Her ku salname dizivire; sal derbas dibe û tên wê rojê; ji wê rojê re dibêjin: "NEWROZ!" Ji ber ku deshilatdariya Kurdan bi qasî 277 salan didome û ji xiyaneta navxweyî bi destê xwe didin persan. Ji ber ku pers jî bi çanda

Zerdeştî ve girêdayîne, bi bawer in, û azadiya MEDAN jî li ser exlaqê Zerdeşt xwe gihandibû armanca xwe. Pers jî vê paşverotiyê didomînin bi heman dîrokê xwe xwedî dikin. Duh hem sersal bû, hem jî waneya me ya “Rêbaz û Heqîqetê” qediya.
Bi rastî di derbarê heqîqet û rêbaz de zanebûna min zaf kêm bû. Ji kêmbûnê jî kêmtir, an jî mirov dikarin bêjin; qet nebû. Tiştên ku hebûn jî hemû şaş û nîvçe bûn. Ji despêka dîroka mirovahiyê heta îro rêbazên ku hatine şixulandin çi ne û van rêbazan çiqas encam girtine, an jî şaşîtiyên wan çi bûn, yek bi yek li ser hat sekinandin.
Yek: Ji bo rêbaz nerînên Rêbertî : « Rêbaz weke têgîn rê, hînbûyîn û nêzîkbûnên hestyarî û aqlane ne ku dikin mirov bi awayekî herî kurtebir bigihîje armancên xwe û encamê. Kengî zelal bû ku wê kîjan rê te kurtebir bigihîne hedefa herî rast, wê wextê rêbaz hatiye dîtin. »

Du: Heqîqet rastiya ku mirov dizane, an jî rastiya ku heye di mejiyê mirovan de xwe dide der ew e, rastî ne heqîqet e, rastî aliyekî wê ye; tiştê ku di rastiyê de xwe dide der e. Heqîqet ew e. Mînak: Hemû mirov yek in, ev rastî ye. Hemû mirov yek in; lê belê hemû mirov îro di şertên wek hev de jiyan nakin. Yê ku van nakokiyan bizanibe, ew rastiyan dizane; ne heqîqetê. Ji ber ku heqîqetê bizanibe rastiya ku dizane divê li gorî wê, wê rastiyê bide derdora xwe. Li gorî wê rastiyê hem jiyan bike, hem tevbigere û têkoşîna wê heqîqetê bike.
Ne ku tenê bizane û bibîne. Gelek kes, gelek tiştan dibînin, an jî dizanin, lê belê nikarin vê rast bidin fêmkirin, an jî di ser guhê xwe re davêjin. Mînaka Hallacî Mensûr; Halac bi salan dergah namîne ku nagere. Ol namîne ku lêkolîn nake; an jî oldar namînin ku biwan re jiyan nake. Dixwaze xwe bigihîne heqîqetê. Lê belê ne dergah, ne jî ol li gorî fikir û ramanên wînikarin rastiyê şîrove bikin. Herî

dawîn Halac heqîqetê di kesayetiya xwe de dibîne. Bi salan li nîvê cîhanê geriya, lê belê herî dawîn heqîqet di xwe de dît.
Halac xwe nas kir; xwe gihand mezinbûna mirov. Mirov çi ye, dikare çi bike, çi biafirîne, mirov ji çi çêbûye, di xwe de çi vedişêre û dikare çi bike; an jî mirov çima bûye mirov? Dema Halac xwe nas dike dibêjê: “Enel Heq” ango ez heq im, heqîqet im, heqîqet ez im û vê heqîqeta ku xwe digihînê bi mirovan re parve dike. Xwe digihîne ferqa mirovan û êdî mirov bi mirovan dide naskirin. Ev jî dibe sebeb ku wî jirêderketyê ol bidin nîşandan û wî bikujin. Dema ew kuştin jî ji fikrê xwe gav bi paşve neavêt. Yê ku ew kuştin jî baş dizanibûn Halac rast e û rast dibêje. Mirov nikare bi aqil tenê xwe bigihîne heqîqetê. Li jor jî me got; “Halac mirov û mirovahiyê ji hemû aliyan ve lêkolîn dike; aqil (hiş), giyan (ruh), dîtin, kirde û bireser ku di mirovan de heye, kî kîjan rolê dilîze, bi yekbûyînê kirde û bireser mirov xwe digihîne çi, an jî rola wan a di jiyana mirovan de û girîngiya wan çi ye? Feraseta wan a li hember hev, an jî feraseta wan a li dij hev çi ye? Mirov vê hemûyî digirin dest. Niha jî rola rêbaz di dîroka mirovahiyê de çi ye; an jî bi kîjan rêbaz bi çi awayî xwe bigihîne heqîqetê. Mîtolojî, gotin, çîrok, an jî jê re dibêjin “gotinên vale.”
Di anîmîzmê de her tiştek zindî û pîroz bû. Ji bo wê jî her kes jî xwe re totemekê dide ava kirin. Di destpêkê de tiştên ku nikarî bûn wate bidinê, ji xwe re dikirin totem û baweriya xwe pê di anîn. ; ew dibû totema wan. Xweza hemû zindî bû. Di nav wê xwezayê de gelek tiştên pîroz hebûn. Ji bo wê mirovê wê demê xwe bi temamî di xwezayê de didîtin. Tu kesî dest nedida totemê tu kesî, an jî bandor li ser totemê kesekî din nedikir. Ji ber ku xweza xwezaya hemûyan bû. Tiştên ku wate nedidanê, an jî jê ditirsiyan, wan li gorî xwe dianîn ziman, mezinbûna wan û hêza wan dipejirandin.

Piştî ku şaristaniya dewletî tê avakirin, bi demê re ji bo parastina exlaq baweriya olan pêş dikeve. Feraseta zihniyeta desthilatdariya bandora xwe li ser pêşdeçûnên pevajoya olan dike. Di olan de, hemû zindîbûna xwezyê û xweza wek tiştekî vale û bê pêdivî hat dîtin; hemû tişt bi hêzeke ku nayê dîtin hat pênasekirin û ew nayê xwiyakirin. Ew hêz birin heft qatên jor ezman danîn û jê re gotin: "Xweda." Gelek nivîs û pirtûk anîn gotin: "wek ku wî gotiye, an jî nivîsiye û şandiye bi mirovan dan pejirandin."
Olan ji aliyê sincî (exlaq) ve gelek tişt bi mirovan dan qezenckirin. Ji bo mirov xwe hê baştir û di xweşiyê de bijîn, an jî mirov xwe ji asta ajaltiyê derxin sinc bi pêş ket. Lê belê ji aliyê mejî ve jî mirov bi pêş ket. Mirov li cihê mejiyê xwe bidin şixulandin, mirov bi sinc tenê ve hat sînordarkirin û ew bi hestên wan re hiştin. Mirov di zanyariyê de gelek bi pêş ket. Mirov ji aliyê hiş û mejî ve xwe gihand asteke herî jor. Kêmasiya zanyariyê jî hiş tenê xebitandin e, bi vê ve bi sînor ma. Ceribandin, an jî gelek tiştên ku ji bo mirovahiyê dîtin, an jî afirandin nayên înkarkirin. Zanyarî yan jî zanistiyê, rêbaza ku derxist holê mirov wek robotekê dît; ji hestan û ji wijdan dûrxist. Dibe ku zanistê atom parçe kiribe, lê belê îro narincoka atomê li serê mirovahiyê bûye bela û bişkova wê dane destê dînekî, yan jî bê wijdanekî dê sibê çi bike ne diyar e.
Di van rêbazan de her rêbazên mirov li gorî xwe girtiye dest û xwestiye bi vî awayî xwe bigihîne heqîqetê. Di mîtolojiyê de mirov her tiştê derveyî xwe hêz dîtiye û bi wan xwe îfade kiriye. Di olan de her tişt bi hiş, an jî bi rihekî ve (xweda) hatiye sînorkirin û mirov tiştekî bê pêdivî hatiye dîtin. Di heman demê de xweza jî bi heman wateyê dibînin û pêşiya pêşketinan digirin.
Di zanistan pozîtîvîst de jî her tiştî bi made digirin dest; mirov û xweza wek made ne, an jî meta bin û wan li gorî pîroziya wan nagire dest; wan li gorî xebitandina wan digirin dest.

Ol her tiştî bi hiş û ruh; zanist pozîtîvîst jî bi madeyê mirovan digire dest; her tiştî şîrove dike, kes şîrove, an jî dîtinên hev napejirînin. Dema mirov li rastiyê meyze dike; mirov û xweza hemû jî made ye, hem jî ji giyan pêk tê; ne yek aliye. Mirov hem made ye, hem jî giyan e. Ango mirov ji kirde û bireser pêk tê. Hem analîtîk û hem jî hestiyar e.

Di olan de tenê giyan û hestiyarî dane pêş; di zanista pozîtivist de tenê made û analîtîk dane pêş. Ji ber wê jî nikarin xwe bigihînin heqîqetê. Divê mirov ji hemû aliyan ve were dest girtin, xwe bigihîne ferqa rastiya xwe û ya xwezayê. Heke ne wiha be dê tu kes tu carî nikaribe xwe bigihîne armanca xwe. Kesê ku xwe nas neke û ne di ferqa rastiya xwe de be, ew ê rojekê ji armanca xwe jî vegere, an jî ew ê berovajî armanca xwe tevbigere. Ji rewşa cîhana ku îro em tê de dijîn jî diyar e ku her kes bûye dijberê mirovahî û cîhanê.

**01.01.2010 / Wargeha Gorsê**




# DI BINGEHA HER KÊMASIYÊ DE PARA MIN HEYE

Demeke dirêj e min ji t e re nenivîsandiye. Herî dawî dema min nivîsand, bi temamî 17 roj di ser re derbas bûn. Di vê mehê de; di yekê mehê de nivîsa xwe ya dawîn, roja min nivîsand wê rojê, di destika (cîhaz) mezin de şîfre dan ku li Apê Mûsa wargehek deşîfre bûye. Li ser wê ez û hevalekî em ji wargehê derketin çûn wargeha ku digotin: “Deşîfre bûye.”Em berê di wê wargehê de mabûn. Ji ber ku gotin: “Wargeh deşîfre bûye û dibe ku haya hevalên di wargehê de ji deşîfrebûnê nebe, yan jî ji wargehê derketibin cih nebe lê bimînin, em çûn cem wan.

Dema em ji êvarê heta sibehê meşiyan, dîsa jî me xwe negihand cem wan. Roja din piştî nîvro dîsa em ketin rê. Jixwe êvarê bi cilan ve li du çemên ku çavkaniya Çemê Dicleyê ne, me xwe lê da. Piştre jî baranê li me kir. Dema me da cihekî, jixwe tiştekî ku em li ser rakevin jî nebû. Ji ber ku ew demeke dirêj bû em meşiyabûn, her dera me diêşiya. Me nikaribû ji jana çokên xwe rakevin.

Wargeha ku deşîfre bûbû wargeha stiyan bû. Di nav van hevalan de fermandareke qadê û yek jî ya eyaletê hebû. Bi giştî heft heval bûn. Dema em çûn cem wan, haya wan ji tiştekî nebû. Dema me ji wan re got: “Wargeha we deşîfre bûye, di heman demê de hûn ê bi me re werin.” Her çiqasî diyar nekirin jî bandorekê li ser wan kir. Bû roja din me ew hemû li transîtê siwar kirin, ew ji herêmê derxistin û anîn wargeha xwe.

Her zivistan dema ez dikevim wargehê, hem ji tengbûna cih, hem jî ji westandina karvaniyê her dem ez teng dibim. Bandora tengasiyên civakê hê jî li ser min maye. Mînak; bêşêwazî, dema ez teng dibim tengbûna min di şêwazê min de xwe dide diyarkirin. Ev nêzîkatî hem min, hem jî derdora min nerihet dike. Ev jî dibin bingeha nakokî û guftûgoyên neyînî.

Çend roj berê dîsa jî ji ber pirsgirêkeke wisa ez û fermandarê eyaletê li ser vê, yan jî ev bû zemîn em ketin qirika hev. Civînek hat çêkirin, di vê civînê de me dîsa pratîk û pirsgirêkên salekê nirxandin. Ji bo nêzîkatî, di şêwaz de kêmasiyên ku di min de û di hevalan de derdikevin hatin rexnekirin. Neyîniyên ku derdikevin holê bi awayekî vekirî li ser hat sekinandin. Di derheqê me her sê rêveberan de biryar hat girtin ku em helwest û nêzîkatiyên xwe ji nû ve bidin diyarkirin. Em her sê hevalên ku di rêveberiya herêmê de cih digirin, dîsa ji aliyê hevalan ve hat pejirandin ku em li ser peywira xwe bimînin. Dema me encama civînê nirxand, vê carê dîsa ji ne fêmkirinê em rêveberiya wargehê li hev ketin. (Li hev ketina me ne wek a sivîlan; bi awayekî rexne û guftûgohkirinê ye) Min di vê civînê de îstîfa kir. Ji ber hinek nêzîkatiyên ne di cih de û ev hem di min de, hem jî di hevalan de bû sedema bêmoraliyê. Pirsgirêkên ku derketibûn her kesî dixwest ji stûyê xwe bavêje û xwe bi derdora xwe rave (îzah) bike. Ji ber vê rewşê, min û fermandarê herêmê, me xwe şûnde da, lê belê ji aliyê hevalan ve nehat pejirandin. Niha vê jî di min de bêmoraliyek ava kiriye. Ya rastî piştî civîna taximê jî min îstîfa kir, an jî pêşniyar kir ku peywira min were sekinandin û ez wek şervanekî xwe tevlî bikim. Ev jî nehat pejirandin. Rexneyên ji min re hatibûn, ji min re giran hatibûn. Li ser vê jî ez ketibûm nêzîkatiyeke wisa.

Hemin em van wek encamên perwerdeyê digirin dest. Perwerdeya ku em dibînin, di vê perwerdeyê de jî em kêmasiyên xwe dibînin.

Divê li ser sekinandinek were çêkirin. Êdî her çiqasî bi êş be jî, ev êş ji bo dema pêş û paşerojê, ji me re bibe alîkar û ronahiyek. Mirovê kêmasiyê xwe nebîne nikare bi pêş jî bikeve. Ji bo ku em bi pêş bikevin û xwe ji kêmasiyan xilas bikin hinek êş jî pêwîst in. Her çiqasî em bi awayekî hestiyar nêzîk bibin û hinek tiştan nepejirînin jî, di bingehê de ev rastiyên me ne û divê em li ser bisekinin.

**01. 17. 2010 / Wargeha Gorsê**




# PIRSGIRÊKÊN HEYÎ ÇAVKANIYA XWE JI MIN DIGIRIN

Îro bîstê reşemiyê ye. Ev mehek zêdetir e min ji te re nenivîsandiye. Di vê demê de me bi giştî perwerde li ser Parêznameyên Rêbertiyê dît. Her çiqasî min ji te re di derheqê xwe de nenivîsandibe jî, min gelek helbest nivîsandin. Ev helbest bi piranî li ser hevalên şehîd bûn. Hinek wekî din jî bûn. Yanî min hestên xwe kêmekî jî di helbestan de anîn ser ziman.

Yek jî nenivîsandina min, min hê tam xwe komî ser hev nekiriye. Ev nêzî mehekê ye, ango piştî civîna herî dawîn min ji te re nivîsandiye. Hê bandora wê li ser min heye. Ji derveyî wê, piştî wê civînê lêhûrbûna min belav bû; êdî kêmekî lêhûrbûna min çû hinek aliyên din. Vê jî nehişt ez tam li ser perwerdeyê kûr bibim. Ev demeke dirêj e jî, hê min tam xwe komî ser hev nekiriye.


Hemin em nikarin bêjin perwerdeya ku me dît me qet encamek jê dernexistiye, yan jî me jê negirtiye. Tiştê ku ez dixwazim bêjim; ji

ber ku lêhûrbûna min belav bû, asta ku min di despêka perwerdeyê de ji xwe re diyar kiribû, ez zaf li dûrê wê mam.

Êdî bihar tê perwerde û lêhûrbûna zivistanê ku em gihandine astekê, divê em bi wê coş û kelecanê derketibûna. Heke ez ji bo ya xwe bêjim; ez niha ne di wê asta ku ji min dihat xwestin de me. Ev demeke dirêj e ez dixwazim fikrê ku min bi paşve dibe, ez ji ser xwe bavêjim; lê belê hê bi tememî min ji ser xwe neavêtiye. Yan jî aliyên ku di min de ne, ez bi temamî li ser nafikirim; an jî wekî difikirim dikim. Ger ne wisa be, çima lêhûrbûna min piştî ew qas fikirandinê komî ser hev nabe. Tê wê wateyê ku fikirandina min bi temamî nîn e. Ev jî di min de dibe sedema bêmoraliyê. Heke heta demeke din ez xwe komî ser hev nekim, dibe ku bi derketina biharê re em ji pêvajoyê re bibin asteng; an jî nikaribin bi temamî ji pêvajoyê re bibin bersiv.

Bi rastî jî pirsgirêkên min, çavkaniya xwe ji min digirin. Ez van dizanim, dibe ku di dema pêş de ez van pirsgirêkan ji te re binivîsim. Wê demê tu yê jî fêm bikî çima ez tam nikarim fikrê xwe ronî bikim. Tu yê hê baştir fêm bikî.

**02. 02. 2010 / 2010**




# AMED LI ÇAND Û HUNERA XWE XWEDÎ DERKEVE

Niha cihê ku ez lê me şilî ye. Gavek berê zîpik barîn; her libeke wê bi qasî xarekê (gule) bûn. Me kon li ser xwe vegirtin, ji bo wê em şil nebûn. Niha baran û zîpik sekiniye, lê belê hê xurexura ewran tê. Êdî bihar e û şiliyên mezin derbas bûn. Ji îro û pê ve rojên biharê tên û derbas dibin, bandoreke mezin li ser me nakin. Li pêşiya me havîn e. Bihar bi şiliyê; havîn bi germahiyê mirov aciz dike. Payîz jî bi serma û bi şiliyê. Zivistan her çiqasî giran be jî, dema cihê mirov zexm be, serma û seqem li mirov kar nake.

Cihê ku niha ez lê me, roj bi dûrbînê Amed hemû dixwiyê. Bi şev jî ronahiya bajêr di deştê de wek zeryayekê ye. Ji aliyê din ve bendava Qiral Qizi li ber me ye. Em jî ji jor ve, ango li serê çiyayê bilind bala xwe didin van xweşikbûn û ne xweşikbûnên xwezayê.

Bendava Qiral Qizi bi dehan gund û bi hezaran donim erd û daristan dibinê xwe de hiştiye û vedişêre. Dema mirov ji jor ve bala xwe dide vê bendavê gelekî xweş e, lê belê dema mirov li xwezayê difikire û piştî çil salê din, cihê ku vê bendavê girtiye nav xwe, dê hemû bibe çol. Êdî ne mirov ne jî zindiyên din nikarin tê

de bijîn. Ev jî tê wê wateyê ku bi kîlometre qareyan axa Kurdistanê êdî bi kar nayê û dimire.
Yek jî bajarê Amedê; dilê Kurdistanê; xewn û xeyalên me her roj mezin dibe û her roj dibe beton, êdî ax namîne ku rojekê yek li ser xew bike. Li gorî bajarvaniyê, Amed her ku diçe xweşik dibe û li gorî bajarên din ew jî dibe bajarekî nûjen. Lê belê li gorî me Amed her roj dibe gora mirovahiyê û ji çand û ferhenga xwe dûr dikeve. Her çiqasî navê wê Amed be jî; êdî ji Amedtiyê tiştek nemaye. Îro di Amedê de êdî Amedî bi Kurdî naaxivin. Êdî kes cil û bergên kurdewarî jî li xwe nake. Berê di Amedê de peyayan şal şapik û êlek li xwe dikirin; keçan jî fîstan (kiras) li xwe dikirin; jinan jî fîstan li xwe dikirin û kofî didan serê xwe. Îro ne ji van peyayan, ne jî ji van jinan kes li çanda xwe xwedî dernakeve. Êdî dilê Kurdistanê, wek dilê Ewrûpayê dijî. Bi çand û huner hemû hatine guhertin. Berê dengbêj bûn. Wiha bûye dê kî mûzîka pop baş bêje! Di Amedê de çawa ku zimanê wan hatiye pişaftin; çand û huner jî hatiye pişaftin. Ev aliyên neyînî ne. Aliyên ku li çand, huner û zimanê xwe xwedî derdikevin jî hene. Lê belê ev nûjeniya DYE û Ewrûpayê êdî li çar aliyên cîhanê bûye deshilatdar û her çand û hunerê di nav xwe de dipişêve.
Armanca me ya yekemîn jî, em li çand, huner û li zimanê xwe xwedî derkevin. Îro şerê ku em didin meşandin di bingeh de xwedîderketina li çand, huner û zimanê kurdî ye. Heke mirovek van winda bike, ji rastiya xwe û ji mirovahiyê jî derdikeve, edî dibe mirovekî din û rastiyeke din. Ango tê pişaftin û dibe tiştekî din. Ji ber ku mirov nebin tiştekî din, divê mirov li xwe, li çand xwe, li zimanê xwe xwedî derkevin û li ser ray û bingeha wan, wan bi pêş bixin. Ne ku di bin navê em çand, huner û zimanê kurdî bi pêş bixin de, çand û hunera derve wek ku ya me ye, em bigirin û boyax bikin.

Îro gelek hunermendên kurd bi zimanê kurdî, lê belê bi rêbazê Ewrûpayê stranan dibêjin. Ev jî pêşxistina ziman û çanda kurdî ye? Ev şemitandina çanda Ewrûpayê ye. Wek hinekên din, zarî (texlît) hinekên din kirin û qîr kirin, ne zimanê me, ne jî çanda me bi pêş naxe. Ez nabêjim bila her kes bibe dengbêj û nikarin bibin jî, lê belê ev sih sal in gelê me êş û eleman dikişîne, kêm kesan li ser van stran, klam derxistin û dibêjin. Moda rep, pop û rak bi pêş ketiye. Ev jî ne çanda me ne û em napejirînin. Min ev li ser Amedê gotin. Her çiqasî ji aliyê pergalê ve bi Amedê were lîstin û bixwazin wê ji cewherê wê dûr bixin, Amed dîsa jî di dilê me de û di mejiyê me de evîna me ye û em ê wê biparêzin.

**10 Gulan 2010**

# MIROV JI WAN WANEYAN BIGIRE

Ne ku te bê biryar bikim van ji te re dibêjim. Di jiyana me de qet qala van nayên kirin; ji ber ku tiştên xwezayî ne. Yek jî ev zahmet nayên hesibandin. Min gotibû; ez û hevalê Çekdar çûbûn. Hevalê Çekdar bi eslê xwe hevalekî ereb e, ji Hatayê ye. Ev heval ji bo azadî û rizgariya me; ango ji bo gelê kurd hatiye tevlî şoreşa me bûye. Bi me re li hemberî zordestên xwe û zordestên tirkan şer dike. Divê mirov rêzê nîşanî kesayetiyên wiha bidin. Yan jî mirov ji xwe re waneyan jê bigire û ji bo azadiya gelê xwe bi her awayî têkeve nav kar. Di nav tevgera PKK'ê de ne tenê ev heval e, bi sedan heval wek vî hevalî hene û bi dehan jî şehîd bûne. Heke ku ji netewên din mirov tên ji bo azadiya me şer dikin, şehîd dibin, ger kesê ku ji xwe re bêje ez kurd im, ji bo xwe û azadiya xwe têkoşîn neke, ji wan bê rûmetir tu kes tune.

Dembaş !

**26. 07. Heftenîn /Ş. Bêrîtan**

# CARINAN KÊMASÎ JÎ MIROV BI PÊŞ DIXIN

Duh êvarê ez çûm ser gora fermandarê xwe, hê min xwe negihandibû cem gora wî heyecanekê ez girtim. Em dema li Başûr û dema di riya Bakur de bûn, em bi hev re bûn, gotinên wî hatin bîra min. Her dem ji me re digot: "Heke hûn xwe bi pêş nexin an hûn ê bibin peyk (uydu), yan jî hûn ê bibin dûvika hinek kesan. Heke hûn xwe bi pêş bixin, hûn ê di asta wan de, bi wan re bimeşin." Rast digot. Heke mirov xwe bi pêş nexe, mirov ê her dem bi gotin û fikrê kes, an jî kesayetan bimeşe, an jî bikeve. Lê belê mirov xwe bi pêş bixe, rastî û şaşîtiyan ji hev derxe, riya ku mirov tê de bimeşe û bixwe diyar bike zerara ku derbikeve jî, wê ji zerar û kêmasiyên ku bi fikrê derdoran derdikevin ê hê kêmtir bin. Qet nebe kêmasî ji fikrê te derketiye. Wekî din jî tu yê îhtîmalan hê bêtir bidî ber çavan. Wisa jî bi awayekî xwezayî mirov bi pêş dikeve. Tu dibînî carinan jî kêmasî mirov bi pêş dixin. Nexwe na, mirov her dem bi fikrê derdoran bimeşe; mirov tu caran encamê jî ji kar û xebatên xwe dernaxin.